# PROPAGANDA
# Û
# AJÎTASYON

**Hevalê Abbas**

**Weşanên Akademiya Çapemeniyê ya Gûrbetellî Ersoz**

**Propaganda û Ajîtasyon**

**Hevalê Abbas**

**Cihê Çapê: Çapxaneya Azadî**
**Dîroka Çapê: 2019**

**Weşanên Akademiya Çapemeniyê ya Gûrbetellî Ersoz**

## NAVEROK

**Pêşgotin** ........................................................................................ 5

1-WATE Û GIRÎNGIYA PROPAGANDA-AJÎTASYONÊ ....... 7

2-DI NAV PKK'Ê DE PROPAGANDA Û AJÎTASYON ........ 25
**a-Propaganda û Ajîtasyona Devkî** ..........................................29
**b- Propaganda û Ajîtasyona Çekdarî** .......................................33
**c- Propaganda û Ajîtasyona Nivîskî**.........................................35

3-LI SER XETA RÊBERTIYÊ ZIRAVTIYÊN PROPAGANDA **Û AJÎTASYONÊ**
..................................................................................................41

4-BI ÇAR PÊVAJOYAN XEBATÊN PROPAGANDA-**AJÎTASYONA PKK'Ê**...................................................................59
**a-Pêvajoya Yekemîn:**
**Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê û Derxistina Serxwebûnê**
..................................................................................................69
**b-Pêvajoya Duyemîn:**
**Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê** ...............................................81
**c-Pêvajoya Sêyemîn:**
**Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê** ...............................................91
**d-Pêvajoya Çaremîn:**
**Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê: Qonaxa YRD'ê**............. 102

5-NIRXANDINA PRATÎKA YRD’Ê.................................... 123
**a-Nêzîkbûna Perwerdê û Pirsgirêkên Kadro** ..................... 128
**b-Xebatên Rêxistinî û Pirsgirêkên Rêveberiyê** ................. 142
**c-Pirsgirêkên Uslûb, Terz û Tempoyê** .................................. 150

6-WEZÎFEYÊN JINÛVE AVAKIRINÊ ................................ 158
**a-Perwerdeya Îdeolojîk û Pîşeyî ya Kadro**
**–Sîstema Akademîk-** ................................................................ 181
**b-Xebata Rêxistî-Partî-Sîstem-Rêveberî**.............................. 192
**c-Uslûp, Tempo û Terzê Karkirinê**........................................ 204
**d-Qadên Cuda yên Propaganda û Ajîtasyonê**
**(Çapemeniya Nivîskî, Dîtbarî, Bihîzbarî û Qada Mecazî)**
........................................................................................................ 213
**e-Xeta Weşanê:** ........................................................................ 234
**f-Têkoşîna Li Dijî Şerê Psîkolojîk** .......................................... 242
**Encam**......................................................................................... 267

## Pêşgotin

Di têkoşîna şoreşgerî de ku hêza yekemîn e, pirsgirêkên rû didin çi ne? Wezîfeyên ku li ser vî esasî werin bicîhanîn çi ne? Pirsgirêk ji kû tên, çareserî çi ne? Ji bo xebitandina van rêyên çareseriyê, lazim e çi were kirin? Wezîfeyên rêveberiyê çi ne? Wezîfeyên Tevgera Giştî çi ne? Wezîfeyên li ber giştî pêşengiya Partiya me çi ne? Wezîfeyên rêxistina YRD'ê ku bi şiklekî xweser ji bo meşandina xebatên propaganda û ajîtasyonê hatiye rêxistinkirin, çi ne? Lazim e Komîteya Giştî ya YRD'ê çi bike? Komîteyên Jêr ew ê çi bikin? Bi giştî xebatên YRD'ê, lazim e di nav vê atmosfere de çawa bê plankirin, rêxistinkirin û meşandin?

Li ser vî esasî, me perwerdeya Hevalê Abbas a li ser **"Propaganda û Ajîtasyonê"** mîna pirtûkekê amade kir û em bi we hevalan re parve dikin. Ev pirtûk bersivên kûr û berfireh dide pirsên li jorê. Em bawer in ku ew ê li ser vî bingehî tevkariyeke girîng li giştî hevalan bike.

**Komîteya Çapemeniyê ya PKK'ê**
9'ê Cotmeha 2019'an

# 1-WATE Û GIRÎNGIYA PROPAGANDA-AJÎTASYONÊ

Di serî de em dixwazin têkildarî mijarê hin têgînan binirxînin. Dîsa li gel têgînan em ê hewl bidin wekî destpêk derheqê wate û girîngiya mijarê hin xisûsan diyar bikin.

Gotinên *propaganda* û *ajîtasyonê* li gel hev tên bikaranîn. Hin destpêkê dibêjin ajîtasyon hin jî têgîna propagandayê bi kar tînin. Dema ku yek beriya ya din tê, bi rastî jî di warê wateyî de guhertinekê çêdike yan ne, em nizanin. Bikaranîna pev re, ne ji hemwatebûnê ye, lazim e wer neyê fêmkirin, lê jev jî pir zêde ne qut in. Bikaranîna pev re, gelo ji ber temamkariya hev e yan ji ber ku pev re qadekê pêk tînin, dikare bê nirxandin, lê gelemperî bi hev re tên bikaranîn.

Propaganda û ajîtasyon wekî hemwate ne çapemenî-weşan e, lazim e şaş neyên bikaranîn. Çapemenî-weşan, şêweyekî propaganda û ajîtasyonê ye, lê ne giştî ye. Ne rast e bê gotin ku propaganda û ajîtasyon tenê bi çapemenî-weşanê gengaz e. Çapemenî-weşan, dibe ku di meşandina xebatên propaganda û ajîtasyonê de ya herî girîng, herî berfireh be. Lê belê, yek ji amûrên xebatên propaganda û ajîtasyonê ye. Lewma jî çapemenî-weşan û propaganda-ajîtasyon ne eynî tişt in, an jî lazim e herdu wekî hemwate neyên nirxandin.

Wekî têgeh propaganda û ajîtasyon ji kû tên, kokên wan digihêjin kû, ez nikarim tiştekî bêjim, min lêkolîneke wisa jî nekiriye, neketiye rojeva min jî. Di çarçoveya mijara perwerdeyê de wekî pirs tê aqlê mirov. Lê, teqez e ku koka xwe Latînî ne. Êdî em wateyên wan ên Latînî bi kar tînin. Her hal gelek zimanan jî wekî têgeh ji vê kokê girtine, guncandine û bi kar anîne.

Propaganda, hê zêdetir têkildarî ragihandina ramanê ye, wekî fonksiyon jî têgeheke pêwendîdarê perwerdeyê ye. Em dikarin propagandakirinê wekî perwerdekirinê jî pênase bikin. Rêber Apo, xebata perwerdeyê wekî xebateke propagandayê dinirxand, gelemperî wisa nêz dibû. Dema ku propaganda wekî

têgeh wisa bê nirxandin, em dikarin wekî pênase bêjin bi sîstemekê û kûrahiyekê îzahkirin, ragihandin û bi şiklekî ku bandorê li mirovan bike teşedayîna ramanekî ye. Li vir kûrahî û berfirehî heye, tê xwestin ku hin tişt bêne îzahkirin û zelalkirin. Propaganda xwedî taybetmendî û naverokeke wisa ye.

Ajîtasyon bi temamî ne wisa ye, hê bêhtir têkildarî bandorkirinê, tevgerkirinê ye. Di naveroka propagandayê de bûyîna xwedî fikirêkî, kûrahiya wateyekê heye, lê ajîtasyon hê zêdetir xwedî naverokeke wisa ye ku bertek çêbibin, hest zindî bibin û bikevin nav liv û tevgerê. Ji vê perspektîfê, di nava ajîtasyonê de tiştekî wisa tine ye ku fikirêk bi sîstem, kûrahî û berfirehî bê îzahkirin, vegotin û zelalkirin. Feqet, tiştekî wisa heye ku encama fikirêkê bi şiklekî bibandor xwe bigihîne hestên mirovan û li ser vê rêgehê bixe nav hereketê. Ji ber vê yekê, propaganda berfireh e, kûr e. Ajîtasyon ne kûr û berfireh e; kurt û teng e, bandorker e. Di nav propagandayê de pêşxistina wateyê, avakirina zihniyetê, lewre jî perwerde heye. Ajîtasyon jî îfadeya bandorkirina hestan û xistina nav çalakiyê ye. Lewma jî zimanê propagandayê zimanê perwerdeyê ye, perwerdekar e, vebêj e. Zimanê ajîtasyonê zimanê çalakiyê ye, dixe nav tevgerê, bi bandor e, beralî dike. Têgeheke wisa yekparebûnê û terzê dayînê dihewîne.

Dema ku ji bo komên mirovan an jî xebateke şoreşgerî tê nirxandin, propaganda hê zêdetir pêwendiya xwe bi amadekariyê heye. Çi di çarçoveya partî de, çi artêşê de, çi di çarçoveya sazî û rêxistinên demokratîk de be, bi armanca ku komên mirovan karibin wezîfeyên diyar bimeşînin, îfadeya dana qezenckirina ramanê ye, amadekirinê ye. Em dibêjin, xebata me ya herî girîng a amadekariyê, perwerde ye. Perwerde, bi giştî tê maneya propagandayê. Em li vir xebata propagandayê dimeşînin. Ez niha wezîfeya propagandakariyê dikim. Lewma jî ji bo karkirinê, ji bo meşandina wezîfeyeke şoreşgerî, propaganda tê maneya xebata amadekariyê.

Ajîtasyon jî ferman e, îfadeya çalakkirinê, meşandina kar e. Eger bê dîqetkirin, amadekarî û meşandina kar jev ne qut in, wekî pêvajoyên ku hevûdu didin domandin derdikevin ortê, lê herdu ne eynî ne. Mînak, di dema amadekariyê de ajîtasyon nabe. Ango bi wî şiklî ti karî nake, nikare rolê bilîze. Wê demê, diyar e ku di jiyanê de, di xebatên şoreşgerî de, ber bi karekî de destpêk a propagandayê ye. Wekî wext, wekî pêvajo pêşik propaganda ye, ango têkildarî perwerde û amadekariyê ye. Ajîtasyon li pey wê, piştî wê tê. Ser meselê, wextê çûyîna karekî, ketina nav çalakiyê dihêle bi şiklekî kelecantir, bi wêrek, fedakarî û îradeya hê tûjtir bi şêweyeke hê çalak, hêzdar berê xwe bidiyê. Ji bo vê arastekirina ferdan a ji bo wezîfe, kar, xebatên cuda yên şoreşgerî, ajîtasyon tê gotin. Vegotin, zelalkirina ku bê ev kar dê çawa bêne kirin, çima bêne kirin, ew ê çi encamê bidin jî îfadeya propagandayê ye, meşandina karê propagandayê. Der heqê têgehên propaganda û ajîtasyonê, bi îfadeyên giştî em dikarin van bêjin. Eger bê dîqetkirin, pêwendî jî cihêwaziya wan jî derdikeve ortê.

Propaganda dikare bi şêweyên cuda bê kirin. Bandorkirin, perwerdekirina mirovan bi ziman dibe, bi nivîsê dibe, bi çalakiyê dibe. Van amûran bi kar tîne. Di vê rewşê de organên propagandayê dibin çi? Teqez karê mejî tê de heye, ziman an jî nivîs xwedî fonksiyon in. Ji bo vê jî uslûp, xîtab, terz lazim e. Ajîtasyon dikare nivîskî jî be bi çalakî be jî. Lê wisa li mirov tê ku cihê gotinê, hêza ziman di ajîtasyonê de hê li pêştir e. Herî kêm qasî di pratîkê de xuyaye, tê jiyîn wisa diyar e, em wisa fêm dikin.

Dema ku em van hemûyan dinirxînin, di xebatên propaganda û ajîtasyonê de têgîn derdikevin pêşberî me çi ne? Uslûp e, cidiyet e, bandorkerî ye, kişînerî ye. Hêza ziman, hostatiya nivîsê, encamgiriya pratîkê di xebatên propaganda û ajîtasyonê de rolê dilîze. Gelek têgehên hevşib mîna têgehên ku di vê xebatê de cih digirin, rolê dilîzin derdikevin pêşberî me. Pêwîst e em van jî bizanin. Wekî nimûne, bandorkerî, kişînerî,

uslûp, bi giştî cidiyet. Ev hemû çawa ji bo propaganda û ajîtasyona devkî xwedî girîngiyekê ne, ji bo giştî jî girîng in. Li ser vî hîmî, propaganda û ajîtasyon bi giştî xebateke wisa ye ku ewil bi hêza ziman, bi gotinê tê meşandin. Bi taybet jî dema ku propaganda mîna xebateke perwerdeyê tê meşandin, bi rehetî tê dîtin ku hêza gotinê, xebata devkî, hêza ziman hê bêhtir li pêş in, bi bandortir in. Propaganda û ajîtasyon di plana giştî de wekî xebateke devkî têne dîtin. Bi rehendekî din jî nivîskî tê kirin. Ji ya nivîskî re "çapemenî-weşan" dihate gotin. Bi pêşketina amûrên mîna radyo, televîzyonê; wisa li çapemenî-weşanê hatiye ku ji hewandina propagandaya nivîskî jî wirdetir çûye, amûrên propagandaya devkî jî girtine nava xwe. Amûrên propagandaya devkî zêde bûne. Berê, pêşketina teknîkî ne di vê astê de bû, di vê astê de ev tine bûn.

Dîsa têgeheke bi navê propagandaya çekdarî heye. Ango, bandora çalakiyê ya propagandayê heye. Bandora propagandakirinê, perwerdekirina çalakiyê çawa derdikeve ortê? Xîtabî sehekan dike, xîtabî fikirê dike, hin tiştan dide fikirandin, xîrabî fêmkirin û hînkirinê dike. Hem perwerde dike hem jî bi livandina hestan ve ajîte dike. Lewma jî propagandaya çekdarî dibe yek ji rehendên pir girîng a xebata propaganda û ajîtasyonê. Di van hemûyan de em dîqet bikin bandorkerî, kişînerî, cidiyeta uslûp girîng in.

Dema ku propaganda wekî xebatên perwerdeyê, ajîtasyon jî wekî xebateke xistina nava tevgerê bê nirxandin, kifş dibe ku ev hemû xebat boneyî mirovan e. Dema ku rewş wisa jî dibe, propaganda girîng dibe ku karibe mijarekê bi şiklekî sistematik ragihîne, zelal be, uslûp kişîner be, bandorker be, bandoreke hê fêrker û hînker li yê beramber bike û armancê pêk bîne. Ji bo ajîtasyonê jî uslûp girîng e. Ajîtasyon jî ne tenê bi hêza maneyê re sînordar e, asta bandora ziman û xîtabê ne tenê bi gotinê, zimanê bedenê jî xwedî roleke girîng e. Ango, bi perwerdkirinê ve dana hereketkirin, boneyî bandorkirina mi-

rovan, motîvekirin, zanekirin, arastekirinê ye. Wê demê heke bi bandor bibe dê karibe vê armancê pêk bîne.

Eger ku ziman, uslûbê propaganda û ajîtasyonê bi bandor bibe, karibe bala yê beramber kom bike, dîsa karibe cidiyeta pêwîst nîşan bide, karibe kişîneriyeke wisa ku ew ê xebat bikare bimeşe bafirîne, bi temamî xîtabî yê li beramber bike ew ê karibe rolê bilîze, encamgir be. Li ser vî bingehî, tenê di warê perwerdekirina hinan de, lazim e ku mijarek bi berfirehî bê vegotin, bi sîstem bê nivîsandin an jî axaftin, bi têrkerî bê ragihandin, lê ev ne bes in. Eger ew ê bê nivîsandin lazim e bi sîstem û uslûbekî wer be ku xwe kişîner bike, çawa dest pê kir heta dawiyê xwe bide xwendin. Eger ku ew ê devkî be, lazim e xwe bispêre uslûb, xîtabeteke wisa ku bi temamî bala yê li beramber li ser xwe bigire. Wê demê dê gotin bêne fêmkirin, dawerivandin, dîqetkirin. Heke wa nebe, fikirekî herî dewlemend jî bihewîne, bi sîstem jî bê dayîn, ne xwedî uslûbekî kişîner be, bi bandor nebe, ew ê guhdarkirin jî, xwendin jî zehmet bibe. Naxwe xebata propaganda-ajîtasyonê ne tenê girêdayî naverokê ye; cidiyet, kişînerî, bandorkeriya uslûp, xîtab û ziman jî girîng in. Ev têgeh jî dibin têgehên pêreyî yên temamkar ên propaganda û ajîtasyonê. Bi gotineke din wekî têgehên temamkarê xebatê yên ku di karên propaganda û ajîtasyonê de cih digirin, rolê dilîzin.

Ji bo amûran, me îfade kir, mînak di propagandaya devkî de amûrên herî esas mejî û ziman in. Ji Rêber Apo re pirsîn, *"gelo çeka te ya herî xurt çi ye?"*, bêyî dudilî yekser got, *"zimanê min e."* Di xebatên propagandaya nivîskî de jî, zimanê wî yê nivîskî, uslûbê wî jî xurt e. Ewil zimanê nivîsê bi kar anî, bername, manîfesto, danezana damezrandinê yekser destnivîsa wî ye. Piştre li Îmraliyê parazname nivîsandin. Feqet, bi taybet di dema damezrandina partî û pêşketina gerîla de di xebata nivîskî de teng ma, têrker nebû. Ji bo ku pêwîstiyên wezîfe û berpirsiyariyên gelekî berfireh di pratîkê de werin cih, pêdivî bi pêşikiya propagandaya devkî dît. Damezrandina nîzama

dibistan û Akademiyê wisa bû. Xebatên perwerdeyê yên ku temelê Akademiya Mahsûm Korkmaz pêk anî bi temamî xebateke propagandaya devkî bû û Rêbertiyê ev xebat bi hêza xwe ya mejî û ziman kir. Di domahiya jiyana xwe de mejî û zimanê wî bû çeka wî ya herî bi bandor a propagandayê. Tabî dema ku parazname nivîsandin hê bêhtir zimanê nivîskî, qelem bi kar anî. Çi uslûbê nivîskî dibe çi jî uslûbê devkî, di propagandakirina mijarekê de wekî naverok û sîstem xwe gihand asteke têrker. Wekî uslûp yekparebûnek afirand. Avaniya milîtanan li cem me hê zêdetir ev propaganda bi kar anî.

Gerîla hê bêhtir rêxistineke propagandaya çekdarî ye. Tevgera me ya Partiyê ji ber ku ji 1978'an ve têkoşîna çekdarî hê zêdetir esas wergirt, li ser bingehê gerîlatiyê têkoşîn meşand, bi şiklekî bandor, berbelav propagandaya çekdarî bi kar anî.

Propagandaya çekdarî di têkoşîna gelên din de jî xwedî cihekî girîng e. Têgîna propagandaya çekdarî ji hêla me ve nehatiye pêşxistin, li Amerîkaya Başûr jî li Asyayê jî gelan di xebata şoreşgerî de hem ev bi kar anîn hem jî ev têgeh pêş xistin. Me jî ji wan girtiye.

Ev dikare were gotin; di Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de propagandaya çekdarî bû şiklekî wisa yê propaganda-ajîtasyonê ku bi şiklekî bi bandor hatiye bikaranîn. Mirov perwerde kirin, di pêşxistina hişmendiya welatparêziyê de têkoşîna çekdarî ya gerîla cihekî pir girîng dagirt. Rolek bi heybet a ajîtasyonê jî lîst. Di tevlîkirina ciwanan bo refên gerîla de, di qezenckirina wêrekî û fedakariyê de, di arastekirina çalakiyan de rola herî mezin, gerîla lîst. Her çalakiya ku derbe li dijmin da, bi dehan, sedan ciwan bandor kirin, zana kirin, wêrek kirin, hest, ramanên wan miz da û xist nav hereketê. Bi roleke mezin a ajîtekirinê rabû.

Çapemenî-weşan, ne di serî de be jî ji 1977'an û şûn de wek amûrekî hatiye bikaranîn. Amûrekî wisa ku di serî de teng dest pê kir, lê her ku çû mezin bû, cihêwaz bû, cih û pozisyona xwe zêde kir. Çapemenî-weşanê jî di xebata propaganda û

ajîtasyonê de roleke girîng lîst. Bi şêweyê nivîskî roleke qismî lîst. Heke em bêjin qasî propagandaya devkî û çekdarî rol lîst ew ê pir ne li cih be. Çima? Ji ber ku civaka Kurd nikarîbû bi Kurdî binîvîsîbana; bi Tirkî, Erebî, Farisî dinivîsandin. Qasî lazim nikarîbû binîvîsîna, bixwenda, feraseta xwendinê tine bû. Ne civakeke wisa bû ku xwe bi xwendin-nivîsandinê perwerde kiribûn. Civakek di bin qirkirina çandî de bû. Qirkirina çandî herî zêde jî mirov di vê qadê de zeîf hiştibû. Ji ber vê yekê ne dikarîbû xwe bi propaganda û ajîtasyona nivîskî têrker bîne ziman, ne jî bi materyalên nivîskî ve xwe perwerde bike û ajîte bike. Feqet, mînak radyo xwedî rolek hê mezintir e. Ruxmî ku televîzyon piştre hate rojevê jî bû xwedî fonksiyoneke hê mezintir. Tevî ku bi têrkerî nehat bikaranîn jî li gorî materyalên nivîskî rola televîzyonê ya di xebata propaganda û ajîtasyonê de, bandora wê hê bêhtir bû. Ji ber ku bi milekî ve xwe dispart gotinê. Her çiqasî pirsgirêkên wê yên ziman hebûn jî xwedî derfetên wisa bû ku dikarîbû li gorî çapemeniya nivîskî zimanên cuda li gel hev bêhtir bi kar bîne. Lewma jî ew pirsgirêk dikarîbû bihatana derbaskirin.

Girîng bû ku di qada dîtbarî de gav hatin avêtin. Ne tenê ya tê bilêvkirin, di heman demê de bi dîtbarî bê gotin, gotin bi dîmen re bibe yek, raman bi libatê re bê temamkirin hê bandortir bû. Lewma hem di warê fêrbûnê de hem perwerde hem jî di xebata propagandayê de roleke mezin lîst. Di ajîtekirinê de, di tevgerkirinê de weşangeriya televîzyonê roleke pir zêde lîst.

Xebatên propaganda û ajîtasyonê; devkî, nivîskî, çekdarî bi çi şêweyî dibe bila bibe, çi rolê dilîze, wate û girîngiya xebateke wisa çi ye, çima em li ser radiwestin, çima lazim e? Bi taybet ji bo Tevgera Azadiyê, partiya şoreşger, ji bo têkoşîna siyasî-demokratîk û xebatên welatparêz, propaganda û ajîtasyon çima lazim e, rol û misyona wê çi ye? Lazim e em di jiyana mirov û civakê de, di qada rêxistin û çalakiya şoreşgerî de propagan-

da û ajîtasyonê çawa binirxînin, li kû bi cih bikin; rol, girîngî, wate û cihê wê çawa binirxînin?

Lazim e di çarçoveya van pirsan de hin nirxandin bêne kirin. Di destpêkê de me hewl da bi kurtasî hin pênaseyan bikin. Ev pênase bi xwe jî heta astekê naverok, wate û girîngiya meseleyê ronî kir, lê belê lazim e hê bêhtir bêne vekirin.

Pênaseya me ya propagandayê ew bû ku mirov, civak, komekê ji bo karekî amade dike, perwerde dike. Me ji bo ajîtasyonê jî gotibû ku hest, wêrekî, fedakariya berêxwedana kar derdixe ortê. Em bala xwe bidinê, têkildarî kar in, têkildarî wezîfeyê ne, xebatê ne. Lewma jî yekser girêdayî jiyan û têkoşînê ne. Di encam de ya ku jiyanê pêk tîne tevgera mirov û civakê ye. Ka ew ê çawa hereket bike jî ji aliyê perwerde û çûyîna ser kar ve tên diyarkirin. Ya ku ferd jî civakê jî di warê jiyanê de dilivîne, teşeyê hereketa wê diyar dike, propaganda û ajîtasyon e. Ferd an jî civak çiqasî hatibe propagandakirin, ango perwerdekirin, çiqasî hatibe wêrekkirin û fedakarkirin, hatibe ajîtekirin, ewqas, bi bandor an jî lawaz berê xwe dide jiyanê. Ewqasî bi xwestek an jî bê dil berê xwe dide kar. Ya ku diyar dike bê çiqasî xurt, bi bandor berê xwe dide kar, jiyanê çiqasî bi bandor dide ser hev, asta wê ya perwerdehiyê û terzê arastekirina kar e. Em ji vê re jî propaganda û ajîtasyon dibêjin. Ya ku amadekarî û arastebûna kar a takekes û civakê diyar dike xebata propaganda û ajîtasyonê ye. Naxwe ji bo jiyanê propaganda û ajîtasyon gerek e.

Ya ku naverok, çarçove, asta jiyana takekes û civakê derdixîne ortê, propaganda û ajîtasyon e. Heke takekes an jî civakê xwe perwerde nekiribe, nikare zêde kar bike yan jî çiqasî perwerde kiribe ewqasî jiyanê plan dike, rêxistî dike, rêkûpêk dike, dafirîne. Çiqasî hatibe perwerdekirin û amadekirin ewqasî bi wêrekî û fedakarî berê xwe dide ser kar. Îrade, cesaret, fedakarî, biryardarî, jêhatîbûna wî ewqasî zêde dibe. Heke ev lawaz bin, ji bo kes an jî civatekê afirandina jiyanê jî zeîf

dimîne. Ev xurt bin, afirandina jiyanê jî xurt dibe, kûr, berfireh û yekpare dibe.

Çi derdikeve ortê? Naxwe propaganda û ajîtasyon nebe, jiyana mirov û civakê nabe, zindîbûn nabe. Ev ji bo hemû giyaneweran derbasdar e. Ajal dibe ku ne di astek pir pêşketî ya mejî de be, lê ew jî xwedî eqlekî ne. Berê tenê her behsa refleksan dihate kirin, niha zanist behsa eqlekî dike. Lê em bêjin refleks jî di asta refleksî de jî perwerdehiyek heye. Wekî nifş ew jî di perwerdeyekê re derbas dibin. Nayê paşguhkirin, her dê û bav zarokên xwe perwerde dikin. Em di hemû alema heywanan de vê rewşê dibînin. Teyr jî perwerde dikin, yên herî dirinde jî perwerde dikin, ji bo ajalên din jî ev rewş wisa ye. Ajalên kedîkirî hê bêhtir bi destê mirovan pêk tê. Ji bo ku karibin li gor armanca xwe bi bandortir tevlî jiyana xwe bikin, di afirandina jiyana mirov de rolek hê zêdetir bigirin, vê dikin. Tu çiqasî karibe heywanan perwerde bike, di wê astê de pratîk, berhemdariya jiyanî, karê çê zêde dike. Perwerdehiya wê kêm be, hunerweriya wê ya karkirinê jî kêm dibe.

Ji bo mirovan ev rewş di asteke hê pêşdetir de ye. Heke tu xwe perwerde neke, wêrekî, fedakarî, jêhatîbûnê qezenc neke, wê demê dê jiyan pir teng, pir monoton, seranser, çors bimîne; kişînerî çênabe, bedewî pêş nakeve, kûrahî dernakeve. Lewma jî domdariya wê çênabe. Nahêle ku mirov, civak hê bi coştir, zindîtir, dirêj bijî. Dikare wisa bê gotin; çiqas propaganda û ajîtasyon, ango perwerde û arastekirin, ewqas afirandina jiyanê, di jiyanê de ewqasî dewlemendî û kûrahî! Di warê jiyanê de ewqasî tesîrkerî û dana pêşxistin! Pêşketina hêza teknîkê, hêza aqil, eger ku perwerdeya mirov bê dîqetkirin, hê zêdetir dike; hê perwerdetir dike. Lewma, jiyan zêdetir berfireh dibe, kûrtir dibe; berhemdariya jiyana mirovan hê zêdetir dibe. Em vê ji pêvajoya pêşketina dîrokî çavdêrî dikin, fêr dibin, fêm dikin. Di warê van rastiyên jiyanê de pêşketina mejî, dewlemendkirina jiyanê wisa derdikeve holê.

Mînak, em têkoşîna hebûn û azadiyê dimeşînin. Di warê hebûna azad de pirsgirêka civaka Kurd heye. Li ser wê zihniyeteke mêtinger-qirker, siyaseteke wisa bi şiklekî rêxistî tê meşandin, di qetlîaman re tê derbaskirin. Ji komkujiya çandî ta qirkirinê, tevî qirkirina fîzîkî û her cure rêbazên qirkirinê li ser tê meşandin. Li beramberî vê lazim e berxwedan, têkoşîneke pirmilî bimeşîne. Ji bo vê jî lazim e xwe di her astê de bi rêxistin bike. Ji bo ku karibe ji vê zihniyet û siyaseta mêtinger-qirker rizgar bibe û bigihêje jiyaneke azad û demokratîk pêdiviya xwe bi pêşxistina rêxistin û çalakiyeke pir berfireh heye. Pêdiviya xwe pê heye ku ji serî heta binî li cem hemû ferdên xwe bibe xwedî rêxistin û çalakî.

Baş e, ew ê çawa bike? Beriya her tiştî, gelo ew ê çawa fêm bike ev rewş pêdiviyek e? Ji bo ku fêm bike ev lazim e, ango ji bo ku karibe armancê diyar bike, lazim e zihniyet û siyaseta mêtinger-qirker fêr bibe. Zihniyet û siyaseta mêtinger-qirker ji bo wê tê çi maneyê? Ber bi kû ve dibe? Çi encaman dide civak û ferdên Kurdan? Lazim e vê bizane.

Wek nimûne, di şertên derketina PKK'ê de ev pirsgirêk jî nedihat zanîn. Sîstema mêtinger-qirker, mêtingeriyê wisa li mirovê Kurd anîbû ku siberoja xwe jî nedizanî. Pêkanînên mêtinger-qirker qebûl dikir, wekî rewşeke jiyanê nîşan dida yan jî wekî neçariyekê lê mêze dikir. Heta digot pêşketine. Digot, hûn ji tinebûnê, xerabiyê rizgar bûn, hatin ser başiyê û bi xwe jî bi vê bawer dikir. Dibû sebeb ku tinebûna xwe ya neteweyî, çandî wekî hebûneke xurt qebûl bike, bipejirîne. Ewqasî hêza wê ya ramanî, mejiyê wê berevajî kiribû. Jixwe qirkirin, qirkirina çandî xwe dispêre berevajîkirina fikireke wisa. Rêber Apo, wekî qada herî esas a qirkirina çandî *"qirkirina zihniyetê"* nîşan da. Di manîfestoya yekemîn de got, *"mêtingerî û asîmîlasyona fikrî"*, di manîfestoya duyemîn de, Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk, ev wekî *"qirkirina zihniyetê"* pênase kir. Şêweyê herî xeter, herî erjeng ê qirkirina çandî, lewma yê ku sûcê herî giran pêk tîne, ev e.

Ji bo fêmkirina xerabiyan, rastiya dijmin, wateya zihniyet û siyaseta mêtinger-qirker, pêkanînên wê, encamên wê, dîtina rastiya xwe, dîtina rastiya xwe ya civaka dîrokî û ferde wê, destpêkê pêwîstî bi perwerdeya berfireh, pêşketina zihniyetê heye. Wek duyemîn jî, bi armanca têkoşîna li dijî hemû spartinên mêtinger-qirker, êrîş, zext, qetlîaman; ji bo têkbirina wan pêdivî bi bûyîna hêzek pispor a şer heye; pêdivî bi hêzeke wisa heye ku karibe pirmilî têbikoşe, bikeve hereketê. Ji bo ku karibe çalakiyeke wisa pêş bixe jî lazimî bi rêxistiniyeke di wê astê de heye. Rêxistinbûyîneke wisa jî bi perwerdeyê derdikeve ortê. Bi propagandayê çêdibe. Bi wêrekî, fedakariya ku ji hêla ajîtasyonê ve hatî hûnandin teşe digire. Heke perwerde nebe, wêrekî û fedakarî nebe, rêxistin jî nabe. Eger rêxistin jî nebe, çalakî û berxwedan nabe. Ti tişt nikare bê kirin. Lazim e em cih û rola propaganda-ajîtasyonê ya di nav xebata şoreşgerî de wisa bibînin. Cih û rola wê ya di jiyana mirov û civakê de yekemîn e, esas e, pêşdatir e, diyarker e.

Heman tişt ji bo xebata şoreşgerî jî derbasdar e. Di xebata şoreşgerî de rola propaganda û ajîtasyonê yekemîn e, esas e, pêşdatir e, diyarker e. Çiqas propaganda û ajîtasyon ewqasî rêxistin û çalakî! Formûl ev e. Lewma wekî partî, wekî gerîla, wekî civak, heke ku em di rêxistin û çalakiyê de ewqasî pêş ketibin, hatibin wê astê ku bala cîhanê bikşînin ser xwe, her kes qebûl dike ku Kurd di vê mijarê de pêş ketine, berfireh bûne, hewl didin ji Kurdan hin tiştan bigirin; em bizanibin ku ev bi saya xebata propaganda û ajîtasyona rêxistî ya Rêber Apo û Partiyê ye. Ya ku hêza pêşketina çalakiya rêxistî pêk tîne, hêza propaganda û ajîtasyonê ya Rêber Apo, Partî û gerîla ye. Eger ku ev nebin, ti derdê civaka Kurd a bi navê perwerde, rêxistin û çalakiyê nabe.

Dema ku Rêbertî, partî û gerîla nîn bû, Kurdan nedikarî ti tiştî bikin. Nikarîbû bigotana *“em Kurd in”* jî. Reva ji Kurdbûnê, xweîfadekirina bi nasnameyeke din, wekî pêşketin didîtin, qebûl dikirin. Ya dijmin dida rast didîtin, hembêz dikirin. Ti

rêxistinbûn û levxwedîderketin tine bû. Civakbûyîna wan parçeparçe bibû. Her kesî biguman, bi dijminahî lev dinêrî. Ji Kurdistanê rev, ji civakê rev, reva ber bi cihên din, civakên din heta qirkê hatibû.

Tê nîqaşkirin ku *"ka Amed çima di pêşketina welatparêzî de ewqasî rolê dilîze."* Me got *"navenda civakê"*. Amedî niha dibêjin *"em ewqasî egîd in û welatparêz in"*, enceq min Amediyên wisa jî nas kirine ku kulma xwe li masê dane û gotine *"heke em ê bi pasaportê biçin Stenbolê, em Kurdistaneke wisa naxwazin."* Ji bo bi rehetî biçe Stenbolê ji Kurdbûyînê û Kurdistanê, ji her tiştan jî dest şuştibû û yê ev digotin li zanîngehan dixwend. Van li Enqerê digotin. Dema ku Rêbertî, partî û gerîla nîn bûn, zihniyet, asta perwerdeyê, feraset û pratîka mirovên Kurd wisa bû. Mirovên ku dibêjin min dinya afirandiye, xwe wisa dibînin, xwedî terz, nêzîkatî û seknên wisa yên jiyanê bûn.

Hin dibêjin, "*Kurd pir çalak in, pir pev girêdayî ne, pir welatparêz in, pratîk in; binêrin li hemberî DAÎŞ'ê tiştên ku ti kesî nikarîbûya bikiribana kirin". L*ê ev ne rastî ye. Yên ku li Şengalê ji ber DAÎŞ'ê revîn jî Kurd bûn. Hem jî pêşmerge bûn ku dibêjin hêza parastina Kurdan e. Me hemûyan ev dît. Her Kurdekî nikarîbû li hemberî DAÎŞ'ê li ber xwe bide, bisekine, şer bike. Naxwe ew sekin ne ji ber Kurdbûyînê ye, ji ber ramanên Rêber Apo wisa lê hatiye. Ji ber têgihandina azadiyê, îradeya wê ya ku Rêber Apo dayî wisa bûye. Yên ku bi îdelojî, felsefeya Rêber Apo hatine perwerdekirin, yên ku propaganda û ajîtasyona Rêber Apo qebûl kirine, berxwedaneke lehengî ya ku DAÎŞ têk birî danîn ortê. Yên ku ev negirtine jî ji ber DAÎŞ'ê reviyane. Wê demê berxwedan jî girêdayî perwerde, zihniyetê ye. Ango, ne ku çekên wan nîn bûn, hejmara wan kêm bû. Ew jî Kurd bûn, lê nikarîbûn heman qehremantiyê nîşan bidin. Kurdên ku li ser vî esasî hatine perwerdekirin, bûne xwedî têgihiştina Apoyî, xwe wisa bi rêxistin kirine li dijî DAÎŞ'ê egîdî û lehengî nîşan dane. Ha em ji vê têgihiştinê re, ji bo rêxistina li ser bingehê vê têgihiştinê, propaganda û ajîtasyon dibêjin. Ev

têgihiştin rêxistin û çalakiyeke ku dikare hêzek faşîst a mîna DAÎŞ'ê têk bibe, derxîne holê. Ango, rêxistin û çalakî nabe sedema propaganda û ajîtasyonê. Propaganda û ajîtasyon dibe sedema rêxistin û çalakiyê.

Tabî çalakiya girseyî û çekdarî xwedî nirxekî propagandayê ye. Me behsa propagandaya çekdarî kir, çalakiyên girseyî jî xwedî nirxekî propagandayê ne. Bi qismî tersê wê jî rast e. Heke tu çalakiyê pêş bixe, gerîla, şer û berxwedanê pêş bixe, bandora wê ya perwerdekar û ajîtatîf jî çêdibe. Li milê din, propaganda û ajîtasyon dihêle ku hê bêhtir rêxistinbûn û çalakiya hê xurttir derkeve ortê. Di van salan de pêwendiyeke wisa ya diyalektîkî heye û tabî ya pêşdatir, ya esas propaganda û ajîtasyon e. Ya ku di xebata şoreşgerî de diyarker, yekemîn propaganda û ajîtasyon e. Di dema Derketina Rêberiyê de rêxistin nîn bû, çalakî nîn bû, lê bûyîn hebû. Vê xwe spart çi? Xwe spart propaganda û ajîtasyonê, perwerdeyê. Naxwe propaganda û ajîtasyon, Rêbertî ye, têgihiştin e, perwerde ye. Ev jî esasî tê maneya pêkhatina Rêberiyê, Bûyîna Rêberiyê. Destpêk, derketina yekemîn, diyarkerî çawa ku bi rastiya Rêbertiyê tê pîvandin, wê demê diyarkerê xebata şoreşgerî propaganda û ajîtasyon e. Asta rêxistin û çalakiyan bandorê li propaganda û ajîtasyonê dike. Asta propaganda û ajîtasyonê jî rêxistin û çalakiyê diyar dike. Yek bandorker e, ya din diyarker e. Wê demê rêvebirina rêxistin û çalakiyê girîng e.

Di vê manê de rêveberên rêxistinê, fermandarên gerîla di rêxistinkirin û pêşxistina çalakiyê de xwedî hin rolan e, xwedî misyon e, berpirsiyarî ye; van rolên xwe bi cih tînin, qada pratîkî bi rê ve dibin. Ya ku mirovan ji bo pratîkê amade dike jî propaganda û ajîtasyon e. Lewma jî ji asta rêxistin û çalakiyê çawa ku fermandar û rêveber berpirs in, yê ku zêdetir berpirs e, xebata propaganda û ajîtasyonê ye. Xebata propaganda û ajîtasyonê qada yekem û diyarker a xebata şoreşgerî ye. Qasî ku ev heye, pêk tê, li gel vê qasî ku bibandor e jî çalakî û rêxistina şoreşgerî derdixîne ortê. Asta propaganda û ajîtasyona

şoreşgerî, asta rêxistin û çalakiya şoreşgerî diyar dike. Eger propaganda û ajîtasyon lawaz be, rêxistin û çalakî jî zeîf dibe. Propaganda û ajîtasyon opurtinîst be, reformîst be; rêxistin û çalakî jî opurtinîst û reformîst dibe. Şoreşger be şoreşger dibe. Naxwe ya ku di pratîka şoreşgerî de herî zêde rolê dilîze û herî zêde berpirs e, propaganda û ajîtasyon e.

Em çima van wisa diyar dikin? Li gel me xebatên propaganda û ajîtasyonê wekî xebatên şoreşgerî, xebatên pratîkî nayêne dîtin. Wisa tê hesibandin ku dema tu ket nav xebatên propaganda û ajîtasyonê, tu ji pratîka şoreşgerî qut dibe. Kadro û komîteyên ku xebata propaganda û ajîtasyonê dimeşînin, li beramberî xebatên rêxistin û çalakiyê xwe berpirs nabînin. Dema ku pêşketin çêdibin, nabêjin min kiriye. Dema xeta û kêmasî rû didin, nabêjin min kiriye, ez ê rexnedayînê bidim. Her li derveyî xwe dibînin û rexne dikin. Şaşitiyek wisa heye, xeletî heye, lazim e bê rastkirin. Halbûkî propaganda û ajîtasyon di her astê de berpirsê rêxistin û çalakiyê ye. Serketinê jî serneketinê jî ew diyar dike. Besî jî nebesî jî çavkaniya xwe ji wê digire. Wê demê, heke ku bes jî be bi xwe kiriye, nebes be jî bi xwe kiriye. Lazim e wê çaxê rexnedayînê bide, xwe berpirs bibine. Lazim e bibîne ku bê xebata wê di rêxistin û çalakiya şoreşgerî de çiqasî rolê dilîze. Di vî warî de pêwîst e em rol û girîngiya propaganda û ajîtasyonê baş fêm bikin.

Ji ber ku em hereketeke Rêbertiyê ne, tevî ku pêşbîniya me diyarkeriya Rêbertiyê nîşan dide jî, sekna me ya pratîk, nêzîkatiya me ya van xebatan, têgihiştina me, rewşa me ya tevlîbûna xebatan ne di heman astê de ye. Di vê qadê de jirêderketin, şaşitiyên cidî hene. Mînak, gelek rêxistinên ku ji xwe re dibêjin şoreşger wekî terzê xebatê tenê propaganda û ajîtasyonê esas werdigirin. Tenê komek e, di merheleya destpêkê de ne û xebatên îdeolojîk dimeşînin. Nakeve nav qada rêxistin û çalakiyê, ev jî jirêderketinek e. Eşkere ye ku propaganda û ajîtasyona nebe rêxistin û çalakî, razber e, ji jiyanê qut e, dogmatîk û jiberkirî ye. Li cihê xwe nikare ti bandorê li jiyanê bike. Ev jî ne

rast e. Lê dixwazim vê bêjim, ew şoreşgeriyê tenê wekî propaganda û ajîtasyonê digirin dest. Li gel me jî şoreşgerî wekî rêxistin û çalakî tê destgirtin. Ev terzê fêmkirinê di têkoşîna dijî wan de derket holê. Mîna bertekeke li hemberî wan bû.

Bi taybet di salên 1970'yan de ev mil pir li pêş bû. Li Kurdistan û Tirkiyeyê gelek partî û rêxistin di salên 1980'yan de li beramberî faşîzma 12'ê Îlonê pasîfîze bûn, teslîm bûn û neketin nav çalakiyê. Di vê demê de meşa ber bi gerîlatiyê ya PKK'ê wekî rexnekirinek hişk a van beşên navborî jî xwe da pêş. Nerazîbûna li beramberî nêzîkatiyên wan ên oportunîst, pasîf, reformîst, çalakbûyîna PKK'ê wisa derxist ortê. Ev jî rastiyek e û tê fêmkirin jî. Lê belê, Ji ber ku wisa ye, lazim e em PKK'ê tenê wekî tevgereke bertekê ya ku li dijî mêtingerî an jî dûvikên wê yên reformîst, oportunîst, teslîmkar nebînin. Rêbertî, ne tenê tevgereke nerazîbûnê ye. Bêguman di nav têkoşînê de bertek û hêrs jî hene, lê hişmendiyeke mezin jî heye, rastî jî heye, yekparebûn jî heye. Ji ber ku ew şoreşgeriyê nîvco digirine dest, em jî ne mecbûr in ku vê carê bi bertekî û ji milê ters ve nîvco bigirine dest. Wê demê em ê bişibine wan, em ê bibin tersê wan û tiştekî ku em karibin ji wan re bibêjin namîne. Nerazîbûna rast, nerazîbûna şoreşgerî di vê maneyê de derbaskirina nebesiyan e. Ne mîna wan ketina nav rewşeke nîvco ye; xwegihandina giştî, tam pêkanîn, giştî tevde kirine. Wê çaxê, PKK ne tenê hereketeke bertekê ye; Rêbertî ne tenê îfadeyeke derketina bertekî ye, berevajî, li beramberî seknên şaş, nebes, nîvco bi şiklekî rast, yekpare, afirandin û pêkanîna şoreşgeriya tam îfade dike.

Hin wekî xebat tenê propaganda û ajîtasyonê didin pêşiya xwe, em jî rabin, propaganda û ajîtasyonê red bikin, tenê rêxistin û çalakiyê, di nava wê de jî tenê çalakiya çekdarî esas wergirin, wê temam bibînin, wê demê em nikarin bêjin em li wê qadê hene. Hin hêz hewl didin PKK'ê wisa pênase bikin, dixwazin PKK wisa be ku PKK'ê wekî tevgereke ku ramanên wan pêk tîne nîşan bidin, ji xwe re parê jê bigirin, rolê bidine

xwe, xwe bînin asta pêşengtiyê. Ev waswaseyên wan e, xwe pirole dikin. Em prîmê nadin wê waswaseyê, pirolekirinê. Em ê şaşitiyên wan jî nedin dewamkirin. Wê demê lazim e em PKK'ê, Rêbertiyê rast fêm bikin. Ji ber ku ew xwe dixapînin, em ê jî xwe nexapînin. Berevajî em ê rast nêz bibin. Nêzîkatiya rast jî ew ê yekpare bibe. Em ê di xebata şoreşgerî de rol û girîngiya diyarker û yekemîn a propaganda û ajîtasyonê bibînin, lê em ê li wir ranewestin, em ê propaganda û ajîstasyonê bi qada rêxistin û çalakiyê re bikin yek, xwegihandina şoreşgeriyeke wisa yekpare û yekgirtî, milîtaniya şoreşgerî, kesayeta şoreşgerî, rêxistina şoreşgerî esas wergirin. Ya rast teqez ev e. Yekparebûna xebata şoreşgerî, rêxistina şoreşger a ku Rêber Apo pêşxistî wisa ye. Di yekparebûneke wisa de jî propaganda û ajîtasyon diyarker e, esas e, yekemîn e.

Çawa ku di jiyana ferd û civakê de propaganda-ajîtasyon, perwerde, cesaret, fedakarî diyarker dibe, di xebata şoreşgerî de jî ku şiklê herî watedar û bi îrade ya jiyana mirov e, propaganda û ajîtasyon diyarker e, bingeh e. Asta pêşketin û bandorkeriya rêxistin û çalakiyê diyar dike. Tu çiqasî perwerdekirî be, çiqasî wêrek û fedakar be, tu çalakiya ewqasî xurt dike, rêxistinê ewqasî saxlem pêk tîne. Lê heke perwerdeya te kêm be, cesaret û fedakariya te kêm be, rêxistinbûna te jî kêm dibe, çalakiya te jî lawaz dibe. Hêz û bandora propaganda û ajîtasyonê rêxistin û çalakiyê diyar dike. Naxwe xebata propaganda û ajîtasyonê di nav xebata şoreşgerî de ewqasî girîng û watedar e. Ango, nêzîkatiya ku dibêje *"bibe jî dibe, nebe jî"* teqez ne rast e. Teqez e ku nebe nabe. Bêyî propaganda û ajîtasyonê xebata şoreşgerî, şoreşgerî nabe. Ji ber ku bêyî wê tu nikare derbasî nav rêxistin û çalakiyê bibe. Ji bo ku tu bikare bibe rêxistina şoreşgerî û karibe çalakiya şoreşgerî pêş bixe, bêyî ku ji wan qut bibe, lazim e tu propaganda û ajîtasyona şoreşgerî pêş bixe. Lazim e tu perwerde, cesaret û fedakariyeke têrker derxîne ortê, pêk bîne. Enceq tu yê wisa karibe rêya rêxistin û çalakiyê veke.

Naxwe girîngî, rola propaganda û ajîtasyonê di asta diyarker de ye. Ji ber vê jî lazim e nêzîkatiyeke ku wekî *"propaganda û ajîtasyon hebe jî dibe nebe jî dibe"* dernekeve. Wekî ku propaganda û ajîtasyon ne di nav xebata şoreşgerî de ye, neyê dîtin. Mixabin, di nav me de –bi taybet di giştî de- nêzîkatiyên wisa şaş derdikevin. Qadên rêxistin û ajîtasyonê pir zêde girîngiyê nadin propaganda û ajîtasyonê. Dibêjin qey ew ê bêyî propaganda û ajîtasyonê rêxistinê pêş bixin û çalakiyên serketî pêk bînin. Tew îcar qadên ku xebata propaganda û ajîtasyonê dimeşînin, qada îdeolojîk xwe di nav xebata şoreşgerî de, di nav xebata rêxistinê de nabînin, li gor pîvan û qaîdeyên wê nameşin. Li hin deveran mîna ku ji partiyê qut, piranî jî wekî angaryayê dibînin. Nêzîkatiyeke ku *"hebe jî dibe nebe jî"*, raber dikin. Ji ber vê jî azwerî û baldariya pêwîst nîşan nadin. Bi şiklekî têrker xwe bi rêxistin nake, fikir, îdeolojî, felsefeya partî û rêgezên wê yên îdeolojîk, feraseta rêxistinê esas nagire. Terz, uslûp û tempoya partiyê esas nagire. Xulase, xwe li derveyî partiyê dibîne. Ji ber ku xebata partiyê tenê wekî rêxistin û çalakî dibîne, propaganda û ajîtasyonê derveyî partiyê dibîne. Mesela dibêje *"xebata çapemeniyê derveyî partiyê ye"* û li gorî esasen rêxistina partiyê bi rê ve nabe. Xebata hunerê li derveyî partiyê dibîne. Xebata teorîk û perwerdeyê li derveyî partiyê dibîne. Li gorî plan, bername, rêxistinbûn, rêgezên ku xebatên partiyê dispêrên, bi rê ve naçe. Nêzîkatî, helwestên mîna takekesîtî, keyfiyet, ligorxwebûn, ji partiyê qutbûn xwe bi zêdeyî didin der. Pirsgirêka esasî ya di xebata vê qadê de jî xwe wisa datîne ortê.

Esas ev rewş ne ji ber fêmnekirin an jî nezanîna kêmasiyan e, sedema xwe ji zanîna şaş, yekparebûna şoreşgerî, partiyê nedîtinê ye. Jirêketin esas ji vir e. Lazim e pêşî ev jirêketin bê dîtin û sererastkirin. Ya ecêb jî, qada xebata Rêbertiyê, li derveyî partî û şoreşgertiyê tê dîtin. Ev jî nêrîneke pir xeter û bi zirar e. Ruxmî ku gel bi qehremanî, cesaret û fedakariyeke mezin têdikoşe; tevî ku em ewqasî li ser xeta fedaîtiyê tevdigerin

jî, em xwedî ewqasî derfet û firsendan e; ji ber ku em bi şiklekî wisa seqet, şaş, derveyî partiyê nêzî propaganda û ajîtasyonê, têkoşîna îdeolojîk dibin, em nikarin rêxistin û çalakiyeke xurt derxînin ortê. Yê esas berpirs qada propaganda û ajîtasyonê ye. Cihê ku lazim e rexneyan li xwe bigire, xwe sererast bike teqez ev qad e.

Lê belê, qada propaganda û ajîtasyonê vê wekî berpirsiyariya xwe nabîne. Her rexne dike ku "*çima şer baş nayê meşandin, çima rêxistin baş pêş nakeve, çima siyaseteke baş nayê kirin.*" Tabî ji ber ku baş perwerde nekiriye, têra xwe wêrekî û fedakarî nedaye qezenckirin; pîvanên şoreşgerî, pîvanên welatparêzî ne di asta pêşdîtina Rêbertiyê de ye, wisa dibe.

Ya ku ew ê van nebesiyên qadê derbas bike, têrkeriyê serwer bike, xebata propaganda û ajîtasyonê ye. Bi xwe nake, kêmasiya wê ye, nebesiya wê ye, lazim e bi rexnedayînê xwe rast bike; lê hinên din nîşan dide û hewl dide rexne bike. Sererastkirinê ji cihekî şaş dide destpêkirin. Naxwe dibe şirîkê şaşiyên şaşan, şaşiya hevşib bi şiklekî hê girantir esas bi xwe dikeviyê. Ji ber ku ya bingeh ew bi xwe ye, ya diyarker dibe şaşiya wê. Eger ku tu li cihêwaziya şaşiyan bigere, bê kîjanê diyarker e û lazim e bê sererastkirin, tabî lawazî, şaşî, nebesiyên qada propaganda û ajîtasyonê diyarker e, lazim e sererastkirin teqez ji wir dest pê bike. Ji bo cih, wate û girîngiya xebata propaganda û ajîtasyonê ku di nav xebatên şoreşgerî, tevgera me ya partiyê de dagirtiye, bi kurtasî em dikarin van bibêjin.

## 2-DI NAV PKK’Ê DE PROPAGANDA Û AJÎTASYON

Di nav dîroka partiya me de xebatên propaganda û ajîtasyonê çawa pêş ketine, çawa hatine bikaranîn, çi encam dane, em dikarin li ser van rawestin. Vegotina dîrokî hem dikare xebatên propaganda-ajîtasyonê hê zêdetir ronî bike hem jî zêdetir şênber bike. Wekî dîrok me di pratîkê de çi çawa meşandine, di van mijaran de jî agahiyek têrker dikare bê dayîn.

Me diyar kiribû ku xebatên propaganda û ajîtasyonê bi sê şiklên mîna devkî, çekdarî û nivîskî tên meşandin. Tabî wekî dîrok, PKK ev hemû di nav pratîka borî de tevde bi kar anîn. Hin deman hin şêweyên propaganda-ajîtasyonê derketin pêş, hin talî man, hin deman yek milî bûn. Wisa hemû li gel hev, di nav hev de çênebûn. Lê şertên Kurdistanê, li Kurdistanê nêzîkatiya yekpare a şoreşgeriyê, lazim kir ku ev şêweyên propaganda û ajîtasyonê pev re bêne bikaranîn. Domahiya dîroka PKK’ê, dîroka Rêbertiyê şêweyê xebata şoreşgerî ya sereke û her tim derbasdar, propaganda û ajîtasyon e. Propaganda û ajîtasyon ji derketina Rêberiyê heta îro heye. Lê têkoşîna çekdarî, çalakiya çekdarî di demek diyar de derket ortê. Ji bo wextekî diyarkirî yê têkoşîna dîrokî derbasdar e. Rêxistinkirin, bûyîna rêxistin di demek diyarkirî de derket ortê.

Bêguman a encamgir çalakî ye, ya ku çalakiyê dafirîne rêxistin e. Bêyî rêxistin ne mimkun e ku li Kurdistanê çalakî bê kirin, serketin bê bidestxistin. Ji ber ku çalakî bi hêzê dibe. Ya ku li Kurdistanê hêzê çêdike jî rêxistin e. Baş e, ya ku rêxistinê çêdike çi ye? Bi gotinekê em bêjin perwerde ye. Ango propaganda û ajîtasyon e, ne xebateke din e. Ji ber vê sedemê propaganda û ajîtasyon xebat û wezîfeyeke wisa ye ku lazim e her şoreşger li her derê di her demê de bîne cih.

Nimûne, hin kadro hene ku dibêjin *“ez propaganda û ajîtasyonê nakim.”* Dibêjin *“ez şer dikim an jî siyasete dimeşînim, wê demê pêwîstî bi propaganda û ajîtasyonê nîn e, ez wê wezîfeyê nakim, bila hinên din bikin.”* Hazirxurî ev e. Baş e, gelo rêxistin nebe tu yê çawa çalakiya eskerî û siyasî bike? Tu propaganda neke, mirovan perwerde neke, tu yê çawa rêxistinê ava bike? Tu yê bi çi ve mirovan îqnayî jiyan, xebat û çalakiya rêxistî bike? Pêwîst e tu xebatên perwerdeyê bike. Vê jî dikare bi propaganda û ajîtasyonê pêk bîne. Wê demê li gel me perwerdekarên herî mezin, berevajiya zanebûna me, çalakvanên herî mezin in. Rêxistinkarên herî mezin, perwerdekarên herî mezin in. Vebirrî ye, yên ku dixwazin di rêxistin û çalakiyê de mezin bibin, pêş bikevin lazim e di perwerdeyê de kûr bibin. Rastiya Rêber Apo bi şiklekî net û şênber vê rastiyê piştrast dike, nîşan dide, ispat dike. Pêdivî bi delîleke din, li cihekî din piştrastkirinê tine ye. Ji ber vê yekê, kadro ne xwedî tercîheke wisa ye ku bêje ez propaganda û ajîtasyonê dikim an nakim. Yê ku dibêje *“ez nikarim propaganda û ajîtasyonê bikim”* tevlî partiyê nebûye û wezîfeyên partiyê qebûl nake. Di serî de tê wê manê ku xebata partiyê red dike. Di têgîhandineke wisa de, di vê feraset û terzê de şaşî heye. Eger wê sererastkirinek hebe lazim e ji vir dest pê bike. An ne, nabe sererastkirin.

Bi heman şiklî gotina, *“ez xebata propaganda û ajîtasyonê dikim, lewma ji rêxistin û çalakiyê dûr im”* û wisa hesibandin jî şaşiyeke mezin e. Ev jevqutkirina xebatan, tê maneya parçekirina partiyê. Parçekirina partiyê jî tê maneya parçekirina civakê. Gelo em dikarin civakê parçe bikin? Gêrçî yên hewl didin parçe bikin jî hene. Niha gelek tiştên ku hewl tê dayîn li ser navê PKK, xeta Apoyî, şoreşgeriyê bêne kirin, di bingeh de parçekirina civakê ne. Tevî ku em ewqasî cesaret û fedakariyê raber dikin, ewqasî bedelan didin jî ev nêzîkatiya parçekar nahêle em bigihêjin encama ku tê xwestin.

Li şûna ku em vê bibînin û sererast bikin, ne rast e ku em hê jî di vê şaşiyê de israr bikin. Ji ber vê jî hê beriya ku em dest bi kar dikin, lazim e di serî de em bibêjin ku jevqutkirina propaganda-ajîtasyon û qada rêxistin û çalakiyê şaşiyeke mezin e, tersî xeta Rêbertiyê ye, tê maneya parçekirina rêxistin û civakê, partî û civakê. Û lazim e em dest ji vê şaşiyê berdin. Ji ber vê jî şaş e ku mirov bibêje, *"di nav xebata propaganda û ajîtasyonê de çalakî û rêxistin nabe."*

Yê ku herî zêde xebatên propaganda û ajîtasyonê meşand Rêbertî bû, lê yê ku herî zêde rêxistin saz kir jî ew bû. Gerîla bi rê xist, şer kir, şer bi rê ve bir, fermandarî kir, pirsgirêkên teqtîk, terz, stratejîk ên şer gihandin çareseriyê. Di vê rewşê de ma gelo em dikarin bibêjin Rêbertî derveyî çalakiyê, derveyî rêxistinê ma? Na, teqez ne wisa ye. Wê demê heke em xwe li derveyî çalakî û rêxistinê bihêlin, tê wê manê ku em ji Rêbertiyê dûr ketine. Ev jî ne ji ber xwezaya xebatê ye, ji ber şaşiya me ye.

Wek nimûne, hevalê Mazlûm Dogan, qet ne li derveyî rêxistin û çalakiyê bû. Endamê yekem ê Komîta Navendî ya Partî bû. Di nav her cure çalakiyên pratîk de bû. Jixwe xebata propaganda û ajîtasyonê jî xebateke pratîkî bû, xebatên perwerdehiyê dikir, lê çalakiyên çekdarî jî plan dikir û tevlî dibû. Ev girêdayî nêzîkbûna şoreşgerî, tevlîbûnê ye. Eger tu xwe sînordar bike, qut bike, teng bike, ew dibe pirsgirêka te bi xwe. Lazim e ev pirsgirêk li xebata şoreşgerî, li xeta partî neyê barkirin. Lazim e tu bi xwe şaşiya xwe, xetaya xwe bibîne û rast bike. Helwesta rast û rastker teqez ev e. Yên wisa nekin, nikarin rast nêz bibin. Li ser vî bingehî lazim e xebat ji hev neyên qutkirin.

Li hin deveran dibe ku çalakî çêbibin, dibe ku em di hin komîte, rêxistinan de cih bigirin, ev karbeşiyekê divê. Lê belê, perwerde, rêxistinbûn û çalakî di nav hev de ne. Rêber Apo got, *"yekîtiya fikir-gotin-çalakiyê". E*v nikarin jev bêne qutkirin. Her şoreşger di nav vê yekparebûnê de ne. Şoreşgeriya ku xwe

ji vê qut dike, yekê esas digire û yên din nabîne, ne şoreşgeriyeke rast e. Ne şoreşgeriyeke Apoyî ye. Wê demê mirov dikare bibêje ku tevlîbûneke rast a partiyê çênebûye. Lê, li cem me cudabûn pir zêde rû didin. Çawa tevlî gerîla dibe, dest ji xebata propaganda-ajîtasyonê, xebata rêxistinbûnê berdide. Tê gotin ku *"bila rêxistin hazir bişîne, ez ferman bidim, kar bimeşin."* Fonksiyona xwe tenê wisa dibîne. Dema ku diçe xebata çapemenî-weşanê jî partî, rêxistin, çalakî tê jibîrkirin. Wisa difikire ku ew bi xwe ji partî, rêxistin û çalakiyê ne berpirs e. Dest jê berde ketina nav partî, rêxistin û çalakiyê, bi rêkûpêk naşopîne jî. Tê çi wateyê, çiqasî rast tê kirin, çiqasî nayê kirin; napirse, encaman jê nagire. Ne mimkun e ku yekî wisa bi şiklekî têrker propaganda û ajîtasyonê bike. Ji ber ku ji pratîk û şênberiyê qut e. Pratîkê naşopîne, bê rast û şaş çi ye, nikare cihêwaz bike. Wê demê ew gotina gotî, nivîsa nivîsandî, libata wî dê çawa rast be? Eger ku xwe ji pirsîna pratîkê dûr bixe, ji rexne û rexnegiriya pratîkê dûr bixe, berpirs nebîne; nikare ne rexne ne jî rexnegiriyê bike.

Xebateke propaganda-ajîtasyonê ya ku nikare rexne bike, rexnegir be, dersan ji xeta û kêmasiyên pratîkê derxe û rastiyan deyne ortê, ji rêxistin û çalakiyê, ji pratîk û zindîbûnê qut dibe. Ha, wê demê rewşeke jiberkirî, dogmatizm û qalibgerî derdikeve holê. Bi gotineke din, dibêjin ya *"ji derve xwendina rojnameyê"* ha wisa lê tê. Li ser pratîkê jî ti bandora wî namîne. Naxwe propaganda û ajîtasyon wisa nabe, şaş e. Ewilî lazim e em xwe ji van şaşiyan rizgar bikin. Ji bo vê jî lazim e em rastiya dîrokî baş lê bikolin, baş fêm bikin. Bê ka di pratîkê de şoreşgerî, xebata şoreşgerî çawa pêş ketiye, lazim e em karibin hûr bikolin.

## a-Propaganda û Ajîtasyona Devkî

Piştî Derketina Rêbertiyê, di demên despêkê de bi şiklekî hê bi bandortir propaganda û ajîtasyona devkî ji aliyê tevgerê ve hate bikaranîn. Dema ku em li dîroka PKK'ê mêze bikin em dikarin vê bi şiklekî rehet bibînin. Derketina Rêbertiyê xwe spart perwerdekirinê, qezenckirina hêza ramanê, îrade, cesaret û fedakariyê. Ev jî dihat maneya xebateke propaganda û ajîtasyonê ku navxweyî pêk tanî. Em dîqet bikin, wekî fermandarê gerîla derketineke Rêbertî nebû. Wekî rêveberê rêxistinê, Sekreterê PKK'ê, Rêber an jî fermandar, Derketina Rêberiyê nebû. Lê belê, Derketina Rêbertiyê bû derketineke ku xwe perwerde dike, wêrekî û fedakariyê qezenc dike, xwe digihîne ramanên rast.

Naxwe Rêbertî bi propaganda û ajîtasyonê derketiye. Di nav vê propaganda û ajîtasyonê de jî li ser şêweyê devkî xwend. Xwend, lê kola, lê pirsî, nîqaş kir, hêza mejî û ziman bi kar anî. Hem lê kola, pirsî, xwend hem jî nîqaş û propaganda kir. Di dema avabûna Koma Îdeolojîk de ku li dora Rêbertiyê çêbû, şiklê esas ê propaganda û ajîtasyonê, devkî bû. Kadroyên wê demê ji bo ku fêm bikin bê ka di warê teorîk de tê çi maneyê; pirtûk xwendin, li ser pirtûkan perwerde dîtin, nîqaş kirin, Rêbertî guhdar kirin. Bi Rêbertî re nîqaş meşandin. Agahiyên ku rast xuya dikin, girtin, dawerivandin û di mejiyê xwe de bi cih kirin. Piştre jî propagandaya wê kirin. Li her cihê ku çûnê, mîna bangawaziyê, li ser esasê ku rastiyekê li hawirdorê

belav dikin, propagandakarî kirin. Di perwerdeyan de axivîn, li ser xwarinê axivîn, li lokalê axivîn, li her derê nîqaş meşandin. Hêza ziman bi kar anîn. Hewl dan yên ku mîna rastî fêr bûne, ji hinên din re ragihînin, wan qeneh bikin, wan qezenc bikin. Bi xebateke wisa ve fikirên ku şaş dibînin rexne kirin. Tekane şêweyê xebata yekeya koma îdeolojîk a li Enqereyê, propaganda û ajîtasyona devkî bû. Xwe dispart perwerdeya li ser bingehê xebata grûbê û nîqaşên li mekteban. Tabî ev xebat û nîqaşên perwerdeyê veguherîn qada rêxistin û çalakiyê. Komaleya Xwendekariya Bilind a Demokratîk a Enqereyê (ADYOD), veguherîna vê asta hişmendiyê ji bo rêxistinê bû ku bi xebateke wisa ya propaganda û ajîtasyonê derketibû holê. Li ser bingehê vê komaleyê, bi taybet li Enqereyê di nav ciwanên xwendekariya bilind de çalakbûnek diyar derket ortê. Danezan hatin belavkirin, li dibistanan xwepêşandan çêbûn, li kolanan meş çêbûn. Di çarçoveya ciwanan de ji bo ku ciwan ber bi fikrên şoreşgerî bêne kişandin, tevlî rêxistinbûna şoreşgerî bibin, ji bo ku di nav ciwantiya xwendekariya bilind de ramanên şoreşger serwer bibin, hewlek hêja çêbû. Komale hatin vekirin, çalakî hatin lidarxistin, li dijî faşîstan şer çêbû, boykot, mîtîng, meş hatin lidarxistin. Lê ya diyarker perwerde û propaganda bû. Xebatên din, girêdayî perwerdeyê, ango girêdayî pêşketina propaganda û ajîtasyonê pêş ketin.

Di nava salên 1976-78'an de ku vegera Kurdistanê pêk dihat, dîsa ya diyarker û esas propaganda û ajîtasyona devkî bû. Kadroyên Apoyî esas qasî bandora çekdarî ya yekeyek gerîla xebata propagandaya devkî dimeşandin, bandor dikirin. Dîsa mîna kovar û rojnameyekê bûn xwedî rola propaganda û ajîteyê. Mîna kovar û rojnameyeke bi ling tevgeriyan, xebat meşandin, rol lîstin. Propaganda û ajîtasyon kirin. Ev bi ziman kirin, bi devkî kirin. Propaganda û ajîtasyona devkî bû esas. Ji bilî wê jî hin rêbaz hatin bikaranîn. Mînak belavok hatin belavkirin. Belavok dihat wê manê ku ji devkî derbasî nivîskî bûye.

Rêbertiyê di dawiya meha Tebaxa 1977'an de *"Pêşnûmeya Bernameyê"* amade kir. Êdî ev dibû di propaganda û ajîtasyona nivîskî de gavavêtin. Di meha Tîrmeha 1978'an de manîfestoya *"Rêya Şoreşa Kurdistanê"* nivîsand. Ev, gavavêtina propagandaya nivîskî bû. Di destpêka Cotmeha 1978'an de *Rojnameya Serxwebûnê* bi şiklekî îllegal mîna organê weşana navendî yê nivîskî hate derxistin. Êdî gav davet propaganda û ajîtasyona nivîskî, xebatên çapemenî-weşanê. Ne di ortama azadiya ku dijmin afirandî de, di ortama ku bi xwe xuliqandî de gav davêtê.

Li gel vê, Rêbertiyê bandora propagandaya çalakiyê her bi kar tanî. Li Enqereyê tevlî pratîka ADYOD'ê bû, li dijî faşîştan li zanîngehan, fakulteyan tevlî meşan, mîtîngan, boykotan bû. Ev çalakbûn ji 1976'an û şûn de derbasî Kurdistanê kir. Mînak, di dawiya 1976'an de me li Pirsûsê merasîmeke cenazeyê li dar xist, wekî mîtîngek mezin pêk hat. Cara ewil me li wir li pêşiya raya giştî dirûşm qîr kirin, pankart rakirin, li dijî leşkeran şer meşandin. Ev yekemîn mîtînga mezin a girseyî bû. Di warê bandora propagandayê de xwedî encamên girîng bû. Li Orte û Rojavayê Kurdistanê bandoreke pir mezin kir. Apoyîtiyê xwe bi vê çalakiyê da xuyakirin. Girtin, avêtin girtîgehan, lê bandora wê mezin bû, xwe da bihîstin. Bi bandora mîtînga Pirsûsê ve hate dîtin ku tevgereke wisa heye, hin fikran diparêze.

Piştre li gelek qadan çalakiyên ciwanan çêbûn, li dijî faşîstan şer çêbûn, li dijî êrîşên çekdarî yên avaniya sixûr û hevkar hamleyên bersivdayîna şoreşgerî, tolhildanê hatin pêşxistin. Li dijî qetilkirina hevalê Hakî Karer ku 18'ê Gulana 1977'an li Dîlokê hatibû qetilkirin, berxwedana tolhildana şoreşgerî ya ku cezakirina qatilan kiribû hedefa xwe, hate pêşxistin. Berxwedana Hîlwanê ku piştî bi destê çeteyên Silêmanan hevalê Halîl Çavgûn di 19'ê Gulana 1978'an de li Hîlwanê hate qetilkirin, wekî berxwedaneke yekpare ya xwecihî pêk hat û şiklê destpêkê yê berxwedana xwerêveberiyên me yên niha ne,

di havîna 1978'an de hate pêşxistin. Ew jî milekî pratîkî ye. Bêguman, giraniya çalakiyê hebû û ya esas ev berxwedan bû. Bi vî şiklî propagandaya çekdarî jî pêş xist. Ji milekî çapemeniya nivîskî, girêdayî wê hewldanên pêşxistina propaganda û ajîtasyonê, li milê din jî propaganda û ajîtasyona ku xwe dispêre çalakiyê gav bi gav dihate bikaranîn. Bêguman di wê demê de ya sereke propaganda û ajîtasyona devkî bû.

Me xebata propaganda û ajîtasyonê wekî xebateke bandorkirin, perwerdekirin, qenehkirin û tevgerkirina ferd û civakan nirxandibû. Rola wê ev e. Encamên wê jî wisa dibin. Wê demê, propagandaya devkî, çekdarî û nivîskî bi şiklên ku perwerdekirina mirovan, bandorkirin, tevgerkirin; bi hêza ziman, kovar û rojnameyên nivîskî yan jî mîtîngan, pêşendanan, çalakiyên çekdarî jev cihêwaz dibin. Li vir amûr cuda ne, em vê bibînin. Bi çekê hatî kirin, bi rojnameyê hatî kirin, bi ziman hatî kirin, ti ferqa wê nîn e. Xebat eynî ye, armanc eynî ye, bandor eynî ye. Nikare bê gotin ku propaganda û ajîtasyona ku bi şiklekî tê kirin xwedî wateyên cuda ne, ya bi şiklekî din tê kirin xwedî wateyeke din e. Ne wisa ye. Wate eynî ne, armanc eynî ne, rol û misyon eynî ne, wezîfe eynî ne. Tenê amûr cuda ne. Naxwe, propaganda û ajîtasyonên cuda tenê bi cihêwaziya amûran dibe. An ne, di armanc, fonksiyona propaganda û ajîtasyonê de ti cudahî nîn e.

Di warê amûr û terzê de propaganda û ajîtasyon wekî hin cureyan jev vediqetin. Bi ziman pêk were, dibe propaganda û ajîtasyona devkî. Di vê de ya esas qise ye. Me berê jî diyar kiribû, ya ku em li vir dikin propaganda û ajîtasyon e. Giştî xebatên me yên perwerdehiyê propaganda û ajîtasyon e. Ji sedî 90'ê xebatên Rêbertiyê her propaganda û ajîtasyon bûn. Perwerde da, ji bo her derê axivî û ev bi devkî kir. Piştre jî bi devkî kir û meşand. Di serî de jî herî zêde ev kir. Ji ber vê jî dema ku dipirsîn demildest bê teredut dibersivand, *"çeka min a herî xurt zimanê min e. Ez bi hêza ziman dixebitim, bi gotinê*

*ve mirovan perwerde dikim, bandor dikim, rêxistin dikim û dixim nav çalakiyê."*

## b-Propaganda û Ajîtasyona Çekdarî

Di Pêvajoya Yekemîn a Partîbûnê de ya esas propagandaya devkî bû. Propagandaya nivîskî yan jî çekdarî di plana duyemîn, sêyemîn, talî de dima. Ya diyarker û esas propagandaya devkî bû. Ev, di warê amûran de jev cuda dibin. Bi ziman bê kirin *"propagandaya devkî"*, bi çalakiya çekê be *"propagandaya çekdarî"* ye. Esas em dikarin ji bo mîtîng û xwepêşendanan jî *"propagandaya çalakiyê"* bibêjin. Heman rolê dilîze. Çalakiya çekdarî jî wisa ye, lê ji ber ku ya sereke û diyarker çek e, em *"propagandaya çekdarî"* dibêjin. Çalakiyek çekdarî dike, mirovan, civakan wisa bandor dike. Mejiyên wan bandor dike, hestên wan bandor dike. Bi bandorkirina mejiyan ve ramanê dide qezenckirin, bi bandorkirina hestan ve, cesaret û fedakariyê dide qezenckirin, dixe nav hereketê.

Propaganda û ajîtasyona nivîskî ya xebata çapemenî-weşanê, xebata li ser kovar û rojnameyê ye. Ev amûr kovar e, rojname ye. Di ya din de amûr çek e. Di propagandaya devkî de amûr ziman e. Di propagandaya nivîskî de amûr rojname û kovar in. Di propagandaya çekdarî de amûr çek û çalakî ye. Armanc yek e, hewl dide mirovan bandor bike, bixe hereketê, xîtabî mejî û hestan bike, ji bo şoreşê bîne asta karkirinê. Vê bi rêxistinkirinê dike. Giştî propaganda û ajîtasyon ji bo pêşxistina çalakiyê xwedî rol in ku mirovan rêxistin bikin. Rêxistin

dike. Çalakiya çekdarî jî wekî çawa bi destê ferd dikare bê kirin, her wiha komî jî tê kirin. Di çapemeniyê de ferd dixebitin, rojname derdikeve. Propagandaya devkî jî wisa ye, ferd dikin, lê rêxistin jî dike. Bi şiklê komî jî dikare bê kirin. Ev hemû rêxistinbûyînê pêş dixin.

Naxwe rêxistin nebe, çalakî nebe. Çi çekdarî be, çi siyasî be, çi demokratîk be bêyî perwerde rêxistin nabe. Wê demê, xebata me, çavkaniya me ya herî bingehîn a hêzê perwerde ye. Xebata herî bingehîn a ku Rêber Apo ji serî heta dawiyê bi şiklekî sereke meşand, perwerde ye, ango xebata propagandayê ye. Rêbertiyê ev jî bi giranî, ji sedî 90 devkî meşand. Bi rêka kovar û rojnameyan, piştre gelek tişt kirin nivîskî. Lê bi xwe di wê demê de, herî zêde giranî da axaftinê. Bi hêza gotinê kir, axaftin kirin nivîs, weşand. Çalakî jî araste kir. Bi xwe yekser neket çalakiya çekdarî û çalakiyê. Bi xebitandina çekê ve hewl neda bandorê li mirovan bike. Pêşiya vê vekir, bersiv da çawabûna wê, berê mirovan da çalakiyek wisa, di çalakiyê de mirov bi rê ve birin. Pirsgirêkên mîna ew ê çawa bê kirin, çareser kir û wisa pêk anî, lê bi xwe yekser çalakiya çekdarî nekir. Ji koma çalakiya çekdar re fermandarî nekir.

Di encama van hemû raveyan de pênaseyek wisa dê li cih be: Di pêvajoya Yekemîn a Partîbûnê de şiklê bingehîn ê propaganda û ajîtasyonê, propaganda û ajîtasyona devkî bû. Propaganda û ajîtasyona nivîskî, dîsa propaganda û ajîtasyona çekdarî bi qismî dihate bikaranîn, bi şiklekî talî nû bi nû pêş diketin. Di dema Duyemîn a Partîbûnê de, ango di salên 1980'yî de bi giranî û esas propagandaya çekdarî bû. Gerîlayên wê demê esas wekî xebatên an jî yekîneyên propagandaya çekdarî dihatin îfadekirin. Lê pir zêde bû, esas bû, diyarker bû. Propaganda û ajîtasyona nivîskî jî hebû. Tevgerê li derveyî welat rojname û kovar derdixist. Dîsa propagandaya devkî dikir. Li her derê, di serî de Rêbertî, kadroyan qasî pêdiviyê di xebatên propaganda û ajîtasyona devkî de cih digirtin. Rêbertî esas xebatên propaganda û ajîtasyona devkî dimeşand. Di wê

demê de her axivî. Wekî pêvajoya beriya wê, axaftin wekî nivîs jî hatin tomarkirin. Lê wekî tevger ya esas û bi bandor propagandaya çekdarî bû. Rêxistinbûna esas gerîla bû, meyl û xebata esas çalakiya çekdarî bû. Lewma çalakiya çekdarî ya gerîla ne tenê xebatek derbkirina dijmin bû, xebateke wisa bû ku civak rêxistin dikir, ji bo rêxistinkirinê perwerde dikir. Perwerde, rêxistinkirin, çalakî 3 wezîfeyên bingehîn ên gerîla bûn. Li Kurdistanê gerîla û rola gerîla wisa hate pênasekirin.

### c- Propaganda û Ajîtasyona Nivîskî

Di pêvajoya Sêyemîn a Partîbûnê de giraniya propaganda û ajîtasyonê ket ser çapemenî-weşanê. Di çapemenî û weşanê de jî wekî çawa rojname û kovar karîgertir bûn, her wiha amûrên propaganda û ajîtasyona dîtbarî û bihîzbarî yên mîna radyo û televîzyonê jî her ku çûn pêş ketin. Zehf bandorkertir bûn. Bi taybet piştî orta salên 1990'î derketin pêş. Heta wê demê giraniya propagandaya çekdarî zêde bû. Ji destpêka 1990'î ve her ku çû propaganda nivîskî, xbatên propaganda û ajîtasyona têkildarî çapemenî-weşanê bûn xebatên esas û diyarker. Karîgeriya gerîla, her wiha çalakiyên girseyî, serhildan, propagandaya çekdarî da domandin. Propagandaya devkî dîsa ji aliyê her kesî ve hate meşandin. Ew jixwe xebateke me ya li dibistanan, perwerdeyan bû. Ji bilî wê li kolanan ajîtasyon derketin pêş, ajîtasyon- propagandayên xîtabî girseyan dike, çalakiyên girseyan araste dikin, dewam kir. Feqet a arastekar, a giraniya xwe çêkir, propaganda û ajîtasyona girêdayî çapemenî û weşanê bû.

Xebatên propaganda û ajîtasyonê yên PKK'ê seyreke wisa ya dîrokî şopand. Di Pêvajoya Yekemîn a Partîbûnê de, ango di salên 1970'yî de di serî de Rêbertî, hemû kadroyan wekî xebateke bingehîn, xebata propaganda û ajîtasyona devkî meşandin. Wekî propagandaya nivîskî di vê demê de belavok hatin

bikaranîn. Ji bo bîranîna hevalê Hakî Karer di bihara 1978'an de broşur hate amadekirin. Dîsa *"Pêşnûmeya Bernameya Partî", "Manîfesto"* û *"Danezana Damezrandinê"* bi şiklekî nivîskî hate amadekirin. Ya esas jî wekî Organê Weşana Navendî ya Partî di destpêka Cotmeha 1978'an de bi şiklê kovarek îllegal "*Kovara Serxwebûnê*" hate derxistin. Ewil wekî hejmarek giştî, heta dawiya sala 1979'an jî 5-6 jimarên taybet hatin derxistin. Desteya Weşana Navendî yan jî Komîteyê ev xebat bi şiklekî îllegal derxist. Bi amûrên ku bi xwe amadekirî wekî daktîlo, makîneya teksîrê ve çapa Serxwebûnê hate kirin.

Yên ku wekî çalakiya çekdarî hatin bikaranîn, çalakiyên ciwanan ên li derdora ADYOD'ê bûn. Piştre, mîtînga Pirsûsê ya di Gulana 1976'an de bû. Di nav karkeran de kar hate kirin, tevlîbûna hin grevan çêbû. Protestoyên ciwanan li Kurdistanê hin caran rêxistî kirin, lê ya ku bi pêş de çû, pêşketina taktîkî ya ku Rêber Apo wekî, *"têkoşîna li ser bingehê şîdeta şoreşgerî ya li dijî avanî, sazî û kesên sîxurbûyî"* pênase kirîbû. Ya ewil di 18'ê Gulana 1977'an de bi armanca tasfiyekirina koma sîxur a Stêrka Sor hate bikaranîn. Di 1978'an de li dora Berxwedana Hîlwanê, li her derê Kurdistanê çalakiya li dijî faşîstan û polîsan, li dijî avanî û kesên sîxur bû. Çalakiya çekdarî her ku çû derket pêş û berbelav bû. Çalakiya çekdarî ya PKK'ê, çalakiyên komên biçûk bûn.

Di Pêvajoya Duyemîn de propagandaya devkî esas ji aliyê Rêbertiyê hate bikaranîn, pirtûk û broşur hatin amadekirin. Hejmarek kêm a kadroyên di nava civakê de dixebitîn jî, bi giranî rêbaza propaganda û ajîtasyona devkî bi kar tanîn. Tevgerê wekî esas propaganda û ajîtasyona çekdarî bi kar tanî. Li ser hîmê Pêngava Gerîla ya 15'ê Tebaxa 1984'an, ev hê berbelavtir û çalaktir bû. Heta wê demê propagandaya hebûna komên çekdar dihate kirin. Piştî çalakiya Dihê-Şemzînan a 15'ê Tebaxê, çalakî jî bû mijara propaganda û ajîtasyonê û her ku çû mezin bû, belavî her derê Bakurê Kurdistanê bû, xwe gihand sînorê Rojava. Ango, gerîla karîgerî li hemû Kurdistanê kir.

Erê, li dijî TC'ê şer kir, qada şer bû Bakur, lê sînorê Rojava, sînorê Başûr, sînorê Rojhilat hemû hatin bikaranîn, xwe gihand wan sînoran. Desteka ji derve ya gerîla ji wan deveran bû. Lewma jî PKK'ê têkoşîna xwe di yek carê de li çar parçeyên Kurdistanê meşand, berbelav kir, xwe kir tevgerek gerîla, vê rewşa xwe li hemû civakê jî belav kir.

Di vê demê de propaganda û ajîtasyon jî li gorî berê pêşdetir bir. Ji destpêka Çileya 1982'yan ve li Ewrûpayê wekî nîv-rojnameyekê Rojnameya Serxwebûnê derxist. Organê weşana navendî bû ku wekî organê weşana navendî ya mehane, di Cotmeha 1978'an de li Bakurê Kurdistanê bi şiklekî îllegal bi formatê kovarê derketibû, dema ku dît êdî li Kurdistanê li beramberî darbeya leşkerî ya faşîst a 12'ê Îlonê bi şiklekî îllegal be jî nema dikare weşaneke wisa derxîne, organê weşana navendî xwe spart ortama kêmekî ji demokrasiyê re vekirî ya Ewrûpayê û ji wir hate meşandin. Serxwebûn nîv-kovar, nîv-rojnameyek bû ku weşana mehane dikir, nêrînên navenda partiyê radigihand, nivîsên Rêbertiyê amade dikirin û diweşandin. Heta roja me jî bêyî ku bê girtin, bê navber wekî weşaneke mehane ma, rol lîst. 37 sal in wekî organê weşana mehane bênavber didome. Organekî wisa yê weşanê ye ku li Kurdistanê bê navber herî dirêj hatiye derxistin. Dibe deng û zimanê Şoreşa Kurdistanê. Rojnameya Serxwebûn wisa ye ku mirov dikare dîroka şoreşê herî rast, roj bi roj jê bişopîne, lêbikole. Materyalekî wisa bingehîn e. Amûrekî wisa ye ku pêşiyê li çalakî û rêxistina şoreşgerî vedike, vedibêje, naverokê radigihîne.

Li gel Serxwebûnê, di orta salên 1980'yî de piştî ku di Newroza 1985'an de Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan-ERNK hate îlankirin, wekî organê weşana eniyê "*Rojnameya Berxwedan*" hate derxistin. Ew jî bi ebada nîv-rojnameyê derket. Hê zêdetir nêrîna gelê welatparêz, encamên têkoşîna gelê şoreşger-welatparêz, têkoşîna jin û ciwanan ragihand. Weşaneke wisa bû ku nûçeyên têkoşînê didan, bi nivîsên kurt ve

têkildarî têkoşîna welatparêzî nêrîn radigihandin. Serxwebûn organekî weşana berfireh a teorîk, felsefîk, îdeolojîk bû, di van qadan de dahûrandin, ronakbîrî pêş dixistin; Berxwedan bû dengê rojane yê têkoşîna azadiyê. Encamên têkoşînê ragihandin. Demek dirêj jî dewam kir. Ewil rojnameyeke her 15 rojan carekê bû, dûvre veguherî rojnameya rojane. Ji wê rojê heta niha li Ewrûpayê wekî rojnameyeke rojane weşanê dike. Xwedî domdariyeke wisa ye.

Ji derveyî vê, pirtûk jî hatin derxistin. Çapa pirtûkan wekî xebateke propagandayê hate pêşxistin. Afîş, belavok, pûllêxistin organê propagandayê bûn. Li gel vê Rêbertiyê demekê li Ewrûpayê bi navê *"Şoreşa Kurdistanê"* kovarek derxist. Beriya Berxwedanê, li gel Serxwebûnê, wê demê ji bo weşandina giştî xebatên teorîk ên berfireh Serxwebûn têrê nekir. Xebatek zêde ya teorîk a Rêbertiyê hebû. Ji bo ku li Kurdistan û Tirkiyeyê têkoşînê, şoreşgeriyê araste bike û pêşiyê lê veke, kovarek weşand û 2 salan domand. Organekî weşana teorîk bû ku her 3 mehan carekê derdiket. Encamên lêkolînên teorîk ên di asta stratejîk de ragihand.

Ji orta 1980'yan û şûn de bi navê "Şoreşa Kurdistan" bi zimanê Erebî li Rojhilata Navîn kovarek hevşib derxist. Ew jî car caran derdiket, hatin wergerandin, pirtûk hatin çapkirin. Ji destpêka sala 1990'î ve di Pêvajoya Sêyemîn a Partîbûnê de her ku çû ev rewş guherî. Rêbertiyê di salên 1990'î de di çarçoveya Dibistana Navendî ya Partî de propagandaya devkî meşand. Ev axaftin bûn nivîs. Parazname li Îmraliyê wekî organê berfireh ê weşanê danî ortê. Propaganda û ajîtasyona ku xwe dispêre çapemenî-weşanê derkete pêş. Propaganda û ajîtasyona devkî wekî rêbaz hê zêdetir li mîtîngan, dibistan, perwerde, çalakiyên girseyî hate bikaranîn. Dîsa propaganda çekdarî, berxwedana gerîla, çalakiyên çekdarî bûn xwedî bandoreke propagandayê, lê rola herî zêde ya xebatên propaganda û ajîtasyonê, perwerdekirin û tevgerkirina civakê, xebatên çapemenî-weşanê girte ser milê xwe. Gerîla ne qasî salên

1980’yan berbelav bû, bandora xwe ya propagandayê ewqas nebû. Wê rola xwe lîstibû. Propaganda û ajîtasyona devkî jixwe di salên 1970’yan de rola xwe lîstibû. Neqediyabûn, dewam dikirin, lê wekî qadeke nû, çapemenî-weşan, ji salên 1990’î ve pêş ket.

Çapemeniya nivîskî heta destpêka salên 1980’yan li Ewrûpayê bû, ji 1990’î û şûn de êdî derbasî Bakurê Kurdistanê, Rojavayê Kurdistanê, Başûrê Kurdistanê jî bû. Li Rojhilat bi şiklekî ku di her firsendê de bandorê lê bike, hate destpêkirin û gav bi gav hate pêşxistin.

Ji bo bandorkirina Bakur, li metropolên Tirkiyeyê pêşketinên berbelav çêbûn. Ji destpêka sala 1989’an ve organê yekemîn ê weşana me *“Toplûmsal Dîrîlîş”* bû. 5-6 jimar derketin. Di encama plansaziyan de ku ji ser Ewrûpayê ve hatin kirin, organa yekemîn a weşana mehane bû. Dema ku ew dan girtin û di destpêka 1990’î de bi serhildanan re sîstema mêtinger hinekî parçe bû, di wê ortamê de çawa ku çalakbûna girseyê, siyaseta demokratîk, qada huner û wêjeyê qismî pêş ket, herî zêde di qada propaganda û ajîtasyona nivîskî de, qada çapemenî-weşanê de pêşketin çêbûn.

Pêşketina kovar, rojname, weşangeriya Kurdî-Tirkî, çapemeniya azad, wekî Ozgur Gundem, Ozgur Halk, Azadiya Welat bi zimanê Kurdî şênber bûn, lê bi navên cur bi cur ên ku versiyonên van ên cuda ne, dest pê kir. Her çiqasî dijmin bi êrîşên xwe ve hewl dabe asteng bike jî berxwedan çêbû, li şûna yên girtî, yên nû hatin damezrandin û wisa domdariya xwe pêk anî.

Tevî hemû hewldanan jî têkoşîna şoreşgerî êrîş şkandin. Propaganda û ajîtasyonek wisa ya nivîskî dewam kir. Ewrûpayê jixwe domand. Ji ser metropolan ber bi Bakurê Kurdistanê ve rêyek wisa ya çapemeniyê vebû. Her ku çû xebatên ji ser Lubnanê ji bo Rojava gihiştin astekê. Bi Şoreşa Rojava re çawaniya xwe zêdetir kir. Televîzyonvanî ku 1995’an dest pê kir, tevî hemû zext û girtinan jî, li gel kovar û rojnameyan, weşangeriya radyo û televîzyonê jî pêş ketin. Weşangeriya

Med TV ji 2000'î û şûn de jî hate domandin, berfirehkirin. Kovarên jin û ciwanan li giştî parçeyan, derveyî welat dîsa ji salên 1990'î ve pêş ket. Weşangeriyek, li gorî xwe, li Başûr û Rojhilat jî çêbû. Hemûyan kêmekî hêz û desteka xwe ji Ewrûpayê girtin. Weşangeriya dîtbarî ya mîna televîzyonê, xwe hê zêdetir bi pêşketinên li Ewrûpayê meşand, xwe spart wir. Lê di şênberiya xwe de jî bi şiklê rojname, kovarê xetek weşangeriyê bi dest anî. Li Bakur her tim legal bû. Tevî hemû hewldanên îllegalkirinê yên dijmin jî di legalbûyînê de li ber xwe da. Ew spart têkoşîna din û di astek girîng de bi dest xist. Li Başûr jî legal bû. Li Rojava demek dirêj nîv-legal, nîv-îllegal meşiya. Li Rojhilat jî derfetên legal hebûn, hinekî hewldanên bikaranînê çêbûn, lê pir nehatin pêşxistin. Lewma jî hewldanên pêşketina legalbûnê her nîv man, hê zêdetir wekî weşangeriyeke îllegal a ku xwe dispêre gerîla dewam kir.

Wekî agahdarkirineke giştî, di warê dîrokî de mîna xulaseyekê ev dikarin bên dayîn. Propagandayên devkî, çekdarî û nivîskî dikarin bi vî şiklî bên pênasekirin. Di pêvajoyên cuda de kîjan rêbazên propaganda û ajîtasyonê derketin pêş, dikarin wisa bên diyarkirin. Ev ne tercîh bû, wekî şiklê xebata şoreşgerî derket. Di salên 1970'yan de di Pêvajoya Yekemîn a Partî de şoreş lawaz bû, mêtingerî serwer bû, her tişt îllegal dimeşiya. Wisa meşiya. Di Pêvajoya Duyemîn de li dijî faşîzma 12'ê Îlonê şer esas bû, dijmin ti şiklên din ên têkoşîn, xebata şoreşgerî nehiştibû, lewma xebata esas gerîla bû. Propaganda û ajîtasyona bingehîn a gerîla propaganda û ajîtasyona çekdarî bû.

Di Pêvajoya Sêyemîn a Partîbûnê de her ku çû qada siyaseta demokratîk pêş ket. Her ku qada siyaseta demokratîk pêş ket, propaganda û ajîtasyona nivîskî, çapemenî-weşan derket pêş. Bi yên din re meşiya. Ji ber ku PKK û têkoşîna wê bû xwedî legalbûneke diyar. Lê, bi guhertinên pêwîst ên şoreşgerî-demokratîk ve nikarîbû li Tirkî, Îran, Erebîstanê avaniyek siyasî ya demokratîk derxîne. Dema ku wisa bû jî her tim nîv-

legal, carna îllegal ma. Weşangeriya van şertan an jî pêşxistina van aliyên propagandayê hemû wekî gereka şertên şênber ên îdeolojîk, siyasî û eskerî derketin ortê. Rêbertî û koma îdeolojîk di salên 1970'ê de ne ji ber ku canê wê xwest propagandaya devkî kir. Bi şiklekî din nikarîbû bikirana. Eger ku hewl bidana kovarê derxînin, ew ê ji roja destpêkê ve bihatibana girtin. Heke kesekî bi bertek serî li çalakiyê bidana, ew ê bihatana gulekirin. Wisa jî ew ê tevger biqediya. Ev xebat, xebateke şoreşgerî ye, bi şiklê tehlîla şênber a şertên şênber pêş ket. Şertên şênber jî enceq bi van şertan ve dikarîbû xebatên propaganda û ajîtasyonê bike, rêxistin û çalakiyê pêş bixe. Rêbertî û partî jî li gor gereken wê tevgeriyan. Şertan çi pêwîst kiribe wisa hereket kirin.

## 3- LI SER XETA RÊBERTIYÊ ZIRAVIYÊN PROPAGANDA-AJÎTASYONÊ

Li ser taybetmendiyên xebatên propaganda û ajîtasyonê gotina çend tiştên din jî ew ê sûdmend be. Mesela me gotibû xebata propaganda-ajîtasyonê, lê her gotin ne propaganda ye. Em nikarin her gotinê wekî propaganda û ajîtasyon pênase bikin. Mînak em nikarin gotegotan wekî propaganda bihesibînin, gazinc ne propagandakarî ye. Serobero axaftin nabe propaganda û ajîtasyon.

Wê demê ji bo ku gotinek bibe propaganda yan jî bibe xwediyê nirxê propagandayê, ji bo bê maneya propagandayê lazim e hin krîteran bihewîne. Lazim e hin taybetmendiyan îfade bike. An ne, em nikarin ji kesê ku herî zêde gotegotan dike re bibêjin *"wa çi propagandakarekî baş, wezîfeya xwe ya dîrokî tîne cih."* Wê demê taybetmendiyên propagandaya devkî çi ne? *"Bûyîna propagandakar"*, *"ajîtatorê devkî"*, têgehên mezin bûn, bi şiklekî dîrokî jî di dîroka civakan de hene. Ji bo bandorkirina civakan, mirovan, ji bo arastekirina xebatên diyar bi kar tanîn. Lê di dîroka dewlet û şeran de jî hebûn. Mesela li

Romayê behsa propagandakaran, ajîtatoran tê kirin ku hemû endamên senatoya Romayê wekî ajîtator, propagandakar têne bibîranîn. Kesayetên ku hê jî behsa navên wan têne kirin hene, heta roja me jiyane. Fermandar, ajîtatorên ku bi qiseyekê ve temamî artêşê sewqî şer kirine, berê wê dane çalakiyekê hene. Propagandakarên ku bi axaftinekê ve li meclîsan mijar dane qebûlkirin hene. Propagandakar û ajîtatorên wisa derketine ku di nava dîrokê de li pêşberî civakê axivîne, civak li pey xwe kişandine, bi ser girtîgeh, qesran de girtine.

Naxwe, propaganda û ajîtasyon karîger in. Li milê din jî her cure axaftin ne xwedî taybetmendiyê propaganda yan jî ajîtasyona devkî ne. Ji bo wisa bibe lazim e hin krîteran bihewîne. Ev kriter çi ne, wê demê propaganda yan jî ajîtasyona devkî çawa tê kirin? Me ji bo propagandayê got perwerdekirina yê beramber e, ji bo ajîtasyonê jî got hilkirina hestên wî ne. Naxwe lazim e wisa bin. Her gotin tavilê nikare yê li beramber rake ser piyan, hestan geş bike. Her gotin ne perwerdekar e. Wê demê em ji yê perwerdekar re propaganda, ji yê ku hestan radike re ajîtasyon dibêjin. Ji bo perwerdekar be lazim e gotinek çawa be? Em pirseke wisa dikarin bikin. Lazim e çawa be? Lazim e yekparebûnek hebe, sîstemek hebe, ravekirin, vegotin, ronakiya wê hebe. Di mijarê de fêrker be. Naveroka wê hebe, yekgirtî be.

Ev jî ne bes e. Ji bo ku gotinek bibe propagandayek têrker an jî serketî, lazim e bi zimanekî guncav, uslûbekî kişîner, karîger ji yê beramber re bê ragihandin. Lazim e baweriyê bide. Kurtasî lazim e perwerdekar be. Ji bo perwerde bike lazim e baweriyê bide û ji bo vê jî lazim e propagandakar bi xwe pê bawer be. Kesekî ku bi xwe bawer neke nikare bi gotina xwe ve kesekî din bide bawerkirin û ew ê teqlîd bimîne. Ti bandorê nake. Gotineke ku jiberkirî û bê bawerî tê gotin, nabe xwedî bandoreke zêde. Heke kesek bi rastiya gotinên xwe bawer be, bi wê baweriyê ve wê çaxê gotina xwe tenê bi ziman ve nabêje, her wiha bi beden jî dibêje, bi tevgera xwe jî dibêje. Ew ê gotin

û tevger yekparebûnekê diyar bike. Tonekî guncav ê deng, uslûbekî wisa bê bikaranîn ku ew ê yê li beramber bandor bike. Di mijarekê de mirov fêm dikin bê çi têne kirin. Li gel vê bandor dibin, fêr dibin, bawer dikin. Bawerî girîng e. Lê ne wisa be, tu bi xwe baweriyê nediyê, wisa bêyî bawerî bi zorê tu tiştekî bibêje, ew ê nejidil be. Gotinên wisa nejidil jî nabin propaganda. Baweriyê nade, yê li beramber bandor nake. Kesek, tiştekî ku pê ne bawer nikare bi şiklekî pê bawer rave bike.

Berê artêşekê dide şer, lê bi serketinê bawer neke, xwe nediyê, bi gotina, *"em biçin şer"* ti kes naçe şer. Ajîtasyoneke wisa nabe. Heke mirov bi rastî baweriyê bide pêk tê. Wê demê ji bo propaganda-ajîtasyonê lazim e hin pîvan bêne bicîhanîn. Mînak heke tu yê di mijarekê de propaganda bike, lazim e tu xwe amade bike, zane bike, fêr bike, fêm bike, hunerweriyek vegotinê qezenc bike, xwe perwerde bike û baweriyê bi rastiya gotinê xwe bîne. Piştre, ji bo ku yê li beramber fêm bike, tu yê hewl bide. Eger tu bêje min got, kî fêm dike bila fêm bike, fêm nekir jî bila fêm neke, min eleqeder nake; heke tu naxwaze kar bike, dixwaze gunehan berde, wextê xwe tijî bike yan jî mîna tiştek kirî xuya bike, dikare wisa nêz bibe. Lê jê re propaganda nayê gotin. Dibe mîna xebata propagandayê bê dîtin, lê di vî warî de lazim e em propagandayê bi qistasekê ve girêdin.

Me wekî karekî, xebatekê destnîşan kir, wê demê em ê propaganda û ajîtasyonê bi qistasa serketinê ve girêbidin. Heke qiseyek yê li beramber bandor bike, tiştekî fêr bike, perwerde bike jê re propaganda tê gotin. Mînak, heke serketin derdikeve ortê, hestan radike, jê re ajîtasyon tê gotin. Propaganda û ajîtasyon xwedî taybetmendiyeke wisa ne. Lazim e propaganda bi serketinê ve were girêdan. Di jiyana civak û mirov de xwedî wate û fonksiyonekê ye. Ne bêwate û bêfonksiyon e. Propagandaya devkî jî qasî ku vê pêk tîne wisa ye.

Têgînek bi navê *"Propaganda Dijber"* heye. Ji bo ew propagandaya ku li dijî propagandaya heyî tê meşandin, dibêjin *"propaganda dijber"*. *Propaganda Reş*, propagandaya ji bo be-

revajîkirina rastiyan e. Di çarçoveya şerê taybet de ev dikare hê berfirehtir bê nirxandin. Xwe dispêre derew, dek û dolaban ku niha herî zêde em bi vê xisûsê re hevrû dibin, lazim e li ser bê rawestandin.

Feqet di wateya rast de propaganda û ajîtasyon ji bo ferd û civakê taybetmendiyên erênî îfade dike. Ji bo ferd û civakê erênîbûnekê vedihewîne. Girêdayî serketinê ye. Em nikarin neyênî binirxînin. Wê demê ji bo ku xebateke devkî bibe xwedî nirxa propaganda yan jî ajîtasyonê, lazim e roleke erênî bilîze, serketinê bîne. Ji van kesên ku propaganda û ajîtasyonê dikin re propagandakar, ajîtator tê gotin. Çawa? Heke ku mijarekê bi şiklekî yekpare û bi zimanekî zelal vebêje dibe propagandakar, ajîtator. Bi gotina, *"ez propagandakar im"* ti kes nabe propagandakar. Nabe ajîtator jî. Propagandakarî yan jî ajîtatoriya kesekî bi rêjeyê serketina wî/ê ve diyar e. Mînak, heke bi axaftinê karibe yê li beramber bandor bike, perwerde bike, encamên serketî bigire, ha ew dibe propagandakar. Bi gotinekê ve komekê bixe hereketê, serketinê bi dest bîne, ji wî re jî ajîtator tê gotin.

Naxwe, propaganda û ajîtasyon pêwendiya xwe bi serketinê heye. Ev erênîbûnê digirin nava xwe. Li gel vê, pîvana wê serketin e. Wê demê, her gotin, her axaftin, her peyva ji dev dertê, nabe propaganda-ajîtasyon. Enceq heke yê li beramber perwerde bike, bandor bike, bixe nav tevgerê, ango karîgeriyê li mejî, dilê kes bike, veguhere perwerdeyê yan jî bixe nav livekê, em dikare jê re propaganda û ajîtasyon bêjin. Ev jî perwerdeyê divê. Ji bo ku ev bi devkî bê kirin, bi rastî jî pêdivî bi xweperwerdekirinê heye. Wisa ji ber xwe nabe. Yek, tu yê bizanî, ev jî perwerdê divê. Dudu; tu yê bawer bikî, ev jî perwerdeyê divê. Sisê; ew ê uslûbê te karîger be, ev jî perwerdê dixwaze. Ji eyarkirina tona deng bigire heta bi şiklekî rast û zelal sazkirina hevokan ev wisa ye. Ev dibin mijarên uslûp, xîtabê. Li cem vê libat jî girîng e. Ti bandora gotinên bêtehm tine ye. Gotinên bi bawerî derdikevin xwedî bandor in.

Gotinên yekpare xwedî bandor in. Gotinên ravekar xwedî bandor in. Mesela qiseyên Rêber Apo bandorker in, ji ber ku yekpare û kûr in, zelal in, ronak dike. Li gel vê, bi çi bawer be wê dibêje. Piştî got, tiştên tersê wê nake. Yê li beramber dibîne ku naxapîne, şaş nake, bi xwe bawer e, gotinên xwe pêk tîne. Wê demê bi xwe dide bawerkirin. Naxwe, yekparebûneke gotin û libatê heye. Li ser vî bingehî, pir girîng e ku mirov bi xwe jî bawer bike, dîsa li gor wê libata xwe eyar bike.

Kemal Pîr, propagandakarekî zehf baş bû. Serobero nedaxivî. Nediket nav sohbetên sivik. Dûvdirêj nediştexilî. Lê, dema ku dest bi axaftina tiştekî dikir jî tenê bi devê xwe nedaxivî, bi hemû laşê xwe dipeyivî. Ser, çav, dest hemû diketin hereketê. Tenê gotin nedigotin, pê re hereket jî dikirin. Hemû tiştên wî bi qiseyên wî re dibûn yek û ji ber vê jî her tim bal dikşandin ser xwe. Bi vê axaftinê ve dikarîbû demildest ê li beramber bandor bike. Ji bo mirovan kişîner dihat. Bandor dibûn, dihatin girêdan. Bawerî bi rastiya axaftinan tanîn, digotin *"em pev re biçin". D*ema ku diçe Lubnanê rastî endamên Partiya Komunîst a Iraqê tên, bi dest, dev dikeve nav vegotina sosyalîzmê. Piştî ku demekê daxive, hevalê li balê dibêje, *"Hevalê Kemal, ev Ereb in, Tirkî nizanin."* Ew jî dibêje, *"Bila nizanibin, ew ê ji libata min fêm bikin, Tirkiya min jî fêm bikin."*

Bêrîvaneke ji Silêmanî hebû. Di 1994'an de dema ku em li dibistana Navendî ya Partî diketin dersê, me dît ku heval wê derdixînin derve. Rêbertiyê ew li ber derî dîtin, li ser sûc girtin û pirsî; *"hûn çi dikin?"* Hevalan gotin, *"Serokê min heval ji Silêmanî ye, Tirkî nizane, ji ber wê jî em derdixînin derve."* Rêbertî got, *"Bibin hundir, hewa min jî perwerde dike."* Propagandakar wisa dibe.

Di warê devkî de her gotin ne propaganda ye. Yek; lazim e yekpare be, xwedî naverok be û ronak bike. Dudu; ya ku bi her terzê tê gotin jî ne propaganda ye, lazim e terz û şiklekî vegotinê hebe. Lazim e yekgirtinek mabeyna qiseker û qiseyê de hebe. Dikare tiştên gelekî rast jî bêne gotin; lê bi şiklekî mirî,

rûtirş, minminok, gotin neyên fêmkirin, nabe. Çiqas tiştên rast jî bêje nikare ti kesî bandor bike, bide bawerkirin.

Dibe ku her mirov nikaribin di heman astê de pêk bînin, lê bixwaze û hewl bide dikare bibe propagandakar û ajîtatorekî baş. Kar esas bigire, ango xwe bide wî karî, dikare bike. Ji ber wê jî girêdayî xweperwerdekirinê ye. An ne, ev ne tiştên ji bûyînê ne. Ser meselê, ji bo ravekirina mijarekê agahî û pergalek ramanan pêwîst e. Tu zane be jî dîsa qisekeriyeke karîger lazim e. Lazim e karibe bibe xwedî hêzeke vegotinê ku zaniyariyên xwe ragihîne. Ev jî bi hewldanê dibe, ji ber xwe nabe. 4 saet in daxivim, berê vê 4 deqeyan jî nedajot. Dest jê berde axafineke wisa dirêj, ne mimkun bû ku yê li beramber fêm bikirana.

Hin heval hene, dema ku em diketin perwerdeyê nikarîbûn yek deqeyê jî baxiviyana. Carekê li gel hevaleke jin em komîsyon bûn, ew ê ders bidana, rabû tiştek got û rûnişt. Careke din rabû û dîsa rûnişt. Me navberek da dersê, me careke din dest pê kir, me dîsa navber da. Em ê careke din dest pê bikin, em ketin hundir, çend hevok gotin, xitimî. Bi şiklekî ku wê qedand min dest pê kir, ez rabûm û axivîm, hevalan ferq nekirin. Halbûkî wê ti carî dest pê nekiribû. Me dît ku nabe, dicirifî. Lê piştre ew kesa xwe di nav rêxistinê de kiriye tiştekî mîna teorisyen, propagandakarek wisa ku di nav rêxistinê de dikarîbû hizbgiriyê bike. Ev bi hewldanê dibin.

Rêbertiyê bi şiklên cuda hewl dida baxive. Rûdinişt daxivî, diceriband. Radibû ser piyan daxivî, dimeşiya daxivî. Di serî de nikarîbû ev hemû di heman astê de pêk banîbana. Bi demê re her bi hewldanê zorî da xwe, xwe perwerde kir û fêr bû. Piştî wê hat astek wisa ku êdî dikarîbû bi her şiklî propagandayê bike, fikrên xwe ragihîne. Ji ber vê bi perwerdeyê tê qezenckirin. Xweperwerdekirin jî têkildarî girêdana armancê ye. Mirov bixwaze dikare perwerde bike. Bi zorê nabe. Dibêje, *"ez ê vê bikim"* û perwerde dike. Daxwaz jî bi baweriyê dibe. Hûn nikarin bêjin ez ê bixwazim. Hûn nikarin tiştên pê bawer nakin

bixwazin. Wê demê hûn ê baweriyê bi gotin, kirinên xwe bînin. Bawerî jî tê maneya tevlîbûnê, pejirandin û dawerivandine. Eger tu di xebata şoreşgerî de fikrên PKK'ê napejirîne, rast nabîne, danawerivîne nava xwe, tu feylezof be jî, gotinên herî xweş ên dinyayê jî bike, tu nikare fikrên PKK'ê propaganda bike. Tu yê bike, lê bawerî nade, bandorê li beramber nake. Mirovê beramber ji yekparebûnê bandor dibin. Ji yekgirtina gotin û libatê bandor dibin. Propagandakarekî baş xwedî hevgirtineke gotin û libatê ye. Propagandakarekî baş, gotinên xwe bi zimanekî vekirî, zelal, di çarçoveya sîstemekê de vedibêje. Propagandakarekî baş, tonê dengê xwe baş eyar dike, ango xwedî xîtabê ye, heta astekê têkildarî hunera xîtabê xwedî agahî ye, dikare bi kar bîne. Lazim e propagandakarek wisa be.

Çima van hemûyan dibêjim? Em şoreşger in, neçar in ku bibin propagandakar. Her şoreşger hem propagandakar e hem jî ajîtator. Yê ku nikaribe bibe propagandakar û ajîtator nikare bibe kesayeteke rêxistin û çalakiyê. Niha hin di nav me de nikarin 2 peyvan bînin cem hev. Di civînan de nêrînekê nadin, dersekê nadin. Dema ku daxivin jî bêmirûz, rûtirş dibin. Di rewşek wisa zor de nikarin derkevin pêşberî gel.

Ewqasî çapemenî-weşana me heye, çend heb qenalên televîzyonê hene. Artêşeke bi hezaran kesî di xebatên çapemeniyê de ye. Ewqasî çalakî hene, hêza gel heye. Civak ne perwerdekirî ye. Mirov; jin, ciwan teqlîda hinên din dikin, xweziya xwe bi hinên din tînin, hinên din ji bo xwe dikin pîvan. Ji ber ku em ne perwerdekar in, em ne bandorker in. Berê yek ji van jî nîn bû. Ne televîzyon ne rojname ne kovara PKK'ê hebû, ne jî ewqas zaniyariyên wê hebûn. Tenê Rêbertî û komeke propagandayê ya ji 30-40 kesî hebû. Lê di warê îdeolojîk de hakim bû. Serweriya wê hem li ser çepgirên Tirkiyeyê hem çepgirên Kurd hem jî li ser qada ramanê ya Tirkiyeyê bû. Her kes wisa li xwe mikur dihatin. Her kesî digot, *"hakimê ortama ramanê ne. Diyarker in. Însiyatîf di dest wan de ye."* Wextê firsend didît, bi axaftineke 5-10 deqeyan ve, PKK'ê wisa xwe bi

bandor kiribû. Ji ber ku nêrînên wê xurt bûn. Îcar ti perwerde jî nedîtibûn, lê baweriya xwe bi qiseyên xwe tanîn. Lewma dijber jî ji hevgirtîbûna wan bandor dibûn. Wê hevgirtîbûnê, neliheviya di nav koma zaniyariyan de teşhir dikir, deşifre dikir, maskeya wan dixist. Ramanê nelihev pir zêde nikare karîgeriyê li mirovan bike.

Pir zanîn, pir kûr zanîn jî ne girîng e. Ev jî lazim in, lê ne diyarker in. Baweriya pê pir girîng e. Bi ya rast dizane re bûyîna yek pir girîng e. Çalakbûna propagandakarekî, di vir re derbas dibe. Ji ber vê her gotin ne propaganda ye. Ji bo ku gotinek karibe bibe propaganda, lazim e xwedî hin pîvanan be. Her qiseker ne propagandakar û ajîtator e. Ji bo ku bibe propagandakar û ajîtor jî hin pîvan lazim e, hin qistas divên. Pir girîng e ku beriya her kesî ew bi xwe baweriya xwe bi rastiya gotinên xwe bîne. Di vê manê de propaganda û ajîtasyon xwedî fonksiyoneke erênî ye, ne neyênî ye. Perwerdekar e, pêş dixe, araste dike, dide qezenckirin. Ji bo ferd û civakan, xwedî taybetmendiyên erênî ne. Xwedî taybetmendiyên pêşxistin, qezenckirin, mezinkirin, bilindkirinê ne. Esasê propagandayê ev e. Esas propagandayeke bi şiklekî din tine ye. Yên din jirêderxistina propagandayê ne. *"Propagandaya şerê taybet, propagandaya reş"* jixwe navê wê li ser e, ji wan re jî propaganda nayê gotin. Ev hemû xebatên dijber in, şaş in.

Em dikarin di warê propagandaya nivîskî de jî rewşeke hevşib binirxînin. Em bêjin ku yek fêrî nivîsandinê bûye, rahişt qelemê, defter li ber e, dinîvîse. Min nivîsî, ev bû propaganda! Wisa nabe. Ji bo ku nivîsek bibe xwedî nirxê propaganda yan jî ajîtasyonê lazim e xwedî hin pîvanan be. Ji bo ku kovarek, rojnameyek, danezanek, bultenek, broşurek, pirtûkek bibe organê propagandayê, pêwîst e hin pîvanên wê hebin. Çi ne ev pîvan? Me berê diyar kiribûn. Ew ê perwerdekar be, qezenc bike, pêş bixe, karîger be, erênîtiyê bihewîne û serbikeve. Ew ê xwedî sîstemeke wisa afirîner be. Xwedî ziman be, tevî bêhnok, gotin, bend, hevok, şiklê xwe ve. Niha derfetên teknîkî pêş ketine, hin

radihêlin kompîterê û serobero lê dide, ne serî ne binî, ne bêhnok ne hevok diyar in. Ji kû dest pê kir, ber bi kû ve diçe ne diyar e.

Rêbertî got, *"Ez ê li cem têkoşer bimeşim."* Kesek dibe ku pir rast be, dirust be, lê kar nake, tênakoşe, wezîfeyê nagire û nameşîne, ez ê çi li dirustê wisa bikim? Ez ê çi li mirovê wisa bikim? Naxebite, tênakoşe, tiştekî nade qezenckirin. Rapor hatiye, bûye nivîs, ti nîzameke wê tine ye. Em ê çi bikin ji vê? Dikare bê gotin ku tê de tiştên xweş hebin em jê sûdê wergirin, lê xwediyê wê bi xwe ewqas qîmet nedayiyê, bi ya min pîvaneke wê ya karibe sûdê bide ti kesî tine ye. Ji ber vê jî ji bo ku nivîsek bibe propaganda, mirovek bibe propagandakarekî nivîskî lazimî bi pîvanekê heye. Ji ber wê perwerde lazim e. Ji bo kesên ku propagandaya nivîskî dimeşînin *"nivîskar"* tê gotin. Di zimanê giştî de wisa ye. Bûyîna nivîskar, pêkanîna hin pîvanan e. Çi bê bîra te, çi ji qelema te derkeve tu birijîne holê û dûvre bêjî, *"binêrin min jî nivîsî, çi nivîsên xweş jî derketin ortê, bûm nivîskar, min pirtûk nivîsî, min gotar nivîsî, min propagandaya nivîskî kir"* nabe.

Di propagandaya nivîskî de çav jî amûrekî gelekî bi bandor e. Ji bo gotinê baş bibîhîze guh bi bandor e. Lê çav jî bi bandor e, tu dikare libata qiseker bibîne. Di propagandaya nivîskî de qasî bi ya devkî ev nayê dîtin. Têgihandinek heye, dibêje çav ne ewqasî bi bandor e. Lê ev hêleşaşiyek e. Di propagandaya nivîskî de jî çav amûrekî bi qasî mejî xwedî bandor e. Bê ka nivîs çiqasî hevgirtî ye, mirov dikare ji şikil, şêwe, naverokê jî fêm bike. Mirov dikare lihevbûna wê ji xetan fêm bike. Nivîskar çiqasî bi vî karî bawer e, çiqasî girîngî dayiyê, nirx dayiyê, baldarî kar kiriye, mirov dikare fêm bike. Lewma jî rastiyeke bê nîqaş e ku propagandaya nivîskî jî perwerde, pîvan, hewldanê dixwaze. An mesele ne tijîkirina rûpelan e.

Mesela li saziyên çapemeniya giştî çi dikin? Em nû çûbûn Ewrûpayê, dawiya mehê hat, em ê Serxwebûnê derxînin, mîzanpaj bikin. Hevalên Selçûk wan dixebitîn, em jî çûn. Em

cara yekemîn mîzanpaja rojnameyekê dibînin. Ji kompîterê stûn derxistin, gotin em ê mîzanpajê bikin. Rêz kirin, niçika nivîsekê ma. Her hal hevalê Selçûk bû, keniya û got *"em qut bikin". M*in got, *"çima qut bikin?"* Gote min, "*endamên Dev-Yol'ê wisa dikin. Dema ku Demokratîk Tirkiye dihate derxistin, eger nivîs dirêj bihatibana me qut dikir, wisa dima."* Min jî gotê, "*Em hin rojnameyan dixwînin, dema ku nivîs wekî qut tê em dibêjiin qey ji bîr kirine."* Got, *"jibîrkirina çi, ew qut dikin û davêjin. Çi girîngiya wê heye, ya girîng tijîkirina rûpelê ye."* Lê bi xwe nivîs girt, careke din li ser xebitî. Çend saetan mijûl bû, careke din ji kompîterê girt. Di wê ebadê de nivîs biçûk kir û dîsa ji kompîterê wergirt.

Di nav nivîseke wisa kêm û qut de her çiqasî tiştên xweş, rast jî hebin, her hal li ser xwendevan bandoreke erênî nahêle. Encam nîn e, ne giştî ye. Naxwe, pûte pê nehatiye dayîn, nirx nedayiyê, gotin û tîp kêm in, xalbendî tine ne, yan jî ketober hatine bikaranîn. Dema ku wisa dibe jî xwendina wê vediguhere êşkenceyekê. Ev ne propagandakariyeke nivîskî ye. Dagirtina rûpelan, nizanim çend sed rûpel pirtûk nivîsiye, ev nabe nivîskarî, jê wirdetir ne propagandakarî ye. Naxwe, pîvaneke nivîsandinê jî heye, baldarî û zaniyariyê ji mirov dipê; kedê, hewldanê û berpirsiyariyê dixwaze. Kareke tu dikî, baweriya pê dixwaze. Eger ku tu bawer bikî, ew hesta baweriyê wê di nav nivîsê de bandorê li xwendevan bike. Lazim e ew naverok bê dayîn ku karibe xwendevan bandor bike. Lazim e acizkirin bên derbaskirin. Pêwîst e xwendina wê, şopandina wê rehet be. Wisa serobero, seresere nabe. Wisa dikin, ev ne ji bo kirina propagandayê ye. Esas ji bo tijîkirina rûpelan û girtina pereyan wisa dikin. Dixwazin civakê bi xebatên wisa ve bixapînin. Her hal tiştê ku hevalê Harûn dibêje, *"Propaganda Reş"* ev in. Heke em bi rastî ji vê re propaganda û ajîtasyon bêjin, dikare wekî reş û gewr bê binavkirin. Lê bi dîtina min lazim e em ji wan re nebêjin propaganda. Lazim e di nav pênase, nêzîkatiya me ya

propaganda û ajîtasyonê de cihê van tine be. Pêwîst e em nebêjin ew jî propaganda ye, ev jî; ew jî ajîtasyon e, ev jî.

Ev kar bi erênîbûnê re pir eleqeder e. Têkildarî serketinê ye, yên din bi rastî jî nabin propaganda. Ew ji hêla sîstema şerê taybet ve tê çepandin. Esas dikare bê gotin ku sîstema desthilatdarî û dewletê ji bo ku civakê bê mejî bike, gêjomêjo bike, korfêm bike van xerakirinan, berevejiyan derdixîne. Ew jî ne propaganda ye. Ew karekî dijmin e. Xebateke dij-mirov, dij-civakê ye. Nabe ku propaganda û ajîtasyon xizmeta zext û mêtingeriyê bike. Nabe ku alîgirê zext û mêtingeriyê be. Lazim e em ji van karên ku alîgirên zext û mêtingeriyê dikin re nebêjin propaganda û ajîtasyon. Eger ew ê *"propagandaya reş"* bê gotin, dikare ji wan re bê gotin. Ew esas ji bo ku karibin bandora propaganda û ajîtasyonê bişkînin, mirovan bê mejî bihêlin, bê hest bikin, lewma jî bikin kole, wisa rehettir bixin bin zextê, mêtinê. Niha lazim e ji bo vê baldarî hebe. Ji bo xebatên nivîsê jî lazim e hin pîvan, qistas bên girtin. Pîvan û qaîdeyên kar hene, lazim e li gor wê nêzîkatî hebe. Bi terzekî ne baldar, ne bihîzyar, ev kar nabe. Lazim e wisa nebe. Bi nêzîkatiyeke ne baldar û bihîzyar, ev kar ser nakeve. Pêwîst e mirov xwe nexîne pozîsyonek wisa, wer nêz nebe.

Di dest me de derfetên teknîkê hene. Ji ber ku em xwedî malzemeyên teknîkî ne, divê nêzîkatiyeke ketober, pûtê pê nade, bê dîqet, serobero neyê raberkirin. Dema wisa bû, ew jî bi rastî karîgeriya xwe namîne. Helbet ji bo ragihandina mijarên dirêj, nivîsên dirêj çêdibin, pirtûkên mezin tên nivîsandin, gotarên dirêj tên nivîsandin. Feqet lazim e pîvaneke wisa hebe ku karê tê kirin tam bê kirin. Kêm nemîne. Bi şertê ku wisa be, di xebatên propaganda û ajîtasyonê de ya herî cewherî, herî kurt, herî zelal; ya esas û rast e. Ji bo propagandaya nivîskî jî heman tişt derbasdar e. Helbet lazim e mijareke têrker bê îzahkirin, ravekirin, lê vala vala neyê nepixandin, mezinkirin, zêdekirin. Qasî ku mimkun e kurt, cewherî, xwerû, bi sîstem, zelal, xwedî destpêk-berfirehî-encamê be, fikrên xwe

eşkere deyne ortê, qasî ku fêmkirina wê rehet be, her wiha xwendin û şopandina wê jî rehet be. Lazim e di vir de jî dîqet hebe. Encamgiriya nivîsê jî girêdayî van e. Yan ne wisa ketober nabe, serobero nameşe.

Di propagandaya çekdarî de jî di maneya çekdarî de her çalakî ne xwedî nirxekî propaganda û ajîtasyonê ye. Ji bo ku çalakiyek di warê siyasî û eskerî de mirovan bandor bike, xwedî nirxekî propaganda û ajîtasyonê be, mirovan araste bike lazim e xwedî hin qistas, pîvanan be. Di serî de girîng e ku di cih û dema xwe de pêk were. Mînak em çalakiyekê li dar dixin, lê gerîla ne tenê hêzeke şer e, di heman demê de hêza perwerde û rêxistinkirinê ye jî. Wê demê fonksiyona perwerde û rêxistina girseyekê jî hildigre. Wê çaxê girîng e ku hin tespîtan bike; di kîjan dem û şêweyî de bibe ew ê karibe girseyê erênî bandor bike. Ji bo vê jî dem û şertê ku bandorê li girseyê dike girîng e. Heke girseya hedef ne amade be, di pozîsyoneke ters de be, bi pirsgirêkekê ve barkirî be, lê tu jî li milekî din tiştekî pir cuda bixe rojevê, tu yê girseyê serobino bike û ev jî girseyê erênî bandor nake. Ew ê bandoreke ters lê bike. Lê heke meyla girseyê hebe, dixwaze pirsgirêkekê çareser bike, dema ku te jî di warê çalakiyê de helwesta hêsanker pêş xist, ew ê bi bandor be. Ji ber vê jî çalakî çi eskerî çi jî siyasî dibe, ne xwedî heman astê ne. Ev girêdayî sekin û pozisyona girseyê ye. Duyemîn, di çalakiyê de serketin girîng e. Di çalakiya eskerî de ev her tim ne derbasdar e. Carina çalakiyeke ku di warê eskerî de ne serketiye, dibe xwedî bandoreke mezin a propaganda û ajîtasyonê.

Wek nimûne, çalakiya PKK'ê ya 30'ê Tîrmeha 1979'an ku li dijî Bûcakan pêk hatibû, wisa ye. Di warê eskerî de ne çalakiyeke serketî bû, lê bandoreke mezin a propagandaya siyasî kir. Di roja îlankirina PKK'ê de pêk hat ku bandora propagandaya îlanê bi çalakiyê temam kir û wisa xurt kir. Ango, partiyê îlana xwe bi çalakiyekê ve ku li dijî Bûcak, hevkarekî xas ê rejîma qirker-faşîst pêk hat, temam kir. Lewma jî çalakiyeke wisa li

gor xeta wê ya eskerî û siyasî jî bû. Di warê eskerî de çalakiyeke pir têkçûyî bû, lê îlana partiyê pir xurt kir. Ji ber ku di dem û cih de bû. Lê di warê eskerî de plan, meşandin, rêvebirin şaş bû. Di demek wisa de çalakîkirin, îlana partiyê bi çalakiyeke eskerî kirin, karekî pir li cih û di dema xwe de bû, li gor xeta partiyê bû. Heke ku çalakî wekî eskerî jî serketî bibûya bêguman ew ê bandora wê hê xurttir bûya. Ya ku di warê eskerî de serneketî, di warê propaganda siyasî de bi bandor bû, encam da. Ber bi derve ve bandoreke erênî kir, lê di hundir de ew bandor nekir. Di nav partiyê de jî bandoreke neyênî kir. Eger di warê eskerî de jî serketî bûya, ew ê bandoreke erênî li hundir jî bikirana. Mînak wekî çalakiyên 15'ê Tebaxê ew ê pêvajoya gerîla wê demê bidana destpêkirin. Naxwe serketin jî girîng e.

Ne bi temamî diyarker e, di cih û demê de pêk were, heke serketina wê kêm be jî yan serneketî be jî, dikare di warê propagandayê de bi bandor be. Bi taybet ji bo derve, ji beşên pir li derve yên ku naveroka wê nizane, yan jî bi xwe ne di wê pozîsyonê de ne, xwedî nirxekî propagandayê ye. Lê li ser kesên ku wê bi rê ve dibin, têkçûyîna eskerî bandorên neyênî dike. Çalakiya Bûcak, wê demê bandorek wisa li me kir. Naxwe, çalakî çi siyasî çi jî eskerî dibe, ji bo ku karibe bandoreke serketî ya propagandayê bike, qasî cih û dema wê, serketina wê jî girîng e. Ji bo serketî be jî, yên pêkhêner lazim e baş fêm bikin, baş rêxistin bibin, amade bibin, ango bi giştî aktîvîte û hêza xwe ve bi şiklekî hê xurttir tevlî bibin. Enceq bi şiklekî wisa tevlîbûn çêbibe bandorê dike, di encama wê de jî kar dikarin rast bêne plankirin û bi serketî bên meşandin.

Naxwe kirina çalakiyê di her demê de nayê maneya propagandayek serketî. Pir zêde li dijmin dayîn di heman demê de nayê maneya propaganda û ajîtasyoneke serketî. Tew îcar pir lêdan, kêm lêdan, ev ti bandora xwe tine ye. Ya girîng lêdaneke wisa ye ku bi şiklekî karibe bandorê li girseyê bike. Ango tu yê gotinekê bibêje, dikare bandoreke mezin a propagandayê bike.

Di cih û demê de tu yê şeqamekê lê bide, bandoreke pir erênî dike, dijber jî bandor dike, propaganda dike. Lê tu yê deh kesan bikuje, ne di cih û demê de be, mirovan bandor nake, berevajî tevî ewqas guleyên hatî avêtin jî ew ê zirarê bide te.

Beriya çalakiya Bûcak bi şeş mehan, hevalê Cûma Tak wan li bexçeyê çayê yê li navenda Siwêregê rûniştine. Dema ku Bûcak dikeve bexçe, 3 heval li pêşiyê ranabin. Bûcak tê ber maseya hevalan, tevî ku her kes rabûne jî heval ji cihê xwe ranabin. Her kes dibêje, *"Bûcak ew ê teqez wan bikuje". J*i ber ku hê ji mala xwe ya 30 kîlometre dûr derdiket, her kes dihat ber deriyên xwe, mîna ku padîşahan silav dikin, di seknek esas de disekinîn. Hemû karmend, dikandar, esnafan wisa dikirin. Ma rehet e, hela bila yek neke, hema di cih de dikuştin, dişewitandin, hildiweşandin. Dewlet, hiqûq û hikumet ti kes nîn bûn, her tişt Bûcak bûn. Yekî wisa, tevî ku hat ber maseya endamên PKK'ê sekini jî ti kes ranebibû. Ev rewşa bi rojan, mehan li Siwêregê bû mijara propagandayê. Digotin, *"Apoyî li pêşiya Mihemed Axa ranebûne ser piyan, Mihemed Axa nikarîbûye ti tiştekî bike. Zilamên wî xwestine lê bidin, lê belê wî nehiştiye, tew di ser de silav jî daye, derbas bûye û çûye..."* Li Siwêregê vê bandoreke felaket a propagandayê çêkir. Lê bandora çalakiya eskerî ya serneketî li Siwêregê kêm bû. Li derveyî Siwêregê bandoreke mezin kir, lê li hundirê Siwêregê nebû, di nava me de nebû. Li derve bû, ji bo yên ku kêm dizanin bû xwedî bandoreke wisa.

Naxwe çalakî li her derê di heman astê de bandorê nakin. Cih û dema wê, asta serketina wê û dozaja wê girîng in, baldariyê dixwazin. Di çalakiyên 15'ê Tebaxê de pir zêde rehendên eskerî tine ye. Bi ser navçeyekê de hate girtin, danezan hebû, propaganda dihatin kirin. Lê rejîmek faşîst-eskerî ya 12'ê Îlonê hebû, her der şewitandibû, hilweşandibû. Di ortameke wisa de ne bi ser bajarokekî de girtin, guleavêtin an jî danezanek belavkirin, gotinek, seknek dijber nîşandan jî ne mimkun bû. Pêkanîna çalakiyê, bi ser navçeyê de girtin, dane-

zan belavkirin, bi ser qereqolê de girtin, bandoreke felaket afirand. Çiqas esker hatine kuştin, dijmin çiqasî hatiye belavkirin, hîç pirsa wê nehate kirin, pêdivî pê nebû. Pirsînek, hûrkolanek wisa nebû. Ya girîng ew tevger bi xwe bû. Dema ku pêk hat jî ji bandora dihat payin zêdetir bû. Naxwe li wir jî tiştên ku divê bihatana dîqetkirin hebû. Di ortameke wisa krîtîk de çalakiyên ku pir zêde zirar nedan dijmin jî, lê heta niha jî bûn xwediyê bandora propagandayekê. Mînak, gerîla niha li pêncî, sed eskerî dide. Gelek caran nayê bihîstin, nabe nûçe jî. Ji sedî yek bandora wan jî bi dest naxe. Ji ber ku di wê demê de ev tine bû. Şert cuda bûn. Di şertên niha de jixwe gerîla 40 sal in li dijî artêşa Tirk şer dike, ewqas lê daye, dîsa lê dide, jixwe her kes vê dizane. Ne rewşeke derveyî zanebûnê yan jî kirinê ye.

Li gel vê, propaganda û ajîtasyon têkildarî nûbûnê û dûbarenekirinê ye jî. Lazim e xwedî nirxekî şoreşgerî be, nûbûnek tê de hebe. Dubarekirina hinan nabe propaganda û ajîtasyonek serketî, Ji ber ku bandorê jî nake. Wê demê xebatek rast a propaganda û ajîtasyonê jî nûbûn, afirînertî ye. Lazim e dubare nebe. Eger ên berê her dubare bike, asta wê ya bandorkirinê dixîne, ji holê radibe, rûtîn dibe. Sekna rûtîn ne xwedî bandoreke propagandayê ye. Ji ber ku ne nû ye, ne afirîner e, ne şoreşger e. Wê demê xebata propaganda û ajîtasyonê xebateke şoreşgerî ye. Ji yên rûtîn re propaganda û ajîtasyon nikare bê gotin. Çima? Ji ber ku propaganda û ajîtasyon tê maneya bandorkirinê. Yê rûtîn nikare bandor bike, perwerde bike, hêza mejî pêş bixe, hestan bilivîne; wê demê mirov nikare jê re bêje propaganda. Rêjeya serketina propagandayê bi perwerdekarî û livandina hestan ve tê pîvandin. Propaganda bi perwerdekirinê, ajîtasyon jî bi livandina hestan ve tê pîvandin. Ev bi rûtînê nabe, bi dubare û teqlîdê nabe. Bi nûbûn û afirînertiyê dibe. Wê demê xebata propaganda û ajîtasyonê xebateke şoreşgerî ye.

Me ev hemû anîn ziman ku dema em xebatên xwe dinirxînin wekî pîvan em karibin bigirin dest, bi kar bînin. Bi

mêzekirina van ve em dikarin gelek tiştan binirxînin. Em dikarin pirsa rojname û kovarên xwe bikin, li televîzyon û radyoyên xwe mêze bikin. Bi devkî ewqasî partî heye, em çiqasî fikrên Rêbertiyê bi şiklekî afirîner û bandor ji civakê re radigihînin, em dikarin mêze bikin. Em dikarin li nirxê propagandaya têkoşîna xwe ya çekdarî yan jî çalakiyên xwe yên çekdarî binêrin. Ji bo ku em karibin van bikin, me ev tişt bi lêv kirine. Di çarçoveya van de pirsa van hemûyan dikare were kirin. Dema ku bê pirsîn, pirsyar bê kirin ew ê bê dîtin ku di xebatên propagandaya van hemû qadan de kêmasiyên pir cidî hene, xeta hene, nebesî hene. Nivîsên me bi rastî jî pir bêbandor in. Çalakiyên me piranî rûtîn in, ya berê dubare dikin. Ji vê wirdetir, di çapemeniya me de ji bo propagandaya me ya devkî pir zêde pûtepêdan û pîvan nîn e. Ji her tiştî re *"erê"* tê gotin, pîvanek wê tine ye. Em weşangeriya televîzyonê dikin, dikeve nav çarçoveya propagandaya devkî jî. Yek ji wan çiqas perwerdeyê dibînin, ne diyar e. Dema ku derket wir, fêrî axaftinê bû, karibe bike, dibêjin ka de derkeve û baxive.

Baş e, li gor pîvanên vê partiyê gelo dikare çiqasî bike? Hin tiştan dibêje, lê gelo baweriyê dide, bi gotinên xwe bawer e? Şikil, uslûp û gotin li hev dikin? Ti kes lê nanêre, tenê dixwazin wextê tijî bikin. Dikare demê tijî bike, lê nikare ti kesî bandor bike. Wê demê ji vê re xebateke serketî ya çapemenî-weşanê nikare bê gotin. Di vî warî de gelek tişt hene ku lazim e bê rexnekirin û rastkirin. Ji ber van xeta û kêmasiyan ewqas hewldan nikarin encamên serketî bînin, ya tê xwestin nayê dest. Heke ku ev kêmasî û şaşî neyên derbaskirin, sererastkirin, li gor naverok û cewherê kar neyê meşandin, em çiqas organên weşanê ava bikin jî, çiqas kadroyî bi cih bikin jî, çiqasî bixebitin jî, em nikarin serketina ku tê xwestin bi dest bixin. Serketin, tenê dema ku kar li gor pîvanê wê, heqê wê be, tê. Ew jî ji naverokê heta tevgerandinê, heta uslûp û xîtabê her tişt li gor pîvanên xebata propaganda û ajîtasyonê, bi dîqet û bihîzyariyekê bê kirin dibe. Ji vir em bikevin rê, di vê mijarê de

terzê Apoyî çi ye? Uslûbekî Rêbertiyê heye, terzek heye. Ser meselê, bûyeran bi şiklekî dîrokî dinirxîne, bi rojanê re dike yek û wisa îzah dike. Destpêkê pênase dike, dûvre îzah dike û encamê jê derdixe. Rêbertiyê got, *"ji bo agahî bê fêmkirin lazim e bê tesnîfkirin. Lê belê, tasnîfkirinek zêde jî afirînertiyê dikuje. Cewherê şoreşgerî ji holê radike. Dogmatîzmê, qalibgeriyê pêş dixe."* Ji ber vê jî bêyî tasnîfkirinê, îzahek zanistî nikare pêk were. Lê lazim e di tesnîfê de jî pir zêde neçe, ew pênaseyeke burokratîk-şematîk derdixe ortê. Zindîbûnê, cewherê şoreşgerî dikuje. Rêbertiyê îzahên xwe qasî ku mimkun bû kirin. Tesnîf kir, têgeh pênase kirin, sazî ava kirin. Bi hin saziyan re fikir xist qalibekî, lê pir zêde xwe nespart wê jî. Cewherê şoreşgerî-afirîner jî derxist ortê. Taybetmendiyê herî girîng ê terzê propagandaya nivîskî, devkî ya Rêbertiyê jî ev e. Zimanê herî baş tê fêmkirin, zimanê Rêbertiyê ye. Mîna helbestê ye. Axaftin jî, nivîs jî, wêje jî li gel Rêbertiyê xurt in. Zanista civakî û wêjeyê herî baş dike yek ew e. Vê jî bi xwendinê, xweperwerdekirinê afirand û pêş xist. Ev taybetmendî ji bûyînê nayên, ev bi hewldanê qezenc kirin. Di dema şagirtbûnê de bi xweperwerdekirinê ve xwe anî astek wisa. Ji ber vê yekê, zimanê wî bi rastî jî pir zelal, herikbar û vekirî ye. Uslûbê xwe rexneyî ye, lê dide qezenckirin. Ne takekesî ye û mehkûm nake. Nirxandinên giştî ye. Tiştên li gel her kesî kom dike, wekî giştiyekî datîne ortê. Lewma jî di nav de her kes xwe dibîne, lê bi rexneyê têr nabîne, rêya çareseriyê jî, rêya derketinê jî nîşan dide. Lewre, dema ku şaşiyan mehkûm dike, rastiyê datîne ortê û nîşan dide ku yê şaş jî dikare bigihêje rastiyê. Ji ber vê jî pêş dixîne, qezenc dike, hêzê dide. Rexneyên dike, yê li beramberî xwe naêşîne, naşkîne. Berevajî, di mirov de hê zêdetir fikrandinê, baldarbûnê, lêhûrbûnê, veguherandina li ser bingehê rexneyan û perwerdekirinê pêş dixe.

Ev taybetmendiyê uslûbê Rêbertiyê ne. Ev uslûp girîng e, ziman ne rojavaparêz e, ne yê polemîkan e. Rexneyî ye, lê ziman ne bi polemîk, rojavaparêz e. Ev pir girîng e. Ne kesan, lê

xeta û kêmasiyan rexne dike. Çavkaniyên wan rast nîşan dide. Her digot, *"dijmin afirand, sîstema desthilatdar-dewletparêz derxist ortê"* û heta dawiyê deriyê rêxistinê li ferdan vekir. Çiqasî sûcdar be bila bibe, ti kesî ji ber sûcên li nav sîstemê nedarizand. Lê ev got, *"erê sûcdar ne hûn in, sîstemê we ber bi sûc ve biriye, ev rast e. Lê em jî rêya rast nîşanî we didin. Li sîstemê ji bo sûckirinê hûn çûne wir, hûn ê li gel me jî rêya rast bibînin. Heke hûn nebînin, wê demê naxwe tercîha we şaş e, aliyê dijmin e. Wê demê em ê we sûcdar bikin."* Ji ber vê jî xîtabî her kesî kir. Got, *"Em ji rastiyeke wisa ya civakî derketin ku yek ferdek nemabû ku îxanet li xwe nekiribû."* Derxistina ji wir, ji wir rizgarkirin esas girt. Ji ber wê jî her xwe wekî tevgereke ku pêş dixe, rizgar dike, diguhere, nû dike bi pêş xist. Uslûbê xwe li gor vê çêkir. Naveroka propaganda-ajîtasyonê li gor vê çêbû. Mirov dikare van hemûyan hê zêdetir lê bikole, bi hûrgiliyan yekpare fêm bike. Lazim e ku rastiya Rêbertiyê bê lêkolan. Mirov çiqasî li ser raweste ewqasî baş e.

Terzê propagandaya nivîskî, devkî; nêzîkatiya li dîtbarî, radyoyê; zimanê wan, uslûb, hêza fikrandinê, kûrahî, rêbazê axaftina wan, lazim e yek bi yek bêne nirxandin, fêmkirin, têgihiştin û dawerivandin. Lazim e ziman, uslûb, rêbaz, terzê propaganda-ajîtasyonê li gor vê çêbibe. Li gel me yê ku rastiyan diyar dike Rêbertî ye. Em jî perwerdeya xwe ji bo fêmkirin û xwegihandina Rêbertiyê didin.

## 4-BI ÇAR PÊVAJOYAN XEBATÊN PROPAGANDA Û AJÎTASYONA PKK'Ê

Eger ku em li ser xebatên propaganda-ajîtasyonê yên xwe dispêrên çapemenî-weşanê rawestin dibe ku em baştir kom bikin. Ya din pir tevlîhev dibe. Li milekî propaganda çekdarî, milekî propaganda devkî, propaganda nivîskî û xebatên ajîtasyonê astengiyê çêdike ku em nikarin xebatên xwe şênbertir, bi detaytir, dîsa ziravî û hûrgiliyên xebatê baştir bibînin. Ji ber vê sedemê em wisa bikin dibe baştir be. Bi vî şiklî nirxandina mijarê dibe baştir bibe. Wisa em ê bikaribin hinekî din bi detayan ve dakevin.

Me diyar kiribû, di dema Avabûna PKK'ê de, di Derketina Rêbertiyê de ya esas xebata propaganda û ajîtasyona devkî bû. Me sedemên vê jî danîn ortê, ji ber ku neçarî bû. Neçarî, ne tenê ji ber kirin an nekirina vî karî bû. Di nav xwe de xebata propaganda û ajîtasyona devkî jî hin zorî dihewandin. Ji bo wê jî perwerde, amadekarî, kadro lazim bûn. Ev xebat ji hêla kadroyên şoreşger dihatin kirin, esasê xebata partî ne. Partî mîna xebata propaganda û ajîtasyonê dest pê kir. Hê partî nebû, di dema komê de beriya xebatên din, xebata propaganda û ajîtasyonê hebû. Naxwe cewher û esasê xebata partiyê pêk tîne. Xebatên din hin deman derdikevin pêş, tên rojevê. Propaganda û ajîtasyon her dem di rojevê de ye. Bûyîna Rêbertiyê xwe dispêre vê. Koma îdeolojîk li ser vî bingehî çêbûye.

Vegera li Kurdistanê, bûyîna tevgerek ciwanan, partîbûn, esas bi xebata propaganda û ajîtasyonê pêk hatiye ku di navenda vê de jî propaganda û ajîtasyona devkî heye. Girêdayî

propaganda û ajîtasyona devkî her ku rêxistin û çalakî pêş ket, hereket hinekî saz bû, vê carê propaganda û ajîtasyona nivîskî xwe dixist rojevê, dîsa propaganda û ajîtasyona çekdarî, qada çalakiyê dibûn rojev. Partîbûn tê maneya li gel hev bikaranîna hemûyan. Piştî PKK hat damezrandin, li her sê qadên navborî jî xebata propaganda û ajîtasyonê meşand. Lê ya destpêkê, lewma jî sereke propaganda û ajîtasyona devkî ye. Di vê rewşê de pirsgirêka kadro, amadebûna kadroyan faktorek bû, lê ne diyarker bû. Faktora diyarker şertên Kurdistanê ne. Ew ortam e ku sîstema mêtinger-qirker li Kurdistanê ferz dike. Di nav ortameke wisa de ku di nav sîstema serweriyê de hatiye xuliqandin, ne mimkun bû ku bûyîna şoreşî, bûyîna Rêbertiyê, avabûna dendika şoreşgerî bi propaganda û aîtasyoneke din pêk bihatana. Heke bi propaganda çekdarî dest pê bikirana, ji bo wê asteke rêxistin û pêşketinê gerek dikir.

Asteke ku ew ê çalakiya çekdarî bike, wêrektî û fedakartiya bikeve çalakiyê nîşan bide, çekê bi kar bîne enceq bi perwerdeyê derdikeve ortê. Ev jî propaganda ye. Rêxistineke wisa jî em dikarin enceq bi propaganda û ajîtasyonê bafirînin. Naxwe bi propaganda û ajîtasyona çekdarî ve kar dest pê nedikir. Rêbertiyê dema biryara partî-rêxistinê da, nikarîbû bigota, *“ez çekekê bigirim, derkevim çiyê, çep-rast guleyan bireşînim, bila her tişt li gor wê pêş bikevin.”* Heke biketibana nav hewldanek wisa, nikarîbû serketî bibûya. Heta dema ku koma ji 6 kesan kom dike û dibe Bendava Çûbûkê jî ji wan re dibêje, *“em bibin komek, nêrînên hevpar biparêzin, perwerdeya propaganda û ajîtasyonê bikin, em xwe mîna komeke cuda ava bikin”*, nedibû ku bigotana, *“hadê em 6 kes çekan hilgirin, wek komeke 6 kesî ya gerîla em xwe bidin Botan, Dersîm, Torosan û partiyê pêş bixin.”* Biketana nav hewldanek wisa ew ê bihatana pelçiqandin. Jixwe rêxistinên mîna THKP-C, THKO, TÎKKO jî ku xwedî asteke rêxistinî bûn, xwe dispartin xebatên nav ciwanan, li gelek bajaran şer dikirin, heta ji bo perwerdeyê xwe gihandibûn Filîstînê jî, bi wî terzî dernektibûn ser çiyê. Dema ku

hewl dan derkevin giştî kom îmha bûn, darbe xwarin. Hêzek wisa ya PKK'ê jî tine bû. Ne mimkun bû ku Rêbertî bi komeke wisa re ku zêde nehatine perwerdekirin, amadekirin û tenê dikarin propaganda bikin, tavilê xebateke wisa bike. Ketibana nav hewldana kirinê ew ê tasfiye bibûya.

Ji mehên Cotmeh-Mijdara 1974'an, rojeke bi baran, em li ADYOD'ê rûniştî bûn, komek qelebalix nîqaş dikirin. Li Fakulteya Ziman Dîrok Cografyayê şer hebû. Yekî Midyadî ji rêxistina Kawa bi parkeyê eskerî û botê kete komaleyê û got, *"hevalino, şer heye û ev şer berbelav dibe. Hûn li benda çi ne, lazim e her kes bikeve nav tevgerê."* Rêbertiyê demildest got, *"ev provakasyon e, her kes bisekine"* û yê wisa gotî jî qewitand. Em bi bûyerên wisa re jî hevrû bûn. Diyar bû ku provakasyoneke MÎT'ê bû. Kê berê xwe bidana tiştekî wisa, dest ji derketina çiyê berde, derketibana kolanê dikarîbûn li Enqereyê bidabana ber guleyan. Hewl bihatana dayîn ku biçe cihekî jî dîsa dikarîbûn bidabana ber guleyan. Heke ku Rêbertî li beramberî rewşên wisa provakatîf ne bihîzyar bûna, nikarîbû ti gavan bavêje.

Ji bo propagandaya nivîskî jî nivîsandin, xetkirin hinekî din zor e, hinekî din pêwîstiyê bi perwerdeyê, amadekariyê dibîne. Ezmûnê dixwaze. Lê propagandaya devkî jî dixwaze. Wisa axaftin ji nivîsandinê ne hêsantir e. Tu dinîvîse, wisa ji xwe re rûdinê û dinîvîse. Axaftina li pêşberî mirovan karekî hê zortir e, bêhtir komasiyê dixwaze, ezmûn dixwaze, pêşketinê dixwaze. Ji ber vê jî bi propagandaya nivîskî ve nikarîbû dest pê bikirana. Ev destpênekirin ne ji ber kêmasiya amadekariya têrker a kadroyan bû. Dîsa ne ji ber pêşneketina fikirêkî têrker bû. Ji bo propagandaya devkî jî fikir lazim bûn. Ortam ne guncav bû. Ya esas ev bû.

Komên din nivîsandin, xet kirin. Ji 1970, heta 1974'an û şûn de hinan komale vekirin, hinan kovar û rojname derxistin, fikrên xwe radîkal jî nivîsandin; lê di hemûyan de sloganavêjî hakim bû, jiberkirî bûn. Dema ku mirov dixwend, dikarîbû

bidîta ku jiberkirî daxive. Ji ber ku piştre te li liv û tevgera wan dinêrî, ti tiştek nedikirin. Mesela Rizgarî, kovarek bi navê Rizgarî derxistin. Orhanê ji Agiriyê û Mumtaz Kotan û birayê wî, Îsmaîl Beşîkçî jî ji wan re dinivîsîn. Xwediyê wê birayên Kotan bû, bi şiklekî tûj dinivîsîn. Digotin *"ji bo serokkomar name"*, nizanim *"li Kurdistanê wisa wisa dibe"*. Dema ku mirov lê dinêrî, digot; *"yê ku wisa nivîsî ye lazim e ne li cihekî vekirî be, li serê çiyê di bin parastina çekê de xwe parastibe."* Lê te dinêrî, li buroyek Enqereyê rûniştiye, gotina xwe netanî cih. Wê demê yekgirtinek gotin û libatê tine ye. Di wê rewşê de pir zêde îtîbara van gotinan nedima, ji ber ku ya girîng ew bû ku çi pêk tînin, çawa pêk tînin. Li Enqereyê, di komaleyekê de nivîsandina wan ti bawerî nedida, bandor nedikir. Ji bilî hin ciwanên acemî, nû; nikarîbû bandorê li gelek derdoran bike.

Li cem Rêbertiyê yekgirtinek hebû, lê ew ên din xwe wisa deşîfre dikirin. Ji ber ku bi rastî jî nêteke wan a şer tine bû. Lê ya Rêbertiyê hebû. Beriya bikeve têkoşînê xwe deşîfre bikirana, tabî nikarîbû amadekariyên şer bike, ew ê bigirtana û bavêtana hepsê. MÎT'ê ew ê bixista bin kontrolê û nedihişt gavekê jî bavêje.

Hêz û derfeta Rêbertiyê tine bû, bi tenê serê xwe bû. Ne zarokê eşîran bû, ne zarokê axeyan bû, ne xwedî pereyan bû, lê hevgirtî bû. Xwendiye, lêkolaye, tespîta mêtingeriya li Kurdistanê kiriye, piştre li zanista vê nêriye, li dijî mêtingeriyê şer çêbûne, dizane ku şer çi ye û çiqasî zor e. Dîroka Kurdistanê lêkolaye, ne şer, yê behsa hebûna Kurd dikin jî bê pirs îmha dikin. Li ortê zihniyet û siyaseteke wisa mêtinger-qirker heye. Tam serwer bûye, ewqasî şewitandiye, hilweşandiye, qir kiriye, sêdar danîne, qetlîam kirine, li Kurdistanê ti hiqûq û qaîde pêk nayên. Wê demê li cihekî wisa şerkirin ne karekî rehet e, karekî cidî ye. Bi çend gotin û nivîsandinan nabe. Ortam destûra şervantiyeke wisa nade. Wê demê tu yê cidî bî. Li gor pêdiviyên karê xwe tevbigerî.

Ji bo ku bikaribe li dijî dijminê xwe şer bike, tu yê ewil hêzekê bafirîne, hêzeke şerker derxîne holê. Zemînê şerkirinê ava bike. Bêyî van tu bêje ez ê şer bikim, hêza ku tu dibêje ez ê pê re bikevim şer, beriya ku tu gavekê bavêje, ew ê ji patika te bigire û bipelçiqîne. Dinya li gor vê çêbûye, ti kes nakeve hesabê pelçiqandina serê Kurdan, jixwe sîstem Kurdan tine dihesibîne. Lewma jî tiştek qasî qetilkirina li Kurdistanê hêsan nîn e. Ji ber vê wisa nedibû. Nikarîbû xeta fikrên xwe bi propagandaya nivîskî ragihîne. Ji ber ku ev îlaneke eşkere dixwaze. Heger bixwesta îllegal bikirana jî ew ê tavilê bihatana bihîstin û girtin.

Me jî di 1978'an de wisa îllegal pêk anî. Em li Amedê xebitîn, ji ber ku polis zêde bûn me berê xwe da Xarpetê. Em li Xarpetê şixulîn, dîsa me got polîsê bi ser me de were, me xwe kom kir û em çûn Çewlikê. Me li Çewlikê temam kir. Em Serxwebûnê derdixin, me got em nîv veşêrin, nîv belav bikin. Çi dibe çi nabe, eger bê girtin jî bila hin di dest me de bimînin. Me nîvê wê xist bawulê û ji bo veşêre me da hevalê Huseyîn Dûrmûş. Dema ku dibir, bi xwe jî hate girtin, hemû jî dan girtin. Yên di dest me de man, ew jî ji bo neyên girtin me lezûbez belav kirin. Dema ku hate girtin, hayê dewletê jê çêbû. Tu hewl bide wisa îllegal pêk bîne jî, dibe yê dike neyê girtin, lê kar, kovar an jî rojname, di roja yekem de nebe, di roja duyem, sêyem de bi şiklekî û li cihekî dikeve destê dewletê û hayê wê jê çêdibe.

Lewma jî hişyarnekirina yê li beramber di terzê Rêbertiyê de xwedî cihekî girîng bû. Ji ber vê jî heta ku bê asta têkoşanê, eşkere îlana fikrên xwe bike, pêkanîna terzekî ku veşartî dihêle, îllegal dixebite, firsend û bingehê nade êrîş û pelçiqandina sîstema mêtinger-qirker û dewleta TC'ê, girîng bû. Şêweyê herî guncav ji bo vê, terzê propaganda û ajîtasyona devkî bû. Rêbertiyê, xebata propaganda û ajîtasyona devkî jî li komaleyê bi xîtabkirina her kesî nekir. Bi axaftinên li mîtîngan nekir. Li malan, kantînên dibistanan, herî zêde bi 2-3 kesan re,

piranî jî yek bi yek axivî. Rêbertî ji vî terzî re jî dibêje, *"ji bo ku kes nebihîze, me di guhên hev de gotin."* Dema ku hewl dide ji hevalekî re vebêje, mîna derketiye gerê, li her derê Enqereyê digere, ti kes nabîne.

Dema ku li Bendava Çûbûkê bi 6 kesan re dicivin jî, derdikevin seyranê, ji ber ku her kes derdiket seyranê. 6 ciwanî xwarina xwe girtine û rojeke biharê li qiraxa Bendavê çûne seyranê. Ango, qaşo hewayeke dikenin, şahiyê didin, lê tiştên cidî daxivin. Enceq wisa jî kamûfle dikin. Propaganda û ajîtasyona devkî ji bo vê lazim bû. Wisa nekiribana, ev terz pêş nexistibana, jê wirdetir, heke serketî naniya cih, Rêbertiyê nikarîbû derketin bi dest bixistana, kombûyîn pêş nediket, pêvajoya partîbûnê bi serketî nedihate meşandin. Enceq bi tiştekî wisa hate meşandin.

Rêxistin tine bû. Ti belgeyeke ku wekî rêxistin karîbana sûcdar bikirana tine bû. Komale nîn e, kovar nîn e, çek nîn e, rêxistin nîn e, nav nîn e. Carina digotin *"Apoyî".* Piştî 1978'an carina bi navê *"Şoreşgerên Kurdistanê"* belavok dihatin belavkirin, piranî di çalakiya Pirsûsê de hat nivîsandin. Pir kêm bi belavokan, li gel vê di nîqaşan de propaganda dihate kirin. Yek an jî du ciwan nêrînekê diparêzin. Dema ku dihate pirsîn bê nêrîna kê ye, digotin *"nêrîna min e". X*ebateke wisa hat meşandin. Propaganda û ajîtasyona devkî hem mirov perwerde dikir, rêxistin amade dikir hem jî wekî rêbaz baş diparast, vedişart, ji dewletê, mêtingeran distirand. Rêbertiyê wisa parast. Ji ber vê jî propaganda û ajîtasyona devkî esas wergirt. An, ne ji ber nikarîbû binîvîsanda yan jî derfet nîn bû. Rêbertiyê ji bo kovarên din jî gotar dinivîsîn. Ji bo kovarên Ciwanên di 1974'an, 75'an de jî hin gotar nivîsîn, pêşnûme amade kirin. Êdî bi kîjan navî nivîsand, çiqasî dihat weşandin em nizanin, lê ne li ser navê tevgerê bû, ji bo xebatên ciwanan bû. Têkildarî rêxistinbûna ciwanan bû. Kurtasî, qasî axaftina xwe dikarîbû binîvîsanda. Di wê ortamê de wekî yên din tevbigeriyana, ji bo derxistina kovar û rojnameyê hin têkilî û tifaq dikarîbû bihatana dîtin. Des-

tek bixwesta gelek derdor hebûn. Lê ew terz rast nedît. Wekî pêwîstiya şertan bi propaganda û ajîtasyona devkî dest bi kar kir.

Ji ber karaktera faşîst mêtinger-qirker a dewleta TC, dijminahiya wê ya Kurd, wekî rêbaz û terzê valaderxistina vê êrîşkariyê propaganda û ajîtasyona devkî hilbijart. Fermana qirkirina Dersîmê tê zanîn. Dibêje, *“lazim e her kesên ku dibe li pêş îdeala Kurdbûyînê di serî û dilî de hebe bêne qetilkirin.”* Îhtîmaleke wisa wekî potansiyel li gel hemû zarokên Kurdan hene; ne diyar e ku dema mezin bibin ew ê bibin çi. Ji bo her yekî îhtîmaleke wisa heye, wê demê lazim e hemû bêne qetilkirin. Qirkirina Kurdan êrîşkariyeke wisa ya qetlîamê bû û bi fermaneke wisa bi rê ve diçû. Ev bi kûrahî didome. Ne girêdayî rêveberiyan e, polîtîkayeke dewletê ye. Dewletê ev didomand. Sîstemeke wisa ya zextê, berêxwedaneke wisa polîtîk ji bo ku vala derkeve, bêguman xebatek propaganda û ajîtasyona li ser esasê veşartîbûnê lazim bû. Ev jî bi şiklê herî baş, bi propaganda û ajîtasyona devkî re ku dikare bê kontrolkirin, mimkun bû. Jixwe wisa jî kir. Derketina Rêberiyê, xebatên koma îdeolojîk, xebatên li Enqereyê bi temamî wisa sist, ne xwedî têkîliyeke fermî ya rêxistinê; bi terzekî komeke ku karên xwe ji dil û can bi propaganda û perwerdeya devkî dike hate meşandin. Enceq wisa komek derket ortê. Li Enqereyê hêzek çêbû, piştî wê kadro li Kurdistanê belav bûn. Bi heman şiklî, piştî 1976’an belavbûna li Kurdistanê jî li ser vî esasî bi rê ve çû. Li Kurdistanê jî piştî ku wekî koma ciwanan teşe girt, dema ku li bajarok, bajarên Kurdistanê komên ciwanan ên şoreşger çêbûn, êdî dikarîbûn bên asta destwerdana jiyana pratîkî. Ha wê demê çalakî ket rojevê. Di Gulana 1976’an de dema ku vegera li welat çêdibû, mîtînga li Pirsûsê, esas merasîmeke cenazeyê bû, ew ji hêla rêxistinên din ve li deverên din jî dihate kirin, PKK jî li Pirsûsê bû û ev kir.

Esas bikaranîna şîdeta çekdarî hê bêhtir piştî ku Hakî Karer di 18’ê Gulana 1977’an de hate qetilkirin, zêde bû. Rêber-

tiyê net diyar kir; *“Eger qetlîamek wisa nebûya, ne diyar bû ku ew ê pêşketina PKK’ê çawa bûna.”* Di vê pêşketinê de wê qetlîamê roleke wisa diyar lîst. Dema ku bi qetlîamê re hevrû ma, vê carê koma propagandakar ket nav têkoşîna tolhildanê. Esas gav bi gav berêxwedana şîdeta çekdarî, wekî şikil, pêwîstiyeke têkoşîna tolhildana şoreşgerî derket ortê. Qada propagandaya çekdarî wisa pêş ket.

Qada nivîskî jî êdî her ku kom hate bihîstîn, rêxistin mezin bû, raman belav bûn, ji bo hê mezinkirinê resmîkirin, nivîsandin lazim bû. Mesela di 1976’an de Rêbertiyê ceriband, dahûrandin hene. Dibêje, *“em û Hayrî rûniştin, min got, Hayrî nivîsand, me pêşnûmeyek amade kir.”* Lê ew qet nehat weşandin. Rêxistin ji bo belavkirina belgeyek wisa hê ne amade bû. Li şûna wê di dawiya 1976’an, destpêka 1977’an de dema ku li mala Pîlot civîn dihate lidarxistin, her tişt pir veşartî dihate kirin. Wisa sobe hezir e, girtek û kaxiz di dest de ne, tiştekî biçûk jî bibe ew ê bêne şewitandin. Ji bilî wê li ser navê rêxistinê ti belge tine ne. Her kêlî dikare bi ser de bê girtin, dema serdegirtinê rû da jî pêş dibîne ku ti belgeyan li pey xwe nehêle. Rêbertiyê bi wî terzî ve ew sîstema zextê şkand û derbas kir. Wisa nekiribûna nikarîbû derbas bikirana.

Piştî şehadeta hevalê Hakî, du rê man li pêşiyê, ew ê wekî rêxistin bimîne yan ne, hebe yan ne, li ser lingan bimîne yan ne. Yek; an tu yê berê xwe bide têkoşîna tolhildana şoreşgerî, tu neke ti kes baweriyê bi te nayne; dijmin êrîşî te dike, qetil dike, ew ê her kes berde bihêle. Dudu; tu yê bike belge, resmî bike ku mirov bawer bikin, xwe amade bikin, ev jî tê maneya partîbûnê. Ji bo vê jî resmiyet lazim e. Resmiyet jî nivîsandinê dixwaze. Rêbertî di dawiya meha Tebaxê de rûnişt û bername amade kir. Bername mîna pêşnûmeya 1976’an daneynî milekî, yekser bi daktîloyê zêde kir, li qadan bi şiklekî veşartî yek bi yek belav kir ku kadro karibin bandora psîkolojîk a qetlîama 18’ê Gulanê bişkînin. Lewma karibe kadroyên nû tevlî bike.

Karibe kadroyên heyî xurttir û bi daxwaztir bixebitîne, pê bawer bin, cesarete jê bigirin. Bi şiklekî din nikarîbû.

Naxwe resmîkirin, di merheleyek neçar û pêwîst de bû ku pêşketinê ev dispart. Li gor gereken wê jî êdî terzê jiyanê, terzê xebatê diguhere. Piştî ku Rêbertiyê bername amade kir, xebatên Rêbertiyê hemû rêkûpêk kir, komî ser hev kir. Heta wê demê li Enqereyê dixebitî, piştî wê berê xwe da Kurdistanê, çû Amedê, deverên din ên Kurdistanê, ji Enqereyê derket. Dema ku li Enqereyê bû kêm zêde dihate zanîn bê li kû ye. Piştî hat Kurdistanê, ti cihekî vekirî yê xebatê negirt. Komale, kovarek wî tine bû. Ti kesî nizanîbû ew li kû ye. Bi xwe terzê xwe yê hereketê diyar dikir. Li her derê bû, qasî pêwîst hereket dikir. Hemû şiklên jiyanê yên derveyî veşartîbûnê rakiribû, heta dawiyê bi baldarî hereket kir, bi dîsîplîn kiribû. Wisa ji milekî ve têkiliyên wî yên li Enqereyê dewam kirin, mîna Pîlot, Fatma. Têkiliyên Fatma bûn, malbata wê li Enqereyê bû, qaşo têkiliyên li gel Fatma bi rêka wê dihatin kontrolkirin. Li milê din jî bi tevgereke pir veşartî ve êrîşên îmhayê yên dijmin vala derxistin. Li milekî qaşo di kontrole de ye, wisa hêvî dan, wekî ku pir derneketiye derveyî venêrînê; li milê din jî baldar nêzî veşartîbûnê bû, wisa nekete nav komployekê, lîstokekê. Wisa jî êrîşên dijmin şkandin. Piştre jî ew çûyîn bû derketina derveyî welat. Piştî Kongreyê dema ku li Xarpetê girtinan dest pê kirin, êdî ji bo domandina hebûna xwe derketina derveyî welat bû neçariyek. Dewlet bi hemû hêza xwe ve ji bo îmhakirinê ketibû nav êrîşê. Xerabkirina vê plana êrîşê enceq bi derketina derveyî welat ve pêk hat.

Propagandaya nivîskî di pêvajoyek wisa ya guherînê de pêş ket. Li milekî propagandaya devkî dewam kir, li milê din çalakiyên çekdarî her ku çû li dijî faşîstan, polîsan, avaniya sîxur pêş ket; li gel bandora propagandaya çalakiya çekdarî ya ku bi berxwedana Hîlwanê, li cihên cuda yên Kurdistanê li dijî derdorên polîsên faşîst dihat pêkanîn, êdî propaganda û ajîtasyona nivîskî jî ji bo pêşxistina fermiyeta rêxistinê, wekî

pêbawerkirineke partiyê ji bo zêdetir kadro û sempatîzanan hate nirxandin, pêşxistin.

Di vê mijarê de piştî danezanan, materyala destpêkê ya nivîskî ku hinekî karîger bû, Pêşnûmeya Bernameyê bû ku di dawiya Tebaxa 1977'an de li Dîlokê hatibû amadekirin. Şaş neyê bîra min 13 rûpelên daktîloyê bû. Kaxizên zirav ên pelûrê hene, li wan hatibû nivîsandin û bi kaxiza karbonê ve 10-15 lib hatibûn zêdekirin, dema ku tu qat dikî pir zirav dibin, ji bo her herêmekê yek hatibû şandin. Bi şiklekî veşartî li malan dihate vekirin û ji koman re dihate xwendin. Wisa demildest nehat weşandin, bi berfirehî nehat belavkirin. Wisa bi şiklekî veşartî û rêxistî, bi baldarî hate xwendin. Bi wê ve pêvajoyek derbas bû. Gelekî bi bandor bû. Çawa ku qatilên hevalê Hakî di encama şopandina 6 mehan de li Skenderûnê hatin cezakirin û vê baweriyeke pir mezin da, xwendina Pêşnûmeya Bernameyê jî li ser kadroyan di heman astê de bawerî çêkir, bandor kir. Cara yekem belgeyeke nivîskî bû. Yên ku heta wê demê hatibûn gotin, bi şiklekî herikbar, zelal, kurt, cewherî hatibûn nivîsandin û pir bi sîstem bû. Wekî çawa bi van milên xwe ve bandorker bû, her wiha cara ewil belgeyek bû. Tu daxivî, agahiya di serê kesekî de ye, ew ê çi bibe ne diyar e. Lê piştî ku hat nivîsandin, êdî ew ji mejiyê te derdikeve, dibe malê her kesî, kî bixwaze dikare bi kar bîne. Heta ku ew nivîsand, ew agahiya di serê Rêbertî de bû. Rêbertî wekî ku dixwest dikarîbû bi kar baniya, lê piştî nivîsandinê, êdî hinên din jî dikarîbûn bi kar banibana. Bû malê rêxistinê, ango resmî bû, êdî nikare paş de bê kişandin. Wisa bêyî têkoşîn, heta tiştekî din neyê pêşxistin, bi rehetî nikare bê guhertin. Hat wê astê. Bandoreke wê ya zêde hebû.

Ew belgeyên yekem xwedî bandorek mezin a propagandayê bûn. Komên ku Pêşnûmeya Bernameyê xwendin, bi bawerî, daxwaz, cesaret û îradeyeke hê mezintir çûn ser karên şoreşgerî. Hemû teredudên qetlîama 18'ê Gulanê şkestin. Ji ber êdî zelal bû ku bê çima têdikoşin, bi kîjan armancê têdikoşin.

Belgeya wê hebû. Ew ê li ser wan armancana têkoşîn bihata meşandin. Tinebûna wî bi xwe ne mesele bû, net bibû ku ew ê di oxira kîjan armancan de tine bibe. Vê îradeyeke muthîş da qezenckirin, bawerî, cesaret, moral da, li gel vê wekî sîstemeke hizrê jî zehf perwerdekar bû. Tu dikare tiştekî devkî guhdar bike, hin tiştan qasî ku tu pê re digihêjê dikare fêm bike. Lê eger di dest te de belge hebe, her xeta wê, her gotina wê, her benda wê tu dikare ji kûrahî ve fêm bike. Xwedî hêzeke wisa ya bandorê bû.

## a-Pêvajoya Yekemîn:

## Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê û Derxistina Serxwebûnê

Dibe ku nivîsa herî zêde di nav tevgerê de bandora propagandayê kiribe *"Bername"* be. Ya yekemîn bû û ev xwezayî bû. Ya ku ji bo derve herî zêde bandora propagandayê kir jî her hal *"Danezana Damezrandinê"* bû. Piştre, piştî ku *"Bername"* hate nivîsandin, hem bikaranîna çekê hem jî bi nivîsandina Bernameyê ve ber bi partîbûnê ve çûyîn, destpêkirina pêvajoya partîbûnê, her ku çû zêdetir rêxistinbûn, tevgera bi plan, li ser vî esasî xurtkirina amadekariyan û pêkanîna partiyê xist rojevê. Ji bo vê jî pêşî di bihara 1978'an de li Xarpetê civînek hat lidarxistin. Dişibe ew civînên ku dem bi dem kadroyên pêşeng li dar dixin. Ne kongre bû, biryara damezrandina partî nehat dayîn. Xebatên *"Yekîtiya Ciwanên Şoreşger ên Kurdistanê"* dewam dikir, lê ew pir nehat îlankirin, berbelav nebû. Îfadeya sîstematîka têkîliyên navxweyî yên rêxistinî bû.

Wezîfedarkirina yekem a ku hinekî din teyisî derve, bandor li avaniya kadroyan kir, civîna Xarpetê ya di bihara 1978'an de bû. Di civîna Dîkmenê ya Çileya 1976'an de wekî

alîkarên Rêbertiyê hevalê Hakî û yekî ku li Dersîmê ji TÎKKO'yê derbasî nav xebatên me dibe, tên wezîfedarkirin. Wezîfedarkirina ewil li wir e. Di 1977'an de her hal di civîna mala Pîlot de yan jî piştî wê têkildarî rêxistinbûyîna Yekîtiya Ciwanên Şoreşger ên Kurdistanê perspektîf, biryar çêdibe, lê nebû rêxistinbûyîneke ku hayê derve jê çêdike û li qadan zêde belav dibe.

Rêxistinbûna 3'yemîn a pratîkbûyî di bihara 1978'an de li Xarpetê bû û ya li vir hatiye rêxistinkirin jî *"Desteya Weşanê"* ye. PKK beriya bibe partî, resmî bibe, hê dema hereketeke komê bû, rêxistina wê ya ewil a fermî ne komîteya weşanê, lê Desteya Weşanê bû. Desteyek weşanê ava kir, li pêşiya Desteya Weşanê bi navê Serxwebûn, derxistina kovarekê danî ku ew ê rola organê navendî yê îllegal bilîstana. Wisa jî xwest ku pêvajoya fermîbûnê ya bi Bernameyê dest pê kir hê pêşdetir ber bi partîbûnê ve bibe. Desteya Weşanê yekser ji hêla Rêbertiyê ve dihate kordînekirin, arastekirin. Kadroyên din jî hevalê Hayrî bû, hevalê Mazlûm bû, ez bûm, Fatma bû. Yekser Rêbertiyê kordîne dikir. Li gel Rêbertiyê, Deste ji 5 kesan pêk dihat. Hê partî nîn bû, ti komîteyên partiyê tine bûn, lê Desteya Weşanê hat damezrandin, biryara derxistina kovarê hate dayîn.

Ji ber vê dibêjim: beriya bibe partî, tevgerê xwe wekî rêxistineke ciwanan îfade kir. Li gel vê jî desteyeke weşanê rêxistin kir. Qada weşanê, çapemenî-weşan qadeke wisa rêxistinkirî ye. Ne qadeke ku ji rêxistinê dide revandin, ne jî qadeke bê rêxistin e. Ne qadeke ji rêxistina partiyê qut e. Ji bo ku nêzîkatiyên niha rast bêne rexnekirin ev girîng e. Beriya partiyê rêxistina weşanê hat damezrandin. Tevgerê, rêxistina çapemenî-weşanê wekî rojevek sereke xist rojevê. Wekî esasê rêxistinbûna Partî hate dîtin. Li ser vî bingehî em têkiliyên çapemenî-weşanê û rêxistinê baş fêm bikin. Meylên ku ji rêxistina partî direvin, hewl didin çapemenî-weşanê bê rêxistin bikin çiqasî dijberî Rêbertî ne, em fêm bikin. Li gel vê kadroyên ku giştî xebata rêxistinê dimeşînin ji bo xebata çapemenî-weşanê bidin

destpêkirin di desteya wezîfedarkirî de cih girtin. Rêbertiyê bi xwe yekser araste kir.

Navê *“Serxwebûn”* hatibû diyarkirin. Heta wê demê hin kovar û rojname li Kurdistanê dihatin derxistin. Kemal Bûrkay û hevalên wî bi navê *“Ozgurluk Yolû”* kovarek derdixistin. Piştre komekê bi navê *“Kawa”* kovarek derxistin, ji we re jî “Kawayî” dihate gotin. Hinên ku ji PKK’ê veqetiyabûn jî tevlî wan bibûn. Wextê ku PKK’ê weşan kir, ev rewş çêbû. Komale hebûn. Xeta PKK’ê, meyla wê xeta serxwebûnxwaz bû, ev vekirî diparast. Yek ji wan 2 sloganan bû ku bihara 1976’an li mîtînga Pirsûsê hatibûn berzkirin: *“Bijî Serxwebûn” û “Bimre Mêtingerî”*. Van jî cewherê bernameya PKK’ê didan. Lewma jî xeta ku Rêber Apo pêşxistî, xeta serxwebûnê ye. Xeta PKK’ê, xeta Serxwebûnê ye. Ji ber vê jî her kesî navê xeta weşana xwe li organa xwe ya weşanê dikir. Bi şiklekî sirûştî bi wî navî tên zanîn. Navê ku PKK dide nasîn jî Serxwebûn bû. Navekî wisa bû ku li gor xeta wê ya îdeolojîk û felsefîk bû, temsîla wê dikir. Hê jî wisa ye. Di vê mijarê de ti tiştek neguheriye.

PKK’ê ti carî serxwebûn mîna dewleteke cuda pênase nekir. Ti carî serxwebûn ji azadiyê qut nekir. Her wekî xwerêveberî nirxand û wisa girte dest. Her tim têkiliya xwe û civakê da pêş. PKK’ê, ji bo her kesî avakirina dewletên cuda ya di bin navê prensîba tayînkirina qedera netewan de ti carî wekî esasê serxwebûnê nedît. Xwedî paradîgmaya dewletparêz bû.

PKK’ê ev jî digot; *“Veqetiyan, dewlet hene, piştre dibin hevkar. Dewlet ne ser bi xwe ne.”* Ev wê demê jî digot. Serxwebûn, ji bo civaka Kurd di esas de azadbûn, xwerêveberî ye. Ev wê demê jî dinirxand. Lewma jî ev xist navenda Bernameya xwe; *“avakirina atmosfereke demokratîk a ku gel wê bikaribe bi îradeya xwe ya azad biryarê bide! Ya din îradeya azad a gel e. Dewletê saz dike, cuda ava dike, bi hinên din re ava dike, lazim e civak pev re biryara vê bide, bi referandûmê bê diyarkirin.”* Wekî çawa ku hinan serwerî ava dikirin û dixistin bin zextê, her wiha hinan jî digotin me dewlet damezrand û dibûn hev-

kar. Ango, bi kurtasî Serxwebûn ne dewleteke cuda ye. Wekî wate ne wisa ye, PKK'ê ji destpêkê ve ev wisa nenirxand. Wekî azadbûn, îradebûn hate dîtin. Bi taybet jî di warê felsefîk, îdeolojîk, fikrî de wekî azadî, serxwebûn dît. Di 2009'an de dema ku Rêbertiyê ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd *"Nexşerê"* amade kir, di rêgeza yekemîn de serxwebûna îdeolojîk, fikrî bi cih kir. Esasê feraseta ewil a PKK'ê ya Serxwebûnê ev bû û hê jî wisa ye.

Lazim e têkildarî xebatên Serxwebûnê hin agahî bêne dayîn. Gêrçî qada çapemeniyê pir zêde PKK'ê esas nagire, Kurdperest e. Ji bo nêzîkatiyên miletperestiya seretayî her kesî *"Kurdperest"* digot. PKK'ê jî "Kurdperest" digot. Ne azadîxwaz e. Esas wekî hereketeke bazarkirina pirsgirêka Kurd dikare were pênasekirin. Tevgereke, rojanekirina pirsgirêka Kurd, bi rojanekirinê ve bidestxistina berjewendiyên madî. Ji bo axeyan jî wisa ye, ji bo burjûvayên biçûk jî wisa ye. Miletperestiya seretayî ya Kurd û miletperestiya reformîst a burjûvaya biçûk diketin nav kategoriya pênaseyeke wisa. Berê jî, îro jî PKK'ê wisa nirxand. Wekî weşan, lazim e tiştên ku ked daye civaka Kurd, tevkarî kiriye esas bê girtin, lê PKK nebû dewama hinan. Bû tevgereke wisa ku civakek ji nû ve afirand, vejand. Her tişt ji sifirê ve da destpêkirin û pêşxistin. Mûsa Anter digot, *"ji binê sifirê hatiye destpêkirin."* Lewma jî hin dane wekî mîrate negirt. Wê demê di her tiştî de destpêkeke nû kiriye. Di qada çapemenî-weşanê de jî destpêka nû Serxwebûn e. Lazim e çapemenî-weşangeriya PKK'ê vê wisa bizane û esas wergire. Nêzîkatiyên sistkirina vê hene. Tevgera me ya çapemenî-weşanê tê de ye. Ev, tersî nêzîkatiya Rêbertiyê ye. Nikare bêje, *"em dîroka Kurdan esas digirin"* û bike, feraseteke wisa ya dîrokê tine ye. Rêber Apo feraseteke nû ya dîrokê afirand. Ji feraseta dîroka miletperest qut bûye. Feraseta dîrokê ya Rêber Apo, ne guhertin û rojanekirina dîroka miletperest e. Îfadeya qutbûyîna ji dîroka miletperest e, redkirina wê îfade dike. Fe-

raseteke nû ya dîrokê, afirandina tezeke dîrokê dihewîne ku wê demê lazim e her xebat jî wisa bê nirxandin.

Di xebata çapemenî-weşanê de jî lazim e wisa bê dîtin. Rojnamegeriya azadîxwaz bi Serxwebûnê dest pê kir, ew ê her kes vê bizane. Beriya wê hereketên cur bi cur weşan kirin, rojname û kovar derxistin, tiştên xweş jî derxistin, baş e, lazim e qîmet pê were dayîn. Lê weşangeriya azad, li cem Kurdan li wir dest pê nekiriye. Tevgera Azadiyê jî ji wir dest pê nekiriye. Ew hemû berxwedan bûn, hewldan bûn. Em maneyê didinê, nirxê didinê, lê di encam de hemû têk çûn, tine bûn. PKK'ê temsîla vejînê kir. Di çapemeniyê de navê vejînê kovara Serxwebûnê ye. Lazim e ev wisa bê zanîn. Ji ber vê jî qada me ya çapemeniyê hê bi meyl e ku dîroka rojnameyên birayên Bedirxanan fêr bibin, fêm bikin; çi di kîjan rojê de çapkirine, çawa çapkirine lê bikolin, roja ewil a çapa wan wekî roja çapemeniya Kurd bihesibînin, der heqê wê de bernameyên televîzyonê çêbikin. Lê ti bername tine ye ku bê ka Serxwebûn çawa derket, çawa hat weşandin, kîjan rojê hat çapkirin, bi kîjan hewldanan çêbû, di jimara yekem de çi hatin nivîsandin.

Mîna ku Serxwebûnê di Çileya 1982'yan de dest bi weşanê kiriye, meha Çileyê wekî meha destpêka Serxwebûnê tê hesibandin. Li Ewrûpayê wisa weşandine. Ango, eger ev neyê sererastkirin ew ê çapemenî-weşan nikaribe bikeve xeta rast a propagandayê. Ya ku nekeve xeta partî jî nikare xeta rast a propagandayê bigire. Ez dixwazim vê taybet li vir tomar bikim, qeyd bikim. Ji ber ku em vê dibêjin, hewl didin, ti kes li me guhdar nake, li ber çavan jî nagire. Yanî xebatên hinên din, ti bandor nekirine, serneketine û çûne, ji bo Kurdan bi qîmettir dibînin. Jixwe hêzên derveyî me Serxwebûnê mîna kovar, rojnameya Kurdan nabînin, li gel me jî wisa nayê zanîn. Di nav me de jî wisa nayê nirxandin. Ev nabe. Di vê manê de piştî ku biryara derxistina Serxwebûnê hate dayîn, wekî Desteya Weşanê me 3-4 caran civîn li dar dixistin. Rêbertî winda dibû, diçû xebatên din, dûvre me didît ku dihat Amedê û digot, *"ka werin*

*em civînekê li dar bixin."* Em kom dibûn, yek-du roj civîn, nîqaş, plansazî dihatin kirin, bi çend rûpelan mijar dihatin diyarkirin, dihate nîqaşkirin. Piştre Rêbertî dîsa diçû, wisa wekî heyî dima. Me yek-du mal girtibûn, li wir me di nav xwe de nîqaş dimeşandin, me hewl dida bi lêkolînê hin tiştan kom bikin.

Hevalê Mazlûm wekî amadekarî çend gotar nivîsîn, hevalên din nîqaş dikirin bê em çi derxînin, lê me nedikarî gavekê bavêjin. Wisa di carekê de nebû. Piştî wê di civîna sêyemîn yan jî çaremîn de me yek-du rojan civîn li dar xist, dema bû êvar civîn bi dawî bû, me sê-çar rûpel plan derxistin, ev reşnivîs bû ku me yê vê carê nivîsa xwe pê amade bikirana, lê me beriya wê jî tiştekî wisa derxistibû. Em ji cihê civînê derketin, ez û hevalê Hayrî diçûn mala ku em lê diman. Min gotê, *"Hevalê Hayrî wisa nabe, çi dibe bila bibe, êdî bes e. Em kom dibin, reşnivîsan derdixin, belav dibin. Hefte bihurîn tiştek nîn e, piştre dîsa kom bibe, dîsa hevşib bike, careke din heman tişt. Me niha kir, em dîsa belav bûn, ew ê dîsa wisa bibe."* Hevalê Hayrî got, *"Ew ê rojekê çareseriya wê çêbibe, hinekî sebir lazim e."* Hevalekî pir bi sebr bû. Li gel vê terzê Rêbertiyê jî baş dizanî. Heta ku tiştek neseridanda wisa bi rehetî gav nedavêt. Hevalê Mazlûm 3-4 gotar nivîsandin. Me gelek amadekarî kirin ku bê em ê kovarê çawa derxînin. Orta meha Tîrmehê, rojekê Rêbertî li Şehîdgehê, li wê malê ku digot *"ez jê revîm"* dest bi nivîsandinê kir. Her roj serê sibehê derdiket şaneşînê û wisa 4-5 rojan nivîsî. Min û hevalê Mazlûm jî, me daktîloyek girt.

Rêbertî ti carî xebata xwe bi mêzekirina pirtûkan nake. Notan nagire û naxwîne. Dixwîne, li mejiyê xwe dinîvîse, piştre jî yê li mejiyê xwe li kaxizan dinîvîse. Rojê 30-40 rûpelên defterê nivîs dinivîsand. Ya ku rojekê dinîvîsand, di roja duyem de me hema hema nikarîbû bi daktîloyê biqedanda. Di 1975'an de em fêrî nivîsandina daktîloyê bibûn, em jî rûniştin li mala Anittepeyê û me pev re derbasî daktîloyê kir. Qedand, dûvre nivîs da. Got, *"hûn Desteya Weşanê ne, hûn ê binirxînin."* Me jî bi daktîloyê nivîsand, 40 rûpel derketin. Me lê mêze kir, me got

em navê wê bikin *"Rêya Şoreşa Kurdistanê". M*e sernivîsek jî lê kir. Piştre me komî ser hev kir, me ji bo demeke pêş li Dersîmê randevuya civînê dabû Desteya Weşanê. Hinekî zû jî qediyabû. Em çûn Nazmiyê. Heval li gundê Hacerî yê Nazmiyê kom bibûn, hevalê Fûat jî li wir bû. Civiyan, me di rûniştinekê de xwend. Wisa herikbar bû ku, bêyî navber, bêyî bêhn biçike qediya, me navber da. Fatma hat û got, *"we nivîsiye ne wisa". M*in got, *"Na, hemû ji hêla Rêbertiyê ve hatiye nivîsandin, me xalek, bêhnokek jî daneniye."* Mîna hatiye nivîsandin me derbas kiriye, ji bo ku em şaşitiyê nekin me wisa kir, ya ku wê redakte bikira, Desteya Weşanê bû. Fatma hê ji wê demê hêvî dikir ku ew ê Rêbertî nikaribe tiştekî zêde bafirîne. Lê ewqasî bandor bibû ku ji bo lêgerîna tiştekî vegeriya.

Manîfestoyek bû. Di jimara yekem de Manîfesto hat weşandin. Xwezayî bû, zelal bû, yên ku wekî gotar me amade kiribûn hemû li goşeyekê man. Ji bo redaktekirina wê em zêdetirî 20 rojan xebitîn. Zêdetirî 10 rojan em li Dersîmê xebitîn. Operasyon çêbûn, me ji wir girt, di ser Mazgêrtê re em derbasî Depê bûn. Piştî ku em çend rojan li Depê man enceq me dikarî wekî Desteya Weşanê redaksiyona wê temam bikin. Me amade kir û got em vê bikin jimara yekemîn. Jixwe qasî hecmekî kovarê bû. Me nirxand, nivîsek derketinê jî lazim bû, jimara yekemîn e. Me ev jî ji Rêbertiyê re got. Me got, *"ji bo Serxwebûnê nivîseke derketinê jî lazim e". Got,* "*temam"* û hema li wir 2 rûpel nivîsandin. Me serenavê *"Derketin"* lê kir. Ew tenê nivîsek derketinê bû, ya din hemû *"Rêya Şoreşa Kurdistanê"* bû. Berfirehiyeke Bernameyê bû.

Nivîsandin û redaksiyona wê wisa pêvajoyeke dirêj û tijî ked bû, lê neqediya. Ew ê çawa bê çapkirin? Me ji gelek rêxistinan daktîlo û makîneya teksîrê xwest. Hevalan bi ser gelek daîreyên dewletê de girtin. Ji bo bikaranîna daktîloyên klavye mezin, 3-4 lib dizîn. Mîna pirtûkek mezin, herî kêm dema ku rûpelek A4 a di mezinahiya pirtûkê de bê qetkirin bibe wekî pirtûkê. Wê demê ew ê A4'ê ne bi dirêjahî, bi firehiyê bigire

nava xwe. Daktîloyên klavyedar, çendek jî makîneyên teksîrê dizîn. Me pêş didît ku bi rêka wan em ê li kaxizên mûmkirî binivîsin û bi teksîrê zêde bikin. Nivîsandina li ser kaxiza mûmkirî, me li Çewlikê kir. Me li Xarpetê dest pê kir, operasyon derket, me li Çewlikê li mala hevalê Zekî Yildiz temam kir. Teksîra wê, dîsa li Çewlikê rojeke cejnê di dema betlanê de, malên zerzelê hene, di yeka vala de em 3-4 rojan derneketin derve û bêyî navber me her teksir çap kir, jev veqetand. Me ew qet kirin. Beriya wê me 600-700 qapax jî amade kirin. Ji jimara yekemîn me yê 300 lib çap bikirana, ji bo jimarên din jî ji bo ku heman qapax be, me zêde amade kiribûn. Ji bo çapa qapaxê ez çûm Enqereyê, qasî hefteyekê min malzeme kom kirin.

Li her derê Enqereyê geriyam, li çapxaneyên Amedê em geriyane, lê me malzemeyên lazim nedîtin. Giştî hesinên mezin bûn, ne mimkun bû bihatana desteserkirin, revandin. Enceq bi kamyonan, vîncan bihatana derxistin. Me xwest teknîkek hê basîttir ji Enqereyê bibînin, lêkolîn li ser vê bû. Piştre yekî bi navê Fehmî Yilmaz heye, tevlî nav xebatên eskerî bibû, Enstîtuya Perwerdehiyê ya Gaziyê qedandibû, nîgarkêşiya teknîkî dikir. Wî, teknîkek bi navê *"çapa hevrîşimê"* dizanî. Lîsteya malzemeyên pêwîst da û got, *"we dît em ê bikin".* Ji bo dîtina van malzemeyan hefteyekê li Enqereyê geriyame. Meger piraniya vana malzemeyên kevn in. Dawiya dawî me hemû dîtin. Me kom kir, li gel kartonan anî Rezanê ya Amedê. Ew çend rojekî pê re mijûl bû, klîşe amade kir. Em qapaxê mîna ku ji çapxaneyê derketiye çap dikin. Kartona spî jixwe, heta nîvê wê, beşa kêlekê, binî em rengê sor çap dikin. Li ser cihê spî jî bi tîpên sor Serxwebûn dinîvîse. Wextê hemû çap dibe mîna çapa çapxaneyê lê tê. Her çiqasî hundirê wê teksir bû jî me got hema nebe bila derveyî wê mîna ya çapxaneyê xuya bike, ne karekî ji rêzê be, em wisa dikin. Rêbertî hat mala ku em lê dixebitîn. Me roj û nîvekê bi çapa wê derbas kir, 500-600 lib çap kirin. Wisa zehf zor e, Rêbertî li ser piyan ma li bendê. Li wir nezaretî

çapa hemû qapaxan kir ku bê yek bi yek çawa çêdibin, baş e yan ne. Piştî qediya, bi keyfxweşiyekê veqetiya. Bi şiklekî wisa bavêje bila biçe, tiştek nabe jixwe zêde ye, nebû. Ez ji bo îzahkirina van dibêjim. Her hal heval fêm dikin. Rêxistinê çiqasî pûte pê da, girîngî daye, ked daye, hewl da. Piştre 200 ji wan qapaxên karton me ji Amedê derbasî Çewlikê kir. Di havînpayiza 1978'an de polîs bi ser her derê de digirin. Wê demê me her yek qat kir, piştre xist kartonê, bi zimbeyên mezin me zimbe kirin. Ji bo 3 rexên wê dûz bin, me bi cedwela kêr ve 300 lib yek bi yek birîn. Ji ber ku me amûreke din a jêkirinê nedîtibû, me ev bi kar anî. Me biryar da ku em hinekî veşêrin hinekî jî belav bikin. Yê veşartinê me da hevalê Huseyîn Dûrmûş ku veşêre. Di rê de hat girtin, ew ên di dest de da girtin. Yên di dest me de man. Me di nav xwe de bi lez belav kir. Hin jî me biryar girt ku bidin welatparêzên derveyî me, welatparêzên durist ên ji rêxistinên din an jî ne rêxistinkirî.

Jimara yekemîn a Serxwebûnê wisa derket. Hejmara esas bû, ya yekemîn bû. Kovara yekemîn a PKK'ê ev bû, weşangeriya xwe wisa da destpêkirin. Li gel 5 jimarên taybet, 6 jimar heta dawiya 1979'an derketin. Mijarên wê yên din; nirxandina Rêbertiyê ya "Li ser Qetlîama Mereşê" bû. Me redakte kir. Ya din li ser *"Girîngiya Îdeolojî û Polîtîkayê"* bû. Axaftina Rêbertiyê ya di civînê de bû, me redakte kir. Yek a hevalê Mazlûm bû ku li ser *"Berxwedana Hîlwanê"* nivîsîbû. Yek a hevalê Hayrî bû bi navê *"Em di Rêya Rast de Têbigihêjin". L*i ser pêşketin, têkoşîna li Rihayê nivîsîbû. Ji ber ku me ew nivîs lawaz dîtin, me got jimarên taybet. Jimara yekemîn pir xurt bû. Hate gotin ku ji bo jimarek duyemîn hebe lazim e nivîs di asta manîfestoyê de be. Ji ber ku ew ê êdî nivîseke wisa jî nebe, ji bilî jimara taybet di wê demê de me nikarîbû jimareke din a duyemîn derxînin.

Bername, yanî ji çapxaneya teksîrê hatibû zêdekirin û şandin. Manîfesto wekî kovar hat şandin. Nivîsa *"Derketin"* jî girîng bû. Jixwe hatibû gotin ku jimara yekemîn e. PKK'ê qade-

ke nû ya xebatê dida destpêkirin, xebatên çapemenî-weşanê îfade dikir. Yên ku bername xwendibûn ji ber ku dizanin, manîfesto di hin milan de hinekî din berfireh bibû, ravekar bû, li ser wan jî bandoreke mezin kir. Me manîfesto bi gelek hêzên li derveyî me jî da xwendin. Hema hema li her derê Kurdistanê me xwend. Giştî derdorên ku dîtin û xwendin, ji rêxistinên xwe veqetiyan û tevlî PKK'ê bûn. Mesela li Amedê me bi 3-4 koman da xwendin, hemû tevlî bûn. Siwêregî komek bûn, xwendibûn, xwestin me bibînin, ez û hevalekî çûn. Em ê nîqaş bikin, bi meraqa ku gelo ew ê çi nîqaş bikin, em çûn. Em ji nîqaşê neditirsiyan. Fikrên PKK'ê bi bandor bûn, lihevkirî, yekpare bûn. Wisa mîna yên din ne basît bû. Ji ber vê jî me xwe ji nîqaşan nedida paş. Ji ber wê jî, em meraq jî dikin gelo ji çi bandor bûne. Me dît ku nîqaş tine ye, dema ku em çûn kom bibûn. Tenê ev ji me pirsîn, *"Bi rastî jî hûn ê gotinên li vir pêk bînin an tenê ji bo gotin be we gotine, ango yên din dinîvîsin, we jî wisa nivîsiye."* Me bertekên tund raber kirin û me got, *"PKK gotinên xwe pêk tîne, heke nake çima bêje? Heta niha gelo we dîtiye gotin û kirina wê li hev nake? Helbet heta dawî ew ê xwedî li hemûyan derkeve."* Li ser wê gotin, *"bi şertê pêkanîna van em jî tevlî dibin". W*isa bandor bibûn.

Hêza çapemenî-weşanê ya perwerdekirina şoreşgeran, bandorkirina mirovan ji propagandaya devkî zehf zêdetir e. Ji propagandaya çekdarî jî zêdetir e. Hêza ajîtasyona propagandaya çekdarî pir zêde ye. Zêdetir kişîner e, lê ne perwerdekar e. Lê ya ku hem kişîner hem jî perwerdekar, xebata propaganda û ajîtasyonê ye. Çapemenî-weşan e. Lazim e hêza çapemenî-weşanê kêm û lawaz neyê dîtin. Her tim heye, wê demê jî hebû, destpêkê jî hebû, di roja me de jî heye. Wê demê di asta cîhanî de ji bo çapemenî-weşanê digotin "Hêza Çaremîn" e. Lê niha bê nîqaş hêza yekemîn e. Cîhan li ser çapemenî-weşanê dimeşe. Aştî jî şer jî bi çapemenî-weşanê pêş dikeve. Niha rêxistina me ji aliyê çapemenî-weşanê tê birêvebirin. Ez di nav giştî rêveberiyan de me, wekî berpirsê partiyê daxivim. Qaşo partiyê bi rê

ve dibim, lê li vir im û ti pêwendiya min bi rêveberiyê re tine ye; lê 24 saetan bi hezaran kadroyên partiyê temaşeyî wê televîzyonê dikin, li gor wê hereket dikin. Ji min ne talîmatê digirin ne jî gotinê dibîhîzin. Kî li wir daxive li wan guhdar dikin. Dibêjin *"rastiya PKK'ê ev e"* û li gor wê hereket dikin. Lazim e her kes vê bizane. Wê demê ez bi rê ve nabim, televîzyon bi rê ve dibe, çapemenî-weşan bi rê ve dibe. Ewqasî bi bandor û girîng bûye. Di serketinan, pêşketinan de para wê wisa ye, lê di şaşiyan û neyêniyan de jî para wê wisa ye.

Mirovên ku xebata çapemenî-weşanê dimeşînin lazim e di nav têkoşîna şoreşgerî de girîngî û cihê vê xebatê wisa bibînin û li gor vê nêz bibin, tevlî bibin û bixebitin. Li gor vê pûtê pê bidin û baldar nêz bibin. Ji bo ku di dema wê de ya herî xweş, herî li gorî xetê derxînin, bikevin nava hewldanê. An na, nikare rast bi rê ve bibe. Ji ber ku partî û gel bi rê ve dibe. Her şaşî, her karên derveyî partiyê zirarê dide têkoşînê û gel. Ji milê ters ve mirovan perwerde dike. Rastiya Rêbertî û PKK'ê ters û şaş dide nasîn. Mirovan şaş perwerde dike. Ev ne rast e, ne jî di vir de heq û hiqûq heye. Bi ti şiklî ev nayê qebûlkirin. Lazim e ev bê zanîn.

Lewre jî lazim e em wekî pêvajoya yekemîn a xebatên xwe yên çapemenî-weşanê, dema 1977-78'an bigirine dest. Di navenda wê de Serxwebûn heye. Derketin e, destpêk e. Serxwebûn wekî 5-6 jimaran derketiye. Dikare li Ewrûpayê bê dîtin. Di arşîvan de heye, giştî jimar dikarin werin dîtin. Asta teorîk a nivîsan bilind e. Gelek bandor kirine. Ji bo damezrandina partî bi şiklekî xurt pêk were xizmeteke mezin kiriye. Şaş neyê bîra min, *"Danezana Damezrandinê"* neket weşanê. Gelo bûye jimarek taybet, rewşên tevlîhev ên 1979'an, pir nizanim. Feqet di Mijdara 1979'an de dijmin avêt ser çapxaneya me ya li Xursê ya Qoserê. Dijmin hemû bi dest xist. Piştî wê di 1980'ê de me nema dikarî wekî hejmarên taybet Serxwebûnê derxînin. Dema ku malzemeyên çapê çûn, di zivistana 1979-80, bihara 80'ê de bultenên partî yên bi daktîloyan amadekirî

hatin derxistin. Wisa em ketin nav pêvajoya 12'ê Îlonê. Propagandayek li gorî avabûn û derketina partî, hem devkî, bi avabûna partî ve jî bi derketina Serxwebûnê re nivîskî, bi berxwedana Hîlwan-Siwêregê jî propaganda çekdarî; ango xebatên propaganda û ajîtasyonê bi şiklê devkî, nivîskî û çekdarî xwe gihandin yekgirtinekê. Avabûnek pêşengtiyê ya Partiyê pêk anî ku karibe pêşengiya gel bike, şoreşa azadiyê rêxistin bike û rê ve bibe.

Bûyîna şoreşî di encama bingehekî wisa yê propaganda û ajîtasyonê de çêbû. Pêşî li partîbûnê û berxwedana çekdarî vebû. Dijmin jî ji bo ku karibe pêşî li vê bigire, berê xwe da darbeya faşîst-eskerî ya 12'ê Îlona 1980. Piştî darbeya 12'ê Îlonê pêvajoyek nû ya taktîkî pênase kir. Partiyê ev veguherand pêvajoyeke stratejîk. Li gor vê xwe ji nû ve plan kir, rêxistin kir. Li gor wê xwe ji nû ve bi mewzî kir. Li gor pêdiviyên wê xebatên propaganda û ajîtasyonê meşandin. Em dikarin salên 1980'yan wisa rêz bikin. Pêvajoya ji 12'ê Îlonê heta destpêka salên 1990'î wisa ne. Em dikarin wekî pêvajoya duyemîn jî vê bi nav bikin. Di wê demê de jî ya esas propagandaya çekdarî ye. Di ya yekemîn de propagandaya devkî bû. Di dawiya vê demê de propagandaya çekdarî û propagandaya nivîskî pêş dikevin, bandorê dikin. Di pêvajoya duyemîn de ya esas propagandaya çekdarî bû. Ev bi Pêngava Gerîla ya 15'ê Tebaxê ve zindî bû. Girêdayî wê ji milekî propagandaya devkî, perwerde li Akademiya Mahsûm Korkmazê hê rêxistîtir, rêkûpêktir bû. Propagandaya nivîskî jî ji Çileya 1982'yan ve piştî ku Serxwebûn li Ewrûpayê wekî organê weşana mehane ya legal hat weşandin, pêş ket. Xebatên weşanê, çapemenî-weşan, propagandaya nivîskî hê zêdetir li derveyî welat çêbû, navenda wê Ewrûpa bû. Propaganda çekdarî li Bakurê Kurdistanê bi xwespartina çiyê pêş ket, navendî bû. Navenda propaganda devkî jî Rojhilata Navîn bû, qada ku Rêbertî lê bû, Akademiya Mahsûm Korkmaz bû. Van hevûdu bi vî şiklî temam kirin, yekparetî ava kirin û pêvajoya duyemîn pêş xistin. Çapemenî jî di vê demê de

bi taybet li qada Ewrûpa û derveyî welat bi bandor bû. Qezenckirina girseya Ewrûpayê, li Ewrûpayê bûyîna rêxistin bi dest anî. Li gel vê, ber bi Rojhilata Navîn û welat ve herikî. Xebatên propaganda û ajîtasyonê pênase kirin.

**b-Pêvajoya Duyemîn:**

**Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê**

Bi hin rehendan ve me li cih û girîngiya propaganda-ajîtasyonê ya di jiyan û têkoşînê de mêze kir. Hinekî jî em li ser destpêka xebatên xwe yên propaganda-ajîtasyona nivîskî ya ku zêdetir mîna xebatên çapemenî-weşanê tên binavkirin, rawestiyan. Bi taybet jî xebatên di dema Bûyîna Rêberiyê û Partîbûnê de hatî meşandin; pêşketin, bandor, encam, serketina aktîf a propaganda û ajîtasyona devkî; li ser vî bingehî li milekî gavavêtina propaganda-ajîtasyona çekdarî, li milê din propaganda-ajîtasyona nivîskî; di vê çarçoveyê de destpêka weşangeriya Serxwebûnê, gavên yekem, pêşketina wê, wateya wê û ferqa wê ya ji weşangeriyên din bûn mijarên me.

Me têkildarî hin rehendên pêvajoyeke ku em dikarin wekî Tevgera Azadiyê jê re pêvajoya yekemîn a xebatên propaganda-ajîtasyonê bêjin, agahî parve kirin. Ew ê li cih be ku salên 1970'yî, asta xebata propaganda-ajîtasyona nivîskî ya ku di dawiya van salan de pêşketî wekî pêvajoyekê bê destgirtin.

Esas wekî çawa xebateke ji hêla Rêbertiyê ve hatiye avakirin, rêxistinkirin, meşandin, her wiha di çarçoveya propaganda-ajîtasyona devkî de, di çarçoveya propaganda-ajîtasyona çekdarî de mîna xebateke ku giraniya kadroyan tevlî bûn û meşandin derkete ortê, pêk hat. Tabî bi rêxistinbûnê ve dibe xebateke ku ji hêla Desteya Navendî ya Weşanê tê meşandin. Rêxistinbûneke wisa wekî çawa ku beriya damezrandina partiyê hatiye ragihandin, her wiha piştî kongreya damezrandinê jî dema ku bi navê PKK'ê ve ket pêvajoya ji nû ve rêxistinbûyînê, li gel komîteya leşkerî ya navendî, komîteya ku destpêkê hatiye avakirin, Komîteya Weşanê ya Navendî ye.

Ji komîteya navendî ji bo berpirsiyariya komîteya weşanê ya navborî hevalê Mazlûm wezîfe girt û meşand. Yek ji du baskên çalak ê ku di nav partî de hatin rêxistinkirin jî ev bû. Yek milê leşkerî, yek jî milekî îdeolojîk, ango milê propaganda û ajîtasyonê derdiket ortê. Di pêvajoya 1979-80 de xebat di çarçoveya rêxistinbûneke wisa de hatin meşandin. Her du qadan jî hewl dan xwe di çarçoveya xweseriya xwe de bi rêxistin bikin. Qada leşkerî, propaganda çekdarî her ku çû berê xwe da avakirina rêxistina gerîla, Siwêreg jî ji bo vê wekî qadeke navendî ya xebatê hilbijart. Qada propaganda-ajîtasyonê jî li ser bingehê xebatên weşanê bi şiklê yekîtiya perwerde û propagandayê berê xwe da rêxistinbûnê. Hevalê Mazlûm ê ku herî zêde xebat meşandibû, ji xebatan ev encam derxistibû. Pêş dît ku rêxistin an jî xebat lazim e rêxistî bêne meşandin, ew jî dikarin bi şiklê yekîtiya perwerde û propagandayê şênber bibe. Esas bi êrîşên dijmin, girtin, darbeya faşîst-eskerî ya 12'ê Îlonê ve qut nebûna, teqez dihat dîtin ku ew ê qada propaganda û ajîtasyonê xwe bi navê perwerde û propagandayê rêxistin bike û bibe xebateke ku her diçe mezin û rêxistî dibe. Perwerde û propaganda bi vî şiklê rêxistinbûneke di nav hev de dihat destgirtin. Heta hevalê Mazlûm bi girîngî rêzik, rêzikname, xebatên têkildarî avabûna rêxistinê amade kiribûn. Ev di en-

cama girtin û êrîşên faşîst de pêşî lê hate girtin, pratîkbûna wan hate astengkirin.

Pêvajoya ku em dikarin têkildarî vê di karên partiya xwe de wekî pêvajoya duyemîn binirxînin, mîna xebatên propaganda-ajîtasyonê yên li dijî darbeya faşîst-eskerî ya 12'ê Îlonê hatî meşandin, şênber dibe. Di xebatên vê pêvajoyê de xebatên propaganda-ajîtasyonê di vî milî de li pêş e. Di pêvajoya yekemîn de xebatên propaganda-ajîtasyona devkî, li pêş bûn. Di pêvajoya duyemîn de rehendê propagandaya çekdarî li pêş bû. Xebatên li welat, li ser bingehê berxwedana gerîla wekî xebata propaganda û ajîtasyona çekdarî pêk tên. Bi rastî jî çalakiyên ku gerîla di şertên zor de bi cesaret, fedakarî û veşartîbûnek mezin li çiyayê Kurdistanê li dijî artêşa faşîst a Tirk meşandin, TC, sîstema wê ya rêveberiyê, artêşa wê çawa ku bi şiklekî cidî derb xwar; her wiha civaka Kurd, raya giştî ya derve jî ji kûrahî bandor kir. Darbeyên ku gerîlayên Kurd li artêşa Tirk dane, di nav civakê de roleke mezin a ajîtekirinê lîstiye, hêvî û bawerî daye. Diyar dike ku li dijî sîstema mêtinger-qirker berxwedan mimkun e û ev sîstem dikare were têkbirin.

Ev jî hêviyê zêde dike, baweriyê dide, ruhekî berxwedan, azadiyê derdixist ortê. Di serî de ciwan, civak perwerde dikir, rêxistin dikir, seferberî çalakiyê dikir. Ev rewşa tevlîbûnê ya ferd bi ferd, kom bi kom pêk hatî, di destpêka salên 1990'î de gihişt asteke çalakbûna xwecihî ya girseyan, raperînê ku em jê re serhildanên gel dibêjin. Rêber Apo vê wisa pênase kir, *"qutbûna civakê ji sîstemê, serketina Şoreşa Berxwedana Neteweyî". W*isa jî tevlîbûnek girseyî, avabûna dendika neteweya demokratîk, vejîna gelekî ya di atmosfera azadbûnê de ku berxwedana gerîla saz kir, pêk dihat.

Rêxistinbûn û çalakbûna gerîla ya li ser bingehê propaganda-ajîtasyona çekdarî rê li ber berxwedana gel, şoreşa vejîna neteweyî, şoreşa azadiya jinê vekir, dîsa xebatên ku ev afirandî û her wiha milê wê yê propaganda û ajîtasyona nivîskî li derveyî welat pêşketin bi xwe re anî. Em dizanin, xebateke

wisa mezin a ku hemleya wer a gerîla amade kir, xebata amadekariyê ya li sehaya Lubnan, Filîstinê ye. Ew xebat bûn ku yekser Rêber Apo dimeşandin. Ev jî xebata li ser bingehê perwerde û propagandayê bû. Ji bo ku perwerde û amadekariyeke wisa pêş biketana Rêber Apo xebateke pir berfireh a teorîk dimeşand. Xebateke wisa berfireh ku ji destpêka 1981'an û domahiya salên 1980, di pêvajoya yekemîn de xwe spart amadekirina pirtûk û broşuran; di pêvajoya duyemîn de jî di çarçoveya Akademiya Mahsûm Korkmaz de xebata hem perwerde hem jî teorîk pev re meşandinê îfade dike, yekser ji hêla Rêber Apo dihat meşandin. Encamên van tên zanîn û beşek wê ya mezin di dest me de têne nirxandin. Beşên ku di dest me de nehatine nirxandin û di arşîvan de mayî jî hene. Beşên ku em di dest de dinirxînin, analîzên teorîk ên berfireh in ku di çarçoveya Konferansa Yekemîn û Kongreya Duyemîn de hatine amadekirin û xeta teorîk, stratejîk, rêxistinî, siyasî yên şerê gel ê demdirêj ku wê li dijî darbeya faşîst eskerî ya 12'ê Îlonê bê meşandin, datîne ortê. Ev ji rapora Konferansê dest pê dike. Bi pirtûkên mîna *"Li Kurdistanê Rola Zorê, Li ser Rêxistinbûnê, Têkoşîna Rizgariya Neteweyî û Rêya Çareseriyê, Bernameya Eniya Rizgariya Neteweyî, Di Têkoşîna Dij-faşîzmê De Li Ser Eniya Yekbûyî"* amadekariya Kongreya Duyemîn, kadroyan, vegera li welat û pêşxistina berxwedana gerîla dike. Paralelî berxwedana gerîla jî berhemên mîna *"Problema Kesayetê, Jiyana Partiyê û Taybetmendiyên Milîtanê Şoreşger, Di PKK'ê de Pirsgirêk û Wezîfeyên me yên Pêşketinê, Li Dijî Her Cure Xerabkarî û Berhevdanê Em Yekîtiya Partiyê Xurt Bikin"* hatin meşandin. Bi şiklê nirxandinên di civînan de, wekî pirtûk ev ronakkirina teorîk-analîzê di asta Rêbertiyê de tê dewamkirin.

Piştî wê xebatên Akademiya Mahsûm Korkmazê tên. Akademiya Mahsûm Korkmazê lazim e tenê wekî akademiyeke eskerî neyê nirxandin. Akademiya hem îdeolojîk-teorîk hem jî eskerî pev re dihat meşandin, yekpare bû, Navenda Xebata Rêbertiyê, biryargeh bû. Xwedî li encamên qada eskerî derdi-

keve, feqet qada propaganda-ajîtasyonê tam xwedî lê derneket. Halbûkî xebatên herî berfireh ên teorîk, pêşketina ramanên nû, tevkariyên herî cidî ji bo fikirê mirovahiyê, di çarçoveya xebatên Akademiya Mahsûm Korkmaz de derket ortê. Tevkariyên Rêbertiyê ji bo fikrê mirovahiyê di nav wan xebatan de çêbû ku erê milê eskerî girîng bû; şoreşek berxwedana neteweyî bi serketinê ve bir, şoreşeke wisa bû ti kesî nehesiband, hêvî nekir, ne li bende bû. Lê belê ev şoreş tenê bi şîdetê nebû. Geîlayê ku ev şoreş pêk anî ne eskerên dûz bûn, rêxistineke partî bû, rêxistineke fedaî-milîtan bû. Pêşengtiyek wisa ya partî bû ku ji serî heta binî teorîk, îdeolojîk-polîtîk gurçûpêçkirî bû. Têkoşîneke pir berfireh a teorîk-îdeolojîk a ku gerîla derxist ortê hate meşandin û xebatên perwerdeyê hatin kirin. Xebata propaganda-ajîtasyonê ev amade kir. Jixwe li cihê ku xeta îdeolojîk-rêxistinî zehmetiyan dikşîne, Kongreya 3'yemîn û Akademiya Mahsûm Korkmaz pev re di derbaskirinê de rol lîstin. Ango xebatên propaganda û ajîtasyonê kir. Li ser vî bingehî, lazim e xebatên propaganda û ajîtasyonê yên ku di vê çarçoveyê de li Akademiya Mahsûm Korkmaz hatine meşandin, em wekî xebatên herî gurbûyî, berfirehbûyî, encamgir pênase bikin, binirxînin. Di vir de kêmasî hene, ev xebat nayêne dîtin. Ev xebat di vê çarçoveyê de nayên nirxandin, nêzîkatiyeke wisa ji encamê re nîn e. Berhemên derketî li ser vî bingehî nayên nirxandin. Kêmasiyeke cidî ye. Esas ji kêmasiyê wirdetir qutbûyîna ji partî û Rêbertiyê ye. Ev destnîşan dike ku esas, cewher, berfirehiya vê xebatê nehatiye fêmkirin.

Li ser vî hîmî, di pêvajoya yekemîn de Rêbertiyê xebat kordîne kirine, rêxistin kirine, meşandine. Belgeyên esas ên nivîskî ji aliyê Rêbertî hatine amadekirin. Komeke hevalan jî di pêşengtiya hevalê Mazlûm Dogan de xebatên nivîskî meşandine. Komîteyeke weşanê jî çêbû. Wezîfeya ku di pêvajoya duyemîn de hevalê Mazlûm Dogan dimeşand jî Rêbertiyê girtiye ser milên xwe. Bi meşandina van xebatan ve hêz û rewşa Rêbertiyê teng nebû, berevajî berfirehtir bû. Li gel komek he-

valan, yekser Rêber Apo giştî xebatên propagandayê rêxistin kir, kordîne kir, meşand, encam nirxandin. Domahiya demê, xebatên navborî esas di çarçoveya karbeşiya navendê de wekî xebatên ku Rêbertî dimeşînin derketin ortê. Wezîfeya Komîteya Weşanê ya Navendî yekser Rêber Apo li xwe girt û meşand. Lazim e em vê wisa bibînin.

Wisa dîtin tê çi maneyê? Di çarçoveya xebatên Rêbertî û partî de cih û rastiya xebatên propaganda û ajîtasyonê wisa derdikeve. Wisa mêzenekirin tê maneya ji wir qutkirinê. Rêbertiyê berê digot, *"hûn xwe esker dihesibînin, min ne fermandar, wekî gerîla jî qebûl nakin. Ji ber wê jî hûn çi dizanin wê dikin."* Nêzîkatiya heyî, Rêbertiyê wekî xebatkarê propaganda û ajîtasyonê nabîne. Dibêjin em dikin, Rêbertî tiştekî din e. Ev jirêderketineke pir xeter e. Ev ji serî ve bi şiklekî pir nazik qutbûyîna ji Rêbertî û rêxistinê îfade dike. Tabî dema wisa dibe jî li wir her cure şaşî derdikevin ortê. Jê wirdetir, derfetê sererastkirinê jî namîne. Tu yê li gorî çi rast bikî? Ji ber ku xet tine dibe. Dema wisa dike, xet dibe ew kesên ku dibêjin em vî karî dikin. Çawa guncav bibîne, çi rast bibînin, dibêje ew rast e, her kesek bi xwe dibe rastiya xwe, rewşeke wisa ya xebatê derdikeve. Ev jî pir xeter e. Li wir rêxistin nabe, yekîtî nabe. Xebateke wisa jixwe li Kurdistanê nameşe. Ji partiyê derfet û hêzê digire, lê li gor keyfa xwe tevdigere. Wê demê heke partî hêza xwe bikşîne ew ê ji hev bikeve. Xebatên vê demê lazim e di vê çarçoveyê de jî bêne dîtin. Pêvajoya ku Rêber Apo herî zêde berhem dane jî ev dem e. Pêvajoyeke wisa ye ku di mijarên felsefîk de, teorîk de, xeta îdeolojîk-rêxistinî de xeta azadiya jinê de, di serî de ol, di mijarên nêzîkatiyên cuda yên manewî de Rêber Apo fikrên nû pêş dixe, xebata herî mezin dimeşîne, vekirinên berfireh dike. Rehendê propaganda çekdarî ya xebatê wekî artêşek gerîla û şoreşa vejîna neteweyî derdikeve, rehendê pêşketina teorîk-îdeolojîk jî vekirin, ronakbûnek mezin e ku Rêber Apo li ser esasê Akademiya Mahsûm Korkmaz anî asteke berfirehtir û rêxistîtir. Bi rastî jî ro-

nakbûna Kurd herî zêde di vê demê de û di çarçoveya Akademiya Mahsûm Korkmaz de bi saya xebatên Rêber Apo pêş ketine. Lazim e em vê wisa bibînin û fêm bikin.

Xebata propaganda-ajîtasyonê ya ku di 1970'yan de partîbûn afirand, vê carê ronakbûna Kurd, Şoreşa Vejîna Neteweyî, gelê Kurd ê ku artêşbûyînek têkneçûyî ya gerîla derxiste ortê ji nû ve vejand. Di vê çarçoveyê de xezîneyeke mezin a teorîk heye ku Rêber Apo bi şiklê dahûrandinan afirandiye. Beşek ji van bûne pirtûk, hatine weşandin, pêşkêşî civakê hatine kirin, beşek bûne CD, wekî dahûrandin em temaşe dikin, em perwerdeya xwe li ser wan dikin. Beşek jî wekî dahûrandin li arşîvê, pirtûkxaneyê wekî berhemên sûdmend kar dikin an jî radiwestin.

Sehayeke sêyemîn a propagandayê jî sehaya Ewrûpayê ye. Bi taybet sehaya ku xebatên teorîk ên Rêber Apo ji civakê re hatine ragihandin, vediguhere organên çapemenî-weşana nivîskî, sehaya Ewrûpayê ye. Ji meha Çileya 1982'yan ve li Ewrûpayê Kovara Serxwebûnê wekî nîv-rojname, organê weşana mehane derdikeve. Heta roja me jî wekî dengê Şoreşa Kurdistanê, dengê azadiya Kurd bi şiklekî rêkûpêk û bênavber didome. Hejmarên cuda yên taybet jî derxistine, bi şiklekî weşangeriyeke berfireh heta roja me wekî arşîveke bi nîzam a şoreşê tê derxistin. Yek ji nirxên bingehîn a şoreşê ye ku ruxmî gelek tişt qut bûne jî, ew qut nebûye, bi guhertinên ne pêwîst berevajî nebûye. Serxwebûn ku organa Navendî ya Partî ye, arşîva herî mezin a şoreşa Kurd e ku ji meha Çileya 1982'yan ve li Ewrûpayê weşanê dike. Organê Navendî yê Partiya me ye ku di Cotmeha 1978'an de li Amed, Çewlikê jimara yekemîn derxist, di şertên 12'ê Îlonê de li Ewrûpayê weşana xwe domand. Ne weşaneke nû ye. Kovara navendî ku jimara yekem di 1978'an de tê derxistin, di nav şertên nû de jî tê derxistin. Bi nav jî naverok jî wisa ye.

Ne tenê Serxwebûn, li dora weşangeriya Serxwebûnê domahiya salên 80'yî xebateke weşanê li Ewrûpayê gav bi gav

pêş dikeve, berfireh dibe. Li gel vê di 1982'yan de wekî organê weşana Eniya Berxwedana Yekbûyî li dijî Faşîzmê, *"Demokratîk Tirkiye"* li Ewrûpayê tê derxistin. Heta ku enî belav dibe, ew nîv-rojname jî 2 salan weşangeriya xwe didomîne. Piştî ku di 1985'an de Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê tê îlankirin, wekî organê weşana Eniyê, *"Rojnameya Berxwedan"* heye ku her 15 rojan carekê derdikeve û demeke dirêj wekî nîv-rojname weşanê dike. Piştre ew bû rojnameya rojane. Niha wekî *"Ozgur Polîtîka"* tê domandin. Di çarçoveya propaganda-ajîtasyona nivîskî de li Ewrûpayê ji orta 1983'yan heta 1984-85'an *"Kovara Şoreşa Kurdistan"* heye ku her 3 mehan carekê wekî organeke teorîk bi ebadê kovara biçûk dihate derxistin. Beşek girîng a xebatên teorîk a Rêber Apo, ewil di vê kovarê de dihate weşandin. Yên rojane di Serxwebûnê de dihatin weşandin, beşên zêdetirî xwe teorîk jî di vê kovarê de dihatin weşandin. Piştre bi pêşbîniyeke ku hemû di Serxwebûnê de bên weşandin, weşana kovarê tê rawestandin.

Ji bilî wê, di warê propaganda-ajîtasyonê de li Ewrûpayê ji ber ku xwe dispêre derfetên teknîk gelek xebat hene. Ji afîşê heta pûlkirinê gelek xebat hene. Çapa pirtûkan zehf zêde ne. Weşangeriya Serxwebûnê dibe kuliyateke berfireh. Nirxandinên berfireh ên ku di rojname, kovaran de hatibûn weşandin, wekî pirtûk têne çapkirin û belavkirin.

Ev xebat her çiqasî li Ewrûpayê be jî bandorê li welat dike. Bi qismî ji welat re jî tê ragihandin. Esas perwerdekirina kadro, şervanan xurt dike. Jixwe encamên wê ji qada perwerdeyê re tê veguhestin û vediguhere materyalê berfireh ê perwerdeyê. Xwedî roleke wisa ye. Li derveyî welat perwerdeyeke xurt a şoreşgerî dide. Xwe digihîne wê astê ku mirovê Kurd ê bi şiklên cuda koçî derveyî welat kirine, perwerde dike, ber bi şoreşê ve dikşîne, tevlî dike, şoreşê pê dide destekkirin. Li welat her ku zehmetî kişandiye, têkoşîna şoreşgerî van zoriyan bi desteka welatparêzên Kurd ên li Ewrûpayê bihurandiye. Madî, manewî bi her şiklî koma Kurdên li derveyî welat destek

dane şoreşa li welêt. Cih û asta wisa destekker, bêguman li ser bingehê bandora xebatên propaganda-ajîtasyonê, perwerdeyê, dana qezenckirina bi şoreşê pêk hatiye. Komasiya şoreşgerî, heke perwerde û rêxistinbûnek xurt nebe, nikare were wê astê ku zorahiyên li welat bide derbaskirin. Lê Rêber Apo anî wê astê. Lawaziyên avaniya civakî ya ku li welat rejîma faşîst-eskerî ya 12'ê Îlonê bi zext, teror, tundî, hîleyê ve aniye asta ku rêxistî nebe, tênekoşe, desteka gelê li Ewrûpayê daye derbaskirin. Xebatên li derveyî welat nirxên ewqasî saxlem, xurt derxistine. Niha hin wisa mîna bar dibînin. Hinên ku carina dibêjin em rawestînin, dibêjin *"belaya serê me ye."* Lê di salên 1980 de ne wisa bû. Wê demê lazim e mirov li ser bihizire, çawa hate vê astê?

Di dawiya sala 1980 de Serxwebûn 40 hezar lib dihate firotin. Her jimar 5 Mark bûn, bi giştî 200 hezar Mark digirt. Her meh 3 hezar Mark jî, Ji ber ku me 50 hezar jî li çapxaneya derve çap dikir, me heqê wê dida. Em bêjin 5-6 hezar Mark jî ji bo xebatkaran û tiştên din, dike 10 hezar Mark. Serxwebûnê li Ewrûpayê, 190 hezar Markê mayî her meh dikir qezenc. 10 hezarekî din bavêje, 180 Mark dimîne. Di deh mehan de dike 1 milyon û 800 hezar Mark, di 12 mehan de nizanim çiqasî dike. Ji giştî mesrefên li Ewrûpayê jî wirdetir, Serxwebûnê bi serê xwe hemû pêşwazî dikir. Rojname, kovar, pirtûkên din jî ji derveyî vê ne. Di warê nirxê madî de jî bîlançoyeke wisa heye. Min jî di nav van xebatan de cih girt. Her meh min encamên xebatan kom dikir, dikir rapor, wisa dizanim. Niha çawa dibe bar, em nizanin.

Perwerdekariya wê ya civakê mijareke din e, nirxê herî mezin bêguman ev perwerdekarî bû û her jimar hema hema bandoreke di asta şoreşa fikrî de li ser welatparêz û girseyên gel ên li Ewrûpayê dikir. Rêxistinkirina wê jî wisa bû. Xebata li Ewrûpayê li ser çapemenî-weşanê bû. Li ser belavkariya rojname, kovar, pirtûkan bû. Rêxistin li ser vê dihat damezrandin. Welatparêzî bi tevlîbûna vî karî derdiket ortê. Ango ji bo vê

rêxistinbûyînek cuda ne lazim bû. Hemû rêxistina partiyê di nava vê xebatê de bû. Li gel wezîfeyên din, her welatparêzî wekî wezîfeyek yekemîn û dewamî belavkirin û firotina rojname, kovar, pirtûkan dikir. Lewma jî rêxistin li ser vê dihat damezrandin. Mirovan bi xizmeteke wisa hîs dikirin ku tevlî rêxistinê bûne. Diketin nav sîstemeke rêxistinî. Didît ku têkiliya rêxistinî pêşketinên çawa mezin tîne, nirxan dafirîne, piştgiriyê zêde dike. Her wiha ev esas dibû perwerde jî, hêza mirovê rêxistinbûyî derdixist ortê, nîşan dida.

Ji bo vê pêvajoyê jî em xulaseyeke wisa parve bikin. Her hal ji bo fêmkirina hin tiştan ew ê sûdmend be. Ango xebateke rast a propaganda-ajîtasyonê, bi ti şiklê xwe nabe bar, rastiya wê ya afirandina nirxên mezin heye. Heke encameke wisa nede, wê demê lazim e mirov li naveroka wê xebatê mêze bike. Tevlîbûna berpirsên xebatê bê nirxandin. Naxwe di wir de pirsgirêk heye, lawazî û şaşî hene. Wê demê lazim e bê sererastkirin. Lazim e mêzekirineke yekmilî, li gor xwe fêmkirina kar nebe.

## c-Pêvajoya Sêyemîn:

## Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê

Weke pêvajoya sêyemîn heke em salên 1990'î binirxînin ew ê li cih be. Ev ji hev zehf ne qut in. Li ser encam, pêşketinên di salên 1980'yan de, pêşketinên ku di salên 1970'yan de hatine derxistin, bilind bû. Pêşketinên salên 1990'î jî li ser komasiya salên 1970-80'yan pêş ket, pêk hat. Wisa jev pir ne qut in. Lê vekirinên nû hene, pêşketinên nû hene. Hinekî berfirehî, fonksiyona xebatê diguhere. Ji ber vê jî wekî pêvajoyeke nû were nirxandin ew ê sûdmend be. Têkoşîna gerîla di salên 1990'an de bi şiklekî kûr li welat dihate meşandin. Lewma jî perwerdekarî, fêrkeriya gerîla dewam dike. Herêm, eyalet, sehe tên avakirin. Biryargehên gerîla yên li welat esas di heman demê de mîna komîteyên rêveberiya civakê ya demokratîk jî derdikevin ortê. Di pêşengtiya gerîla de rêxistinbûn, rêveberiyeke gerîla teşe digire. Asta rêxistinbûn û rêveberiyê di vê çarçoveyê de ye. Li ser vî bingehê şêweyê çekdarî yê propaganda û ajîtasyonê hebûn û fonksiyona xwe didomîne. Dibe ku qasî salên 1980'yan ne bi bandor be. Ji ber ku berfirehî

zêdetir e, encam zêdetir in. Feqet di salên 1980'yan de derfet tine ye ku bi rê û rêbazên din xebatên propaganda, ajîtasyon û perwerdeyê bêne meşandin. Wekî tekane rê gerîla û propagandaya wê ya çekdarî dimîne.

Rejîma faşîst-eskerî ya 12'ê Îlonê hemû rê û rêbazên li derveyî wê qedexe kiribû. Piştî 1990'î ev tê şkandin. Çawaniya darbeya faşîst a 12'ê Îlonê ya hişk, ya ku dipelçiqîne, qedexe dike ji holê radibe, tê derbaskirin. Ev encameke berxwedana gerîla ye. Dema ku wisa dibe, li dijî mêtingerî-qirkeriyê berxwedana gerîla dibe têkoşîneke çekdarî ya ku bandora propagandaya çeêdarî dike, meşandina xebatê bi rêbazên cuda yên propaganda û ajîtasyonê jî gengaz dibe. Kêmbûna bandora wê ya li gorî salên 1980'yan em di vê manê de dibêjin. Di salên 80'yan de li Bakurê Kurdistanê gerîla û propaganda çekdarî tekane şêweyê propaganda-ajîtasyonê ye. Di salên 1990'î de dibe yek ji şêweyên propaganda-ajîtasyonê, piştre şêweyên din jî derdikevin ortê.

Xebatên Rêbertiyê di salên 1990'î de li Rojhilata Navîn dewam dike. Di destpêka pêvajoyê de Akademiya Mahsûm Korkmaz fonksiyona xwe temam dike. Piştî wê Xebatên Rêbertiyê ya ku mohra xwe li salên 90'î dide, xebatên di nav çarçoveya Dibistana Navendî ya Partî de ye. Rêbertî, Dibistana Navendî ya Partî jî mîna Akademiya Mahsûm Korkmazê, mîna dibistana perwerdekirina kadro, mîna akademiya xebata teorîk jî dinirxîne, dixebitîne, rolê didiyê. Xebatên herî berfireh ên teorîk, çareseriya pirsgirêkên îdeoljîk bi xebatên li vê dibistanê digihîne çareseriyê. Pêvajoya ku li Akademiya Mahsûm Korkmaz dest pê kir, li Dibistana Navendî ya Partî jî bi kûrahî didome. Li vir jî analîz, nirxandinên berfireh ên ku Rêber Apo derxistine ortê hene. Çareseriyên ku tevkariyê bi hizrê mirovahiyê dikin hene. Bi taybet jî ji ber pêvajoyeke belavbûna reel sosyalîzmê ye, xebatên ku fikrên sosyalîst hê rasttir û bandortir pêş dixe hildiberîne. Tevkariya li fikrê mirovahiyê jî hê zêdetir li ser vî hîmî derdikevin pêş.

Vekirinên ku pêşketina gerîla îfade dikin û çareseriya pirsgirêkên rêxistinbûna tevgera jina azad, îdeolojîk, eskerî, civakî, bi xebatên Rêber Apo yên li Dibistana Navendî ya Partî pêk tên. Ev materyalên mîna pirtûkan, dahûrandinan, wekî dîtbarî CD'yan li pêşiya me ne. Komasiyeke pir berfireh heye ku bi şiklê dahûrandinan sûdmend in. Xebat û berhemdariya salên 80'yan di asta Rêbertî de tên meşandin, di salên 90'î de jî bi şiklekî hevşib pêş dikevin, kûr dibin. Lazim e ev jî bêne dîtin. Pêwîstî bi detayên pir zêde tine ye, encam li holê ne. Jixwe giştî materyalên perwerdehiyê yên di destên me de esas materyalên ji wê demê ne.

Li seheya Ewrûpayê jî xebatên propaganda-ajîstasyona nivîskî li ser hîmê weşangeriya Serxwebûnê, şêweyê salên 1980'yan didomîne. Bi şiklên mîna rojname, pirtûk, afîşan xebateke berfireh a çapemenî-weşana nivîskî didome. Piştî orta salên 1990'î li Ewrûpayê li ser vê weşangeriyê televîzyon û radyo jî zêde dibin. Ji 1995'an û şûn de bi navê Med TV weşangeriyeke TV ya ku cara ewil weşangeriya Kurdî dike, li Ewrûpayê tê rêxistinkirin. Di çarçoveya xebatên propaganda-ajîtasyonê de îfadeya vebûneke nû ye. Dema ku li weşangeriya Televîzyonê weşangeriya radyoyê jî zêde dibe, di astek weşangeriya neteweyî de xebatên xwe yên propaganda-ajîtasyonê xurttir dike. Encama xebatên propaganda-ajîtasyona nivîskî ya di ser Ewrûpayê re dihate meşandin, ji sedî 98 bi Ewrûpayê re sînordar dima. Lê encama weşangeriya televîzyon û radyoyê ya ku di ser Ewrûpayê re dihate meşandin, bandora xwe wekî Ewrûpayê, li ser çar parçe Kurdistanê, giştî Rojhilata Navîn dikir. Wisa jî mekanê ku jêderketî bihurand û xwe gihand girseya esas, giştî gelê Kurdistanê. Ev bi şiklekî hê yekpare û kûrtir pêşketina xurt a xebatên propaganda-ajîtasyonê derdixîne ortê. Xebatên Rêber Apo xwe bi asta xebatên perwerdehiya akademîk û Ewrûpayê re sînordar nehişt, xwe gihand giştî gelê Kurdistanê, çar parçe Kurdistanê. Rêber Apo hem weşangeriya radyoyê hem jî ya televîzyonê bi şiklekî bi bandor

nirxand. Ji xwegihandina giştî civakê sûd wergirt û bi şiklekî pir xurt veguherî amûrê perwerdekirina civakê.

Rêbertî, dema ku weşangeriya televîzyonê derket ortê, li Bakurê Kurdistanê, Tirkiyeyê pêwîstî pê nehişt ku xebatên kadro, kadroyên partî di nav girseyê de hebin. Ji ber ku wan xebatên propagandayê dikirin. Rêbertiyê xebatên propagandayê bi rêka TV-radyoyê yekser li ser xwe girt. Bi xebatên televîzyonê ve ew kar bi cih anî. Lewma jî pêwîstî pê nema ku kadro di nava girseyê de xebata propagandayê bimeşînin. Xebata ku hemûyan bi hev re hewl didan bikirana Rêber Apo bi tena serê xwe bi rêka televîzyonê dikir. Bi şiklekî pir xurt jî kir, yekser bi rê ve bir, bernameyên xwe li gor wê amade kir. Bernameyên nîqaşê danîn. Fikrên xwe bi şiklekî rêkûpêk ji civakê re ragihandin.

Di nav salên 1995-98'an de perwerdeyeke xurt a civakê ku hê jî bandora wê dewam dike, pêk anî. Perwerdeya felsefîk, îdeolojîk a civaka Kurd pêk anî, fikireke nû da qezenckirin. Perspektîfa azadiyê da jinan, ciwanan, ew kirin xwedî dewlemendiyên ramanê; hêvî û bawerî da. Lewma jî rêxistinbûneke xurt a civakî derxist ortê. Rêxistinbûnên navborî di encama xebateke wisa de derket ortê. Ji bo ku rastiya Rêbertî û partiyê bi şiklekî herî baş bê ragihandin, her cure îmkan seferber kir. Xebatên rojane kontrol kir. Mudaxeleyî her tiştên ters kir, ji holê rakir. Negot em wisa dikin, li gor keyfa xwe dikin. Di dema weşanê de jî dema ku şaş dikir, digot *"biçe"* û ji wir derdixist. Got, *"yên ku dikarin rast bikin bila bikin."* Li pêşiya gel ên ku rast nedikirin rexne kir. Rêveberiya partiyê jî kişand ser ekrana televîzyonê û rexnedayîn xwest. Got, *"hesab bidin gel."* Wekî çawa ku çapemenî-weşan kir cihekî perwerdeya gel, rêxistin kir û kontrol kir, her wiha kir organekî ku rêveberiyê jî kontrol dike. Rêbertiyê ev hemû kirin.

Heke ku ew ê dîrok bê lêkolandin lazim e rast bê lêkolandin. Bi mêzekirina îro, bi mêzekirina derdorê nabe ku bêje *"weşan wisa dibe, çapemenî wisa ye."* Wek nimûne, lazim e

weşangeriya Serxwebûnê bê lêkolandin. Di salên 1980, 90'î de çi kiriye, ji 1995'an ta 99'an weşangeriya televîzyonê lê bikolin. Çi dikir? Ev ji hêla Rêbertiyê dihat birêvebirin. Li wir rastiyên Rêbertiyê hene. Xerabûnên piştî wê, Rêbertî dibêje ya, *"dema ku komplo qewimî hinan gotin roj ji me re li hev hat."* Tabî di çapemeniyê de jî yên wisa derketin. Di 1999'an de piştî komployê hinên hewl dan Serxwebûnê bi dest bixin derketin. Hinan hewl dan televîzyonê bi dest bixînin. Hinên ku demildest hewl dan pîvanên ku Rêbertiyê danîne ji hev bixînin, li gor keyfa xwe tevbigerin. Li gel vê hin derketin û gotin, *"Bes e êdî ewqas pirtûk, nivîsên dûvdirêj, em aciz dibin. Bila di Serxwebûnê de jî gotarên wisa 3-4 bendan ên kurt hebin, hemû rojname jî wisa bin, televîzyon jî wisa bin, em spotan derbas bikin. Ya din me aciz dike."* Yên ku hewl didan terzê bêmejîkirina modernîteya kapîtalîst bi me jî bidin kirin hema piştî komployê derketin ortê. Heke em niha perwerdeyê dikin, em fêrî Rêbertiyê dibin, lazim e ev bê zanîn. Hemû akademî, xebatên me xeta Rêbertiyê fêr dikin. Wê esas digirin. Li ser vî hîmî rê û rêbazên xebatan dadiwerinîn nava xwe. Yên tersî vê davêjin. Lazim e wisa be.

Propaganda-ajîtasyon jî wekî xebateke ku Rêbertiyê yekser bi xwe dimeşand, lazim e hê zêdetir endeksî Rêbertiyê be. Wê demê rastiyên Rêbertiyê çi ne, lazim e li ser wan serî bê êşandin. Bê lêkolandin. Ji ber çav lê tê girtin, çav didinê, mirov nizanin û ya heyî jî wekî rastiyên Partî û Rêbertiyê dibînin. Pêşkêşkirineke bi wî şiklî jî heye. Ev şaş e. Bi taybet Akademiya Gûrbetellî Ersoz lazim e agahiyên dîrokî bi şiklekî têrker derxîne holê. Lazim e lêkolîna dîrokê rast bike. Bi taybet jî lazim e bizanin, fêr bibin ku bê Rêber Apo xebatên propaganda-ajîtasyonê çawa meşandine, çawa girtine dest û çi wate dayiyê. Di vê mijarê de komasiyeke dewlemend heye ku dikare bersivê bide her tiştî. Dibe ku gerîlavan bêje, *"Rêbertiyê yekser fermandariya yekîneyê nekiriye"*, ji ber wê em ê yekîneyê çawa bimeşînin? Nikare bêje, *"me li gel Rêbertiyê nedît, ez dikim!"* Jê

wirdetir, yê propaganda-ajîtasyonê dike, nikare wisa bêje. Ji ber ku yê hemû afirandiye Rêbertî ye, da kirin, bi xwe bi rê ve bir. Em ê van derxînin ortê, fêr bibin û wekî rastî qebûl bikin.

Em bê pîvan propaganda yan jî perwerdeya çapemeniyê nakin. Em perwerdeya xeta Rêber Apo dibînin. Ji ber vê jî lazim e ev xet bê derxistin, pratîkbûna xetê bê dîtin; ev xet di pratîkê de gihiştiye çi manê, çawa pêşketiye, rabirdûya wê ya dîrokî bê lêkolan û eşkerekirin. Ji ber vê jî bi taybet mîna salên 1980'yî, lazim e salên 1990'î jî bên lêkolan. Wekî çawa lazim e em bibînin bê Rêbertiyê di rojnamegerî, kovargeriyê, çapemeniya nivîskî, çapa pirtûkê de li çi miqate bûye, terz û uslûbekî çawa pêş xistiye, çiqasî girîngî daye xebata teorîk, ronakbûnê, hewl û kedeke çawa raber kiriye; her wiha di warê weşangeriya televîzyonê de jî lazim e bê dîtin ku ji ber xwedî daneheveke girîng a ezmûnê ye, di weşangeriya televîzyonê de jî rastî ji Rêbertî werin girtin.

Lazim e MED TV bê lêkolan. Tu yê bêjî *"bi MED TV dest pê kiriye"* lê tu yê wekî xwe bikî, tabî lazim e ne wisa be. Wê demê MED TV çi bû, çi rol lîstin, tevî ku amadekarî û kadroyên xwe tine bû jî çawa di carekê de dest bi weşanê kir û hat meşandin, li gel vê çawa ewqasî bi bandor bû. Dihate gotin ku rêjeya wê ya temaşekirinê ji sedî 70'ê, 80'ê ye. Ne tenê li Kurdistanê, li Tirkiyeyê jî wisa bû. Rêjeya bi dehan televîzyonên dewleta TC bihurandibû. Niha ti kes li van televîzyonên ku dibêjin em dewama wê ne, mêze nake. Dema ku tu bernameyan lê dikole, li nûçeyan dinêre, tu dibîne ji hinên din sûdê digire. Ji kû hate kû? Weşangeriya MED TV çi bû, çiqas bi bandor bû, çima bi bandor bû, lazim e em vê bibînin. Niha yên ku dibêjin em baş dikin, bila dereceya xwe ya çalakbûnê nîşan bidin, kî temaşeyî bernameyên wan dikin? Dikarin li weşangeriya MED TV a ku naecibînin mêze bikin. Em ê van bizanin. Em ê heqê Sezar bidine Sezar. Em ê li ser rastiyên dîrokî lêkolînên rast bikin.

Ji bo vê demê guhertina rehendê Rêbertî û Ewrûpayê wisa ye. Layê herî girîng ê pêvajoya sêyemîn, ji Bakurê Kurdistanê

heta metropolên Tirkiyeyê, destpêkirin û pêşxistina xebatên propaganda-ajîtasyona nivîskî ye. Ya nû ev e. Rastiya ku di propaganda-ajîtasyonê de diyarkeriya giştî ya propaganda çekdarî ya gerîla ji holê radike jî bi milekî ev rastî ye. Bi milekî ji 1995'an ve weşangeriya MED TV ye, milê din jî bandora çapemenî-weşangeriya nivîskî ye ku ji metropolan dest pê dike û li Bakurê Kurdistanê tê pêşxistin. Vebûna pêvajoya sêyemîn di vir de ye. Ya esas pêşketina li Bakurê Kurdistanê ye, lê di heman demê de ji bo Rojavayê Kurdistanê jî kovar û rojname hatine derxistin. Li Başûr jî wê demê xebata çapemeniya nivîskî ya mîna rojname, kovar, bultenê hatine meşandin. Feqet a esas, ya ku vekirineke berfireh afirand, pêşketin anî xebatên çapemenî-weşanê yên li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê bûn.

Heval van xebatan dizanin, dikarin bi berfirehî tevî detayan vebêjin. Feqet lazim e bê zanîn ku xebateke wisa ya weşanê bi vejîna civakî dest pê kiriye. Ev pir zêde nayê dîtin. Êdî ji ber çi be, di vê qada propaganda-ajîtasyonê de meyla ku hewl dide karan bi xwe ve bide destpêkirin pir zêde ye. Bi xwe li kû dest pê kiribe, wê mîna destpêka her tiştî û navenda wê dibîne. Yên ji derveyî wê tên paşguhkirin. *"Kî dike bila bike, yên ji derveyî wê piranî pêkanînên Rêbertiyê ne."* Ev nêzîkatiya înkarê ya li beramberî Rêbertiyê ye. Ev gelekî xeter e, ji ber vê jî em neçar dimînin ku her dubare bikin. Daxwaza Rêbertiyê ew bû ku di çarçoveya plansaziya Kongreya Sêyemîn de ji ser Ewrûpayê re ji milekî sewqa kadroyan ji bo Bakurê Kurdistanê çêbibe ku wekî xebatkarên girseyê bixebitin, li milê din jî û hê girîngtir li ser bingehê derxistina rojname û kovarê xebatên propagandayê dike biryar û di vê çarçoveyê de li ser vî hîmî amadekarî û desteka li Ewrûpayê ji dawiya payiza 1988'an ve li Stenbolê bi navê "Toplûmsal Dîrîlîş" kovarek bê derxistin. Her hal 6-7 jimar tên derxistin, piştre ji hêla sîstema faşîst qirker tê qepatkirin.

Piştî wê, dema ku di serê 1990'î de Şoreşa Vejîna Neteweyî di astekê de zext û çewsandina mêtinger şikand, serhildanan di her warî de serweriya mêtinger-qirker zeîf kirin, di vê ortamê de pêşiya xebatên demokratîk vebû, xebat hatin pêş xistin. Yek ji van siyaseta demokratîk bû. HEP hat damezrandin û bû rêxistinbûneke siyaseta demokratîk a heta roja me hatî. Dîsa di çarçoveya xebatên çand-hunerê de NÇM hat vekirin. Vebûna xwe derbasî Kurdistanê kir û heta roja me ya îro başxerab dewam dike.

Li qada propaganda-ajîtasyonê jî pêvajoya derxistin û pêşxistina organên çapemenî-weşanê dest pê kir. Bû vekirinek firehtir. Di bin navên cuda de rojname û kovar derketin, weşanên Tirkî derketin, dûvre Kurdî jî derketin. Wekî kovar a ku herî zêde nav li pey xwe hişt, *"Ozgur Halk"* bû. Wekî rojname *"Ozgur Gundem"* heye. Beriya wê bi navên mîna Ozgur Ulke weşanên demkurt hatin kirin. Bi Kurdî *"Azadiya Welat"* weşan dikir, ew jî bû heftane, lê di demên cuda de hewl hate dayîn ku rojane jî derkeve. Pirtûk hatin çapkirin. Her çiqasî ji metropolan jî dest pê kiribe, bû xebateke berfireh a propaganda-ajîtasyonê ku xwe gihand Kurdistanê, Kurdistan jî yekser bandor kir. Destpêka xebata weşanê ya ku di çarçoveya qanûnan de li Tirkiyeyê PKK'ê meşandî, ev e. Lê çapemenî-weşangeriya PKK'ê wê demê dest pê nake. Hin heval ji wê demê ve didin destpêkirin. Mîna ku 1990'î azadiya Kurd çêbûye, xebatên propaganda-ajîtasyonê dest pê kirine yan jî ew bi xwe ji cihekî cuda bûne nîşan didin. Ev nêzîkatî û feraset şaş e. Ev, bi bandora têkoşîna PKK'ê çêbû. Di atmosfera avakirî de ev weşangerî çêbû.

Li gel vê, ji vir ve wekî xebatên partiyê hatin kirin. Di 1988'an de hemû amadekariyên derxistina *"Toplûmsal Dîrîlîş"ê* min kir. Ekîba ku ew kovar derxist jî min şand Stenbolê û piştî wê hatim girtin. Jixwe Elmanya ne ji ber ku ez li Ewrûpayê xebatê dimeşînim, bê çima ez van xebatan dişînim Kurdistanê min sûcdar kir. Bi îdîaya ku li Tirkiyeyê, li qada mutefîkên wan

xebatên terorê têne meşandin ez hatim girtin. Rêbertiyê, di ser Ewrûpayê re ev xebat hemû araste kirin. Ti tiştek mîna ku hin li Stenbolê kom bûne, xwestine rojname yan jî kovarê derxînin, pêk nehatiye. Bi şiklê erkdarkirina Partî û Rêbertiyê çêbûn. Ew der wekî qadek têkoşîna mezin hate vekirin û pêşxistin. Bi rastî jî berxwedanek mezin hate kirin. Çend rojname hatin girtin? Her ku hate girtin yeka nû hate vekirin. Dema ku wisa nikarîbûn pêşiyê lê bigirin, vê carê jî yekser êrîşên eskerî pêk anîn, rojnamevan dan ber guleyan, nûçegihan qetil kirin, malên rojnameyê bombe kirin, belavkarî asteng kirin, qedexe kirin. Vê xebata çapemeniyê bi dehan şehîd da, birîndar çêbûn, bêhejmar hatin girtin. Lê li hember van hemûyan li ber xwe da, têkoşiya. Esas, qadek mezin a şer bû, qada berxwedanê bû û di wê çarçoveyê de berxwedan çêbû.

Bi sedan kadroyî xwe di nav wan xebatan de perwerde kir, pêş xist, hem xebat meşand hem jî bûn militan, dûvre tevlî nav refên gerîla bûn. Şervanî û fermandarî kirin. Hevala Gûrbetellî Ersoz (Zeynep) yek ji wan bû. Li metropolê, Stenbolê demeke dirêj berpirsiyariya van xebatan hemûyan kir. Piştre dema ku êrîşên dijmin zêde bûn, lêgerîna wê derket. Di encama vê de derket çiyê, tevlî gerîla bû, gerîlavanî, fermandariya gerîla kir. Ji bo wê ferqa wezîfeyan tine bû, ha li Stenbolê, Amedê rojnamegeriyê dike ha li çiyê gerîlavaniyê dike, hemû xebatên şoreşgerî bûn, wezîfeyên milîtanî-şoreşgerî bûn. Kîjan demê çi wezîfe dikeve ser milan, şoreşger ew wezîfe pêk tanîn. Dema guhertin lazim dibû jî diguherîn. Ne xebateke li derveyî xebatên şoreşgerî bû. Hinan nikarîbû wisa bikirana. Tenê wekî rojnamevan man. Niha yên tenê wekî rojnamevan mane xeta xwe dispêrên, israr dikin. Dibêjin, *"ya rast ev e"*, dibêjin *"me rojnamegerî pêş xistiye",* lazim e bi van neyên xapandin.

Li vir 2 xetên cuda hene. Ne wisa pêlîstoka zarokan e. Erê, li gorî xwe dixebite, lê wekî kadroyekî partiyê naxebite. Wekî rojnamevanekî dimîne. Li qada siyaseta demokratîk dimîne. Dema jê re tê gotin ka were qada gerîla, nikare were. Hâlbûkî

pîvana partîbûnê tevlîbûna gerîla ye. Ev pir eşkere ye. Li gel me qada ku cesaret û fedakarî di asta herî bilind de dimeşe, jiyana demokratîk komunal bê kêmasî teşe digire, ortama gerîla ye, jiyana gerîla ye. Pîvanên partiyê jî ev in. Cewherê pîvanên partiyê, pîvanên kadro ya ku Kongreya 3'yemîn kiriye biryar, şênber kiriye, PKK ji pîvanên sosyalîzma pêkhatî qut kiriye, ev e. Pîvanên rizgarbûna ji her cure mulkiyetparêziyê, takekesiyê ev e. Ji derveyî wê li ortaman madiyatperestî, mulkiyetparêzî û takekesî hene. Xwesînorkirina bi hin qadan heye. Şoreşgeriyeke komple tine ye. Di bûyîna kadroyê şoreşê de, di bûyîna milîtan de nîvcotî heye. Lazim e em vê rastiyê bibînin. Ferasetên ku tevlîbûneke wisa nîvco dispêrên me hene. Hinek ji van ji me dûr ketin û çûn nav rêxistinên din.

Xebatên çapemenî-weşanê ya ku me salên 1990'î bi navenda Stenbolê meşand, gelek rojnamevan perwerde kirin. Li Tirkiyeyê jî niha beşek ji kadroyên ku xizmetî çapemeniya Tayîp Erdogan dikin, ji perwerdeyên me derbas bûne. Hatin, perwerde dîtin, hinekî xizmet jî kirin, fêr bûn, dûvre çûn bi pere, bi mizê xizmetî cihekî din dikin. Beşek wan a mezin wisa ne. Hinek jî neçûn, lê li ser xeta Gûrbetellî Ersoz şoreşgerî nekirin. Li ortê radiwestin. Dibêjin, *"em jî wisa ne."* Ev jî dikare xetek be, xetek duyemîn a mîna *"tenê dikare xebatkariyeke çapemeniyê jî bê kirin"* dispêrin partiyê. Yên wisa dema ku tengav dibin dawiya dawî dest jê berdidin an jî derbasî xebatên din dibin.

Beşek wan, ên takekes madiyatperest, çûn rojnamegeriya sîstemê, beşek mezin jî di şoreşgeriyê de pêş ketin. Bûn şoreşgerên profesyonel ku her cure xebat meşandin. Çapemeniya azad ku ji 1990'î û şûn de li metropolên Tirkiyeyê, Bakurê Kurdistanê hate pêşxistin, wekî çawa xebatên xwe rêxistin kir, her wiha mîna qadeke girîng a xebata şoreşgerî, perwerde û rêxistinbûnê rol lîst ku kadroyên xurt ên partî gihandin, perwerde kirin, kadro tevlî partiyê kirin, tevlîbûna ciwanan a partiyê pêk anîn. Ev rastiyek e, wisa bi sedan milîtan hene,

fermandar hene, kadroyê partiyê hene. Bi sedan şehîdê vê xebatê hene, bi sedan milîtanên wê hene ku hê li qadên cur bi cur kar dikin. Ji şehîdan em behsa Gûrbetellî Ersoz dikin. Tabî lazim e em hevalê Elîşêr jî bijmêrin. Hevalê Alîşêr Koçgirî ku di serî de bi taybet di xebatên Ozgur Halkê de rol lîst, demek dirêj ev xebat meşandin. Hevalên din jî qederek in.

Vebûneke wisa li rex propagandaya çekdarî bi şiklê rojname û kovarê, çapemenî-weşan û propaganda kir yek, mezin kir, xurt kir. Orta 1990'î wextê weşangeriya MED TV jî lê zêde bû, di nîvê duyemîn ê salên 90'î de li ser civaka Bakurê Kurdistanê hem bandora gerîla hem bandora çapemenî-weşanê hem jî bandora MED TV perwerde û hişmendiyeke pir mezin ava kir. Ji hemû eniyan di carekê de yekser ji civakê re propaganda hate kirin. Rêbertiyê di ser televîzyonê re kir, di ser çapemenî-weşanên nivîskî yên Stenbolê re kir, bi pêşxistina gerîla kir. Rastiya Partî û Rêbertiyê bi giştî rehendên wê ve bi şiklekî karîger ji hemû civakê re ragihand, civak perwerde kir.

Heke piştre li beramberî êrîşên komploya navneteweyî civakê berxwedanake mezin nîşan dabe, tevî hemû êrîşên sîstema înkar û îmhayê jî civak ji xeta Rêbertiyê qut nebû. Eger li dijî komployê li dora Rêbertiyê kilît bû û têkoşîneke wisa xurt dabe, ev encama perwerdeya xebateke wisa ya propaganda-ajîtasyonê ye. Bawerî, îrade û hişmendiya ku vê xebatê daye, civak ber bi têkoşîneke pir mezin ve kişand. Ya ku nehişt Komploya Navneteweyî serketî bibe, vala derkeve, ev encam bûn. An, ti tiştekî din nikarîbû bafirandana. Eger perwerdeyeke wisa xurt û xebateke propaganda-ajîtasyonê ya ku ew pêk anî nîn bûya, astek hişmendî û rêxistinbûnek wisa xurt têdikoşe û li ber xwe dide, dernediket ortê. An civakê wisa ji ber xwe têkoşîn nemeşand. Ji ber ku hate perwerdekirin, ji ber ku ber bi fikrên rast ve hate kişandin, ev kir. Rêbertiyê û Partiyê bi wan xebatan ve giştî civak gihand asteke hişmendî û rêxistinbûneke ku li dijî êrîşên mîna komployê li ber xwe bide, têbi-

koşe. Xebatên propaganda-ajîtasyona li ser vî esasî bû. Bi rastî jî xebatên çapemenî-weşanê yên ku di salên 1990'î de ji metropolan derbasî Kurdistanê hatin kirin, tam mîna xebatek gerîla bibû mînakek mezin a berxwedanê. Lazim e em wan şehîdan bi rêzdarî bi bîr bînin. Ji Êlihê heta Stenbolê, heta Rihayê li her derê nûçegihan, mirovên ciwan ji aliyê tetîkêşên faşîst ên şerê taybet, ji hêla Hîzbûl-kontra li kolanan hatin qetilkirin. Avahî hatin bombekirin, lê çavên wan neşkest, bêdeng neman. Bi hêza ku ji tevgera giştî girtî, xeta şoreşgerî hê pêşdetir birin û bi xebata xwe ve perwerdeya civakê bênavber meşandin. Ha, berxwedana li dijî komployê li ser vî hîmî pêş ket.

## d-Pêvajoya Çaremîn:
## Xebatên Propaganda-Ajîtasyonê: Qonaxa YRD'ê

Heke ev di çarçoveya plansaziya ragihandinên me de were destgirtin, pêvajoya YRD'ê îfadeya pêvajoya çaremîn e. Di nav dema YRD'ê de mirov dikare çawa dabeşî pêvajoyan bike, ev dîrokçe çawa tê dayîn, ez nizanim, me pir zêde pêwîst nedît jî, me got jixwe heval dikin. Helbet pêvajoyek dirêj e. Di warê xebatan de li ser hîmê cudakirinên xwedî taybetmendiyên cewaz dibe ku ew jî di nav xwe de xwedî pêvajoyên cuda be.

Lazim e ev dîrokçe bê zanîn û fêrbûn. Em ê YRD'ê (Yekîtiya Ragihandina Demokratîk) hê zêdetir bi planeke giştî de binirxînin. Mîna rêxistinên HPG'ê, me hin vebûnên rêxistinî pêk anîn. Hin hevalan gotin, *"çima gotina Kurdistanê tê de nîn e"* û pir zêde îtîraz kirin. Me got, *"Kurdistan di PKK'ê de heye. Kurdistana PKK'ê bes e, lazim e rêxistinên cuda cuda tine bin."* Herî dawî di Konferansa 7'emîn a HPG'ê de hate gotin ku *"çi jî bibe em ê Kurdistanê bixin rêziknameyê".* HPG'ê danî. Di dawiya wê de Kurdistan jî heye. Tê gotin ku *"dema Kurdistan tê de nebe, dibe rêxistineke nediyar."* Feqet dema wisa dike jî dibe mîna rêxistinek cuda. Dikare mîna partiyek siyasî, tevgerek civakî ya

serbixwe bê nirxandin. Ev jî ji şaşiyê wirdetir, xeter e. Parçebûna rêxistinî hinekî jî wisa pêş ket. Her diçe zêdetir pêş dikeve. Me rê, şêweyekî rast nedît. Ji navkirinê heta naverokê kêmasiyên me hene. Me watedayîneke baş nekiriye. Ferasetên cur bi cur, li gor xwe hene. Di vê pêvajoya ji nû ve avakirinê de wekî şikil jî naverok jî hê pirsgirêk hene.

YRD çawa ket rojevê, em dikarin têkildarî YRD'ê çi bêjin? Di çarçoveya van pirsan de hin xisûs dikarin werin diyarkirin. Têkildarî beriya wê agahiyên me zêdetir bûn, me heval agahdar kirin. Esas lazim dibû ku têkildarî YRD'ê zêdetir bûna, lê nebû. Em detayên çapemeniyê yên demên beriya wê jî, yên di dema 90'î de li metropolan pêşketî jî zêde nizanin. Hevalên ku wê dizanin jî vedibêjin. Lê me wate, pênaseya wê ya gelemperî got. Têrê dike. Em ji bo YRD'ê jî wisa bikin ew ê bikaribe têrker bibe.

Rêya YRD'ê, bi biryara guhertin-veguhertinê ya Kongreya 7'emîn a PKK'ê hat girtin. Biryardariyeke girîng bû, kongreyeke girîng bû. Piştî komployê heta astekê rol lîst. Dema ku komplo pêk dihat, Partî di Kongreya 6'emîn de bû. Encama Kongreya 6'emîn li ser bingehê biryara pêşxistina berxwedaneke ku dikare îmhaya komploya 15'ê Sibatê asteng bike, bû. Dijmin behsa emrekî 6 mehan dikir. Kongreya 6'emîn jî karîbû plansaziyek berxwedana 6 mehan bike. Wisa nirxand ku eger plana îmhaya dijmin a ku arasteyî Rêbertiyê dike vala derkeve, piştre li gor rewşa derketî ji nû ve kongre dikare were çêkirin, biryardarî û plansaziya pêvajoyê dikare were derxistin. Li gor taybetmendiyên şertan ew ê bihatana diyarkirin. Di dema komployê de ev ne diyar bûn. Wezîfeya esas a wê demê astengkirina îmhayê bû. Ji ber vê jî biryara Kongreya 6'emîn li dijî komployê bû berxwedana fedaî ya topyekun.

Berxwedan hat domandin. Di mehên Sibat, Adar, Nîsanê de berxwedanake mezin çêbû. Bû berxwedaneke wisa ku tirs xist dilê dijmin. Herî dawî dijmin da xuyakirin ku ew ê mehkeme bike. Li gel Rêbertiyê têkilî hat danîn, îmha hat astengkirin. Di

dema mehkemeyê de berxwedana topyekun hat sînordarkirin, veguherî şerekî bi kontrol. Mehkemeyê cezayê îdamê da. Ji bo ku darvekirin were valaderxistin, li ser pêşniyara Rêber Apo rêzebiryar hatin girtin. Ji 1'ê Îlonê ve derbasdar, dîsa agirbesta bêdem hat ragihandin. Biryar hat dayîn ku hêzên gerîla derkevin derveyî sînor û pêvajoyek wisa hat destpêkirin. Komên aştiyê hatin şandin. Di propaganda-ajîtasyonê de li vê dihat miqatekirin û bi vî şiklî têkoşîneke ku pêş dibîne darvekirinê vala derxîne, di nîvê duyemîn yê 1999'an de hate meşandin. Di encama têkoşîneke wisa de kongreyeke nû hat lidarxistin. Ev dibû kongreya awarte. Piştî salekê dihat lidarxistin. Plana komployê ya di nava 6 mehan de îmhakirin û tasfiyekirina partiyê hatibû valaderxistin, lê gefa darvekirinê dewam dikir. Li dijî wê têkoşînek hatibû meşandin. Ev ê çawa bi encam bibe û xebatên piştî wê dê çawa bibe, Kongreya 7'emîn ev diyar kiribû.

Dema ku PKK'ê Kongreya 7'emîn li dar dixist, hikûmeta TC jî li ber şênberkirina pêkanînên têkildarî biryara darvekirinê bû. Bû pêvajoyeke beramber a civîn û biryarê. Li gor biryara hikûmeta TC'ê ew ê PKK'ê ji nû ve stratejî diyar bikirana. Rêbertiyê jî wisa pêş dîtibû, pêdiviyên pêvajoyê jî wisa bûn. Herî dawî di 11'ê Îlonê de hikûmeta koalîsyonê ya di serokatiya Ecevît de da xuyakirin ku ew ê biryara îdamê pêk neynin. Biryarek wisa girtibûn. Dan xuyakirin ku biryar girtine, ew ê dosyaya îdamê neşînin meclîsê, li Serokwezîrtiyê bigirin, wisa jî pratîkbûna wê asteng bikin. Li ser vê Kongreya Awarte ya 7'emîn a PKK'ê biryara guhertina stratejiyê da. Biryar da ku têkoşîna siyasî-demokratîk bimeşîne. Li gor pêdiviyên têkoşîna siyasî-demokratîk plansaziyek derxist ortê. Heta wê demê stratejiya şerê gel ê demdirêj dişopand. Biryar, plansaziyên Kongreyan, konferansan li gor şerê gelê şoreşgerî çêdibû. Ya esas şer bû. Wekî xebateke li kêleka şer xebatên propaganda, girseyê dihatin pêşdîtin. Lê ji sedî 95'ê biryar û plansaziyan li ser şer bû. Kongreya 7'emîn planeke wisa gu-

hert. Biryar da ku gerîla bi navê HPG'ê ji nû ve vesaz bike, dest ji stratejiya şerê gel ê demdirêj berda. Derbasî stratejiya têkoşîna siyasî-demokratîk bû û gerîla wekî yek ji xebatan pênase kir, wisa derbasî plansaziyê kir.

Wekî plansaziya stratejiya têkoşîna siyasî-demokratîk hin xebat derxistin pêş, plana xwe berfireh kir. Yek ji van xebatên girseyê, têkoşîna girseyê, xebatên perwerdeya gel bû. Çand-huner-wêje yek ji van xebatan bû. Bi şiklekî hevşib xebatên propaganda-ajîtasyonê jî mîna beşeke girîng a plansaziya kongreyê kir biryar. Plansaziyeke ji 7-8 beşan derxist, kongreyê qebûl kir. Yek ji van beşan jî bi şiklekî hê rêxistî û karîger pêşxistina xebatên propaganda-ajîtasyonê bû. Dema ku şerê gel ê demdirêj dihate meşandin, têkoşîn û rêxistinbûna esas, gerîla bû. Lewma jî propaganda-ajîtasyona bingehîn, propagandaya çekdarî bû. Lê belê, dema ku ev ji esasbûnê hate derxistin, propaganda-ajîtasyona çekdarî daket asteke kêmtir. Wê demê lazim dibû ku xebatên propaganda-ajîtasyonê bi amûrên din bi şiklekî bi bandortir bêne meşandin. Ji ber ku xebatên propaganda-ajîtasyonê nebin, rêxistin û çalakî jî nabe. Li qada siyaseta demokratîk ew ê rêxistin û çalakî pêş bikevin, lazim dibû ku xebateke wisa ya propaganda-ajîtasyonê bê meşandin ku xurt û bi bandor bike. Ev êdî nedibû ji aliyê propagandaya çekdarî bê kirin, wê demê lazim dibû ku di asta propagandaya çekdarî de xebateke çapemenî-weşanê bê pêşxistin. Xebateke çapemenî-weşanê lazim bû ku bandora propaganda-ajîtasyonê bike. Êdî propagandaya çekdarî nedibû. Pêwîst bû ku xebata propaganda-ajîtasyona li ser esasê çapemenî-weşana nivîskî hê rêxistîtir, karîgertir bihatana kirin.

Xebatên huner-wêjeyê jî hevşib bûn. Dihat pêşdîtin ku bi bandortir pêş bikevin. Ji bo xebatên aboriyê jî xwedî biryareke wisa bû. Ji bo xebatên gel jî mîna vê biryar dabû. Hin xebatên ku niha lazim e li gor rehendên neteweya demokratîk bêne meşandin, di Kongreya 7'emîn de ketibûn plansaziyê. Ne di vê astê de bû, ewqasî ji hev cuda nebibûn. Piştre, di çarçoveya

pênaseya konfederalîzma demokratîk de ew rehend hê bêhtir derketin pêş. Di pêvajoya Kongreya 7'emîn de vebûna yekemîn, guhertin-veguhertineke berbiçav çêbibû. Wekî pêdiviya wê lazim dibû xebatên çapemenî-weşanê xwe bigihandana asteke propaganda-ajîtasyona ku rêxistin û têkoşîn pêdiviyê pê dibîne. Gerek dikir ku di vê astê de bihatana rêxistinkirin û pratîkkirin. Rêxistinbûna piştî wê jî xwe spart vê biryarê.

Ev biryar di Çileya 2000'î de hat girtin. Di meha Nîsanê de yekemîn dibistana çapemeniyê vebû. Saziyên perwerdeyê ku heta wê demê tenê wekî dibistanên kadro dihatin pênasekirin wekî *"Dibistana Hunerê, Dibistana Wêjeyê, Dibistana Çapemeniyê"* hatin berfirehkirin. Ji bo perwerdekirina kadroyên hazir ku karibin li gor her beşa plansaziya Kongreyê xebatê bimeşînin, di havîna 2000'î de dibistan hatin vekirin, dewreyên perwerdeyê hatin destpêkirin. Beşek plansaziyê ew bû ku xebatên çapemenî-weşanê bigihêje asta rêxistinbûneke ku karibe wezîfeya propaganda-ajîtasyonê bimeşîne. Ji bo karibe kadroyê vê pêwîstiyê bigihîne jî dewreyeke perwerdeya çapemeniyê vekir. Pêvajoya perwerdeya dibistana çapemeniyê hate destpêkirin.

Heta astekê komasiya çawanî û çendahiyê hebû. Heke şaş nebim, nêzî 70-80 hevalan hebû. Ji nav şagirtên dibistanê hê jî yên di nav çapemeniyê de dixebitin hene. Lazim bibe têkildarî xebatên dibistanê, dewreya dibistanê dikare agahî ji wan bêne girtin.

Perwerdeya dewreyekê çêbû, lê encamên xebata perwerdehiya sala 2000'î mîna ku tê xwestin veneguherî rêxistinbûn û pratîkê. Ji ber ku şerê li dijî YNK'ê rû da. YNK'ê û Îranê li hev kirin, ji TC'ê destek girtin, xwestin Qendîlê dorpêç bikin û tevgerê teslîm wergirin. Li ser vê di Îlona 2000'î de bi giştî tevgerê li dijî YNK'ê şerekî dijwar meşand. Dibistanên navborî ji ber vî şerî hatin belavkirin. Hem ji ber şer hem jî ji ber ku perwerde hat asta ku nema dimeşe, belav bûn. Her wiha dibistanên kadro jî ji ber şer hatin belavkirin. Piştî şer enceq me

dikarî perwerdeyeke giştî ya kadroyan bidin meşandin. Çapemenî-weşan, çand-huner di encama şer de wisa man. Ji ber ku vî şerî heta nîvê zivistanê jî dewam kir.

Di bihara 2000'î meha Adarê de wekî rêveberiya partiyê me civînek plansaziyê li dar xist. Wê demê bi xwespartina encamên erênî yê şerê YNK'ê jî li ser bingehê biryardariya Kongreya 7'emîn me biryar da ku ji nû ve vebûnên rêxistinî bêne kirin, beşên xebatên cuda ên plansaziyê di nav xweseriya xwe de bêne rêxistinkirin û meşandin. Li ser vî bingehî pêvajoya ji nû ve rêxistinkirina xebatên çapemenî, xebatên çandê, rêxistinbûna gerîla ket rojevê. Beşek ji kadroyên ku berê perwerde dîtine û beşek hin kadroyên nû li hev kom bibûn ku van xebatan bimeşînin. Li ser esasê vê kombûnê em ber bi avabûnên rêxistinî çûn.

Sala 2001'ê bû saleke ku vebûnên rêxistinî, dezgehên rêxistinî hatin avakirin. Gerîla, bi konferansa meha Tîrmehê ve xwe bi navê HPG'ê ve ji nû ve ava kir. Bi konferansên di çarçoveya Qada Îdeolojîk de jî xebatên çapemenî û çand-hunerê hate rêxistinkirin. Li çiyê, li qada Xinêrê di meha Hezîranê de me cara yekemîn konferanseke çapemeniyê li dar xist. Piştre cara yekem konferansa çandê hat lidarxistin. Wisa jî saziyên rêxistinî yên ku kongreyê pêş didîtin hatin damezrandin. Wekî nasnameya rêxistinî ya xebatên çapemenî-weşanê saziya YRD'ê hat biryardan. Wekî xebatên çandê jî TEV-ÇAND hat biryardan.

Konferansa çapemenî-weşanê têkildarî xebatên qadê wezîfedarkirineke berfireh derxist. Li ser bingehê pejirandina rêveberiya Partiyê, rêveberiyek hat diyarkirin. Wê demê em kordînasyona partî bûn û ev di bin venêrîna kordînasyonê de dihat meşandin. Di van konferansan de ez dîwana yekemîn a konferansa çapemeniyê me. Me biryara damezrandina YRD'ê da. Her çiqasî em dibêjin em detayên YRD'ê nizanin jî, em ne ewqasî dûr in. Me xebatên çapemeniyê nedikir, lê em kordînasyona partiyê bûn, heman demê komîteya qada îde-

oljîk bûn. Me herdu pev re dimeşandin. Hingê rêveberiya partiyê wezîfeya kordînekirina xebatên qada îdeolojîk dabû kordînasyona giştî. Rêbertiyê jî hem kordînasyontiya giştî dikir hem jî xebatên îdeolojîk dimeşandin. Piştî Kongreyê hatibû pêşdîtin ku rêveberiya Rêbertiya giştî Partiyê ew ê li gor rêxistinbûna partiyê be, kar ew ê li ser wî bingehî baştir bê birêvebirin. Di sala 2001'an de jî wisa dewam kir. Lewma jî me ji 7 kesan rêveberiyeke YRD'ê ava kir. Plansaziyek berfireh derket ortê. Me qad diyar kirin. Hê rêxistin, tevgerê piştî komployê xwe tam bi sîstem nekiribû. Mesela ew ê rêxistinbûn çawa bûna; me ev ewil li ser çapemenî, çandê ceriband; çar parçe Kurdistan, çiya, derveyî welat, Ewrûpa, Rûsya wekî 6-7 beşên qadên xebat û rêxistinbûnê hatin diyarkirin, plansazî derket ku xebat li gor vê avaniya rêxistinî bê meşandin. Piştre rêxistina giştî jî xwe li gor vê plansaziyê plan kir. Plansaziya wê jî li ser vî esasî bû. Ev gihiştin hev, bûn yek, hevpar bûn.

Me biryar da, Akademiya Gûrbetellî Ersoz a ku wekî sîstemeke akademîk kadroyên di van xebatan de karibin her bên perwerdekirin û amadekirin, wekî akademiyeke kadro bê vekirin û xebatan bimeşîne. Ev avabûn bû vebûneke girîng. Hedef dikir ku xebatên çapemenî-weşanê yên PKK'ê bi şiklekî rêxistî bi rê ve bibe. Xebata ku hevalê Mazlûm xwest di 1979'an de wekî yekîtiya perwerde û propagandayê rêxistin bike, di 2001'ê de wekî YRD xwe gihand nasnameyeke rêxistinî û şênber kir. Esas bû damezrandin û rêxistinkirina yekîtiya perwerde û propagandayê. Ne rêxistinbûneke cuda bû, beşek ji xebatên partiyê hatibû rêxistinkirin. Ji ber vê jî bû YRD, bû TEV-ÇAND, bû HPG. Li gel Kurdistanê, heke bibe rêxistineke cuda ya ku welat û gel digire nava xwe, ew mîna rêxistineke cuda ya îdeolojîk û siyasî dibû xwedî pênaseyê. Halbûkî ev rêxistinên PKK'ê bûn.

Ne KCK bû jî, jixwe di wan deman de KCK nîn bû. Pêvajoyeke guhertin û veguhertinê ya ber bi KCK'ê ve hatibû destpêkirin. Kongreya guhertin û veguhertin da destpêkirin, li

gor stratejiya têkoşîna siyasî demokratîk biryara ji nû ve rêxistinkirina PKK'ê da, Kongreya 7'emîn bû û piştî wê jî bû pêkanîna vê biryarê. Ango pêvajoya gav bi gav guhertin û veguhertina di zihniyetê de, di terzê xebatê de bû.

YRD wekî rêxistinbûna pêvajoyeke wisa derket ortê, ava bû. Komasiyeke têrker hebû. Nirxandinên konferansê hatin rêkûpêkkirin, bûn pirtûk, têrker nîqaş çêbûn. Qada îdeolojîk bû, wekî çawanî û çendanî tevlîbûneke têrker hebû. Ji xebatên cuda jî tevlîbûn hebûn, lê esas ji xebatên çapemenî-weşanê tevlîbûn hebûn. Ji Ewrûpa, Tirkiye, Başûrê Kurdistanê ku heta wê demê li van deran xebatên çapemenî-weşanê zêde bibûn, hatin û tevlî bûn. Delege hatin. Wisa jî di warê çawanî û çendaniyê de pêkhateyeke têrker hebû, wextekî baş hat veqetandin û nîqaşek baş jî hate meşandin. Dikare li encaman bê mêzekirin, wekî naverok baş e, plansaziyên wezîfeyan têrker e, armanc baş hatine diyarkirin. Yekgirtineke rêgezan derketiye holê. Tabî rêxistineke partiyê li gor rêziknameya partiyê tevdigere. Lê ew ê li gor kîjan beşan bihatana rêxistinkirin, tevî girêdayî rêxistina partiya giştî ye jî ew ê têkiliyên navxweyî çawa bûna, ew jî diyar kiribû. Damezrandina YRD'ê wisa bû.

Xebatên qada îdeolojîk wê demê jî li Xinêrê dihate birêvebirin. Di civîna Adarê de me wiha plan kir. Navenda xebatên siyasî, girseyî û xebatên eskerî ew ê Qendîl bûna. Kordînasyon û xebatên Qada Îdeolojîk wekî navend ew ê li Xinêrê bûna. Li gor vê, em piştî Newrozê ji Qendîlê derbasî Xinêrê bûn, domahiya salê jî me ev xebat rêxistin kir û meşand. Dibistanên kadroyan jî derbasî wir bûn û bûn yek. Piştre navê Dibistana Navendî ya Partî ya Mazlûm Doganê girt. PAJK'ê xebatên xwe veguhestin wir. Partîbûna jinê bi temamî derbasî Xinêrê bû. Xebatên xwe yên îdeolojîk li wir ava kir. Wisa jî di giştî de xebatên partî, xebatên kordîneya îdeolojîk a partiyê û di xweseriya jinê de li Xinêrê kom bûn. Dihate gotin ku *"li Xinêrê ev kar nabin",* ji ber vê li ser radiwestim. Rewşeke girêdayî rêxistinbûn û meşandina kar wê demê hebû, ji ber xwe rêxistin

dikir, xebateke rêxistî dimeşand. Kadro û komîteyên wezîfedarkirî rol dilîstin, xwedî lê derdiketin. Dema wisa dibû, xwe bi rêxistin dikirin, amade dikirin û dimeşandin.

Yek ji qadên ku di warê terzê xebatê de xwe li gor rewşa guherî baş neguncandî jî çapemenî bû. Bi halê heyî amadekariyên wê tine bûn, ji ber wê her tim cih guhert. Ji ber ku xwe li gor pêdiviya pêşketinên eskerî di wextê de amade nekir. Xebatên pêwîst ên binesaziyê nemeşandin. Ket nav nêzîkatiyeke wisa seresere. Ji ber wê niha zorahiyê dikşîne. Li kû dibe jî zorahiyên hevşib derdikevin. Mijarên ku lazim bû beriya 4-5 salan bixe rojeva xwe, hê niha dike. Dikare bike, gelo ew ê serkeve, ne diyar e. Hin gavên derengmayî hewl dide enceq niha bavêje. Di vî warî de nebesî, ji pêşketinan qutbûnî heye.

Piştî konferansê, beşek ji pêkhateya konferansê, li gel tevlîbûnên nû dewreya yekemîn a Akademiya Gûrbetellî Ersoz hate avakirin. Di havîn, payiza 2001’ê de dewreya yekemîn a Akademiya Gûrbetellî Ersoz yek ji akademiyên xwedî perwerdeya herî berfireh bû. Komasiya çawanî û çendaniyê baş bû. Tê bîra min, gelek pirsgirêkên partiyê me li wê akademiye nîqaş kiribûn. Ji ber ku pirsgirêkên felsefîk-îdeolojîk hebûn, êdî zexta komploya navneteweyî bêhtir dihate hîskirin. Di hêvî, baweriyê de şkestin hebûn. Wisa jî gelek pirsgirêkên îdeolojîk û rêxistinî di asta ferd de derdiketin ortê. Akademiya Gûrbetellî Ersozê sedemê vê mîna dibistaneke felsefeye nîqaş kir. Di destpêkê de bi navê DAB (Yekîtiya Ronakbûna Demokratîk) akademiyeke me ya xebatên teorîk dimeşand hebû, mîna niha Akademiya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan. Komek hevalên xwedî ezmûn û komasiya teorîk civiyabûn, mijarên wisa jî nîqaş dikirin. Li milekî bi wê re li wir, li milekî jî li Akademiya Gûrbetellî Ersozê ev pirsgirêkên felsefîk-îdeolojîk, psîkolojîk-sosyolojîk dihatin nîqaşkirin.

Payiza 2001, zivistana 2001-2, heta pêvajoya piştî 2002’yan jî wisa derbas bû. Nîqaşên li gor pêwîstiya demê bûn. Dibe ku ne pirsgirêkên pir rêxistî, bi sîstem bin; me pir ni-

karîbû kom bikin û ji bo pêvajoyên nû veguhezin, lê nîqaşên ji bo pêdiviya rêxistinê bûn, bi armanca hin çareseriyan hatin kirin. Girîng bû, hê jî dikare wisa bê nirxandin. Di nav xebatek wisa de ku nîqaşên teorîk, têkoşîna îdeolojîk, perwerdeya kadro digire nava xwe, dewreyên Akademiya Gûrbetellî Ersozê jî roleke girîng lîst. Di dema yekem de dewreya yekem, dema duyem de dewreya duyem hat vekirin, plansaziya perwerdeyê wisa pêş ket. Bû sîstemeke akademîk ku ji bo fêmkirina ferd û civakê ev mijar xistin rojeva xwe, nîqaş kir û nirxand.

Xebatên çapemenî-weşanê li ser bingehê konferansek wisa û Akademiya Gûrbetellî Ersozê xwe gihand asteke nasnameya rêxistî û xebatên rêxistî, rêveberiya wê têrker bû. Wê demê hevalê Karasû berpirs bû ku xebatên Qada Îdeolojîk bimeşîne, heman demê, ji bo xebatên çapemeniyê jî wezîfedar bû. Xebatên DAB'ê dewam dikir. Hevala Sara xebatên çandê dimeşandin. Komîteyeke me ya Îdeolojîk a wisa ji 7-8 kesan pêk dihat, hebû. Di nav wê de hevalên ku wezîfeya kordînasyona partiyê dimeşînin jî hebûn. Heta payiza 2001'ê vê wisa dewam kir.

Di payiza 2001'ê de me kordînasyon da tevgera gel. Di hin mijaran de pirsgirêka xebitînê rû da. Di xebatan de hê zêdetir xebatên gel derdiketin pêş. Wezîfedarkirin ji hêla tevgera gel hat kirin, hate gotin ku bila rêveberiya qada îdeolojîk bike. Nebû xebitîneke pir baş. Dema ku nehat zanîn kî li kû wezîfedar e, nehate meşandin. Bi lêgerîneke ku bila baştir bixebite, me guhertineke wisa kir. Li gel vê, milên zorlêker ên takekesî yên kesayetên mîna Ferhat hebûn. Dixwest xwe bike navenda her tiştî, te çi dikir jî mudaxeleyî her derê dikir. Heke mudaxele dikir, bibûya berpirsê wê jî ew ê baş biba. Ew ê pratîk mudaxele bike, di fermiyetê de nebe berpirs, berpirsiyariya kirinên wî ew ê hinên din hilgire, ev jî ne rast bû. Pêşdîtina me hinekî jî bi dibetiya çareseriya van pirsgirêkan bû. Piştî Konferansa 6'emîn, kordînasyon bi kordînasyona tevgera gel re bû yek. Wê demê kordînasyona qada îdeolojîk cuda bû, şênber bû.

Kordînasyona partî nebû, qada îdeolojîk a partiya me ev jî meşandin. Mîna akademî, Dibistana Navendî ya Partî ya Mazlûm Doganê, çand, çapemenî, DAB'ê; navenda PAJK'ê jî bi şiklê rêveberiyek hevpar a Qada Îdeolojîk bû.

Di nav vê de çapemenî hem di pêşxistina rêxistina navendê de bi bandor bû hem jî li çar parçe Kurdistanê, derveyî welat, qadan ji rêxistinbûna qadek wisa ya îdeolojîk re pêşengtî kir. Jixwe organên wê hebûn, xebatkarên wê yên kadro hebûn. Wan sîstemeke nû qezenc kirin û wisa xebat meşandin. Xwedî sîstem û rêxistinbûnekê bûn. Xebat dihatin meşandin, hin encam jî derketin ortê. Di warê naverokê de bes an nebes dikare were nîqaşkirin, bibe mijara rexne-rexnegiriyê, lê xebatek hebû. Dewreyên Dibistana Navendî ya Partî ya Mazlûm Doganê wekî dewreyên berfireh berdewam kirin. Perwerdeyeke geş a kadroyan hem wekî çawanî hem jî çendanî hatin kirin. Li gel vê Akademiya Gûrbetellî Ersozê dewreyên çapemeniyê vekirin, kadro perwerde kirin, di heman demê de xebatên çapemeniyê rêxistî û bi sîstem bû. Li qadan xebat dihatin meşandin. Organên çapemeniyê, xebatên televîzyon, kovar, rojname, radyo, Ewrûpa, Bakur, Başûr, Rojhilat, Rojava û xebatên çiyê gihiştin wê astê ku hê zêdetir piştgiriyê bidin hev, di warê rêxistinî de baştir bê kordînekirin.

DAB'ê hin nîqaş meşandin. Di ronîkirina hin mijarên teorîk û çareserkirinê de asteke wê jî hebû. Di vê çarçoveyê de heta astekê xebatên qada îdeolojîk hin encam didan. Ji bo wê demê dikarim van bibêjim. Kelecan, coşek hebû, plansaziya gelek wezîfeyan dabû pêşiya xwe. Rewşeke wisa hebû ku ev xebat hevûdu xurttir destek bikin û plansazî hevpar bimeşin. Heta astekê xebat hatin kirin.

Ev rewş bi tasfiyegeriyê serobino bû. Ji dawiya 2002'yan û şûn de pêvajoyeke wisa pêş ket. Di 2003'yan de zêdetir diyar bû. Di sala 2004'an de gihişt asta krîzek rêxistinî, êrîşeke ku hebûna partiyê tehdîd dike, dixe nav talûkeyê. Di dawiya 2003'yan de bi damezrandina Kongra Gel ve, bi nêzîkatiyên ku

guhertina nasnameya partiyê îfade dike û bi firsendperestiyê ve bandora êrîşên tasfiyeger, pêvajoyeke wisa ya krîzê rû da. Di van pêvajoyan de yek ji qadên ku herî zêde li ser hate nîqaşkirin jî çapemenî bû. Çapemenî qadeke bi bandor bû, heta astekê gurçûpêçiyeke wê ya perwerdeyê hebû. Di pêvajoya Kongra Gel de li dijî tasfiyegeriyê heta astekê bû xwedî seknekê.

Feqet, tasfiyeger bi zêdehî li ser Komîteya Çapemeniyê disekinîn. Wekî çawa ku bandora wê li ser gelek xebatan heye, li rêveberiya Komîteya Çapemeniyê bicihkirina hin ûnsûrên tasfiyeger, di wê demê de bandorên tasfiyeger xiste nav qada çapemenî-weşanê, rêxistinbûna YRD'ê. Her çû di nav xebatê de rewşeke serobinobûnê bi berbelavî ket rojevê. Qada çapemeniyê, sekna xwe ya ku di serî de dema tasfiyegerî pêş diket bi spartina perwerde û rêxistinbûna xwe ve li dijî tasfiyegeriyê nîşan da, nema dikarîbû nîşan bide. Lê xwedî komasiyeke kadroyan bû, perwerdeyê bû, seknek îdeolojîk û rêxistinî bû. Li dijî tasfiyegeriyê bi van ve seknek nîşan dabû, lê bi van bandorên navborî ve serobinbûnekê rû da.

Piştre ji bo jinûve avakirina PKK'ê, damezrandina KCK'ê, di pêvajoyên jinûve vesazkirinê de bi taybet ji bo xebatên çapemeniya Tirkiyeyê bimeşîne hin kes hatin erkdarkirin. Di têkoşîna dijî komployê de hin rol lîstibûn. Bi fikrê ku dikarin gelek derdorên rewşenbîr kom bike, li gel hev bigire, her wiha êrîşên komploger lawaz bike, Rêbertiyê xwest hin wezîfeyan bide hin derdorên rewşenbîr ên li Tirkiyeyê. Mesela Pinar Selek yek ji wan bû. Dema ku ev erkdarkirin bi êrîşên tasfiyeger ên li dijî Komîteya Çapemeniyê re bûn yek, zirar da qada çapemeniyê.

Tevî hemû kêmasiyan jî li Ewrûpayê rêxistinbûnek hebû. Li Tirkiyeyê boneyî Bakurê Kurdistanê rêxistinbûneke diyar, kadrobûyînek ava bibû. Kadrobûyîna çapemeniyê ya li Tirkiyeyê di nav xwe de bibû wekî meylekê. Kadrobûyîneke burjûwaya biçûk ya ku xwe hê zêdetir bi çapemeniyê îfade

dike, hewl dide xebatên çapemeniyê di destê xwe de bigire, derketibû ortê. Rewşeke takekesî îfade dikir ku bi milekî li ba partî ye, gelemperî li dijî xebatên belavkirina partiyê radiweste, lê li milê din jî pir zêde xwe esas digire, xwe navendî dike, bi partiyê re tam nabe yek. Formîlasyona kadroyekî ku xwe ferz dike, mîna Bakî Gul û hin jin hebûn, wisa pir zêde li gel xwe navendî kiribûn. Dema ku Pinar Selek ji jor ve li gel van hate wezîfedarkirin, hê zêdetir serobino bû.

Rêxistinbûna çapemeniyê ya li Bakur û Tirkiyeyê girîng bû, qada bingehîn a rêxistinbûyînê bû. Yek ew ya din jî Ewrûpa bû. Rewşa li her du qadan gelemperiya xebatên çapemeniyê bandor dikir. Esas li beramberî Pinar Selek bertek çêbûn, lê ew bertek ne li ser hîmê parastin, pêşxistina xeta partî bû. Li ser xeta takekesî burjûwaya biçûk a bi şiklê, *"em li vir in, em rêxistî ne, em dizanin"* bû. Lewma jî têkoşîneke rast nehat meşandin. Li dijî ferasetên ku Pinar Selek dixwest pêş bixîne, sekneke rast a li gorî xeta partiyê nehat nîşandan. Bi heman şiklî nebe jî tersa wê sekneke li ser bingehê takekesiya burjûwaya biçûk pêk hat. Lewre jî helwesteke ku tasfiyegeriyê dinirxîne, rexne dike, pêşî lê digire, wisa xeta partiyê dimeşîne derneket. Leqîna zêdetir, parçebûna zêdetir, bandora kûr a takekesî, xeta çapemenî-weşanê ya ku salên 90'î li Tirkiyeyê gelemperî piştî 1970'yan bi xebatên partî hatiye avakirin, di rêxistinbûnê de, sekna kadro de, dîsa naveroka îdeolojîk-polîtîk de hat serobinokirin, parçekirin.

Pinar Selek ev eşkere digot, *"em li holê ne, cihekî mabeyna dewlet û PKK'ê ne. Em nikarin li gor xeta PKK'ê bixebitin. Azadiya çapemeniyê heye. Azadbûn tê maneya qutbûna ji partiyê."* Tabî ew rewşenbîrek bû, bibû dost. Bi armanca ku ew ê dostan kom bike, Rêbertiyê ew wezîfedar kiribû. Lê mîna ku hemû raye dane wê, yên ku xebat dimeşandin jî digotin, *"ev çima wisa bû"* û bertek nîşan didan, dixwestin bixin bin yekdestiya xwe. Ne ku di warê rastkirina şaşiyê de parazvanên rastiyê bûn, bi şiklekî zehf takekesane şaşiyên xwe derxistin pêş. Xeta

rêxistinî, îdeolojîk, polîtîk û xebatên li ser vî esasî pêşketî bêtir zirar dîtin. Dikare wisa were îfadekirin.

Mudaxeleya ji navendê, avakirina Komîteya Çapemeniyê, di asta YRD'ê de mudaxelekirin, sererastkirin tam têra vê nekir. Hin mudaxele çêbûn, lê ne bi şiklekî rastker, bergirî, dikşîne rastiyê, kontrolker bû. Sekin û terzeke ku zêdetir îdarekar, pir zêde pêşiya berbibabûnê nagire, lîberal di binyeya YRD'ê de hakim bû. Dema wisa bû qada çapemeniyê veguherî qadek qayişkêşî û gengeşiyê.

Di 2001'ê de konferansek hat lidarxistin, her du salan carekê konferansek dihat lidarxistin. Di 2003'yan de konferansa duyemîn hat lidarxistin. Asteke wê hebû, di 2005'an de konferansa sêyemîn hat lidarxistin. Konferansa 2005'an bû şahide nîqaşeke cidî. Hem di warê xeta îdeolojîk-rêxistinî de nîqaş hebûn, hem wekî plansazî hem jî di warê rêveberiyê de ew ê kî rê ve bibe, hatin nîqaşkirin. Xeta weşanê hat nîqaşkirin. Di dawiyê de dema ku biryar hat girtin me gotibû, *"xeta me ya weşanê çi ye, em xetê diyar bikin."* Belgeyeke xetê ya bi 9 xalan di wê konferansê de derketibû. Lê ev bi nîqaşên gurûgeş pêk hatibû, ji ber ku teriqîn hebûn. Her kesekî li gor xwe pêşikek xwe çêbibû. Ji xeta partiyê zehf hatibû ketin. Ji pozisyona rêxistina partî, xebata partiyê qederekê dûr ketibû. Baş tê bîra min. Yekemîn; dayîna rastiya Rêbertiyê bû. Ya duyemîn; dayîna têkoşîna Partî-gerîla bû. Me ev jî kiribû rojev, ji ber ev bi xwe jî bibûn mijarên nîqaşan. Takekesane, ligorxwebûn gihiştibû asteke pir zêde.

Wek nimûne, tê bîra min me li ser Başûr nîqaş kir, hevalên hê di nav me de hene, ji ber ku hinan jî berdan. Derxistina kovarê qebûl nedikirin. Digotin, *"li Başûr kovara îdeolojîk nabe, her kî yê bike, bila were bi xwe bike. Tenê em dikarin propaganda bikin, bultenekê derxin."* Ango dixwestin bulteneke hevşibî PDK û YNK'ê derxînin. Lê belê em ne rêxistinên PDK û YNK'ê ne. Em ne hêzeke wisa ne ku kirinên PDK û YNK'ê bi navê PKK'ê propaganda bikin. Em hêzeke wisa ne ku xebatên PKK'ê

propaganda dikin. Em li ser vî bingehî hêzeke têkoşîna îdeolojîk in. Li ser vî hîmî jî têkoşîna îdeolojîk herî zêde li Başûr lazim e. Ji ber vê yekê, cihê ku herî zêde têkoşîna îdeolojîk, organê teorîk-îdeolojîk lazim dike xebatên Başûr e. Rêbertî digot, *"eger navê PKK'ê jî biguhere, lazim e ev nav li Başûr neguhere. Pêwîst e PKK Başûr bimîne û mabeyna PDK-YNK'ê têkoşîna îdeolojîk bimeşîne."*

Di wê çarçoveyê de jî hin li ber ba ketibûn. Nêzîkatiyeke ku pir zêde xwe wekî rehendekî digire dest, lewma jî wekî rêxistinek KCK'ê mêze dike, sekna xwe ya îdeolojîk daxistiye xeta welatparêziyê, sîstema kadro û xebata rêxistinî bi şiklê KCK'ê pênase dike, derdiket. Ev serwer dibû. Wisa jî çapemenîweşan, qada propaganda-ajîtasyonê nedibû organê sekna îdeolojîk, pêşengiya îdeolojîk, têkoşîna îdeolojîk. Xeta welatparêziyê diyar dikir, şênber dikir ku ew jî ber bi xeteke di rêjeya KCK'ê de dikare sekneke îdeolojîk û têkoşîneke îdeolojîk bimeşîne. Ji ber vê yekê bû ku me xeta weşanê ewqasî xist nav rojeva nîqaşê, ewqasî organên weşanê nîqaş kirin.

Ya ku kadroyên PKK'ê pêk anîn, konferanseke çapemeniyê bû, pêkhate wisa hatibû avakirin, lê cewaziyên ferasetê zehf çêbibûn. Komikî bibûn. Lewma jî YRD'yek çawa? Felsefe çi ye, îdeolojî çi ye, siyaset çi ye, rêxistin çi ye, lewre ew ê pratîka wê çawa pêş bikeve? Ev hemû hinekî di nîqaşê de bûn. Ez dizanim ku me nîqaşeke kûr meşandibû. Heval Fûat wan jî hebûn, ji bo şênberkirina gelek mijaran me nîqaş meşandin. Ji bo derbaskirina bandorên tasfiyekar hin biryar hatin girtin.

Feqet di pêkanînê de pir têrê nekir. Rêveberî serî pê re derneket, pir zêde têkoşîna îdeolojîk nehat nîşandan. Li ser wê dîsa vesazkirinên komîteyê çêbûn. Hevalê Karasû jinûve tevlî wezîfedarkirina komîteyê bû. Qada îdeolojîk li gor vê dîsa hat rêxistinkirin. Têkoşînek wisa dihat pêşdîtin ku bandorên lîberal ên navborî hem di xetê de hem di rêxistinbûnê de kêm bike, bide derbaskirin. Di 2007'an de hin guhertin çêbûn. Piştî wê di meşandina perwerde, rêxistinbûn, pratîkê de demek dirêj

aktîvîteyeke diyar a rêveberiyê rol lîst. Piştre di 2015'an de wekî guhertinên komîteyê hevalê Kasim Engîn tevlî bû. Hevalê Karasû hem di hevserokatiyê de bû hem jî di komîteyê de bû; me got ev nabe. Lewma jî di komîteyê de hin guhertin çêbûn. Hêvî û hesap hatin kirin ku dibe di mijarên naverokê de jî hin guhertin çêbibin. Feqet ew pir zêde pêk nehat. Zihniyet û sîstemek çêbibû, terzek çêbibû, rûniştibû, wê dewam kir.

Bi civîna navendî ya payiza 2018'an ve me hewl da hin guhertinan bikin. Komîteya berê got, *"em êdî nikarin bimeşînin."* Hevalê Kasim her hinekî tevlî xebatên komîteyê dibû, dema ku kêmekî têkildarî xebatên çapemenî-weşanê rexne hatin jî her got, *"bi vî şiklî ez nikarim bimeşînim, nikarim bibim komîte, lazim e ez bêm guhertin."* Piştî yek-du salên destpêkê, her tim ev anî rojevê. Hema hema di her civîna partî de yek ji qadên ku herî zêde hat rexnekirin, çapemenî-weşan bû. Li gor xwe çavdêriyek xwe heye, feraseteke xwe ya partiyê heye, li ser wî esasî asta propaganda-ajîtasyonê dibû mijara rexneyê. Her ku xebatên siyasî, rêxistinî, eskerî hatin rexnekirin; wekî yekemîn berpirsê van nebesiyên xebatên îdeolojîk ên xebatên propaganda-ajîtasyonê hatin rojevê. Rexneyên têkildarî pratîkê, di encam de wekî rexneyên li ser xebatên propaganda-ajîtasyonê, têkoşîna îdeolojîk şênber dibûn.

Destpêkê rexne wekî nebesiyên pratîkî tên rojevê, dema ku nîqaş kûr dibin, derdikeve ortê ku sedema wê lawaziya îdeolojîk lewma jî nebesiyên xebatên propaganda-ajîtasyonê, perwerdeyê ne. Ya berpirs qada îdeolojîk e, ya berpirs xebata propaganda-ajîtasyonê ye. Weşan-çapemenî ya ku saziya herî bingehîn a perwerdeyê ye, wekî qada saziya têkoşîna îdeolojîk, dibe serkêşê rexnegiriyê. Ji ber ku di vê demê de êdî saziya yekemîn a ku propaganda-ajîtasyon lê tê meşandin saziya çapemenî-weşanê ye. Di salên 1970'yan de saziya propaganda-ajîtasyona devkî diyarker bû. Di salên 1980'yan de propaganda û ajîtasyona çekdarî diyarker bû.

Ji salên 1990'î ve bi vekirina MED TV'yê, dema ku bi navendîbûna Stenbolê bi şiklekî legal li Tirkiye, Bakurê Kurdistanê derxistina kovar, rojnameyê hat rojevê, pêşikî û diyarkeriya çapemenî-weşanê ya di propaganda-ajîtasyonê de ket rojevê. Piştî komployê, dema ku di Kongreya 7'emîn de stratejî hat guhertin, stratejiya têkoşîna demokratîk esas hat girtin jî li gorî stratejiya têkoşîna demokratîk organê bingehîn ê xebata propaganda-ajîtasyonê çapemenî-weşan bû. Qada ku wekî kovar, rojname, radyo û televîzyon şênber bû, qada ku yekemîn berpirsê propaganda-ajîtasyonê, di propaganda-ajîtasyonê de diyarker bû, ev qad bû. Lewma jî ya li ser pêşketina xebatên pratîk, xebatên rêxistinî-çalakiyê bandor û diyar dike, propaganda-ajîtasyon bû. Qaîdeya ku me destpêkê diyar kiribû, li vir jî xebitî. Çiqasî propaganda-ajîtasyon, ewqasî rêxistin û çalakî! Nebesiyên di qada rêxistin û çalakiyê de dema ku ketin rojevê, bûn nîqaş; rastiya ku rêxistin, rêveberiyên vê qadê berpirs in, derket pêş. Xebatên propaganda-ajîtasyonê jî qasî rêveberiyên wan qadan berpirs hatin dîtin. Lewma jî hatin rexnekirin. Bi şiklekî xwezayî berpirsên xebatan hatin dîtin, wekî çawa di pêşketinan de para wê heye, her wiha wekî çavkaniyên serneketinan, nebesiyan û xetayan jî hatin rexnekirin.

Rêveberiyên qadên din ên xebatê, qadên xebata rêxistinî-çalakiyê jî li derveyî rexneyê neman. Ew jî hatin rexnekirin, lê wekî çavkaniya xeta û kêmasiyên di heman xebatan de nebesiyên xebatên propaganda-ajîtasyonê hat dîtin. Lewma jî qada çapemenî-weşanê jî ji heman xeta û nebesiyan berpirs hate dîtin û rexnekirin. Bi şiklekî xwezayî berpirsê nebesiyên pratîkî, xeta û nebesiyên çapemenî-weşanê hatin dîtin, her tim di her civînê de qada çapemenî-weşanê ket çarçoveya rexneyan. Rexne wekî çawa li ser qadên xebata pratîkî kom bûn, her wiha ji ber van lawaziyan li ser çapemenî-weşanê jî hat sekinandin.

Komîteya Çapemeniyê her tim li ser bingehê van rexneyan ket rojevê. Komîteyê xebitîna rêxistinî ya heyî kir rojev û rexne

kir. Li beramberî van rexneyan Komîteyê diyar kir ku ne xwedî însiyatîf e, sîstema heyî însiyatîfeke têrker nade komîteyê, derfetê nadiyê, nikare bibe komîte, lewma jî ew ê nikaribe bi sîstemeke wisa re bimeşe; guhertina sîstemê nebe, pêwîstiya guhertina kesan xiste rojevê. Hevalên ku ji komîteyê berpirs in guhertina wezîfeyê xwestin. Di çend civînan de hat nirxandin ku lazim e bên rexnekirin, têkoşîn bê meşandin, feraset û pîvanên rast bên pêşxistin. Feqet dema ku israr çêbû, ji nû ve guhertinek çêbû.

Ti carî neketime nav rêveberiya YRD'ê, lê ji destpêkê ve li derveyî wê jî nemam. 4-5 salên dawiyê jî di çarçoveya xebatên partî de pir zêde pêwendî, yekîtiya me çênebû, lê bi şiklekî fermî berpirsê wê me. Dema ku rêveberiya partî tê rexnekirin, dîsa mîna 2001'ê rexne dike ku kordînasyona partiyê di asta yekemîn de berpirsê vî karî ye. Lê me nikarîbû bi qada îdeolojîk re jî bi Komîteya Çapemeniyê re jî diyalog, xebitîneke pir baş bidin rûniştandin. Di vê de berpirsiyariya me jî heye, di asta yekemîn de dikare were dîtin. Ji ber vê jî ji xeta û nebesiyan em berpirs in. Feqet, helwest, sekna Komîteya Çapemeniyê û rêxistinbûna YRD'ê jî xwedî berpirsiyariyekê ye. Me nedîtibû ku ewqasî bûye hestî, me wisa nenirxandibû. Lewma jî em neketin nav hewldan, nêzîkatiyeke bingehîn a guherîner, rastker. Em fikirîn ku bi rexneyên qismî ve em ê bikaribin di nava pêvajoyê de guhertinên pêwîst bi cih bînin. Lê di rewşa heyî de tê dîtin ku rewş ne wisa ye. Heger sererastkirineke bingehîn nebe, qada çapemenî-weşanê pir nebes e, ji xetayan re pir vekirî ye. Lewma jî bi sîstem, terz û xebitîna heyî re nikare xebata propaganda-ajîtasyona ku pêdiviya tevgerê pê heye bîne cih, bimeşîne. Pir nebes dimîne, ji bo vê guhertin û sererastkirinên bingehîn lazim in. Bêguman lazim e ev ji hêla Komîteya Çapemeniyê bê kirin, li gor vê Komîteyeke Çapemeniyê bê rêxistinkirin. Lê, ev Komîteya Çapemeniyê jî girêdayî Komîteya Îdeolojîk a PKK'ê ye. Lazim e Komîteya Îdeolojîk kontrol bike, çalakbûneke pêwîst li ser çapemeniyê saz bike. Berpirsê Komîte-

ya Îdeolojîk jî bêguman Sekreteryaya Giştî ya Partiyê ye. Lazim e Sekreteryaya Giştî li ser vî karî raweste.

Di pêvajoya 2001'ê de piştî komployê me ev rewş baştir nîqaş kiribû. Rêbertiyê ev kar meşandibûn. Lewma jî xebatên îdeolojîk esasê partiyê ne. Me gotibû, ev jî eger ku Sekreterya Giştî karibe xeta îdeolojîk rast bimeşîne, li ser qada îdeolojîk kontrole çêbike, xebatên îdeolojîk li gor xeta partiyê rêxistin bike û bimeşîne, mimkun e. Lê, 4-5 salên dawî Rêbertiyê di vî warî de rêxistin kir, wezîfe dan, lê me sekneke wisa nikarîbû nîşan bidana. Ji ber şerê ku em tê de ne, me hê bêhtir qada eskerî da pêş. Li gel qada Îdeolojîk pêwendiyeke me ya pir sînordar hebû. Beşek me li qada îdeolojîk bû, lê ne li qada çapemenî ne li çand-huner ne jî di xebatên Akademiya Zanistên Civakî de me sererastkirineke têrker; bi plansazî û bernamekirineke din ve bi avakirina binesaziyê ve ku ev wezîfe bikaribin şer bigihînin serketinê; me guhertin û sererastkirineke rast nekir. Di vê mijarê de nêzîkatiyên Sekreteryaya Giştî nebes in, têkiliyên xwe qut in.

Komîteya Çapemeniyê qet Sekreteryaya Giştî wekî mûxatab nabîne. Em 5 sal in di vî karî de ne, têkildarî karên xwe ji Sekreteryayê ti carî destûr negirtiye. Komîteya Îdeolojîk jî pir zêde wekî rêveberiya xwe nabîne. Rêveberiya dibîne Hevserokatî ye, li gel qada siyasî zehf pêwendîdar e. Me nikarîbû vê rewşê biguherînin. Lewma jî xebatên çapemenî-weşanê pir zêde neguherîn. Guhertin û sererastkirinên dihatin pêşdîtin nikarîbûna bihatana kirin.

Niha em vê ji nû ve dinirxînin, şertên êrîşa giran heye, çiqasî dikare bê pêşdîtin û guhertin em nizanin, lê li gelek qadan çapemenî di lêpirsînê de ye. Li Ewrûpayê lêpirsîn çêbû, li Rojava hê jî di lêpirsînê de ye. Gelek milên çapemeniyê bû mijara lêpirsînê, êdî ne di asta rexneyê de ye. Di qada çapemeniyê de jirêketina îdeolojîk pir zêde ye, ligorxwebûn pir zêde ye, dûrketina ji pîvanên partiyê pir zêde ye, li gor vê jirêderketin û rev hene. Jirêketinek, jirêderketinek hebe, lazim e bê se-

rerastkirin. Her kes vê dibîne, lê ew ê tam çawa bê rastkirin, di wir de tam netbûnek tine ye. Ji ber vê jî lazim e ev akademî van hemûyan bizane û binirxîne. Xebatan, pirsgirêkan li ser vî bingehî bigire dest, pêşdîtina sererastkirinekê bike, bi xwe jî rolê bilîze. Misyon û berpirsiyariyeke wisa ya vê Akademiyê heye. Qasî Komîteya Çapemeniyê berpirsê vê ye. Ji van karan Komîteya Çapemeniyê berpirs e, lazim e komîte were vê astê. Lê di halê hazir de ne wisa ye. Lazim e Komîteya Îdeolojîk, rêveberiya partî û Sekreteryaya Giştî bi van karan re mijûl bibe. Lazim e hewldana xebatê nîşan bide, bi vê qadê re eleqeder bibe, eleqedarî perwerde, rêxistinbûn, rêveberiya wê bibe. Lazim e qadên din jî wisa destekê bidinê.

YRD, di pêvajoya 2001'ê de hat avakirin. 2001'an heta 2003, 2004'an rêveberiyeke wê hebû. Di 2004'an de wextê Kongra Gelê di rêveberiyê de guhertinek çêbû. Heta 2007'an jî rêveberiyeke wê hebû. Di 2007'an de careke din vesazkirina rêveberiyê guherî, heta 2015'an hat. Me di 2015'an de rêveberiyeke din guhert. Ji 2007'an heta 2015'an demek dirêj a rêveberiyê ye. Piştî 2015'an jî me guhertinek kir, di astekê de meşiya. Wê demê jî kêmasiyên heyî pir nebihurandin. Niha careke din rêveberî hat guhertin. Me ji dewreya havînî ya Ocaxa Partiyê vesaziya hin hevalan kir. Dîsa di civîna navendî de me hin guhertinên rêveberiyê pêş dîtin. Lazim e ji nû ve avabûna Komîteyê, terzê wê yê xebatê, sîstema wê, ji nû ve vesaziya wê, herî kêm xebata partiyê ji nû ve were sazkirin. Ji ber ku li hemberî ya heyî û kêmasiyan rexne hene. Pêwîst dike ku bi şênberkirina wan rexneyan ve li gorî wê guhertin-sererastkirinek pêş bikeve.

## 5-NIRXANDINA PRATÎKA YRD’Ê

Bi nêzîkatiyên rojkî civak nikare bê perwerdekirin. Ev dibe îfadeya ketina bin bandora modernîteya kapîtalîst. Rehendê îdeolojîk ê şoreşê lawaz e. Li Rojava rojnameyeke rojane tine ye. Rêjeya xwendinê zeîf e. Weşana televîzyonê wekî naverok pir zeîf, seresere ye. Halbûkî şoreşeke pir mezin heye, îdeolojî, felsefe, teoriya şoreşê pir xurt e, lehengtiya wê dikare mirovahiyê bixe liv û tevgerê. Weşana wan jî nayê kirin. Me rexne kir, ewqasî qehremantiya şer çêbû. Ji çar aliyên cîhanê, gelek beş û rewşenbîr tên, belgefîlman çêdikin, pirtûkan dinîvîsin, fîlman dikşînin; lê ev li ba me nîn e. Rojnamegeriyeke rojane heye. Di bin navê weşana zindî de weşaneke demkî heye, resimkirin heye, naverok nîn e. Mesela ew lehengtî dikarin baş bêne dayîn. Her qademeya şerê li dijî DAÎŞ’ê dikare bi şiklekî xurt bê dayîn. Mînak zafera Kobanê heye, berxwedana Kobanê berxwedana çi bû, berxwedaneke çawa bû, kê, çawa li ber xwe dan? Niha xebateke fîlmê heye, çi pêdivî bi fîlm heye, me ev bi çavê xwe dîtin. Belgefîlm dikarin bên çêkirin. Li şûna ku yek hewl bide wê rolê bilîze, jixwe ew jiyane, dikarin bi xwe bikin,bêjin. Fîlmên herî xweş dikarin wisa bêne çêkirin. Li wir têkoşîneke wisa hate meşandin ku mirovbûna mirovatiyê bi bîrê dixe.

Bûyer û pêşketinên wisa çêbûn ku mirov bi ser xwe ve anîn, nêzîkatiyên modernîteya kapîtalîst ên ku mirov ji mirovbûnê derxistiye dide lêpirsîn. Ev dikarin bi şiklekî pir xurt bêne dayîn. Eger wisa nebe civaka şoreşê nagihêje, mirovê şoreşê dernakeve ortê, jin-mêr pêş nakeve, ciwanên şoreşê çênabin, civaka şoreşger nayê afirandin, perwerdekirin. Ji ber vê jî perwerdeya civakê lawaz e. Ya îdîa û armanc û ya di

pratîkê de hevûdu nagirin. Kî berpirsê vê ye? Hêza ku lazim e armancê bi civakê bide fêmkirin berpirs e. Ev jî çapemenî-weşan e. Wê demê ya ku bi rola xwe ranabe çapemenî-weşan e. Ya ku nebes, çapemenî-weşan e, teqez mirov nikare li cihekî din li sûcê bigere.

Ji derveyî vê li qada Başûr jî xebatên çapemenî-weşanê, çand-hunerê, xebatên gel jî bi damezrandina PAK'ê ve dest pê kir û ji 1991'ê û vir ve kêm kêm be jî hatiye meşandin. Piştre di encama zextên PDK û YNK'ê de dem bi dem asteng bûye, lê dewam kiriye, hin deman berfireh bûne. Li gor pêşketina têkilî, rêxistinbûna me, me kovar û rojname derxistinine, di hin deman de em heta asta bultenan teng bûne.

Li gorî min, ji bo rêxistinkirina xebatên Başûr, ez bim ez ê giştî kadroyan seferber bikim, xebateke kovarê rêxistin bikim, rewşa heyî ji wir ve bidim ber rexneyê, hewl bidim civakê bi wê ve perwerde bikim. Xebata herî xurt a şoreşgerî, ew ê ya perwerdekar, rêxîner e. Karekî ku dikare giştî hevkarî, mêtingerî, diziya rêveberiya PDK, YNK'ê derxîne holê, dikare bê kirin. Heke nebe, destûra vê nedin, bi kirinek îllegal têrê neke, mirov dikare bi televîzyonekê bike. Xebateke wisa jî dibe, lê nehatiye rêxistinkirin, nayê kirin, teng e. Dema ku propaganda-ajîtasyona şoreşgerî jî nebe rêxistin û çalakî jî nabe, jixwe nikare bibe jî. Wê demê pirsgirêka esas a Başûr destpêkê rêxistinkirina propaganda-ajîtasyonê ye. Rêxistina me wisa nagire dest. Tê gotin ku bêyî propaganda-ajîtasyonê, bêyî rêxistina partiyê em hilbijartina qezenc bikin. Xweziyê bi vê tînin, *"li Bakur parlementer derdikevin, li Başûr em jî bikevinê, parlamenterên me hebûna, em li meclîsê rûniştibana ser qoltixan, pere bigirtana, nitûq bidana ew ê çiqasî xweş bûna."* Li ser navê PKK'ê meylên wisa çêdibin. Lêgerînên wisa tabî serketî nabin, nikarin bibin jî. Yên ku li Bakur derketin di encama xebateke şoreşgerî de derketin. An wisa ew hebûn, xebata şoreşgerî jî li ser hebûna wan nebû. Ew ji hêla xebat, têkoşîna

şoreşgerî afirîn. Heke tu têkoşîna şoreşgerî nemeşînî, nexebitî tu nikarî pêşketinên wisa derxînî, lazim e ev bê dîtin.

Di xebatên têkildarî Rojhilat de jî israr hene. Esas em baldar bûna ta ji serî ve me dikarîbû derfetên legal binirxînin û di ser çapemenî-weşanê re xebateke propaganda-ajîtasyonê bimeşînin. Me nikarîbû ew bikirana. Piştre gerîla û şerê çekdarî pêş ket, dewlet li beramberî rewşê hişyar bû, qedexe pêş xistin, me derfetên legal ji dest dan. Li ser vê me xwest ku bi şiklekî îllegal xebatên propaganda-ajîtasyonê bimeşînin. İsrarek, hewldanek heye. Heval gelemperî li çiyê kovar û rojnameyên aîdî gerîla, rêxistinên jin û ciwanan derdixînin û dişînin hundir. Lê ev pir teng, bi xebateke komekê re sînordar e. Ji bilî vê weşangeriya TV'yê ya li derveyî welat dimîne. Di propagandayê de ya bi bandor niha ew e, feqet rêveberiya wê jî, xebitandina wê jî pirsgirêkeke cidî ye. Tevî ku daneheveke pir mezin heye jî, materyal hene jî di ragihandina wan a civakê de pirsgirêk, lawaziyên cidî hene.

Jê wirdetir, her bandorbûna ji Ewrûpayê heye, bi berçavkê Ewrûpayê li Îranê, Kurdistanê dinêre. Ango bandora wê kêm dibe, vala vala li gel dewleta Îranê bertek û êrîşê tetîk dike. Ev li ser civakê vediguhere zextê. Halbûkî dikare hê bi pîvan, bihîzyar nêz bibin. Li şûna nêzîkatiyên wisa basît û bi bertek, weşangeriyeke TV'yê ya ku civakê li ser bingehê modernîteya demokratîk perwerde dike, dike xwedî hişmendî, lewma jî rêxistin û amade dike, dikare xurttir bê kirin. Ew ê pir bi bandor be jî. Ne lazim e em kadroyên xwe winda bikin. Eger bê dîqetkirin, tên îdamkirin, pêdivî bi wê jî namîne. Dikarîbû rehettir bibûya. Di wê mijarê de îmkanên teknîkî hene, amûr jî hene, lê di karanînê de pirsgirêk heye. Bi polîtîkayeke rast a weşanê, feraset û xetê ve ew teknîk hê karîgertir bibe. Em tê de lawaz dimînin, pirsgirêkan dijîn. Lazim e ev bê fêmkirin û li ser vî esasî pirsgirêk bêne çareserkirin.

Li milê din, li Rûsyayê xebateke diyar heye. Ji berê ve di asta herêmî de bû. Hedef dikir ku Rûsyayê ji giştî re veke. Me

carina hewl da xurt bikin. Lazim e bi şiklekî sînordar bê meşandin, lazim e wisa pir zêde neyê pirolekirin. Di astekê de raya giştî ya Kurd heye, lazim e deng û gotinên wan hebe. Rûsya navendeke girîng e, siyaseta Asyayê ji wir tê diyarkirin. Ji bo ku hemû pêşketinên li Asyayê bê şopandin, lêkolandin, pêşketinên li Rûsyayê bê şopandin û ji temamî Kurdistanê, gelê Kurd, çapemeniya giştî re bê ragihandin, li wir dikare xebatek bê meşandin. Ya tê meşandin dikare hê sîstemtir, hê têrker bibe. Aktîvîteyeke wir jî heye.

Li gel vê xebatên çapemeniya xweser ên tevgera jinê hene, pêş ketine. Weşangeriyeke jinê ya ku ji dawiya 1980'yan ve tê rêxistinkirin heye. Kovar hene, ji Ewrûpayê dest pê kir, belavî Tirkiyeyê bû, li cihên din jî dibe. Kovar tên derxistin, li çiyê jî rewşeke wisa heye. Di nav çapemeniya giştî de cihekî wê yê girîng heye. Niha wekî rewşeke nû televîzyonvanî tê pêşxistin. Bi şiklê rûpelên rojnameyê, kovar, televîzyonê xebatek heye. Esas radyovanî jî dikare bê pêşxistin.

Xebateke diyar a ciwanan heye. Ew jî ji dawiya 1980'yan ve mîna kovarên ciwanan li Ewrûpayê, dûvre metropolan, Tirkiyeyê çêbû. Piştre li parçeyên din jî rêxistî bû. Bi şiklê kovaran weşan tê kirin. Bi şiklê kovar, bernameyên televîzyonan, rûpelên rojnameyan xebateke çapemenî-weşanê ya bi navê ciwanan heye.

YRD îfadeya rêxistinbûneke wisa berfireh e, xwedî çarçoveyeke berfireh e. Eger bê dîqetkirin, derfetên wê zêde ne, qadên wê yên xebatê fireh in, pêşketina tevgereke xurt a şoreşgerî jî heye. Lewma jî em di demeke wisa de ne ku lazim e em şerên mezin bimeşînin û zaferên mezin bi dest bixin. Pêdivî bi perwerde, xebatek propaganda-ajîtasyonê heye ku karibe rêxistineke şerker û serketî derxîne holê. Pêdivî bi perwerdekirina tevahî civakê heye. Êdî em tenê partiyê perwerde nakin an jî tenê beşên diyar ên ciwan û jinê perwerde nakin. Niha em xeta neteweya demokratîk dişopînin, wezîfeyên avakirina neteweya demokratîk dimeşînin, lewma jî em xebateke şoreşgerî

ya pêşbinî dike ku karibe xîtabî hemû civakê bike, giştî perwerde û rêxistin bike, dimeşînin. Lazim e xebatên me yên propaganda-ajîtasyonê giştî civakê li ser vî bingehî perwerde, rêxistin bike û seferberî çalakiyê bike. Qasî rêjeya serxistina vê, mirov dikare bibêje xebatên propaganda-ajîtasyonê rast û têrker hatine meşandin, serketî bûye. Wisa nebe, ew ê nebes be, lawaz be.

Baş e, di rewşa heyî de gelo têrkeriyeke wisa heye? Tine ye. Li ser çapemeniyê rexne pir in, kêmasiyên wê zêde ne. Ev kêmasî ji kû çavkaniya xwe digirin? Bi gelek milan dikare bê nirxandin. Mesela di bernamekirina wê de nebesî hene. Her ku amûrên teknîkî pêş dikevin, radyo û televîzyon derdikevin pêş, li gel vê berxwedana gel, gerîla û têkoşîn pêş dikeve, çapemenî-weşan bi van re sînordar ma, plan û bernameya xwe gelekî teng kir, ket ser xeteke wisa. Xwe bi propagandaya rojkî, polîtîkbûnek teng ve sînordar hişt. Di nav xeteke wisa de ye. Ev jî nebes dimîne. Pêdiviya wê bi bernamekirineke nû, plansaziyekê heye. Ne bes e ku çapemenî-weşan wekî amûrê propagandaya rojane were dîtin. Ew jî tenê dibe ajîtasyon. Di çapemenî-weşana me ya heyî de pir zêde fonksiyona propagandayê tine ye. Hin bername, nîqaş hene, ku ew jî pir teng dimînin, tu wan jê derbixî, yê mayî hemû ajîtasyona rojane ne, resimkirina rojane ne. Halbûkî rehendê propagandayê heye, wezîfeya wê ya perwerdekirina civakê heye, wezîfeya wê ya avakirina zihniyetê heye. Di vê wateyê de ji bo şopandina weşangeriyeke ku hişmendiyê ava dike, ferasetê dide qezenckirin, têkoşîna îdeolojîk dimeşîne, bîreweriya teorîk a berfireh û têkoşîna îdeolojîk pêk tîne, pir nebes e. Di vê mijarê de ne Rêbertî bi têrkerî tê esasgirtin û ragihandin, ne jî asta zihniyeta partiya me tê teyisandin. Mesela plansaziya têkoşîna îdeolojîk çi ye, bernameya wê çi ye, ne diyar e. Plansaziya wê ya avakirina zihniyetê, meşandina xebata teorîk çi ye? Ev tine ne. Berê dema ku parêzname nû hatin bernameyên mîna vê hinekî dihatin dayîn, meşandin. Ew jî qut bûn. Jixwe nebes bûn, li şûna ku xurttir bikin,

ew jî sekinandin. Di vê xalê de çapemeniyê bi rastî jî xwe di asteke teng de ku bûyerên rojane, teng-polîtîk propaganda dike, hişt. Resmê rojane dikşîne. Ji hişmendiya dîrokî, civakî, ji vî zihniyetî qut e. Rojane çi diqewime, çi bigihêje ber destan wan dide. Organekî ajîtasyonê ye, bi rastî jî propaganda tine ye. Ragihandina şer, ragihandina çalakiyên gel jî wisa lê hatiye.

Bi rastî jî em hatin wê astê ku eşkere eşkere rexne dikin. Ciwanekî 20 salî jiyana xwe dide, di atmosfera herî zor de şer dimeşîne, tenê wek nûçeyek deh saniyeyan derbas dibe. Tenê nav tê nivîsandin, wêne jî nayê dayîn. Tu nikarî avekê jî di ewqas wextî de vexwe. Ragihandina şehîdekî qasî wextê vexwarina avêkê jî demê naxwe. Avahiyeke wisa heye, tengbûyî ye, daketiye asta resimkirina bûyeran. Xebata çapemenî-weşanê ya PKK'ê, xebata çapemenî-weşanê ya Rêber Apo wisa nabe. Piştî komployê ev gav bi gav dihat tengkirin. Tiştên mîna, *"bila nivîsên dirêj nîn bin, tiştên kurt girîng in, bila pirtûk nebin!"* hatin gotin. Rêbertî wisa li derve hate hiştin, wisa xuyaye ku niha gihiştiye wê xalê. Resimkirina rojê bes nayê dîtin. Çi tê destan wê dide, wisa diçe. Ji ber vê çapemenî ji bo xwe wezîfeyekê nizane. Ji ber vê yekê bi çavê organekî ku bi meşandina xebata propaganda û ajîtasyona partiyê wezîfedar e, li xwe mêze nake. Nabîne ku organekî bingehîn ê perwerdekirina civakê ye. Xeta wê ya îdeolojîk, polîtîk, felsefîk tine ye. Her kesên ku di vî karî de dixebitin ewqasî takekesane bûne ku li gor xwe xeta wan hene, çi tê destan wî dide. Mîna neynikekê diteyisîne, wekî naverok nade qezenckirin, araste nake, ruh nade. Feraseteke pir tengbûyî ya propaganda û ajîtasyona çapemenî-weşanê heye. Plansaziya wê wisa ye. Lê belê ev şaş bû. Me her tim îfade kir ku lazim e ev bê guhertin û sererastkirin.

### a-Nêzîkbûna Perwerdê û Pirsgirêkên Kadro

Di çapemenî-weşanê de xaleke din a girîng tinebûna sîstema perwerdeyê ye. Sîstema wê ya akademîk nemeşiya. Perwerdeya çapemeniyê di 2000'î de dest pê kir. Mazlûm Dogan jî hema piştî komployê di sala 2000'î de dest pê kir. Akademiya Gûrbetellî Ersoz di Hezîrana 2001'ê de hat vekirin û ji Tîrmehê şûn de dewreya perwerdeyê da destpêkirin. HPG'ê jî akademiyên xwe wê demê da destpêkirin. Niha sed akademiyên HPG'ê hene. Dibe ku ji sedî jî zêdetir bin. Ciwanan akademî vekirin, tevgera jinê ewqasî dibistan vekirin. Lê Akademiya Gûrbetellî Ersoz nikarîbû her sal dewreyekê jî veke. Hin salan qet perwerde jî nekir, perwerde rawestand. Kadro perwerde nekirin, lewma di rewşa heyî de çapemenî ne navendeke kêşanê ye. Tevî ku saziya herî perwerdekar, karîger e jî ji bo civakê, ji bo ciwanan ne navendeke kêşanê ye. Berê navendeke kêşanê bû, tevlîbûnên partiyê her di ser vir re dibû. Wisa ne bi televîzyon, radyoyan jî bi kovaran ev dikirin. Mînak Ozgur Halkê ev dikir, Serxwebûnê dikir, nivîsên wekî dirêj tên tên îfadekirin, di vê astê de bandor li mirovan dikirin. Heke baş bê bikaranîn televîzyonvanî pir zêdetir bi bandor e. Lê wisa nayê bikaranîn, wisa bandorê nake. Ji ber ku perwerde nake, ne kişîner e, tevlî nake, kadroyê xwe perwerde nake. Çaxa perwerde nake jî têkoşîna xeta îdeolojîk-rêxistinî nameşîne. Xeta partiyê esas nagire. Di nav çapemeniyê de têkoşîna xeta îdeolojîk-rêxistinî tine ye. Ji ber vê yekê bi xwe kadroyan nagihîne, her tim ji rêxistinê kadroyan dixwaze. Tê gotin ku bila ji şer kadro bên kişandin û bidin me. Ewqas kadro ne ji bo xebatên çapemeniyê bike, ji bo ku şer bikin tên perwerdekirin.

Tê çapemeniyê, dibêjin *“nikare bike.”* Tabî nikare bike, ji ber ku li gorî çi hatibe perwerdekirin dikare wê bike. Heke te perwerde nekiribe nabe. Wê demê tu yê perwerde bikî. Ev nabe, ji ber vê jî rewşeke kadroyan a ku her diçe teng dibe derdikeve ortê. Niha statuyeke kadroyan a ku demek dirêj di van xebatan de cih girtine, tenê vî karî dikin û nikarin bêne guhertin, hene. Ji bo Bakur me gotibû di 1990’î de du xet hene. Ber bi çapemeniya li ser xeta duyemîn ve rêveçûn heye. Di rewşeke wisa de wextê kadro neyê perwerdekirin, têkoşîneke sekna îdeolojîk, felsefîk tine be, jirêketinên îdeolojîk jî pir zêde dibin.

Qada çapemenî-weşanê ye, bi her kesî re pêwendîdar e, ji her derê nêrînan digire, her tim mêze dike bê çi diqewime û ya ku digire çi be, bi xwe jî jê bandor dibe. Lewma jî ji bandorên derve re pir vekirî ye. Dema ku xwe perwerde nake û têkoşîna îdeolojîk nameşîne jî takekesane û jirêketin derdikevin. Rewşenbîrên takekesane yên sîstema netew-dewletê, nîzama burjûwayê hene ya, her diçe takekesiya rewşenbiriyeke wisa derdikeve. Tîpek wisa derxistiye holê ku li gor xwe ye, nakeve nav rêxistinê, ferasetên li gor xwe qebûl kirine, pîvanên xwe cuda ne, pîvanên xwe yên red-qebûlê cuda ne; rêxistinê, xeta Rêbertiyê naecibîne, ji xeta îdeolojîk derketiye, ji xebata rêxistî qut bûye, xwe ecibandiye, ûqala ye, takekesane dixebite, ji armancên şoreşgerî qut bûne, xwe derdixe pêş. Wekî feraset wisa ye, wekî tîp wisa ye. Rihê berdide, guharan bi kar tîne. Mirovê ku xweziya xwe bi mirovên wisa tîne ku di nav sîstemê de ji hêla modernîteya kapîtalîst ve veguherîne meymûnê. Ev di nav çapemeniyê de peyda dibin. Li şûna ku di nava civakê de li dijî wê têbikoşe, çapemenî bi xwe bi van tijî bûye. Gelo, em ê civakê bi çi perwerde bikin? Saziya perwerdehiya civakê heke taybetmendiyên jiyana kole ya ku modernîteya kapîtalîst dane civakê bi xwe qebûl bike, bi wê re bijî, dê kî guhertina civakê pêk bîne? Ew ê çawa bibe? Nikare. Tiştê ku dibêjin pirsgirêk jî wisa derdikevin. Lêpirsîn ji vir ve dikevin rojevê û ev xwezayî ye. Lazim e ev bên zanîn.

Lewma jî qada ku lazim e bibe hêzek îdeolojîk a gurçûpêçê, xweperwerdekirinê; ketiye rewşeke qutbûyîna ji têkoşînê. Bi rastî jî ne perwerdekar e. Em ewqasî hewl didin, ewqas organên weşanê hene, lê di warê îdeolojîk de faşîzm ji me zêdetir bandorê li civakê dike. Modernîteya kapîtalîst zêdetir bandor dike. Ew taybetmendiyên takekesane, berjewendperest, taybetmendiyên dizan, kolekaran bêhtir bandor dike. Ti kes nikare bibêje, *“meyla civakê heye.”* Rêber Apo, PKK’ê ispat kir ku civak ji şoreşê re vekirî ye. Bi rakirina civakê ve ev derxist holê. Wê demê xebatên me civakê ji wir nakşîne yan jî daf nade. Wê bi mirovan dide pejirandin. Teşe nîn e, nîzam û pîvan nîn e, têkoşîn nîn e. Dema ku wer dibe ew ê mirov ji vir fêrî çi bibin, ti tiştekî fêr nabin an jî yên ku ji sîstemê girtine fêr dibin. Ji ber vê jî tîraja wê, rêjeya temaşekirinê zêde nabe. Ji ber vê di çapemeniya me de afirînerî tine ye, teqlîd hene. Wisa xwe dişibîne hinan, xweziya xwe pê tîne, jê bandor dibe. Heke sekin û têkoşîna îdeolojîk nebe, ev bandorbûyîn xwezayî ye. Bandor dibe û teqlîd dike. Heke yê tê teqlîdkirin bi xwe di rewşeke baş de bûna, jixwe ew ê kar bimeşandana. Ji ber ku ne baş e, ji wir jî encamek dernakeve. Teqlîdkirin ne rewşeke baş e, ji wir jî rojnamegeriyeke baş dernakeve.

Azadiya çapemeniyê şaş hatiye fêmkirin. Azadiya çapemeniyê wekî qutbûna ji partî, civakê, wisa bi serê xwe, şêlû, bêalîmayînê tê dîtin. Ev şaşiya herî mezin e. Ti eleqeya vê bi azadiyê re nîn e. Di Tirkî de gotinek heye, *“Yê teref nebe ew ê berteref bibe.”* Tu nebî teref tu yê beralî bibî. Xebata çapemenî-weşanê wezîfeya propaganda-ajîtasyonê dimeşîne. Propaganda-ajîtasyon xebateke şoreşgerî ye, xebata partî ye. Tu yê çawa bêalî bibî? Çapemeniya azad çawa bêalî dibe? Azadî aliyek e li dijî koletiyê. Ma bêalî çawa dikare azad bibe? Têgihandineke wisa heye. Carekê poz bilind, zimanzêde, jîrik dibe, takekesane dibe. Wê demê jî xweziya xwe bi seknên wan qaşo rewşenbîrên ku mîad tijî kirine û marjînal bûne, di cewher de

jî ruhê xwe ji dest dane, tînin. Ji vê re jî azadî tê gotin, dibêjin em dikarin wisa bêalî bibin. Wisa nabe, ev xebateke partiyê ye.

YRD rêxistineke partiyê ye. Min got ya PKK'ê damezrand. Di damezrandina YRD'ê de ez dîwan bûm. Wekî Kordîneya Komîteya Navendî ya PKK'ê ez dîwan bûm, ne bi navekî din. Kî bûna ew ê li cihê min bûna. Li wir ne filan kes, rêveberiya partiyê dîwan bû. Partiyê damezrand. Li ser bingehê meşandina xebatekê damezrand. Ji bo xebatên propaganda-ajîtasyonê bi YRD'ê re bimeşîne damezrand. Wê demê YRD berpirs û wezîfedar e ku erkên propaganda-ajîtasyonê giştî bi şiklekî herî serketî bi rê ve bibe. Hemû kadroyên YRD'ê, hemû organ, hemû rêxistinên wê berpirs in. Ti wezîfe û berpirsiyariyeke din tine ye. Nikare ti karekî din bike. Heke hewl bide tiştekî din bike, ew ê PKK desteser bike. Ew ê ji xetê derkeve. Ji ber ku YRD ji bo vê damezrandiye. Dudu, PKK kadroyên wê dide. Sisê, PKK derfetan dide. Çar, hin dibêjin ya, *"ez ê bigirim, wekî dilê xwe bikim"*, dibêjin *"ez ê bêalî bim."* Wis nabe. Di dema tasfiyegeriyê de Pinar Selek digot, *"em li orta dewlet û PKK'ê ne, mesafeya me ya herdu aliyan jî eynî ye."* Ew çû, dibe ku ew feraset di wê astê de tine be, feqet tiştekî mîna vê ya wekî fêmkirina azadiya çapemeniyê heye. Takekesitî hinekî ji wir tê. Tê gotin ku em bêteref û azad in. Ew ê bêteref û takekesî be. Ew ê li partiyê guhdar neke, rêxistinê guhdar neke, komîteyê guhdar neke, hevalan guhdar neke, nekeve nav xebata rêxistî, pîvanên Rêbertiyê esas negire. Ev nayên qebûlkirin. Ti eleqeya van bi rastiyê re tine ye.

Ji roja ewil a xebatên çapemeniyê ve ez di nav de me. Di pêvajoya yekemîn de hevalê Mazlûm li gel Rêbertiyê meşand. Di pêvajoya duyemîn de yekser Rêbertiyê meşand. Di pêvajoya sêyemîn de yekser Rêbertiyê meşand. Di pêvajoya çaremin de kordînasyona partiyê YRD damezrand ku rêxistî be û xetê bide meşandin. YRD wekî organekî partî yê di vê astê de, mîna wekaleta xebata ku Rêbertiyê dimeşand, hate damezrandin. Wê demê girêdayî felsefeya partî, xeta partî ye. Propagandaya fel-

sefe û îdeolojiya partiyê dike, pîvanên wê wisa ne. Kadroyên wê wisa dijîn, rêxistinên wê wisa dixebitin. Lê ev tine ne. Wisa nabe. Me berê jî diyar kir, Akademiya Gûrbetellî Ersozê perwerde neda. Lê dikarîbû xwe bigihîne 3-4 şaxan. Ji bo her parçeyan dikarîbû perwerde bidana destpêkirin, şax bihatana vekirin. Her sazî, cihê xebata çapemenî-weşanê dikarîbûn mîna akademiyekê rolê bigirin. Em çawa ku ji bo Akademiya Zanistên Civakî dibêjin cihê perwerde û xebatê, çapemenî jî dikarîbû wisa bûya.

Di 2001'ê de dema ku me YRD damezrand, wekî modela rêxistinbûna YRD'ê pêşdîtina me ev bû. Ji bo Bakur jî Ewrûpayê jî me ev plan kir, talîmat da. Li gorî vê sîstemeke çawa dikare were pêşxistin, jiyan, xebat rêxistinbûneke demokratîk komunal çawa dikare were pêkanîn? Pergaleke jiyan û xebatê ku dikare ji civakê re bibe mînak, bibe mînaka komunalîzma demokratîk çawa dikare were sazkirin, me ev nîqaş kirin. Li gor vê jî me her cure mesref, ketina nav her cure xebatê danî ber xwe. Ji ber ku me hesab kir, ew ê ji ya heyî zêdetir nebûna mesref, heta ew ê erzantir bibûya. Ti ji wan nehatin kirin. Me digot kampusên mezin ên jiyana komunal ava bikin, cihên xebatê, sporê, civînê, keyfê û bêhnvedanê saz bikin, bila her tişt tê de be, bi sedan mirov bikevênê, xwe perwerde bikin, tevkariyê bi xebatê re bikin, jiyaneke komunal û xebateke kolektîf pêş bixin. Lê wisa nekirin. Çi kirin? Pere dan 2-3 kesan, gotin biçin malekê bigirin, mîna dixwazin bigerin, bila fon bikeve bêrîka te, pere bên xerckirin, ango ji kontrolê nereve, van jiyanên besît takekesî danîn pêşiya vê xebata komunal. Organekî wisa takekesane bûye ku nikare Rêbertiyê fêm bike. Rêbertiyê venabêje, nikare vebêje. Bi gotin, ruh, tevgera xwe ve nikare Rêbertiyê biteyisîne. Di vî warî de nebes e.

Bi rastî jî lazim e ku sîstem carekê di ber çavan re bê derbaskirin. Mîna ku di serî de min got, di propagandakariyê de bawerî girîng e. Tu takekesî bijî, mîna burjûwayê biçûk cilan li

ber xwe bike, wisa tevbigere, dûvre derkeve û nivîsên Rêbertiyê yên têkildarî komunalîteyê bixwîne. Ew ê kî bi te bawer bike. Ma mirovê nebêjin, "tu çi dibêjî!?" Ew ê bêjin û bawer nakin. Çiqasî berê xwe bide Rêbertiyê, gerîla, nirxên şoreşê jî ew ê baweriyê nede. Ji wê re mêtina wan nirxan tê gotin. Jiyana bi mêtina wê tê gotin. Nabe temsîlkirina nirxan, ragihandina ji civakê re, propagandakirin. Di rewşa heyî de têkildarî perwerdeyê, têkildarî rêxistin û rêveberiyê, têkildarî terzê pirsgirêkên ku lazim e bêne rexnekirin û çareserkirin hene.

Pêvajoya ku xebatên me yên çapemenî-weşanê herî berfireh, rêxistinî bûye, dema YRD'ê ye. Di salên 1970'yî de di dema damezrandina partiyê de me enceq dikarîbû gaveke ku kovareke îllegal derdikeve bavêtana. Bi xebatên propaganda-ajîtasyona devkî ve me wezîfeyên perwerde û tevgerandinê anîbûn cih. Di salên 1980'î de propagandaya çekdarî zêdetir rol lîstibû. Ji derveyî wê me çapemeniya nivîskî li ser bingehê derxistina kovar, rojname, amadekirin û derxistina pirtûkan pêş xistibû. Ji orta 1990'î ve di warê organên weşanê de ev pêvajo pir pêş ket, kûr û berfireh bû. Li gel weşangeriya kovar, rojname, pirtûkan; weşangeriya radyo û televîzyonê jî ket rojevê. Wisa lê hatibû ku me xebatên ajîtasyon-propagandaya organên weşana nivîskî ya ku xebatên teorîk an jî nûçe-şîroveyê pêş dixistin derbas kirin, bi radyo û televîzyonê ku wekî dîtbarî û bihîzbarî tê pênasekirin, me dest bi meşandina xebatên propaganda-ajîtasyonê kiribû. YRD di ser van xebatan re rêxistî bû. Dema ku YRD hat rêxistinkirin, wekî tevger me dikarîbû ev xebat hemû bimeşandana. Wekî çawa ku me ev xebat ji derveyî welat dimeşandin, her wiha li çiyê, ortama gerîla jî bi qismî pêş diket. Lê esas me li parçeyên Kurdistanê têkildarî rêxistinbûnê hin gav dikarîbûn bavêjtana. Mînak li Bakur hem bi şiklê rojname, kovar çapemeniya nivîskî hem jî di asta radyoyê de me weşangerî pêş xistibû. Li Rojava bi qismî hebû. Kêm be jî li Başûr jî wisa bû. Li Rojhilat jî me di vî warî de gav avêtibûn.

Bi rêxistinbûna YRD’ê re li van qadan giştî kapasîteya xebatê mezin bû. Organên nûçeyê, organên teorîk, organên mîna radyo-televîzyonê, organên bi şiklê pirtûk û broşurê, kapasîteya me ya organên weşanê zêde bû, mezin bû, cur bi cur bûn. Tevgerên jin, ciwan û gerîla hatin wê astê ku li her parçeyî xebatên çapemeniyê bimeşînin. Me organ zêde kirin, her wiha ne tenê hatina asta kirinê, wekî hejmar jî hecm jî me mezin kirin. Me bi gelek qenalên radyo û televîzyonê weşan kirin. Kovar wekî hejmar li gelek qadan zêde bûn. Xebatên mîna pirtûk, rojnameyê zêde bûn, berfireh bûn, hema hema her sazî, rêxistin hatin wê astê ku çendek organên çapemenî-weşanê bimeşînin. Li ser vî hîmî berfirehiyek çêbû.

Paralelî vê hejmara kadroyên ku tevlî vê xebatê bûne jî zêde bû. Hejmara kadro û sempatîzanên ku li her qadê tevlî xebatên organên weşanê bû, wezîfe meşand, zêde bû. Hema bêje gihişt hezaran, bû artêşeke mezin a propaganda-ajîtasyonê. Sîstema nûçegihaniyê wisa pêş ket ku ev tenê ne wekî xebatkar, sîstem, nîzameke xebata ku tenê organên wê yên weşanê amade dike; wekî tevna rêxistinî ya ku nûçeyan kom dike, organên derketî belav dike, hê mezintir bû, tevna nûçeyan berfireh bû. Rêxistinên belavkariyê hatin avakirin, ajansên nûçeyan hatin rêxistinkirin. Hema hema li hemû parçeyên Kurdistanê ev pêk hatin. Li derveyî welat sîstemeke nûçegihanî-ajansê pêş ket ku giştî nûçeyên Kurdistanê ji raya navneteweyî re radigihîne û bi salan e weşanê dike, wezîfeyê dimeşîne. Wisa jî em gihiştin asta tevgereke berfireh a çapemenî-weşanê. YRD ji vê pêk tê. Rêxistinbûneke çapemenî-weşanê derket holê ku dikare propaganda-ajîtasyonek xurt bike, xwe bigihîne giştî beşên civakê, ji raya giştî re hemû pêşketinên li Kurdistanê, serpêhatiyên gelê Kurd, encamên têkoşîna azadiya Kurdistanê ragihîne.

Li Kurdistanê ev xebat bi PKK’ê re watedartir bû. Miletperestiya seretayî pir zêde nikarîbû xebata propaganda-ajîtasyonê bimeşîne. Organên wan ên çapemenî-weşanê pir

lawaz bû, di astek pir kêm de bû. Halê yê herî pêşketî, di asta derxistina bulteneke nûçeyan de bû. Di çarçoveya miletperestiyek teng de dikarîbûn qaşo propagandayê bikin. Edebiyata Kurdperestiyê hebû, rewşeke ku xwe dispart bi şiklekî vala pesindayînê, lê ti rewşên psîkolojîk, fikrî, libatî, rêxistinî, çalakbûnî nanirxîne, rexne nake, rexneyan li xwe nagire. Herî zêde weşangeriya radyoyê dikirin. Ew jî wekî van cihazên me yên mezin bûn. Piştre em ketin nîzameke wisa ku her yekîneyekê ew cihaz bi kar anîn. Wan di ser wê re ji giştî rêxistinê re weşan dikirin. Li ser radyoyan dihate guhdarîkirin. Rêxistina herî xurt a ku herî zêde propaganda li ser cîhazeke mîna weşana radyoyê hatiye bihêzkirin dikir, xwedî weşangeriyeke di vê astê de bû. Rojê çend saetan talîmat didan, agahiyên rêxistinî radigihandin.

Mîna ku xeta miletperestiya reformîst ew hinekî derbaskirin dikare bê nirxandin. Bi taybet li Bakur ev pêş ket. Li pey vê, bi taybet di çapemenî-weşangeriya nivîskî de li Rojhilat jî li Başûr jî hin pêşketinên qismî bi dest xistin. Li Bakur hê zêdetir kovar derdixistin, rêxistin bi kovaran dihatin binavkirin, her rêxistinek kovarake wê hebû. Jixwe niha dema ku em rêxistinan rêz dikin jî navên tên ziman navên kovaran e. Ozgurluk Yolû, Kawa, Rizgarî ev hemû navên organên weşanê ne. Rêxistin wisa dihatin binavkirin. Wisa di çapemeniya nivîskî de berê xwe dan kovarê. Li gor miletperestiya seretayî di propagandayê de rewşeke hinekî din li pêş dikare were dîtin, lê tiştên jiberkirî dinivîsandin, dubare dikirin. Kovargeriyeke pir dogmatîk hebû. An bi şiklekî pir ziwa, jiberkirî, dogmatîk teoriya sosyalîst dubare dikirin an jî bi edebiyateke Kurdperestiyê ya pir zêde ne watedar e, ew kovar tijî dikirin. Rewşeke wan a perwerdekirin, hişmendî dayîn, mirov arastekirin, aqildayîn, hest barkirin, moral dana qezenckirin, sewqî kar dike, tine bû. Mîna Bakur, li Rojhilat jî li Başûr jî tevgerên meylî çepgiriyê hinekî ev pêş xistin.

Li Rojava jî hê zêdetir rêxistinbûnên ku dikarîn bultenan derxînin hebû. Pêşketina ku rastiya Kurd û Kurdistanê kir orjîn û derket derveyî mêtingeriyê; rastî, hebûn û pêşketina civaka dîrokî ya gelê Kurd, li ser vî bingehî pirsgirêkên wê û wezîfeyên wê yên têkoşîna azadiyê bêyî bixe ber otosansurekê azad û li ser hîmî zanistê nirxand; bi analîzan, lêkolînan ve teoriya wê ya azadiyê, xeta îdeolojîk-polîtîk pêş xist û ev destpêkê ji kadroyan, namzetan re ragihand, li ser vî bingehî kadroyên şoreşger perwerde kirin, dûvre bi ragihandina ji giştî beşên welatparêz re li milekî bi çalakiyê hişyar kir, li milê din jî bi amûrên propagandaya nivîskî perwerde kir, PKK'ê pêk anî. Ev hemû li ser bingehê PKK'ê hatin avakirin û pêşxistin. Min îfade kir, hejmara yekemîn a Serxwebûnê dibe ku bi sedan mirov ji rêxistinên din veqetand û tevlî PKK'ê kir. Ewqasî bi bandor bû. Destpêka salên 1990'î, dema ku Ozgur Halk, Ozgur Gundem derketin, li Bakurê Kurdistanê li cem hezaran kadroyî alîgir jî çêkirin. Gelek rêxistin çûn sifirê. Her kes bi van hizran hatin perwerdekirin û bûn sempatîzanê têkoşîna azadiyê.

Bi rastî jî weşangeriya ku dikare jê re kovar bê gotin, mayinde, mijarên teorîk lê kolaye, ji aliyê PKK'ê hatin kirin. Serxwebûn kovareke wisa ye. Yê din ji 75'an heta 80'yan li Bakur her meh kovar derxistin, lê ji wan çi ma, qet ne diyar e jî, şop jî nemaye.

Çapemenî-weşangeriya ku bi rastî kadro gihandin, civak araste kir, ji aliyê PKK'ê hat pêşxistin. Kovargerî ji hêla PKK'ê hat destpêkirin. Rojnamegeriya rojane û organên nûçeyan ji hêla PKK'ê hat destpêkirin. Pêvajoya ku li Bakur bi Ozgur Gundemê dest pê kir, pêvajoyeke wisa ye. , niha jî dewam dike. Ev bi Tirkî kir, dûvre jî bi Kurdî kir. Rojnamegeriya ku xwedî domdarî ye, xîtabî civakê dike, perwerde dike, araste dike, çalak dike, ewilî Tirkî, piştî ku astek xwendinê pêş ket jî bi Kurdî ji aliyê PKK'ê hat kirin. Lazim e ev bê zanîn.

Televîzyona destpêkê ji aliyê PKK'ê ve hate vekirin. Di 1995'an de dema ku PKK'ê li Ewrûpayê MED TV vekir, ti

qenalên ku bi Kurdî weşan dikir tine bû. Gumanê her kesekî hebû ku gelo weşana televîzyona Kurdî dikare bê kirin an ne, bi zimanê Kurdî û komasiya Kurdistanê weşangeriyeke wisa dikare 24 saetan dewam bike an ne. Mijara nîqaşê bû ku gelo Kurd dikare tiştekî wisa bike yan ne. Lê PKK'ê ew vekir, çi zor û zehmetî hebe da ber çavê xwe, çi pêwîst bû kir, pêş xist, xebitand, bi bandor bû. Perwerdeya Neteweya Demokratîk bi amûrên wisa bi şiklekî pir xurt pêş xist. Kengî navenda şerê taybet dît ku PKK li ser xeta azadiyê civak, ciwan, jinên Kurd perwerde dike, hişmendiya azadiyê dide, civakê ji giştî bandorên mêtinger-qirker dûr dixe û li civakê serwer dibe, ha wê demê rêxistinên mîna PDK û YNK'ê jî sewqî xebata çapemenî-weşanê kir. PDK, YNK û hêzên din li ser vî esasî sewqî rojnamegeriyê, derxistina kovarê kir. Wan bi xwe ev nekirin, dijmin da kirin. Armanca wan ne ronîkirina civakê bû, astengkirina xebatên perwerdekirina civakê bû. Televîzyona PDK û YNK'ê jî ji aliyê kontrgerîlaya TC'ê hat damezrandin. Kurdistan TV jî Kurdsat jî di dawiya salên 1990'î de ji aliyê şêwirmendên taybet ên serokwezîrtiya Tirkiyeyê ve bi diravdanên serokwezîrtiyê hatin damezrandin. Wisa ne rêxistin damezrandin ne jî ti derfetên dewletê bi kar anîn. Yekser hikumeta TC'ê kir, derfetên madî pêşwazî kir, kadroyê wê perwerde kirin. Dixwest PKK'ê asteng bike ku civaka Kurd bi hişmendiya azadiyê perwerde neke, ji giştî civakê re vê hişmendiyê nebe. Ji ber vê kirin, ewqas mesrefek giran dan ser xwe. Eşkere ye, dikare bê lêkolînkirin. Kî şêwirmend in tê zanîn, dikare were lêkolînkirin, hê gelek ji wan dijîn. Ev şêwirmendên çapemeniyê yên serokwezîrên Tirk bûn.

Ji bo PDK û rêxistinên din em dibêjin ji aliyê hêzên derve têne destekkirin, lê tenê bi vê ve sînordar bûya baş bû, bi desteka dijmin in. Yên ku dixwazin Kurdan tine bikin û hewl didin tine bikin, ev afirandin. Ji ber vê niha PDK nikare devê xwe jî veke. Dema ku ew ê tiştekî bike, Tirkiye dibêje, *"Me tu parast. Li hemberî PKK'ê me we parast, hûn hê çi dixwazin, ti mafê we*

*yê gotinê tine ye."* Ji ber vê yekê ewqasî girêdayî, muhtac in, gotinên wan pêk tînin, li devê wan dinêrin, nikarin dij derkevin.

PKK'ê tenê weşangerî pêş nexist, wekî hecm çapemenî-weşan mezin nekir, di heman demê de yekemînên hemûyan ava kir, pêk anî. Van bi xwespartina hêza gelê Kurd ve pêk anî. Beşek pir mezin a li derveyî van pêşketinan di çarçoveya şerê taybet de ji bo ku civakê di venêrîna hêzên din de bigirin, aktîvîteya PKK'ê ya di vê qadê de bişkînin, ji bo nehêle fikrên azadîxwaz bigihêje civakê ji aliyê mêtingeran ve hate kirin. Dijminê mêtinger ewqasî hewl da, derfet bi kar anî û pêşketineke wisa pêk anî.

Li derveyî PKK'ê jî bi dehan televîzyonan Kurdan hene, bi sedan radyoyên xwe hene. Bi taybet piştî avabûna statuya Başûr, ev hê zêdetir pêş ket, belav bû. Kovar û rojname hene. Destpêkê nizanîbûn binîvîsînin, çandeke wan a nivîsandina pirtûk, gotarekê jî tine bû. Nikarîbûn li ser televîzyonê weşanê bikin, bernameyê çêkin. Niha xwe gihandin weşangeriyeke wisa ya radyo û televîzyonê ku di asta herî pispor nûçegihaniya Amerîkankî de bernameçêkeriyê dikin. Bi dinyê re ketine pêşbirkê. Qederekê fêrî vî karî bûne. Hêzên cur bi cur, yên li derveyî me perwerde kirin. Em, di perwerdekirinê de, xwegihandinê de nebes man. Milekî girîng ê rexneya li YRD'ê jî ev e. Di demeke wisa de YRD li şûna ku bi hêza xwe li ser ezmûnên xwe ve xwe perwerde bike û pêş bixe, di van karan de li ser hîmê gelperwer girêdayî nirxên azadiyê xebatê hê kamiltir bike, wekî terz, uslûb, tempoyê hê xurttir bike, lewma bi yekgirtina gotin û libatê ve bi bandortir bike; sînordar ma, xwe dubare kir, afirîner nebû. Jê wirdetir, di rewşeke wisa de ma ku xweseriya xwe winda kir, ji pêşketinên dijmin bandor bû, xwezî pê anî, ew girîng dîtin. Nebes ma. Yên din hatin û çûn.

Dikare bê gotin ku derfetên wan ên madî zêde bûn, hêzên cuda destek dan, perwerde kirin, lê yê me jî hêza me ya ramanê, baweriya me hebû. Rewşeke me ya temsîlkirina civakê

heye. Teşhîrkirina wan, ragihandina nirxên xwe ji bo civakê zehf zehmet bû? Gelo ew ê bêbandor bûya? Na. Nêzîkatiyeke di nav lihevkirina gotin û libatê de ew ê zortir bûya? Na. Berevajî ew ê xurttir bûya. Divê neyê gotin ku ev kar bi kapîtalîstî dibe, bi terzê burjûvaya biçûk dibe, bi mulkparêziyê dibe, takekesî dibe, beramberî pereyan dibe, bê pere nabe. Lawaziyên heyî tê maneya vê, vê dispêre hereketê. Ev şaş e. Nêzîkatiyeke wisa domandin û teyisandina zihniyeta miletperest, mulkparêz, desthilatgir, dewletparêz e. Ti karakter, taybetmendî, wateyeke din a vê nêzîkatiyê tine ye û ev ne rast e. Di encam de bi şiklekî ji civakê qut tu xîtabî civakê dikî, mirovan dixapînî, lê gelo bêîmkan e ku tu bi karaktereke civakî ve xîtabî civakê bike, mirovan perwerde bike, alîgiran qezenc bike? Na. Civak ji bo te vekirî ye, komunalîst e, piştevan e, azadîxwaz e, têkiliyên civakî demokratîk in. Lewma jî ji çand û hişmendiya azadîxwaz demokratîk re bêhtir vekirî ye. Ew ê zêdetir bipejirîne. Eger tu bi şiklekî rast, karîger wan pîvan, feraset, zihniyetê bi bandor ji civakê re ragihînî ew ê zêdetir te qebûl bikin. Di vê manê de ti kesên ku karibe ji me xurttir, bi bandortir xebatên propaganda-ajîtasyonê bimeşînin tine ye.

Di xebatên çapemenî-weşanê de feraseteke wisa derketiye ortê. PKK'yî nikarin bikin. Kadro nikarin weşanê bikin, kadro nikarin pêşkêşvaniyê bikin, kadro nikarin nizanim çi bikin! Baş e, gelo kî dikare bike? Yên li kolanan digerin! Ev gotin aîdî ew kesên di nav PKK'ê de ne. Eger dijmin bêje mirov nikare ti tiştekî bêje, lê hewl didin bi PKK'ê ve van tiştan bidin qebûlkirin. Çima nikare? Yê ku çelepeyê cîhanê, herî xerab, herî nezan, herî ji civakê qut PKK'yî ne? An yên herî wêrek herî fedakar, herî fedaî, herî milîtan, herî zêde piştevanî û azadiya civakî qebûl kirine tevlî PKK'ê dibin? Em bawer dikin ku ya duyemîn rast e. Lewre em bawer in ku karên herî baş dikare ji aliyê PKK'yiyan ve pêk were. Em her tim dibêjin, em ê bêjin jî, ya yekemîn êrîşek herî namerdane ye ku fikrê lîberal ê modernîteya kapîtalîst berê wê daye sosyalîzma demokratîk,

komînalîzma demokratîk. Ji ber vê jî di nava YRD'ê de me sekn, helwest, terz, kesayetek nedît ku wê modernîteya kapîtalîst, zihniyet, siyaseta desthilatparêz û dewletparêz, mulkperestiyê, diziyê, siwarbûna pişta hinan, zextê, pozbilindiyê rexne dike; berevajiya vê pîvanên piştevaniyê, parvekariyê, kolektîfbûnê, jiyana hevpar xurt dikin, bedew dikin, pêş dixin hakim dike. Weşangeriya YRD'ê di xebateke wisa de negihişt. Wekî nivîskî nabe, dîtbarî nabe, devkî nabe. Xerabûn, bi şiklê dûrketina ji pîvanên demokratîk komunal, şemitandina ber bi modernîteya kapîtalîst, lîberalîzmê pêk tê. Bi şiklê jirêketinê pêk tê.

Heke YRD li beramberî vê bandorê tênekoşe, nikare bibe rêxistina PKK'ê. Xebatên YRD'ê nabin xebatên PKK'ê. Nikare xeta PKK'ê bide, nikare rastiya Rêbertiyê bide, ew ê tiştên din ragihîne. Em jî nikarin vê wekî YRD'ê qebûl bikin. YRD rêxistineke PKK'ê ye. Wezîfeya YRD'ê ew e ku Rêbertiyê, gerîla, pêşengtiya Partiyê, milîtanbûnê, li ser vî bingehî têkoşîna jin û ciwanan, şehîdên wê yên leheng, li ser vî bingehî pîvan, rêgez, nirxên ku derketine ortê ji civakê re ragihîne. Ragihandina ji bo gel, propagandakirin, li ser van nirxan perwerdekirina gel e. Ji bilî vê ti erkek xwe tine ye. Kar û wezîfeya xwe, berpirsiyariya xwe di vê çarçoveyê de ye.

Dema ku em wisa lê mêze bikin arastebûna feraset û nêzîkatiyên wisa hene ku ji rastiya xwe dûr dikeve, xweziya xwe bi hinan tîne, hewl dide teqlîda hinan bike, wan baş, xwe xerab dibîne, hê zêdetir ber bi takekesiyê, madiyatparêziyê, lîberalîzmê, xapandinê, mêtingeriyê dişopîne. Ev di nav rêxistin û xebata YRD'ê de derdikevin ortê. Perwerde ji bo astengkirina van girîng bû.

Esas fonksiyon, wezîfeya Akademiya Gûrbetellî Ersoz ew e ku di nava YRD'ê de jirêketinên wisa îdeolojîk rawestîne, li şûna wê her tim kadro, sempatîzanên YRD'ê, rêxistinên YRD'ê li ser xeta Rêbertî û partiyê perwerde bike, gurçûpêç bike, li ser xeta azadiyê kûrtir bike. Piştî ku Akademiya Gûrbetellî Ersozê perwerde sekinandin, nexebitî, dewreyên perwerdeyê

venekirin; wê demê YRD'ê têkoşîna îdeolojîk, perwerdeya partî rawestand. Jirêketinên îdeolojîk, takekesî derketin ortê, derdikeve. Ewqas ligorxwebûn, pozbilindî, qayişkêşî, hevûdu kişkişandin ji vir derket pêş. Pirsgirêka kadro wisa derket ortê. YRD, nebû saziyeke ku mirovan ber bi xwe ve dikşîne, tevlî dike, perwerde dike, kadro ava dike; esas bû qadeke ku kadroyan diqedîne, dide revandin, dicemidîne, kadroyan tevlî nake, nakêşîne. Ev nabe, rewşeke wisa wekî rastî nabe ku bê qebûlkirin. Lazim e bi şiklekî herî cidî bê rexnekirin.

Lazim e em vê bizanin: ti xebat bêyî rêxistin nagihêje serketinê. Bêyî perwerde jî rêxistin nabe. Ez ê rêxistî bibim, ew ê rêxistina min hebe, ez ê bibim fermandar, bibim rêveberî, çeprast emîr-talîmat bidim, lê qet perwerdeyê nakim! Baş e, ew ê ev rêxistin ji kû derkeve? Bila hin bikin, ava bikin, bidin bin emrê min, ez jî her tim emir bidim. Ti kes ti kesî bi gotina *"ka çawa dixwazî bi kar bînî"* perwerde nake û nade. Lazim e her kes vê bizane. Ji ber vê yekê heke tu yê karekî bikî, lazim e tu rêxistinê ava bikî. Heke tu yê rêxistinê ava bikî jî lazim e beriya her tiştî perwerde bikî. Tu yê mirovên ku ew ê rêxistinê pêk bînin derxîne ortê. Tu nikarî li benda hazirê bimînî û bibêjî bila partî bide min. Bila YRD jî kadroyan tevlî bike, perwerde bike, beşekê ji xwe re bigire, beşekê jî ji bo sewqî xebatên din bike bila bide partiyê. Ya rast ev e. Partî kadroyan nade YRD'ê, lazim e YRD kadroyan bide partiyê. Lê niha tersa wê heye, tê gotin ku bila rêxistin kadroyan bide YRD'ê, kadro tên xwestin. Dema ku rêxistin kadroyan nade, rexne dikin bê çima kadroyan nade. Em dibêjin nade, qebûl nake. Berê di vê mijarê de min gelek nîqaş li cem Komîteya Çapemeniyê meşandine. Ez dibêjim, *"nade"*, ew dibêje *"çawa nade."* Çima ew ê kadroyan bide te, tu bi xwe kadroyan perwerde bikî, tu kadroyan bidî partiyê. Berê çapemeniyê kadro didan partiyê, navenda kêşanê bû, kadro tevlî dikirin, perwerde dikirin, hemû qad veguherandibû qadeke perwerdehiyê. Ji ber vê yekê nêzîkatiya xwe

ya perwerdehiyê şaş e, tiştê herî girîng ê lazim e bê sererastkirin jî ev e.

## b-Xebatên Rêxistinî û Pirsgirêkên Rêveberiyê

Rêxistinbûn û xebateke çapemenî-weşanê ya ku xwe dispêre perwerdeyê tine ye. Her sazî ne saziyeke perwerdeyê ye. Li gel vê, milekî pîşeyî jî heye. Ser meselê, ji bo ku karibe di wî rehendê teknîkê de kûr bibe lazim e her tim perwerde bibe. Ji ber vê jî lazim e her yekeyek YRD'ê, her buroyeke YRD'ê, her qadeke YRD'ê bibe dibistanek. Lazim e her yek mîna şaxeke Akademiya Gûrbetellî Ersozê kar bikin. Me berê jî diyar kiribû ku lazim e hem xebatên pratîkî bike hem jî perwerdeyê bike. Bila rastiyeke ku mirovan, kadroyan li ser xeta Rêbertiyê û partiyê perwerde dike derkeve ku kadroyên karibin wezîfeyên xwe serketî bînin cih derkevin ortê. Bi rastî jî feraset, helwestên pir şaş hene. Di nava çapemeniyê de lîberalîze dibin, kêmekî fêr dibin, dûvre êrîşî rêxistinê dikin. Rêbertiyê got, *"Partiyê kêmekî hişmendî da we, hin tişt fêr kirin, hûn bi wê ve li partiyê vedigerin û gez dikin."* Niha rewşeke hevşib heye. Li qada çapemeniyê rewşeke wisa bi zêdehî pêş dikeve. Partiyê hin tişt fêr kiriyê, li şûna ku bi wê ve xebatên partiyê hê xurttir bimeşîne, partiyê dikişkişîne, pîvanên partiyê, pîvanên kadro dikişkişîne, lêdipirsin, rast nabînin, di hundir de madê xwe dikin, di nav xwe de dikin. Lîberalîzm heta çokê ye. Dîsîplîn û kontrola îdeolojîk-rêxistinî, xwegihandina pîvanên îdeolojîk, têkoşîna îdeolojîk di nava çapemenî-weşanê de tine ye. Rexne û rexnedayîn bi şiklekî cidî tine ye. Rewşeke wisa heye ku her îdare dike, derbas dike, mîna ku têkoşîna îdeolojîk dike nîşan

dide, lê nake. Ev jî xeter e. Di nava çapemenî-weşanê de takekesîtî pir zêde ye. Ew jî tê wê manê ku di nava zihniyet û helwesta modernîteya kapîtalîst de ye.

Sîstema wê ya rêxistinî jî hinekî bi pirsgirêk e. Dema ku xeta îdeolojîk-rêxistinî neyê girtin, têkoşîn neyê meşandin aktîvîteya rêveberiyê jî namîne. Pir zêde kes li ti kesî guhdar nake. Sîstema wê ya rapor-talîmatê pir naxebite. Rapor tên, qaşo talîmat jî tên dayîn, lê kes pir zêde li hevûdu guhdar nake, her kes bi ya xwe dike. Dema ku bû parvekirina karan, derfetan, şerê bûyîna rêveberiyê tê kirin; dema mesele dibe karkirin, girtina wezîfe û berpirsiyariyê, pir zêde wezîfeya rêveberiyê li xwe nagirin. Di vê mijarê de mîna xebata kolektîf di jiyana komunal de jî pirsgirêkên cidî hene. Di jiyana kolektîf de jî pirsgirêkên cidî hene. Pir zêde takekesîtî heye. Qaşo kom wekî komîteyên YRD'ê rêxistinkirî ne, lê ew jî tam wekî organên kolektîf naxebitin. Di sîstema xebata komîteyan de, karbeşiyê de nebesî hene. Halbûkî tevî xebateke bi keyfxweşiyê, bi nîqaşên hevûdu xurtkirinê ve dikare hê bi bandortir bê meşandin jî, berevajî rewşeke zorlêker heye. Ligorxwebûn pir zêde ye, pozbilindî di astek pir pêj de ye. Ji wir jî pirsgirêk ber bi takekesitiyê ve dişemite.

Di encama van de çapemenî-weşaneke ku wekî hecm mezinbûyî heye. Xebateke propaganda-ajîtasyona ku 24 saetan didome heye. Lê karîgeriya van xebatan kêm e. Fonksiyona wê nebes e, perwerdekariya wê sînordar e. Civakê, jin, ciwanan bi şiklekî rast û bi hestan, fikran, libatê ve bi kûrahî perwerde nake, rêxistin nake. Lewma jî sewqî xebata şoreşgerî nake, arasteyî çalakiyê nake. Organên me yên çapemenî-weşanê ajîtasyonê jî nake. Karibe ajîte bike wê demê dê civakê rake ser piyan. Eger ranabe ser piyan, nakeve nav têkoşînên zor, ji bo serhildanên mezin ranabe, ji ber perwerdeya şaş e. Ji ber ku çapemenî-weşan bi têrkerî gel perwerde nake.

Ev çima wisa dibe? Naxwe rastiya Rêbertî û partiyê wekî naverok rast û têrker nayê dayîn, nivîsên çapemeniya nivîskî;

hem naverok hem uslûb, terz, şiklê çapemeniya dîtbarî û bihîzbarî ne xwedî avaniyeke wisa ye ku bikaribe mirovan bandor bike, perwerde bike, biguherîne û rêxistî bike. Ne hîkarîker e, ne bandorker e, nade lêpirsandin û fêrkirin. Êdî hatiye asteke ku wext tijî dike, rûpelan tijî dike, piranî dide gotin ku *"em jî vî karî dikin."* Ji ber vê yekê, tevî ku ewqas organên weşanê hene, lê asta propaganda û aktîvîteyê ne qasî kirinên yek qenala televîzyonê ye jî, ne qasî kirineke kovarekê, rojnameyekê ye. Pir li paş e. Nayê xwendin, nayê guhdarkirin, nayê temaşekirin. Dema wisa dibe jî yên ku vê dikin dibêjin, *"ji ber dirêjbûna nivîsan nabe, ji ber aîdî partiyê ye nabe, ji ber komunal e, takekesîtiyê rexne dike nabe, ji ber ku li gorî keyfa me nayê hiştin nabe."* Ango her tim partiyê sûcdar dikin. Sûc û pirsgirêk her di pîvan, xeta Rêbertî û Partiyê de tê dîtin. Di sekn, helwesta xwe de, di qutbûna xwe ya partiyê de nabîne.

Ji civakbûnê qutbûn heye, baweriyê bi sosyalîzmê nayne, pir takekesî ye, firsendê dibîne pir mulkparêz e. Ortama çapemeniyê ji takekesîtiya burjûvaya biçûk re pir vekirî ye. Heke terzê xebatê jî hinekî rast neyê danîn, şaş bê sazkirin, ber bi wir ve diçe. Li derveyî me mînakên wisa pir zêde hene, xweziya xwe bi wan tînin, wan teqlîd dikin, lewma jî teşegirtineke wisa derdikeve. Seknên ku ji xeta partiyê, rastiya Rêbertiyê qut, hê zêdetir xweziya xwe bi hêzên derveyî me, takekesîtiya burjûvaya biçûk tîne, wê diteyisîne, gotinên wê derdixin pêş, libatên wisa bi berbelavî pêş dikevin. Ortama me ya propagandayê xerab dike.

Rexneyên li ser vî hîmî di rewşa heyî de li ser çapemenîweşanê zêde ne. Rêbertî bi şiklekî rast û têrker di naverokê de nayê teyisandin. Çarçoveya teorîk-îdeolojîk, pîvanên redqebûlê nîn in. Têkoşîna îdeolojîk nameşîne, partiyê nateyisîne. Jixwe çiqasî pêwendiya xwe li ba partî heye, ew jî nediyar e. Di sala 2001'ê de ev rêxistin ji aliyê PKK'ê ve hat damezrandin, lê di 2003'yan de piştî ku biryara fesxkirina PKK'ê hate girtin, ev rêxistin ji PKK'ê qut bû. Mesela di Sibata 2007'an Konferansa

4'emîn a HPG'ê de me biryara jinûve tevlîbûna PKK'ê girt. Nivîskî ye, biryara konferansê ye. HPG, ji nû ve tevlî PKK'ê bû. An ne ew jî cipcihê bû.

Min çend cara pêşniyarî YRD'ê kir ku biryara jinûve tevlîbûna PKK'ê bigire. Hevalên li Komîteya Çapemeniyê bi vê pêşniyarê keniyan. Digotin, *"Ma PKK kî ye! Em PKK ne."* Ne wisa ye. Ti kes ne PKK'yî ne. Yên ku wisa dibêjin ew in ku herî zêde ji PKK'ê qut bûne, bila ev wisa bê zanîn. Lewma tevlîbûna ji nû ve net nekir. Heke konferansek YRD'ê çêbibe, lazim e biryara jinûve tevlîbûna PKK'ê bigirin. Piştre ew ê bikaribe bi pîvanên PKK'ê xwe perwerde bike, bidarizîne, li xwe bipirse. Em niha yê di nav xebata YRD'ê de nikarin bi pîvanên PKK'ê bipirsin, daraz bikin. Hin eşkere dibêjine me, *"hûn nikarin van bispêrin me",* hin jî wisa eşkere nabêjin û veşartî dewam dikin. Mîna li gorî pîvanan tevdigere nîşan dide, lê di hundir de heman rewşê dijî, pêk nayne. Ev rastiyek e û lazim e bên zanîn. Ji ber vê jî lazim e tevlîbûnek rast a partiyê çêbibe. Di HPG'ê de dema ku hate konferansê nerazîbûn nîşan dan, me red kir. Me gelek tişt nîşan dan ku bê *"hûn çawa dikarin van bikin",* Ji ber ku eleqeya wê bi PKK'ê re tine bû. Me got *"sîstema li vir ne sîstema PKK'ê ye"* û me hemû guhertin.

Ev çêbûye; dema ku biryara tasfiyekirina PKK'ê hate girrtin û tiştekî wisa pêş ket, hemû rêxistinan bê ew ê çawa karibin xwe bêyî PKK bi rê ve bibin, li gorî wê sîstem ava kirine. Ji bo rêveberina xwe biryar girtine, lê piştî jinûve avabûna partî ew ê biryara tevlîbûnê bigire, wan guhertinan ji nû ve biguhere, ew ê were ser pîvanên partiyê, ew ê li gor wê mîna rêxistina partiyê bimeşîne. Ruhekî wisa yê partîbûnê tine ye. Mesela nîqaşa partî, têkoşîna partî tine ye. Di nîqaşên nava YRD'ê de nayê gotin ku *"pîvanên partiyê wisa ne, pîvanên Rêbertiyê wisa ne, taybetmendiyên milîtanê şoreşger wisa ye."* Ûslub, têgeh û nîqaşa wê cuda ye. Lê berê ne wisa bû. Ma rêxistina ku Mazlûm damezrîne qet wisa dibe? Rêbertiyê got, *"Partî Mazlûm e."* Ji serî heta binî li şûna ku hemû bibin PKK û PAJK, niha ji vê dûr

disekinin, direvin. Xwe li derveyî vê dihêlin. Yên wisa dizanin hene, yên dixwazin wisa bin hene, yên li gorî vê hewlê didin, xebatê dimeşînin hene. Ev hemû rastî ne. Eger neyê sererastkirin pêşketinek çênabe. Lazim e wisa nebe. Me bandora kûr û texrîbkar a wê tasfiyeya li ser xebat û rêxistinên xwe pir zêde nenirxandiye, fêm nekiriye, lê pir zêde bûne. Ji ber ku bi têkoşîneke lez û dijwar di dema wê de nehatiye rastkirin, rê li ber encamên wisa neyênî û berdewamiya wan vekiriye. Mirov dikare vê bi rehetî îfade bike.

Bernameya wê ters e, tenê xebatên ajîtasyoneke rojane, lawaz, mirî ye. Rêxistinbûna wê tine ye, xebatên ku kûrahiya civaka dîrokî lê dikole, lê dipirse, li gor wê nirxan derdixîne, pêşkêşî civakê dike, perwerde dike, nebes in, benda haziriyê ne. Mesela me demekê navê *"radyoya bi dîmen"* li televîzyonê kiribû. Qiseker her bi telefonê re daxivîn, tenê ekraneke wê heye, me digot radyoya bi ekran. Bernameyên zindî tine ye, her ji derve tevlî dikin, lê wekî cudahiya ji radyoyê ekraneke wê jî heye, lê wekî sîstema bernameyan ti ferqa wê tine ye û li gorî wê rêxistinbûn, afirandin tine ye. Dema tê rexnekirin jî hevalên ku xebatê dimeşînin dibêjin, *"partî nade, rêxistin nake, di dest me de weşan tine ye, em ê çawa bikin."* Tu yê vê rêxistin bikî, te wezîfe girtiye, kî yê bo te hazir bîne. Piştre ew ê hinên din perwerde bike, rêxistin bike, pêk bîne, biweşîne û ew ê bibe karê rêveberiya YRD'ê. Ev wisa nabe. Ji ber vê jî bi rastî pêdivî bi guhertin û sererastkirineke pirmilî heye.

Dema ku me xwe ji bo perwerdeyê amade dikir, me ji hin hevalan pirsîn, gelo di çarçoveya xebatên propaganda-ajîtasyonê de em çi ji hevalan re bêjin. Çend hevalan hin nêrîn dan, min not girt. Ji bo ku heval agahdar bin em dikarin çend xisûsan ragihînin.

Hevalek dibêje, *"li qada çapemeniyê, di warê rêxistinbûna çapemeniyê de qutbûnek ji îdeolojiyê, partiyê û dîrokê heye."* Yê ku ji îdeolojiyê qut be, wê demê heta dawiyê ketiye nav lîberalîzma modernîteya kapîtalîst. Ji îdeolojiyê qutbûn nabe.

Bêîdeolojîbûn nabe. Li cîhanê kesî bê îdeolojî tine ye. Yên dibêjin *“bê îdeolojî bin”*, berdevkên modernîteya kapîtalîst in, îdeologên wê ne. Bi derewkarî vê dibêjin û dixwazin bibêjin werin aliyê min. Ji hemû îdeolojiyên din veqetin, bibin aliyê min. Ji ber vê eger ji îdeolojiyê qut be, wê demê lîberal e. Sekna mirovê ku modernîteya kapîtalîst dixwaze bafirîne ev e. Eger ji partiyê qut be wê demê rêxistina çi ye? YRD ji aliyê PKK'ê ve hat damezrandin. Propaganda û ajîtasyon xebata PKK'ê ye, xebata perwerdeyê ye, xebata sewqkirinê ye. Pêşengtiya partiyê ev e. Partî ev e. Tu dikarî karên din wekî karên eskerî, siyasî bijmêre. Lê îdeolojî partî ye. Propaganda-ajîtasyon tê maneya dayîna pîvan û nirxên îdeolojîk. Hingê ji partiyê qut be, vediguhere mîna xebateke ku karên rojane yên modernîteya kapîtalîst îfade dike. Qutbûna ji dîrokê qutbûna ji civakê ye. Qutbûna ji civakê pir zêde ye. Li Bakur ji bo ku di nava civakê de civak bi şiklekî dîrokî bê lêkolînkirin me xebat dabûn destpêkirin. Me plansazî di çarçoveyeke wisa de çêkirin ku ji bo hemû gundan, qadên dîrokî kom hatin avakirin, ew ê xebata lêkolîn-lêpirsîneke dîrokî bihatana kirin. Hemû li ser kaxizê man, ti nehatin lêkolandin. Lê belê navenda mirovahiya cîhanê Kurdistan e, nirxên dîrokî li Kurdistanê derdikevin, hûn ê nikaribin vê li Amerîkayê bibînin. Amerîkayî tên, li Kurdistanê fêrî dîrokê dibin û hewl didin xwe wekî xwediyê dîrokê nîşan bidin. Lê em hewl nadin rastiya xwe lê bikolin, fêr bibin, fêm bikin, hîn bikin.

Dîsa mijara lawaziya estetîk û coşê hate rexnekirin. Lazim e estetîk dîmen be. Bêşekiliyeke dîmenê heye. Rêbertî jî di nameya xwe ya dawî de li ser etîk û estetîkê rawestiya. Tabî Rêbertî cewher e, naverok e, lê Rêber Apo bi milekî jî şekil e. Digot, *“Rast bisekine! Çik bimeşe! Por û gijika xwe sererast bike! Wekî mirovan bisekine! Cilan baş wergire! Bişibe mirovan! Bedew bibe!”* Rêber Apo dijminê takekesitiya burjûvaya biçûk, pejmûrde, laûbalî, halên ruhê lumpentiyê bû. Lazim e her kes vê bizane. Di weşangeriya MED TV de hin kes ji ekranê

qewirandin. Dema ku bi telefonê re daxivî, ji ber bêşikiliya hinan ji wan re got, *"tu kî ye li wir."* Heke Rêber Apo niha temaşe bike, ew ê nîvê xebatkarên televîzyonên me bêne qewirandin, bila agahiya we hebe. Yên ku ew dikirin dizanîn ku ew ê Rêbertî wan biqewirîne. Tew bi zanebûn jî dikin. Ma ewqasî jî dibe? Piştre dibêjin, *"Rêber Apo-Rêber Apo."* Ewqasî qelpî nabe. Lazim e em durûtiyê biborin. Ji ber vê jî şikil û estetîk girîng e. Kî derkeve wir, gel dibêje *"Ev Apoyî ye."* Dibêje, *"Libata PKK'ê wisa ye."* Çi li ber xwe bike, çawa disekine û tevdigere, mîna ku Rêbertî wisa ye lê tê mêzekirin. Mirov ji bo ku Rêbertiyê bibînin li televîzyonê temaşe dikin.

Tu eger ku derdikeve wir wê demê tu yê bibe PKK'yî. Heke na wê demê tu yê dernekeve, lazim e dernekeve. Lazim e rêveberiya YRD'ê nehêle bikeve wir. Me çend caran hişyarî dan, herî dawî me Komîteya Çapemeniyê hişyar kir, me got nebe em ê mudaxele bikin, wekî partî dest deynin ser. Ma em ê cuda çi bikin. Ji ber ku eger wisa nebe, jirêderketin çêdibe. Ji ber vê yekê ti helwest, libat, cil ên ku bi pîvanên azadiyê re nakok in, ji aliyê Rêbertiyê ve nayên qebûlkirin. Jin jî mêr jî ew ê li vê miqate bin. Ti kes nikare bêje em azad in, çi dixwazin wisa dikin, ti kes nikare qarişî me bibe. Yên wisa dibêjin kû dixwazin dikarin biçin, lê wê demê nikarin li televîzyona PKK'ê bimînin. Nikarin xebatên çapemenî-weşanê yên PKK'ê bimeşînin. Nikarin wê nivîsê binîvîsînin.

Nikarin derkevin ekrana televîzyonê, bejn û bala xwe nîşan bidin. Ji ber ku ew derfetên partiyê ne. Yê derdikeve wir xizmetî partiyê nake, reklama xwe dike beriya her tiştî, lazim e em vê bibînin. Mirovên ku partî derxîne wir zêde ne. Bila ti kes nebêje em muhtacî hinan in, *"em nikarin ti kesî bibînin."* Bi hezaran kadroyê wê hene, sempatîzan hene, bi rehetî dikare bê dîtin. Tabî pîvanên estetîk ên Rêber Apo hene û ev pîvan îdeolojîk in. Şêweyekî her îdeolojiyê heye. Tu di kîjan şêweyê de bî, tu yê karibe wê îdeolojiyê biteyisîne. Heke tu lîberal tevbigerî, piştre tu nikarî bibêjî ez ji îdeolojiya azadiyê me yan jî îdeoloji-

ya PKK'ê me. Tenê tu yê bibe propagandakarê modernîteya kapîtalîst, ewqas. Jê wirdetir nabe tiştekî din.

Dîsa behsa lawaziya coşê hatiye kirin, hevalek wekî *"bêruhî"* pênase dike. Ev tê çi wateyê? Tê wê wateyê ku bi zorê di nav kar de ye. Eger tu bi zorê li wir bî, eger bi dildarî tevlî nebibî, tevlî nebe, biçe. Kes bi zorê kesî tevlî nake. Li PKK'ê dildarî esas e. PKK ne muhtacî ti kesî ye. Tu tê û dibêjî ez ê tevlî PKK'ê bibim. Piştre moral nabe, kelecan nabe, coş nabe, bêruh e, mirî ye, mîna girtiyê jiyanê, madtirş e. Bi mirovên wisa re jiyan nayê avakirin. Mirovên wisa jiyanê dikujin, mirovan dikujin, diqedînin. Di jiyan, pîvanên Rêbertiyê de cihê seknên wisa tine ye. Em rastiyeke Rêbertiyê ne ku jiyana herî bedew dafirînin, karên herî zor jî bi coşeke mezin, kelecaneke kolektîf bi serketî tînin cih. Tevgereke wisa ya Rêbertiyê ne. Ji ber vê jî yên bêcoş, bêruh ne ji PKK'ê ne. Di nav me de ye, lê bi ruh, hest û pîvanên xwe ve dijberî me ye, lewma jî me xerab dike. Em ên wisa bavêjin, ma em ê çi jê bikin! An bila rast tevlî bibin an jî em bavêjin! Ji ber ku eger rast naxebite ti feydeya xwe li me nabe.

Perwerdekariya mirovê bêruh jî nabe. Mirov li yên wisa temaşe nakin. Bînin ber çavê xwe, yek derketiye, bê coş e, bê ruh e, bi zorê nûçeyan pêşkêş dike yan jî bernamê çêdike, mirov lê temaşe nakin. De îcar hejmareke zêde ya televîzyon, radyo, rojname, kovar û pirtûkan heye. Her kes çi lê cazib were wê dixwîne û temaşe dike. Wisa tenê yek tine ye û ti kes mehkûmî yekê nîn e. Tu yê xwe bide temaşekirin, xwendin. An wisa ne rehet e ku tu xwe bi mirovan bide temaşekirin an jî xwendin.

### c-Pirsgirêkên Uslûp, Terz û Tempoyê

Di terzê çapemeniyê de pûtepênedan, sereberetî, teknîkîbûn pir zêde ye. Em bi malzemeyên teknîk re mijûl in, di hin hevalan de reweşeke wisa pêş dikeve ku mirov mîna teknîkê digirin dest. Çawa tu pê li bişkokekê dike û dixebitînî, mîna ku bişkokek mirovan jî heye, tu pê lê dikî û dixebitînî. Di hin rewşan de ev rewş ewqasî li pêş e ku dema çavê min lê ket, ez tirsiyam, min ji gel xwe qewirand. Ez ne ew teknîk im ku tu pê li bişkoka min bikî. Di ortama herî zor de lerzê bi me girtiye, ji bo qeydeke deng bê tomarkirin di saet 12'ê şeve de 2 saetan axivîme, roja piştî wê careke din cîhaza qeydê danîne pêşiya min û gotine, *"Me ji bîr kiriye ku em vekin, me nikarîbû qeyd bikirana, ka careke din baxive em qeyd bikin."* Rêbertî demildest şeqam li yên wisa dida. Ji ber ku me nedikarî em wisa bikin, me qewitand. Me ev dît û em şaşwaz bûn. Terzekî wisa bêdîqet, bêpûte, serebere, nizane çi dike, nabe. Dinîvîse nabe, diqetîne davêje. Nizanim ev nebû, dîsa dide dubarekirin. Bi dîtina min di serê kesên wisa de ku ewqasî didin dubarekirin, diqetîne davêje, pirsgirêk hene. Naxwe ji karê xwe ne razî ye û bi karê xwe re ne li hev e. Di vî warî de pir bêpûteyî heyî.

Jêrnivîs dibihurin, tu dinêrî her şaş e. Îcar televîzyon jî bi dîmen e, tu li dîmen dinêrî şaş e, nivîs şaş e, lazim e di demê de derkeve lê tu li mêze dikî şaş e, li rastnivîsê dinêrî şaş e. Nizanim, pirtûkên yekem min nivîsandin, yê ku herî zêde nivîsên

Rêbertiyê redakte dikir ez bûm. Min bîrkarî xwendiye, wisa bi wêjeyê, nivîs û xetkirinê, axaftinê ti pêwendiya min tine bû, mirovekî wisa bûm ku min nedikarî 2 gotinan bînim ba hev, 2 rêzan bînim ba hev. Lê vê partiyê ez kirim nivîskar, qiseker, pirtûk dan nivîsandin. Lê niha lê mêze dikim ti qaîdeyên rastnivîsê tine ye, nîzamek tine ye. Temam, me fêm kir, heval nizane bi Tirkî binîvîse. Di nivîs de pirsgirêk derdikevin, tê fêmkirin, lê wisa jî nabe. Heke tu zimanekî dinîvîse lazim e tu li gor qaîdeyên wî zimanî be. Ez li ew kesên ku zimanê Tirkî bêserober dinîvîsin dinerim, li beramberî Kurdî jî wisa ne. Ev ne ji ber ku ziman nizanin wisa ne, pûtê pê nadin, bê dîqet in. Heta niha min yek nivîsa xwe jî îmha nekiriye, ez ne lê vegeriyame û min xwendiye, ne jî ji bo îmhakirina wê bi dil bûme. Piranî jî di carekê de dinîvîsim. Berê me bi destan dinîvîsî. Ez ne wisa me ku destpêkê reşnivîsekê binîvîsim, dûvre ji nû ve binîvîsim, ji ber ku di dema nivîsandinê de difikirim. Tevî vê jî Rêbertiyê çend caran rexne kir. Got ev kar wisa nabe. Lerizandina li ser kar tineye. Dibêjim ya seroberotî, paşguhkirin heye. Hevalê Selçûk gotibû ya *"heke dirêj be, qut bike û bavêje"*, ya girîng tijîkirina wir e! Ya girîng kirin e, ne naverok, bandor, wate, perwerdekarî ye! Ev jî ji bo ku rêxistinê bixapîne dike. Ew terzê memûran e. Ew terzê pîşekaran e.

Yanî ji bo ku bêjin kar kiriye, ji bo pereyan bi dest bixîne wisa tê xebitandin. Hunermend wisa naxebitin. Şoreşger mirovên hunermend in. Xebata şoreşgerî xebateke hunermendane ye. Xebata propaganda-ajîtasyonê jixwe bi temamî xebateke hunerê ye. Tu yê propagandakar be, ajîtator be û xwe perwerde bike; qaîde, pîvan hene, lê miqate be, li gorî gerekên wê tevbigere.

Dîsa hevalan digotin, *"danehevên teorîk, asta çanda giştî û aktîvîteya civakî lawaz e."* Mirov wisa qebûl nakin, tersê wê li ber çavan dibînin, lê çavdêriya hin hevalan jî wisa ye. Bi danehevekê kêm a teorîk ve xebata propaganda-ajîtasyonê nikare bê kirin. Dikare pê li bişkoka kamerayê bike û fêr bibe, dikare

fêrî bikaranîna tiştekî bibe, fêrî kişandina tetîkê bibe û çekê bi kar bîne, lê tu xwe perwerde neke tu nikare nivîsekê binîvîsîne, nikare axaftinekê bike, nikare libatekê bike. Ji ber vê Lenîn digot, *"lazim e karên pratîk kesên kêm perwerdekirî, karên teorîk ên mîna çapemenî-weşanê jî kadroyên xwedî danehev, gurçûpêç bikin."* Wekî dîrokî yek ji wan mirovan e ku herî zêde serê xwe bi vî karî re têşîne. Lewma jî mirovekî bê perwerde, bê perwerdeya çandî û aktîvîteya civakî, lawaz, daneheva teorîk kêm, nikare karê propaganda-ajîtasyonê bike. Nikare bibe propagandakar û ajîtatorê xeta Rêbertiyê. Ji ber ku xeta Rêbertiyê wekî xeteke teorîk xwe dispêre teoriyeke kûr a ku civaka dîrokî ji kûrahî ve analîz dike. Ne wisa rojane, serebere, tenê yê heyî radigihîne. Ji ber vê jî dema ku mirov tevlî vê xebatê tên kirin lazim e bên perwerdekirin. Xwe perwerde bikin. Lazim e rêxistin li gorî vê erkdar bike. Ji ber ku Rêbertiyê wisa dikir.

Hevalekî/ê digot, *"di xebatên çapemenî-weşanê de pozbilindî pir zêde ye."* Rewşên wisa bê perwerde, bi lezûbez ji valatiyan sûdê digire, rayeyê, derfetan bi dest dixe, hene. Ev rewş ber bi xwewendakirinê ve dibe. Pozbilindî wekî feraset, halê ruh, libata mirovê bê perwerde, bê çand, bê berpirsiyarî ye. Takekesîtî, mulkperestî, dizî ji vir dest pê dike. Cihê ku mirov raserî mirovên din tê dîtin, pozbilindî ye. Lîberalîzma burjûva dibêje, *"yê ku xwe neecibîne ew ê biteqe, bimire. Her kesek xwe diecibîne."* Ev ne helwesteke rast e. Erê, her mirov ji ber bûyînê xwe diecibîne, lê ne bi şiklê ku xwe di ser mirovan re bibîne. Bi ecibandina her kesî ve xwe diecibîne. Mirovbûnê, zindîbûnê diecibîne, lazim e em xwe bigihînin asteke wisa.

Lazim e vesaziyên erkan bê sererastkirin. Bi rastî jî bêyî formasyoneke wisa heke rayeyê bi dest dixin, ew ne rast e. Di qada YRD'ê de kadroyên pir kevn, bi ezmûn hene, di xebata rêxistinê de bi ezmûn in, li gel wê di xebatên propaganda-ajîtasyonê de bi tecrûbe ne, yên ku wisa nû, di carekê de bilind

bûne, tine ye. Di nav re hin dibin wisa bûne, lazim e bên sererastkirin.

Di qada çapemenî-weşanê de girtina însiyatîfê lawaz e. Li pey hinan kaş dibin. Hevalan rexne kirine, em dikarin dubare bikin. Mijara *"çapemeniya kê"* hinekî bi nîqaş e. Rewşeke ku xwe bêalî dibîne heye. Rewşên wisa hene ku wekî xebateke partiyê lê mêze nake, li gorî pêwîstiyên xeta partî rêxistinbûn, jiyan, karkirin, propangada-ajîtasyonê nameşîne, xwe wisa nabîne. Dema wisa dibe jî ne alî ye. Wê demê seknek îdeolojîk tine ye. Çi dimîne? Mîna reflektorekî çi tê pêşiyê dixe nav rojname, kovaran, bêyî li elekê bide, li ser ekrana televîzyonê diteyisîne. Esas tam jî ne wisa ye, wer tercîh dike, wisa tê gotin, lê dema ku tercîh wisa dibe pêk tê.

Pîvan, feraset, nêrîn, rêgez cuda ne. Tu partiyê qebûl neke, ne li ba rêgez û pîvanên partiyê be, feraseta te ne rast be, danewerivîne, wekî feraset tu nikare teqlîd jî bike. Propaganda-ajîtasyon ne lîstikvanî ye.

Tu li çapemeniya TC, çapemeniya AKP'ê dinêrî her tiştên boneyî şer çapemeniyê li xwe girtiye. Mesela qenala me ya Medya Haberê ji şehîdên me re nabêje *"şehîd"*, qenala Stêrkê dîsa carinan dibêje. Çima? Tê gotin ku hiqûqa Ewrûpayê *"wisa bûye."* Wê demê em nizanin ku çapemeniya çawa ye û ya kê ye. Eger ku çapemenî ji ber hiqûqê wisa dike, wê demê em bigirin baştir e. Ji ber ku civak temaşe dike. Gelek caran şehîd nayên dayîn an jî deh çirkeyan li ser ekranê namîne. Em nikarin wêneyekî jî bibînin. Tê gotin ku merasîma cenazeyê çêbûye, qelebalixê nîşan dide, lê merasîma kê ye, ev nayê dayîn. Vî mirovî canê xwe daye canê xwe! Yên wisa dibêjin lazim e kêmekî bên êşandin, hinekî bibînin ku bê canê xwe dayîn çi ye, êş çi ye, her hal wê demê dê fêm bikin. Wisa ji vexwarina şûşeyeke avê kêmtir tê dîtin. Tê gotin ku ma wê çi bibe, ma wisa dibe! Ev rewşeke pir giran e û pir zorlêker e. Em hemû temaşe dikin, dema ku nabêje şehîd em hemû bandor dibin. Eger wê wisa bibe, nebe baştir e. Rewşeke pir zorlêker e.

Ew ê çawa bê sererastkirin nizanim, lê em partiyekê dimeşînin, propagandaya şoreşa azadiyê dikin, alîgirê partiyê ne, alîgirê Rêbertiyê ne, alîgirê têkoşîna azadiyê ne. Lazim e têgehên me, feraseta me li gorî vê be. Em dikarin tehrîk nekin, li uslûbê xwe miqate bin, çarçoveyeke hiqûqî ya ku em weşanê dikin heye, di hin milan de em dikarin zorê li wan nekin, lê em nikarin rastiya xwe biçepînin. Eger ku em nikaribin rastiya xwe di wê çarçoveya hiqûqî de bi şiklê yasayî û legal deynin ortê, wê demê lazim e em îllegal pêk bînin. Em dest ji legalbûnê berdin. Ji ber ku em xwe bi xwe dixin ber otosansurê, îdeolojiya xwe diguherînin. Her roj tu li ser navê PKK'ê weşanên ku îdeolojiya PKK'ê diçepîne dike. Tu teşeyeke wisa dide mejiyê mirovan ku ev jî felaket e. Ji wê weşanê ne girseya partiyê, ew ê dijberên partiyê derkevin. Lazim e wisa neyê kirin, wisa nebe.

Tê gotin ku *"heval bi xwe ne bawer in, hakimiyeta wan a îdeolojîk lawaz e, meyleke wisa zêde ya aqilmendiyê heye."* Li beramberî sîstem, perwerdeya neteweya demokratîk bêalîbûn heye, xwe li ortê dihêle. Li cihekî navbera modernîteya kapîtalîst û modernîteya demokratîk de ye. Eger em wisa bibin, em ê bibin tasfiyekerên herî xeter. Kî hewl bide weşaneke wisa bike, bila bizane ku tasfiyekerê herî xeter e. Yek dikare dijberiya PKK'ê bike, her roj organên weşana AKP'ê û yên dinê heqeretê dikin, ew ne mesele ye. Lê li ser navê PKK'ê tu bêje teoriya PKK'ê ye û li cihekî navbera PKK û TC'ê raweste, wir biteyisînî, hingê tu PKK'ê revîze dike, tasfiye dike, bi navê PKK'ê tiştên şaş pêşkêşî mirovan dike. Tu mirovan li ser navê PKK'ê şaş perwerde dike. Bi navê pîvanên Rêbertiyê, tu pîvanên burjûvayê radigihîne. Ev dibe dijminahiya herî xeter. Lazim e em dîqet bikin. Ev kar ne karekî wisa hêsan e. Propaganda-ajîtasyon teşedayîna hinekan e. Eger tu li gorî pîvanên partî, rêgez û pîvanên Rêbertiyê bike, ew dibe xebata partiyê. Heke tu wisa neke, mîna li ser navê partiyê dike xwe nîşan bide, wê demê tu yê dijbertiya xwe ya partiyê derxîne holê.

Di bernameyan de, nivîsan de, dîtbarî de pêdivî bi lêkolînên berfirehtir ên teorîk-îdeolojîk, bi uslûbekî kişîner heye. Pêdivî bi dîmenekî xwedî pîvan heye, lazim e em baldar bin. Rêbertiyê wekî pîvan got, *"jiyana mîna yekî ji gel."* Wekî pîvana kadro, milîtan got, *"yek loqme yek xirqe."* Her roj tu bi markayên navdar derket ser ekranê, ew ê çi bibe? Hingê mîna reklama saetan a Mehmet Alî Bîrand lê tê. Wî dikir, qet nedibû wî pere werdigirtin. Dema ku tu belaş reklama ew kesên ku nizanim çi dikin tînê ser ekranê, civak bi hêrs li wê dinêre. Em ê ti carî ji bîr nekin ku bê ka nirxên me çawa hatine afirandin. Em bi kar tînin, lê ew nirx hemû bi xwîna şehîdan, bi çirika xwînê tên qezenckirin. Malê gel e û dema ku gel dibîne bi malê wê çi dibe, ji partiyê dûr dikeve. Ji ber vê jî em ê li cil û bergên xwe, li tevgera xwe, sekn û uslûbê xwe miqate bin. Em ê mîna lumpenan nebin. Em ê mîna xwezilokên burjûvayê nebin. Em ê cil û bergên mirovên kolebûyî neteyisînin. Rêgez, pîvana redqebûlê, îdeolojiya Rêber Apo heye. Rêbertiyê got, *"Uslûbê me li gorî me baş e, çima hûn xweziya xwe bi hinên din tînin."*

Li girtîgehê me hin tişt dinîvîsandin, wê demê Yalçin Kuçuk kovar derdixist. Uslûbekî wî heye, bi gotinên mîna min wisa kir, wisa birî, xwe bi hevalan dida xwendin. Hevalê Fûat ji bo Serxwebûnê nivîsek nivîsî, piştî 3 rojan ji Rêbertiyê hişyarî hat, çawa dîtiye, çawa hema çûye ber destê Rêbertiyê nizanim, got; *"çima, qey heval uslûbê me naecibînin? Uslûbekî me jî heye. Çima xweziya xwe bi hinên din tînin."* Nikare bê gotin ku ma hevalê me ye çi pê tê. Semîrê tasfiyeker digot, *"her egîdek şiklekî xwe yê xwarina mast heye. Di nav partî de her kes dikare li gorî dilê xwe tevbigere."* Rêbertiyê jî jê re xeber dan. Got, *"PKK ne kuçe ne, her kes wekî dixwaze nikare hespê xwe bibezîne. Pîvaneke vir jî heye, rêzik heye, ne bêxwedî ye û lazim e ev bê esasgirtin."* Lazim e heval bizanin, baldar bin. Heke tiştê ku tu nake ji hinên din re bêje bike, nakin, ti kes baweriyê bi te nayne. Di vî warî de bawerî pir girîng e. Ev ne pêlîstoka zarokan e. Tu qet wisa neke, ne li gor gotina xwe be, lê ji hinan ben-

dewariya pêkanînê bike. Mirovê pênebawer wisa derdikeve. Ewqas mirov çawa bi Rêber Apo ve hatin girêdan? Heke li Enqereyê di qesra Tayîp de rûniştana û ev bigotana, ti kesî bawer nedikir, wisa nedihatin girêdan. Lê çû sirgûnê, di nav partiyê de bû, rojekê jî ne li derveyî van kadroyan bû. Pênc qirûşê wî jî tine ye. Ji bo xwe milkekî 5 qirûşan jî negirt. Giştî hêz, nirx, keda xwe da têkoşîna azadiyê. 20 sal in li êşkencexaneya Îmraliyê ji bo karên gel li ber xwe dide, hewl dide bijî. Ji ber ku mirov dizanin ev ji bo wan nirxekî çiqasî mezin e, bi Rêbertiyê ve tên girêdan, bi gotinên wî bawer dikin. Wisa nebûya kesî bawer nedikir.

Bi rastî jî bandorker bûn, çêkirina rast a nûçeyan, hîkarîkerbûn, derxistina cewherê kar, girîng e. Girêdayî lêhûrbûnê ye. Li gel vê girêdayî têkoşerbûyînê ye. Em di van mijaran de lawaziyê dibînin. Mesela em li rojnameyan dinêrin, li televîzyonê dinêrin, em li kirinên xwe, asta fêmkirina hevalan dinêrin, nebes e. Herî dawî me di nava rêveberiyê de anî ziman. Wekî rêveberiya partiyê em daxuyaniyan didin. Daxuyanî jî yan yek an jî du rûpel in. Dixwîne, çi peyam dixwazin bêne dayîn, baş nabîne. Ya talî, heta ya qet tê de nîn e derdixe pêş. Dibêje, *“PKK vê dibêje”* û li gorî xwe hildiberîne. Lê di wir de peyama ku daxuyanî dide nagire, nabîne. Naxwe tercîh cuda ye. Naxwe lêhûrbûn lawaz e. Ango ne wisa nezan e, xwe dide axaftin. Wekî dixwaze jî diguhere. Rêxistinê, nivîsa navenda rêxistinê diguhere, dikare biryarê jî biguhere. Ev şaş e. Dibêje, *“ya rast ev e”* û xwe ewqasî jî rayedar dibîne. Xwe mîna xwediyê PKK’ê dibîne, wisa nabe. Li milekî di navbera PKK û dewletê de mîna bêaliyan bisekine, li milekî jî dema hat hesabê te mîna şefekî mudaxeleyî her tiştê PKK’ê bike. Li ti biryar û rêzikên wê guhdar neke, bêje *“ya rast ez im, mîna zanebûna min e”* û bike. Du şaşî wisa li cem hev, wisa li heman cihî derdikeve ortê. Bi rastî jî çi peyam tê dayîn, heval nizanin, nebes e, em rexne dikin. Ji ber vê jî ragihandina daxuyaniyan nebes e.

Encamên ku ji bernameyan derdixînin nebes e. Em mêze dikin, ne li gorî rojevê ye.

Her feraset û xeteke wan a li gor xwe heye. Xeta di eksena Ewrûpayê de vê diteyisîne. Her wê dispêrin me. Em ê çi bikin ji wê? Ne rast e ku ewqasî di bin bandora hinên din de bimînin. Bi gotina em ji Ewrûpayê weşanê dikin, ma em ê propagandaya fikrê Ewrûpayê nekin. Em ê di bandora Ewrûpayê de nemînin! Yê me jî fikr û xeta me heye. Em ê propagandaya xeta xwe bikin. Lazim e hinekî wisa be, lê bandorbûneke pir zêde ya ji fikrê Ewrûpayê heye. Hevalên me kêmekî guman dikin û nabêjin, *“ka heval ji welat çi dibêjin, rêveberiya me heye, gelo çi dibêjin, dibe ya wan rast be, em kêmekî guh bidinê.”* Li kû dibin bila bibin, dibêjin *“em rastiyê dizanin”* û xwe ferz dikin.

Lê li Ewrûpayê nabe, heke li Ewrûpayê mirov nikaribe welat baş bişopîne, dikare tavilê ji rê derkeve. Li wir sîstemek heye. Sîstemeke wisa ye ku tu destê xwe nede avê-sabûnê, mîna ku ti tiştek nîn e xuya dike. Lê kêmekî dest bide zulfê yara wê, ew ê dîktatoriyeke çawa derkeve ortê. Gotina demokrasiyê li lû ye, vala ye. Demokrasî qasî parastina berjewendiyê wan heye. Tê maneya parastina berjewendiyê wan. Hela kêmekî zirarê bide berjewendiyê wan, binêrin çawa dîktatorî ye, demokrasî ye.

Çapemenî lazim e di her warî de bihîzyar, geş, encamgir be.

## 6-WEZÎFEYÊN JINÛVE AVABÛNÊ

Parçe parçe be jî me têkildarî pêşketina xebatên xwe û pirsgirêkên îro bi şiklekî dîrokî hin nirxandin anîn ziman. Me rexneyên xwe jî kirin. Li ser çapemeniyê rexne zehf in. Rexnekirin ne pirsgirêk e, lê derbaskirin wisa ye, me wer fêm kir. Ji ber ku bi rexnekirinê derbas nabin. Ne ji ber nezaniyê ye. Ji ber nezaniyê be tu yê bi rexneyan bide derbaskirin, dikare wisa bê gotin. Bi zanebûn dibe. Ji ber vê jî rexne bi serê xwe ne rastker e, rêbazên din lazim e. Li ba vê teqez rastkerbûn lazim e. Eger ku ev nebe, xerab e. Ji ber ku bi şiklekî zelal derketiye ortê, ev kar wisa nabe.

Di vê rewşê de em xebatên xwe yên propaganda-ajîtasyonê, beşa wê ya çapemenî-weşanê çawa dikarin bînin asteke têrker? Lazim e em xebatan çawa bigirine dest? Hinekî em di vê çarçoveyê de li ser mijarê rawestin her hal ew ê baştir be.

Pirsgirêk jî wezîfe jî tên zanîn, feqet dîsa jî nîqaş, rexne-rexnegirî, jinûve biryardarbûn, plansazî ew ê li cih be. Li gor wê pêşxistina vesazkirinên nû ew ê baş be. Lazim e hesab dayîn û xwestin hebe. Pir zêde guhertin hene, ev hemû di çarçoveya rêveberiyê de didomin.

Li gorî rêziknameya YRD'ê, lazim e her du salan carekê konferansek bê lidarxistin. Beriya 2013'an ji ber şer yek du caran pêk nanî. Li gel vê ji 2015'an ve pêk naniye. Di Hezîrana 2014'an de carekê li dar xist, ew konferansa dawiyê bû. Konferansa çendemîn bû, baş nizanim. Bi şiklekî normal bihatibana

lidarxistin, ji 2001'ê heta 2019'an 18 sal hene, ew ê Konferansa 9'emîn bihatana lidarxistin. Feqet herî kêm 3 konferans nehatin lidarxistin. Herî zêde dibe ku konferansa 5'emîn be. Ji derveyî konferansan, bi tevlîbûna hevalên ji hemû qadan civînên mîna konferansan hatin lidarxistin.

Lazim e civîn bêne lidarxistin, ji ber ku kolektîvîzmê pêş dixin, tevlîbûnê zêde dikin, berpirsiyariyê zêde dikin, kontrolê ava dike. Pirsgirêkeke me ya cidî ya kontrolê û tevlîbûnê heye. Pirsgirêka kolektîvîzmê heye. Lazim her kes hinekî din hevûdu kontrol bikin. Di çapemeniyê de pirsgirêka xebata kolektîf heye. Li çapemeniya nivîskî jî li qadên din ên xebatê jî danehevek zêde, derfet û firsendên zêde hene. Berhemên qat bi qat zêdetir dikarin bêne derxistin. Ez bi vê bawer im. Lê xebata kolektîf lawaz e, takekesîtî pir zêde ye. Mesela bi şiklekî hevpar nikarin pirtûkê amade bikin, bi nîqaşek hevpar nikarin hizrekê ava bikin. Nêrînên hevalan tersî hev in. Li heman cihî ne, li ser heman bingehê dixebitin, heman karî dikin û PKK'yî ne, lazim e nêrîn hevpar bin, lê belê ne hevpar e, cuda ne. Ev ne rewşeke pir baş e. Egîdî ne ev e, teqez partîbûn, milîtanbûn ne ev e, azadbûn jî wisa pêk nayê. Ev tê maneya takekesî û pozbilindiyek pir zêde. Kaprîs hene, waswase hene, kariyerîzm hene, gelek nexweşiyên ku pêwîst e neyên ser ziman hene. Halbûkî di civata çapemeniyê de lazim e tiştên wisa nebin. Dema ku mirov şehîdên çapemeniyê tîne ber çavên xwe, tu dibêjî lazim e di hereketa van şehîdan de şopa vê jî tine be; di vir de enceq xizmet dibe, bi temamî ked dibe, hewldan dibe, jiyan û xebata hevpar dibe. Feqet rastî ne wisa ye. Mixabin ji ber vê sedemê pêdivî bi sererastkirineke cidî heye, pêdivî bi biryardarbûnê, jinûve avakirinê heye. Pêdivî pê heye ku ji komîteyê dest pê bike, hemû xebatên qadan xwe li gorî vî terzî bigire dest, jinûve bername bike, hin guhertinan pêk bîne. Wisa bibe dikare hê dînamîk, hê tevgertir bibe. Pir zêde eynî kar meşandin, heman kar kirin, rûtîn dibe, dubarebûnê tîne.

Li derveyî me jî dema ku tu li xebatên çapemenî-weşanê dinêrî, kesek karekî zêdetirî 5-6 mehan nake. Ez mêzeyî nûçegihanên din dikin, eger yek pêşkêşvaniyê dike herî zêde piştî şeş mehan tu dibînî diguhere, bernameyeke din çêdike, karekî din dike, ji wî karî derbasî yê din dibe. Demekê xebatekê dimeşîne, tiştê dikare bide dide mirovan, piştî wê dikare bibe dubare, zorlêker. Guhertin pêwîst e. Ji bo guhertinê bike jî lazim e her kes ji bo her wezîfeyê amade be û karibe her karî bike. Naxwe kadroyê li qada çapemeniyê wekî çawa ew ê wezîfeyên xwe yên şoreşgerî, partî pêk bînin, her wiha lazim e wezîfeyên çapemenî-weşanê jî bînin cih. Ango nikare bibêje ez ê tenê karekî bikim, bi wê derbas bikim, bi kamerayê dîmenan bigirim, kameravan im, 80 salan bibim kameravan. Tu salekê xebitî, nebû 2 salan xebitî, hunerweriya xwe danî ortê, tiştê ku tu dikarî bidî te da. Piştî wê lazim e tu bikarîbî biçe karên din, cuda. Dikare biçe xebatên derveyî çapemeniyê jî, lê ez behsa karên di nava çapemeniyê de dikim. Lazim e tu bikaribe di karên teknîkî de bike, karên nivîskî de bike, di karên dîtbarî de bibe pêşkêşvanê bernameyê, bibe spîkerê nûçeyan, bibe amadekarê nûçeyan jî. Lazim e tu bikaribe li pêş be jî li paş be jî. Kar li kû be lazim e bikevî pozîsyoneke ku bikarîbe hemûyî bike. Wisa bibe guhertinên kar dikarin tim bi tim pêk were. Mirov ji rûtînê, dubarebûnê dikarin rizgar bibin, hunerweriya xwe baştir deyne ortê, hê berhemdartir bibin. Li gel vê bi taybet dema ku tu tevlî xebata kolektîf bû, li dijî vê derneketî, li wir berhemên zêde derdikevin ortê. Çima nebe? Çima dernekeve?

Yên berhemê nadin, diz in, berîkbir in, şêlînker in, mêtinger in, zextker in. Ew her tim qurnaziyê dikin, hewl didin eyarê bidin tiştan. Ji ber wê jî nikarin du milê kar bînin ba hev, nikarin berhemdar bin. Hereketeke fedaî, hereketeke ku xwe ji bo civakê feda kiriye, çima ne berhemdar be, çima gotinên xweş hilneberîne, çima pirtûkên bi bandor nenivîsîne, çima libatên baş nîşan nede? Tiştekî ku asteng bike tine ye. Dikare karê herî

baş bike, yê herî têkûz bafirîne, bike guregur, her cure karî bike û ti astengiyek li pêşiya vê milîtanbûnê, berhemdariyê tine ye. Rastî ev e, eger astengî derkevin, pirsgirêk rû didin, li wir lawazî hene, ji ber wê ye. Xwe perwerde nake, xwe ji xebateke komple re amade nake. Di encama wan de encamên bi vî şiklî derdikevin. Lazim e em van derbas bikin.

Em çawa dikarin van pirsgirêkan derbas bikin, em dikarin li kû bikin, em nizanin. Lê lazim e em li ser kar bisekinin. Heke di vê mijarê de sîstema xebatên akademîk rêkûpêk bûya, mînak xebatên ku lazim in û me nikarîbûn bikirana, me dikarîbû di binyeya akademiyan de pêk banîbana. Rêbertiyê Akademiya Mahsûm Korkmazê wisa dixebitand. Dawiya her dewreyekê mîna konferansekê dinirxand. Karên partiyê ji nû ve plan dikir, ji nû ve vesaz dikir, wezîfedar dikir, sewqî pratîkê dikir. Dawiya her dewreya Akademiya Gûrbetellî Ersoz jî dikare wisa bibe. Wisa bibe, nêyîniyên mîna pêknanîna konferansê, pêknanîna civînên din ew ê li ser bingehê encamên dewreyên akademiyan bê derbaskirin. Lazim e akademî sîstema xwe ya perwerdeyê bîne vê astê. Terzê Rêbertiyê ev e. Ji ber ku em jî di nav hereketa Rêbertiyê de ne, em ê terzê Rêbertiyê esas wergirin. Em nikarin bêjin Rêbertî wisa ye, em cuda ne, em cuda dibin. Wê demê em ji Rêbertiyê qut dibin. Rêbertiyê çawa kiribe em ê jî hewl bidin wisa bikin. Ya ku serketinê dafirîne, serketinê derdixîne ortê teqez ev e. Bi şiklekî cuda rêya serketinê tine ye. Di vî warî de pêdivî bi hin nirxandinan, sererastkirinan, rexne-rexnegiriyê heye.

Demek dirêj çêbû, wezîfeyên rêveberiyê hatin girtin. Gelek guherîn niha, kê çiqas kir-nekir, serxist-nexist, kî, ji çi, çiqasî berpirs e, bi şiklekî cidî hesab dayîn-xwestin pêk nehatiye. Lazim e hesab dayîn û xwestin çêbibe. Rewşeke girîng ev e. Em ê çawa vê bikin, em nizanin. Heke sîstema akademîk pêş bikeve, li ser wî bingehî dikare hinekî çareserî çêbibe. Lê, heke rêveberiya partiyê, Komîteya Îdeolojîk, Sekreteryaya Partiyê hinekî din eleqedar bibe, dikare baştir bibe. Lazim e em karibin fera-

seta ku li gel komîteyê xebateke şidandî dimeşîne, pêş bixînin. Lê rewşeke ecêb e, her çawa dibe, em ne kişîner in, em dehf didin. Ji xwe dûr dixînin. Ev demek e em van her dibêjin, lê bi ti şiklî neguherî. Em hêvîdar in ku di demên pêş de biguhere. Lazim e teqez biguhere. Bi vî şiklî nameşe.

Di vesazkirin, guhertin û jinûve avakirinê de lazim e hin guhertinên zihniyetê çêbibe. Lazim e ji wir bê destpêkirin. Lazim e di mijarên destgirtin û pênasekirina YRD'ê de sererastkirinek çêbibe. Bi rastî jî konferanseke fermî çêbibe, lazim e YRD biryara tevlîbûna PKK'ê bigire. Lazim e neyê gotin *"ma ji PKK'ê cuda ye?"* Girîng e ku biryara fermî û asta biryarê bê pêşxistin, pêdivî bi vê heye. Lazim e xebat wekî xebateke partiyê bê dîtin, di nava rêxistinbûna partiyê de bê destgirtin, li gor bername û rêziknameya partiyê xebatên YRD'ê bê plankirin, rêxistinkirin, vesazkirin û meşandin. Em hê nû pêk tînin, mesela rêxistinbûna rêveberiyê, sîstema xebatê ne li gor rêziknameya PKK'ê ye, li gor sîstema KCK'ê ye. Ne rêxistineke partiyê ye. Cara yekem me got, *"em di komîteyê de Sekreteryayekê rêxistin bikin"*, dibêjin *"na em ê bibin hevberdevk."* Di rêziknameya PKK'ê de wezîfe û pênaseyeke wisa tine ye, berdevkiyeke wisa jî tine ye. Ev rêxistina YRD'ê sist dike, vediguherîne rêxistineke gel.

Bêguman di nav YRD'ê de kadroyên partiyê hene, welatparêz jî hene, lazim e wisa jî bibe, rêxistinbûn her ji kadroyan pêk neyê. Welatparêz jî bixebitin, lê di nav YRD'ê de lazim e rêxistinbûna partiyê ya kadroyên partiyê jî hebe. Pêwîst e sîstema rêxistina YRD'ê li gorî partiyê be. Welatparêz jî sempatizan jî di encam de kadroyên partiyê ne. Lazim e li gorî xeta îdeolojîk a partiyê bijîn. Gerek îstîqamet îstîqameta partiyê be. Pîvan û rêgez lazim e pîvanên partiyê be, nekeve asta KCK'ê. Rêxistineke KCK'ê nikare bi têrkerî PKK'ê propaganda bike, nikare xeta fedaî bide. Yên ku xeta fedaî, milîtan nejîn nikarin bidin. Saziya ku lazim e civakê li ser xeta Rêbertiyê, xeta par-

tiyê bide jiyandin, heke bikeve asta xeta welatparêziyê, hingê xeta Rêbertî û partiyê tine dike.

Divê neyê gotin em kadroyên partiyê kêm bikin, bila li vir welatparêz bixebitin. Di xebatên çapemeniyê de ew ê kadroyên partiyê pir bixebitin, qada ku herî zêde kadroyên partiyê lê ne, ew ê vir be. Hem jî ne ciwan, ne kadroyên nûtevlîbûyî, kadroyên kevin, xwedî ezmûn, xwedî danahevek teorîk bikevin nav vê xebatê. Ya rast ev e. Ciwan pir in, dikarin milê pratîk ê vî karî bikin. Karên zihniyetê, nîqaşa teorîk helbet ên xwedî komasî dikarin bikin. Her ji yên nûtevlîbûyî, ji ciwanên 15 salî pêk bînin, ew ê wekî îdeolojîk û teorîk çi bidin hinên din, çi vebêjin. Jixwe ew pêdiviya xwe bi perwerdeyê hene. Jirêketin, tersî, şaşî jixwe li vir e. Ez nabêjim bila qet ciwan an jî welatparêz nîn bin. Lazim e ew jî hebin, lê ya esas divê kadroyên partiyê bin. Lazim e kadroyên partiyê yên bi ezmûn, xwedî danehev, li vir bin, vê xebatê bigirin ser milên xwe. Mirovên ku xwe perwerde kirine, li xeta Rêbertiyê, felsefe û teoriyê gihiştî, xeta îdeolojîk-teorîk zane, dikare propaganda-ajîtasyonê bike, binîvîse, baxive, bûye xwedî hêza ruh, agahî, fikrê lazim e vî karî bikin. Lazim e kadroyên wisa di vî karî de bên erkdarkirin.

Rêbertiyê vala vala Mazlûm Dogan wezîfedar nekir, rojê 500 rûpel pirtûk dixwend. Yê ku herî zêde tevlî nîqaşan dibû, gotar dinivîsî Mazlûm Dogan bû. Ji bo vê jî Mazlûm Dogan hat erkdarkirin. An ne mirov nebêje, ew ê qet gotin ji devan dernekeve, naxive, propaganda neke, tenê wekî kevir rûnê, ji bo wê anîne, dane rûniştin. Hevîrê hişmendiya partiya me bû û yê hevîrê hişmendiya me ji bo vî karî bike bû wezîfedar.

Ev der ne cihekî mudiriyetê ye, cihê karkirinê, xebatê, hilberîna propaganda-ajîtasyonê ye. Ji ber vê jî sererastkirin lazim e. Lazim e sererastkirin ji vir bê pêşxistin. Pêwîst e ku xebat wekî xebata partiyê bê pênasekirin, xeta pêşengtiya partiyê bê serwerkirin, li gorî rêxistinbûna partiyê bê rêxistinkirin, beşek girîng a kadroyên partiyê di vî karî de bên lêhûrkirin, kadroyên bi ezmûn li gel welatparêzan karên pratîkî bikin,

tevlî partiyê bikin, hem perwerdeya partiyê hem jî perwerdeya gelê welatparêz li ser bingehê xebatên wisa rêxistî bimeşîne. Lazim e kadro welatparêzan jî perwerde bikin, welatparêz nikarin kadroyan perwerde bikin. Rêbertî giştî gel perwerde dikir. Gel kadro perwerde nedikir, kadro gel perwerde dikir, partiyê perwerde dikir. Em ê gel perwerde bikin, welatparêzan perwerde bikin. Em welatparêzan bînin û bêjin *"ka baxive û pîvanan bide qezenckirin"* ew ê ne rast be. Dikare kê perwerde bike? Lazim e yekî xwedî pîvanên bilind be ku karibe bibe perwerdekar. Ji ber vê jî lazim e pêkhate û xeta rêxistinî bê sererastkirin. Lazim e bi temamî xeta partiyê bê hakimkirin. Pêwîst e bi temamî wekî xebata Rêbertî û partiyê bê pênasekirin, li gorî pîvanên Rêbertî û partiyê giştî jiyan û kar bê avakirin. Li gorî vê lazim e qada çapemenî-weşanê wekî xebatên felsefîk, teorîk, îdeolojîk bê şênberkirin. Bi şiklê din nêzîkatî, pênase ne rast in. Wekî sîstema rêxistinê, terzê jiyanê, polîtîkaya weşanê, wek terzê kadro, wek terzê xebitîn û rêveberiyê lazim e partî bê serwerkirin. Pêwîst e em sererastkirinê ji vir ve bidin destpêkirin, pêşik ev der be.

Em nabêjin bila qada propaganda-ajîtasyonê tenê boneyî partiyê bixebite. Enceq wekî esas pêwîst e gel perwerde bike. Lê ew ê gel jî ji aliyê partiyê, gerîla bê perwerdekirin. Lazim e fikrên Rêbertiyê, têkoşîna azadiyê ji bo hemû raya giştî ya cîhanê ragihîne. Li ser bingehê ruh, felsefeya Rêbertî û partiyê lazim e hemû gelên cîhanê, kedkaran, jinan û ciwanan perwerde bike. Lê pêwîst e ew bi xwe ji bo cihekî perwerdeyê guncav be, xwedî taybetmendiyên perwerdekar be. Pir girîng e ku roleke wisa ya perwerdeyê jî bilîze. Danahev gerek e, dixwazim vê bêjim. Pêwîst e kadroyên xwedî komasiya herî kûr a zanyariyê li vir bin. Yên ku herî zêde Rêbertiyê dizanin, herî zêde diteyisînin, herî zêde fêm dikin, lazim e di vê xebatê de werin bicihkirin. Ya duyemîn, lazim e mirov bawer bikin. Pêwîst e li ser terzê jiyan û xebatê; pîvanên partiyê, xeta îdeolojîk û polîtîk, rêxistinî hakim be. Lazim e ne mîna meleyen derewkar

be. Nivîsên Rêbertî û partî bên vekirin, bêje wisa wisa bikin û bi xwe bi şiklekî cuda binîvîse, nabe. Lazim e gotinên xwe bike, kirinên xwe vebêje. Ji ber vê jî xebata çapemeniyê lazim e bibe cihekî mînak ku jiyana partiyê û terzê xebatê lê hakim be. Pêwîst e sîstema xebata komunal û xebata kolektîf li vir bê avakirin. Lazim e welatparêz jî tevlî jiyana komunal bibe, ciwan jî. Tevlîbûna wekhev, azad, tevlîbûna bi îrade di asta her kesî de gerek pêk were. Lazim e hemû nirxên azadiyê bên parastin. Pêwîst e jiyaneke mînak a partiyê, sîstema jiyana komunal û xebata kolektîf li holê bê danîn. Lazim e hemû pirsgirêk, di nav vê sîstema jiyana komunal û xebata kolektîf de bigihêje çareseriyê. Nebe çavkaniya pirsgirêkan.

Yê ku bi xwe dibe pirsgirêk, nikare wekî çareserkerê pirsgirêkê biteyise derve, tenê dikare pirsgirêkan biteyisîne. Lazim e hemû pirsgirêkên xwe çareser kiribe ku dema civak bi pirsgirêkan re hevrû dibe karibe têkildarî çareseriyê nêrînan bide. Rêya çareseriyê nîşan bide. Ji ber vê yekê lazim e qada çapemenî-weşanê bibe cihê mînak ê partiyê, rêxistina partiyê. Di vê mijarê de pêdivî bi netbûneke tûj heye. Lazim e ast neyê xistin.

Bûyîna partî, derxistina asta herî jor a asta pîvanên îdeolojîk û rêxistinî ne. Heke hîza bikeve asta jêr a civakê, em ê civakê bibin kû, çawa perwerde bikin? Ev xebat di warê pîvanan de lazim e li pêş be ku civak bi wir ve bikşîne. Çapemeniya ku lazim e pêşeng be, heke bi gotin, libat, nivîsa xwe ve li herî jêr be, ew ê çawa karibe milet berpêş bibe? Nikare ti kesî bibe ti derê. Hingê ew ê civak zêdetir berpaş biçe, bikeve hembêza faşîzmê, mêtingeriyê. Pêwîst e wisa nebe. Ji ber vê jî lazim e ku YRD biryara tevlîbûna xwe ya partiyê bide. Lazim e pîvanên partiyê bên esasgirtin, pirsgirêka partîbûnê bi hemû rehendan bên destgirtin û çareserkirin. Ango lazim e YRD xebatên partîbûnê bi şiklekî pir çalak, karîger bimeşîne. Lazim e ti dudilî, nîqaş nemînin. Li hember sekn û ferasetên ku pîvanan berpaş dikşîne, pîvanan dixîne, têbikoşe. Têkoşîneke geş a îdeolojîk û rêxistinî bimeşîne û sererast bike. Heke yên asteng

hebin li qiraxê deyne. Lazim e xwediyên van taybetmendiyên xerab ne li ser vî karî, ne di nav de be. Ji ber ku wisa be wê rêxistinê, xebatê xerab bike, zirarê bidiyê, ji bo wî bi xwe jî ne baş e. Lewma pêdivî bi partiyîbûneke cidî heye. Pêdivî bi tevlîbûna partiyê û bûyîna li gor pîvanên partiyê heye. Jixwe damezrandina wê li ser vî esasî ye. Bingehê wê wisa hatiye danîn. Ne biyaniyê vê ye. Lê mehtbûn hene, teriqîn hene, dejenerebûn hene. Ev rewş ji ber bandorên ferdan, terzê rêveberiyê, bandorên tasfiyekeriyê ye, jê wirdetir gelek sedem çavkaniya xwe ji serpêhatiyên me ne. Enceq ji kû tê bila bê, lazim e sedemên wê bêne dîtin, xeta partiyê bê sererastkirin. Lazim e di vê mijarê de dudiliyek tine be.

Pêwîst e ev wekî destwerdana hinan neyê dîtin. Wekî zextekê, neyê nirxandin. Ji bo ku xebat gihiştî bibe, berdar bibe, baştir bê birêvebirin pêwîst e her kes baweriyê bi gerekbûna wê bîne û li gorî vê tevlî bibe. Lazim e hewa, ferasetekе wisa were afirandin. Pêwîst e feraset wisa be. Li ser vî bingehî coşek, kelecanek, daxwazek, azweriyek derkeve holê. Gerek bandora partîbûnê ya bilindkirinê, xurtkirinê, berdariyê, pêkhêneriyê li ser vê xebatê bê serwerkirin. Lazim e her kes jî wisa fêm bike û tevlî bibe. An bi şiklê ku bila yek ji jor ve were, ferz bike, bi zorê bibe, hin werin me bikin partiyî, wisa nabe. Ya tê payîn ev e. Heke tu li ser kar e û tu jî partiyî be, wê demê çima tu bi xwe nake? Çima tu li gorî pêwîstiyên partiyê nabe? Civîn ji bo vê ne, lazim e em li pêşiya her kesî vê deynin. Baş e, çima tu ne li gorî partiyê ye? Tu kadroyekî çawa yê partiyê ye? Tu ji rêya partiyê derketiye, rexnedayînê bide, ji bo ku banga rêya rast bê kirin pêdivî bi civînan heye. Wisa nebe, feraseteke giştî û nêzîkatiyeke rastker bi şiklekî komî neyê derxistin, bi gotina bila hinek were me sererast bike, an em ê li gorî berê dewam bikin, nabe. Ti kes nayê ti kesî sererast nake an jî bi hewldana hinan nabe. Biryar tê girtin, feraset tê avakirin, li gorî wê yekgirtinek hizrê çêdibe, hewl tê dayîn, tevlîbûn tê nîşandan, rexne-rexnegirî pêş dikeve, xwe perwerde dike, rast

tevlî dibe ew ê kar rast bibin û rast bimeşe. Bi şiklekî din nabe. Em vê rastiyê bibînin. Esasê yekemîn ê sererastkirinê, jinûve avakirinê, biryardariyeke wisa ye, bi şiklekî yekpare ketina ser riyeke nû ye.

Dema ku em van dibêjin, em neheqiyê li hinan nakin, rexne nakin, sûcdar nakin. Di çapemeniyê de teredudek wisa heye, bi nîqaş e, xwe dide nîqaşkirin. Ev nîqaş ji Komîteya Çapemeniyê dest pê dike, Qada Îdeolojîk nîqaş dike, em tevlî nîqaşan dibin, hemû qad tevlî dibe, li virde-wirde her kes dikişkişîne. Çapemenî li ortê maye, dibe qadeke ku her kes şîrove dike, mîna dixwaze dikişkişîne. Ew ê çawa bike, li kû bike, li kû bi cih bibe, kî yê bi rê ve bibe, çawa xwe rêxistin bike, her kes her tiştî dibêje, her seriyek dengek jê dertê. Saziyeke ku xwe ewqasî dide nîqaşkirin ma dikare perwerdekar bibe, dikare pêşengtiyê bike? Ew ê bêjin destpêkê xwe perwerde û sererast bike. Xwe perwerde nekiriye, nexistiye nav nîzamekê ku rêxistinê bixe nav sîstemekê. Karibe hemû partiyê, gel bixe nav pergalekê. Lê nikare bike. Bi rastî jî li holê rewşeke şermê heye. Çapemenî tê nîqaşkirin, xwe dide nîqaşkirin. Ew ê çawa bibe, li kû bibe, rêveberiya wê li kû bibe, biçe kû? Ev 5-6 salên dawiyê ev hatiye derxistin. Berê ev tine bû. Xwe kişand rexekî Kurdistanê û çû, dîsa jî sîstemeke wê ya xebatê hebû. Hinan pirsgirêkeke wisa afirand. Çapemenî veguherî qadeke kişkişandinê. Ma saziya pêşengtiya îdeolojîk tê kişkişandin! Ji tevgereke ku saziya wê ya pêşengtiya îdeolojîk tê kişkişandin, çi dimîne! Pir xeter e, dixwazim wê bibêjim, rewş cidî ye. Di vê mijarê de lazim e rêveberiya partiyê dest li rewşê werde, ji vê rewşa ku tê maneya kişkişandinê, lazim e di her warî de bê derxistin. Lazim e qada çapemeniyê jî YRD jî xwe ji vê pozisyona kişkişandinê, şêlû, nîqaşî rizgar bike. Pênase diyar e, rêgez diyar in, pîvan diyar in. Lazim e li cih be, li gorî cihê rêgez, pîvana xwe be. Li gorî wê tevbigere. Vê biryardariyê, îradeyê deyne holê. Sîstemeke wisa esas wergire. Bi şiklekî din nabe.

Bi rastî jî rewşeke pir zorlêker, zirardar e û zorê li me hemûyan dike, êşê dide. Berê me pir girîngî didayê, lê wextê qada ku me herî zêde ked lê daye hat asteke ewqas nîqaşî, me ji xwe guman kirin. Lazim e em bibînin ku bê qada tê kişkişandin kî ye. Hin qet vê nabînin. Ti kesên ku xebatên çapemenî-weşanê, propaganda-ajîtasyonê bi Rêbertiyê re pêwendîdar dike tine ye. Nayê gotin ku Mazlûm Dogan vê bi rê ve dibir. Gûrbetellî Ersoz kî bû? Fermandara Biryargeha YJA Starê bû. Di 1996, 1997, 1998'an de em pev re xebitîne. Li Biryargeha Navendî, li Behdînanê, li Garê, li Metîna, wekî fermandariya biryargeha hevpar li gorî dîrektîfên Rêbertiyê li gel hevala Zeynep me tevgereke sererastkirina îdeolojîk-rêxistinî pêş xist. Gûrbetellî Ersoz ne yeka wisa bû ku tenê qelem girtiye destê xwe û nivîs nivîsandiye. Milîtaneke partiyê bû. Ji pêşeng û fermandarên têkoşîna azadiya jinê, gerîlaya azadiya jinê bû. Milîtaneke wisa ya partî û azadiyê bû. Lazim e wisa bê fêmkirin. Lazim e em cihê hevalan di nava partiyê de rast bizanin. Lewma jî dema têkildarî hevalên ku rêxistin diyar kirine, xebatên rêxistinê meşandine tên pênasekirin jî dema ku dixwaze tevlî wan bibe, fêm dike jî divê em rast fêm bikin. Bi şiklekî din nabe. Pir zêde ligorxwebûn heye, şêlûkirin heye, nêzîkatiya belavkirinê heye. Rewşeke wisa nayê qebûlkirin. Ji ber vê sedemê lazim e ev xisûs li ber çav bê girtin. Pêwîst e sererastkirinek bi şiklekî bi bandor bê pêşxistin.

YRD, Çapemeniya PKK'ê, ne saziyeke xêrê ya li derveyî PKK'ê ye. Ne cihekî wisa ye ku ji hêla saziyên xêrê yên Kurdan hatiye avakirin. Di nav Kurdan de cihê PKK'ê çawa be, cihê vê saziyê jî wisa ye. PKK di nava pêşketina gel de çiqasî cih girtibe, YRD jî di nava çapemeniya Kurdan de ewqasî cih digire. Ne wisa ketiye nav miletperestiyê, axatiyê û begîtiyê; ne dewamek wan e. Beriya her tiştî lazim e em sererastkirina xetê ji wir bikin. Lazim e em cihê wê, pênaseya wê rast bikin.

Ji bo îlankirina ERNK'ê me di Tîrmeha 84'an de biryar girt. Me plansaz kir ku danezana wê Fatma binîvîse. Gote me, *"Ez ê*

*giştî îsyanan lêbikolim, broşurê amade bikim, em ê dosyayekê derxînin, an jixwe nabe enî."* Wê demê me red kir, me gotê; *"Ev der tevgera PKK'ê ye, tu behsa hereketê dike. Vê eniyê em ava dikin, hereketa Barzanî ava nake."* Me li gorî wê danezana xwe amade kir, me îlana xwe kir. PKK kirina dewameke miletperestiya seretayî, wisa fêmkirin xeteriya herî mezin e. Berevajî vê lazim e wekî alternatîfa wê bê dîtin.

Miletperestiya seretayî, dewamek mêtingeriyê, qirkirinê ye. PKK ne dewamê wê ye, alternatîfa wê ye, dijberê wê ye. Lazim e ev bê zanîn. Di hemû xebatan de wisa ye, propaganda û ajîtasyon jî wisa ye, çapemenî jî wisa ye. Sekna wê ya dîrokî, sekna wê ya îdeolojîk, cihê wê yê rêxistinî tê şêlûkirin. Xebateke dewama miletperestiya seretayî, wekî îdeolojîk ti pêwendiya xwe bi partiyê re tine ye, milekî KCK'ê; wekî rêxistinî di pîvanên KCK'ê de qadeke xebatê ya ku mirov bi hilbijartinê tê ser kar û diçin; bi şiklê ku li gorî vê ti kes têkil nabe, ferd çi dixwazin dikarin bikin; pîvanên îdeolojîk, dîrokî, rêxistinî tên jirêderxistin, revîzekirin, ji rastiya partiyê tê qutkirin, şêlûkirin, sistkirin. Em nikarin vê qebûl bikin.

Xala ku dixwazim diyar bikim ev e. Piştî ku em ketin rewşên wisa, çapemeniya me ew ê aktîvîteya xwe zêdetir ji dest bide. Her diçe zêdetir an ew ê nêzî xeta miletperestiya seretayî ya PDK-YNK'ê bibe yan jî tine bibe. Ji ber ku cewherê xwe, xeta xwe temsil nake. Li ser wir rûnenê, serketineke wê nayê payîn. Ji ber vê jî lazim e ev baş bên zanîn. Lazim e di vê mijarê de her kes xwedî heman fikrî be. Lazim e Akademiya Gûrbetellî Ersoz xeteke wisa bigirtana. Li gorî vê karîbûya xeteke weşanê, sekna weşanê, tevgera çapemenî-weşanê ava bikirana. Li dijî her cure feraseta ku vê berevajî dike, çep-rast dikşîne, sist dike, lazim e karîbûya têkoşîneke pir xurt a îdeolojîk, rêxistinî bispartana. Heke ev nebe, perwerde hebe jî bê fêde ye. Heke ew ê perwerde hebe jî lazim e di van pîvanan de be. Ji bo jinûve sererastkirin û avakirinê, mijara yekemîn a ku lazim e bê kirin, dikare ev bê dîtin.

Xisûsa duyemîn esas me di çarçoveya rexneyan de diyar kir. Lazim e ji nû ve were plankirin, bernamekirin. Xebatên çapemenî-weşanê bi rastî jî teng bûne. Pêwendîdarê xala yekemîn, wekî çawa pênaseya dîrokî, pênaseya xetê, cihê wê, xeta wê ya îdeolojîk-rêxistinî hinekî hatiye şêlûkirin, tevlîhevkirin, her wiha çarçoveya xebatê jî hatiye tengkirin. Di rewşeke wisa de ye ku bernamekirina wê hatiye lawazkirin, sînordarkirin. Pêwîst e ev teqez bê derbaskirin. Heke em xebata çapemenî-weşanê, lewma propaganda-ajîtasyona spartî vê tenê wekî teyisandina polîtîkaya rojane bê kêmkirin, wê demê em partiyê, teoriyê, felsefeyê, lewma jî Rêbertiyê tine dikin. Li derveyî vê qadê dihêlin. Ev, îfadeya tengkirin û sereserkirineke zehf zêde ye. Lê belê rewşa heyî hinekî wisa ye. Lazim e ev rewş jî teqez ji ortê bê derxistin. Dema ku YRD hat damezrandin, bernamekirina wê ne wisa bû. Ez ji damezrînerên wê me, tevlî konferansa wê ya damezrandinê bûme. Ez tevlî biryar, plansaziyên damezrandinê bûm. Ev rewş ne wisa bû, em baş dizanin. Hingê xebateke wisa daketiye asta nûçegihantiya rojane ya polîtîk teqez tine bû. Heke ev xebat wisa bimîne fonksiyona propaganda-ajîtasyonê teqez nayne cih. Nikare gereken li gor berpirsiyarî û wezîfeyên têkildarî propaganda-ajîtasyonê bi serketî bînin cih. Lazim e hin xebatên din bike, li gorî wê bi bername bibe, plansaz bibe, rêxistî be, bibe xwediyê xebat, bername û planeke hê berfirehtir. Bêyî ku dem derbas bibe lazim e ev bi şiklekî net were bicîhanîn.

Me ev ji Komîteyê re jî ragihand, em ê çawa vê bikin nizanim. Bi civînên berfireh bûna, bi konferansan bûna, di warê girtina nêrînên zêdetir de, di warê zêdetir tevlîkirina hevalan de ew ê baştir bibûna. Heke em ê bernameyek şênber derxînin, me yê karên xwe şênbertir û zelaltir danîna ortê. Lewma her kesekî nêrîna xwe danîbana ortê, ew ê nêrînek dewlemendtir derketibûna holê. Em vê diwazin. Ji bo vê heke me karîbûya zemînek bi dest xista, ew ê baş bûna. Şert û zirûf zêde derfeta vê nade. Li gel bêkêriya şert û mercan, em dikarin heman

rewşê bi rêbazên cuda çawa bikin, hinekî em lêkolîna wê dikin, lê dipirsin, difikirin, lê hê me çareseriyek nedîtiye. Heke me li gorî vê terzekî guncav pêş bixistana û pêk banîbana, ew ê baş bûna. Teqez pêdivî bi terzekî wisa yê sererastkirinê heye.

Mesela dema ku em bernameyê derdixînin, wekî pêşdatirê lazim e em karibin pêwendiya wê bi xebata teorîk, felsefeye re baş deynin. Em karibin vê di beşa yekemîn a bernamekirinê de bi cih bikin. Yekemîn xala xebatên çapemenî-weşanê xebata teorîk e, lêkolîn e. Eşkerekirina rastiya civaka dîrokî ye. Dahûrandin, rexnekirin û mehkûmkirina rastiya sîstema dest-hilatparêz-dewletparêz e. Pêwîst e, teoriya ku Rêber Apo di paraznameyan de bi şiklekî berfireh danîne ortê esas bê girtin, bê teyisandin, li gel vê bi şiklekî ku ew ê bersiva pêşketinên rojane bide veguhere têkoşînê. Cihên ku lazim e bi pêşketinên nû re bê berfirehkirin hebe, pêwîst e bên berfirehkirin.

Li ser vê îstîqametê Akademiya me ya Zanistên Civakî heye. Saziyên me yên mîna Edebiyatê hene. Lazim e pêwendî û hevkariyeke nêz bi wan re deyne û bike. YRD û Akademiya Zanistên Civakî wekî du saziyên cuda yên xebatekê jî dikarin werin nirxandin. Jixwe dema hat damezrandin jî wisa bû. DAB û YRD li rex hev bûn. Yek li qûntarekî bû, ya din li qûntarê din, rojane têkiliyên wan ên nêz hebû. Yekîtiya Ronakbîriya Demokratîk (DAB) û YRD li gel hev bûn. Rojana pêwendiyên xwe yên nêz hebûn. DAB, mîna meclîsa YRD'ê bû. Cihekî wisa bû ku mijarên teorîk, felsefî, îdeolojîk dihatin nîqaşkirin, çareserî dihatin hilberandin û ji bo çapemenî û Akademiya Gûrbetellî Ersozê dihatin ragihandin. Niha ti pêwendî mabeyna çapemenî û Akademiya Zanistên Civakî de tine ye. Ji hev re nabêjin "merhaba" jî. Silavê jî nadin hev. Saziyên ku lazim e ewqasî nêz, hevpar bixebitin, ewqasî dûrî hev disekinin.

Li derveyî vê, bername û xebatkarên karekî wisa yê YRD'ê qet tine ye. Ti saziyên wê yên lêkolînê dikin tine ye. Lêkolîna dîrokî, civakî nake, nakeve kûrahiyên civakê. Rojhilata Navîn, Kurdistanê lê nakole, rêxistinbûyîneke wê ya wisa tine ye. Kî

bike, jê digire, xwe wisa nîşan dide. Yên ku wê dinivîsînin, li gorî feraseta xwe, felsefeya xwe, xeta xwe dikin. Heke tu wê bigire û biteyisîne, tu yê bibe xizmetkarê wê. Wekî PKK, tu yê wan ferasetan bidî cîvakê. Qet ne diyar e, ne li xemê ye, lê mêze nake. Ji ber vê jî lazim e em di merheleya yekemîn de lêkolîna teorîk bi cih bikin.

Îdeolojî û polîtîkaya bê felsefe nabe. Saziyeke ku têkoşîna îdeolojîk-polîtîk dimeşîne heke xwe nespêre felsefeyekê ew ê li ortê bimîne, parçeparçe bibe. Em ê ji kû bizanin çi dipejirîne, çi red dike, çi qebûl dike. Wê demê bê îdeolojî dibe. Ji ber vê sedemê yek, di warê lêkolîna teorîk de lazim e lêkolîna her tiştên mîna civaka dîrokî, erdnîgarî, dewlet, desthilatdariyê bêne kirin. Rêbertî, teorî ye jî. Rêbertiyê got, *“ez zanyarê civakî me, dixwazim wisa derbasî dîrokê bibim. Ez qebûl dikim ku navê min li Akademiya Zanistên Civakî bê kirin.”* Ne tiştekî din. Hingê lazim e pêwendiyên me li gel zanistên civakî hebe. Xebata zanistên civakî girîng e, ragihandina Rêbertiyê ragihandina wir e.

Xisûsê duyemîn; beşa îdeolojîk-felsefî ye. Dibe ku li gel îdeolojiyê bê destgirtin ew ê rasttir bibe. Xebata felsefî çarçoveya têkoşîna îdeolojîk e. Em xeteke îdeolojîk in. Rehendê têkoşîna îdeolojîk ê xebatên çapemenî-weşanê, ew ê li pêşiya têkoşîna polîtîk be. Ya esas ev e. Esasê hemû şeran îdeolojîk e. Xeleka yekemîn a Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ku li Rojhilata Navîn dewam dike, îdeolojîk e. Rehendê eskerî şênbertir dikare bê dîtin, rehendê siyasî her roj diguhere. Xwe bê îdeolojî bihêle, wê demê em ê çawa polîtîkayê bikin, çawa eskeriyê bikin? Em ji kû bizanin ji kê re bêjin mutefîk, ji kê re bêjin dijmin? Wê demê em ê ji dijminên xwe re bêjin mutefîk, ji mutefîkên xwe re bêjin dijmin. Di pratîkê de rewşên wisa jî derdikevin ortê. Me gelek mînakên wê li rojava dîtin, em li Bakur jî dibînin. Li gelek qadan dibînin. Mesela em weşangeriyeke wisa bikin, dest ji dayîna hişmendiyê berde, em ê civakê serobino bikin, mejiyên wan çelq bikin, ber bi şaşiyê ve bibin. Ji ber vê sedemê ew ê têkoşîna felsefîk-îdeolojîk di plana duyemîn de were.

Çapemenî-weşan di esas de organê têkoşîna îdeolojîk e, ev rastî ew ê bê dîtin. Çapemeniya nivîskî jî wê wisa bike, çapemeniya dîtbarî jî wê wisa bike, em li her qadê wisa bikin. Ne tenê têkoşîneke îdeolojîk a navxweyî, em ê hemû xebata çapemenî-weşanê wekî organ, xebateke dijwar a têkoşîna îdeolojîk bibînin. Ew ê di plana yekemîn de têkoşîna îdeolojîk were. Em ê her tiştî li gorî esasen têkoşîna îdeolojîk vesaz bikin. Ji bo wê jî em ê îdeolojiya partiyê, îdeolojiya Rêbertiyê, çarçoveya têkoşîna îdeolojîk bizanin. Em ê sosyalîzma demokratîk bipejirînin, fêm bikin, fêr bibin. Em ê komunalîzma demokratîk fêr bibin, teoriya modernîteya demokratîk fêr bibin. Em ê bi felsefeya wê, rêgezên wê yên îdeolojîk ve bên girêdan. Ew ê kadro vê qebûl bikin? Ma em dikarin bibêjin kadroyên ku van nizane, fêm nakin an jî qebûl nakin ew ê werin û propagandaya Rêbertiyê, partiyê bikin, têkoşîna wê bimeşînin? Enceq kadroyên ku fêm kiriye, bawer kiriye, zane, dawerivandiye dikarin têkoşîneke wisa ya îdeolojîk-felsefîk bizanin, bimeşînin. Ji ber vê jî wekî me di serî de diyar kir lazim e bibe xebateke ku bi kadroyên partiyê re bêhtir hatiye gurçûpêçkirin. Gereka vê ji ber meşandina têkoşîna îdeolojîk-felsefîk e. Heke xwe bi kadroyên wisa yên partî re gurçûpêç bike dikare têkoşîna îdeolojîk-felsefîk a xetê bimeşîne. An ne, mirovên ji gelê welatparêz nayên û têkoşîna xeta fedaî-milîtan a partiyê nikarin bimeşînin. Ew nizanin, ji ber ku tevlî wir nebûne. Heke karibin wê têkoşînê bimeşînin, ewil ew ê bi xwe tevlî bibin. Bi xwe tevlî nebûye ku wê fêm bike, bizane, têkoşîneke têrker bimeşîne.

Qutbûna ji îdeolojiyê, felsefeyê ji vir tê. Berbibabûna di pîvanên jiyanê de, di rêgez û pîvanên îdeolojîk de ji vir tên. Di çapemeniya îro de sekneke wisa heye ku gelek feraset û libatên derveyî partiyê têne qebûlkirin. Ji ber vê ye. Xeta îdeolojîk esas nagire, ji ber vê jî gelek pirsgirêkên îdeolojîk hene, bênavber dikeve ber lêpirsînê. Ma saziya perwerdeyê dikeve ber lêpirsînê? Em bêjin mamoste şaşiyê bike û bikeve ber

lêpirsînê, ma şagird dikarin fêrî rastiyê bibin, perwerde bibin! Wisa nabe, lê rewşa çapemeniya me niha wisa ye. Piştî wê jî em dibêjin, *"çapemenî bê bandor e, di perwerdekirina civakê de lawaz dimîne."* Wisa bibe ew ê bê bandor bimîne, nikare pêş bixîne. Derbaskirina vê rewşê pir girîng e.

Di bernamekirina xebatên me yên çapemenî-weşanê de xala yekemîn, xebata teorîk, lêkolîn e, lazim e li gorî vê em wezîfeyan diyar bikin. Lazim e em li çar aliyên Kurdistanê, di nav civakê de, li çar aliyên cîhanê mirovan peywîrdar bikin û xebatan derxînin. Pêwîst e em karibin encamên wê derxînin û berbelav bikin. Ya duyemîn xebata têkoşîna îdeolojîk-felsefîk e. Em ê vê îstîqametê esas wergirin, em ê li gorî vê xwe rêxistin bikin, bi bername bikin, pêşdatirên wê diyar bikin; uslûb, xîtab, terzê wê li gorî vê ava bikin. Dema ku bi şiklekî din bibe, ew ê her ji rê bikeve. Ew ê ya rast rawestîne, ya çewt derxîne pêş. Têkoşîna îdeolojîk nade, teşeyê nade mirovan. Perwerde şekildayina mirovan e. Qezenckirina zihniyet, pîvan û libatê ye. Tu ne xwedî sekneke îdeolojîk e, zihniyet, pîvan, libata te tine ye yan jî lîberalîze bûye, tevlîhev e, tu yê çawa şekil bide yê li beramber? Enceq dema ku te xwe sererast kir, feraseteke wisa qezenc kir, dibe. Di vî warî de lazim e bê zanîn qadek xebata îdeolojîk, xebata teorîk e. Qada têkoşîna îdeolojîk qadeke wisa ye ku bi wezîfe û berpirsiyariyên têkoşîna îdeolojîk dagirtiye. Ev rehendê qada çapemenî-weşanê jî li pêş e.

Wekî sêyemîn rêxistinbûyîn e. Lazim e em wezîfeyê înşayê bi cih bikin. Di polîtîkayê de eskerî ne pir li pêş e, di vê mijarê de şaşitî hene. Wezîfeya esas înşa ye. Esasê partîbûna pêvajoya sêyemîn avakirina neteweya demokratîk e. Avakirina Neteweya Demokratîk, tê maneya perwerde û rêxistinbûna demokratîk a civakê. Avakirin, rêxistinbûn e. Di pêvajoya yekemîn de me partî bi rê dixist. Di pêvajoya duyemîn de me artêş û gerîla rêxistin dikir. Em di pêvajoya sêyemîn de civakê rêxistin dikin. Lewma jî ji bo rêxistinkirinê lazim e em civakê perwerde bikin. Maneya xebata înşayê, xebata perwerdekirin û rêxistinkirina

civakê ye. Xebata perwerdekirin û rêxistinkirina civakê ji pêşdatirên xebatên me yên çapemenî-weşanê ne. Piştî xebata teorîk, xebata îdeolojîk, xebatên avakirinê tên. Ji ber ku em şer bi spartina civakê bi rê ve dibin. Valavala em nabêjin *"şerê gel."* Em siyaseta xwe bi spartina gel dimeşînin. Heke em gel perwerde û rêxistin nekin, em ê siyasete bi kê re bikin, bi kê re eskeriyê bikin, Ji ber ku xwe dispêre civakê. Em di ser civakê re dimeşînin. Ji ber vê yekê perwerdekirin û rêxistinkirina civakê pêşika me ya herî bingehîn e. Wê demê, girîng e ku li ser xebatên înşayê lêhûrbûn pêş bikeve, xebatên înşayê, ango xebatên perwerde û rêxistinbûna civakê bê arastekirin, pêşengtî bê kirin, civak li ser vî esasî bê perwerdekirin.

Di pratîkê de em dibêjin kadro bila li akademiyan bikin, ew jî xebatên akademîk nakin. Hêza duyemîn a ku lazim e bike jî çapemenî ye, lê qet ne li bala wê ye. Hevalên ji qada îdeolojîk boneyî perwerdekirina civakê xebatên mîna *"rêxistinbûna Konfederalîzma Demokratîk çi ye, rehendên Neteweya Demokratîk çi ne?"* kirin. Lê niha tu dibêjî qey em êdî xebateke wisa nameşînin, ji vê dûr ketin. Lê belê li Rojava şoreş çêbû, Rojava bi temamî wisa ye, li Bakur, ji ber ku em nexebitîn tine bû. Me nikarîbû civakê rêxistin bikin. Berpirsê vê çapemenî ye. Civak perwerde nekir, rêxistin nekir. Ji ber vê jî xebatên înşayê, ango xebatên perwerde û rêxistinkirina civakê lazim e xaleke me ya pir girîng û pêşdatir be. Di ronahiya xebat, têkoşîna teorîk û îdeolojîk de ya ku lazim e em herî zêde bikin, teyisandina pirsgirêkên avakirina civakê, wezîfeyên wê eşkerekirin; li ser mijarên mîna ew ê van pirsgirêkan çawa çareser bike, wezîfeyên xwe çawa bîne cih, perwerdekirin, pêşîvekirina civakê ye. Pêwîst e ku xebatên perwerde û rêxistinbûna civakî, xebatên înşayê, danehevên xwe yên ezmûnê her tim ji çapemeniyê re ragihîne, lêbikole, pirsgirêkan bike rojev û li rêya çareseriya pirsgirêkan bigere.

Em dibêjin *"xebata komunê, xebata meclîsê, xebata koperatîfê"*, lê gelo akademî heye, kar dike? Koperatîf heye, kar di-

ke? Komun çi ye? Meclîs çi ye? Ji van yek jî heta niha li Rojava tine ye. Nav hene, lê pratîk tine ye. Gotin em li Bakur dikin, ewqas rapor dan rêxistinê, dijmin carekê êrîş kir, me dît ku yek jî nîn e, hemû derew bûne, gotin bûne, seresere bûne. Li Rojava jî taybetmendiyek wisa nîşan dide. Heke ev neyê derbaskirin rewş cidî ye. Xeter e, şaş e. Lazim e em sererast bikin, an sibe rewşa Rojava dikare ji ya Bakur xerabtir bibe. Di êrîşeke biçûk de dikare parçeparçe bibe, li cihê xwe jî nemine. Ji ber ku ev xebat girîng in. Gelo em dikarin bibêjin bila van kadro bikin, partî bike, di vê mijarê de ti wezîfe, berpirsiyariya xebatên çapemenî-weşanê tine ye? Na, em nikarin bêjin.

Yên bi perwerdekirina civakê re wezîfedar in, kadroyên pêşengtiya partiyê ne, ev rast e. Lazim e kadroyên li van qadan bikin, em wan berpirs dibînin. Xebateke din a berpirs jî çapemenî-weşan e. Xebatên çapemenî-weşanê berpirs e ku gel perwerde bike, ji bo rêxistinbûnê hazir bike, ji bo pirsgirêkên fikrî yên xebatên înşayê çareseriyan bafirîne û civakê li ser vî bingehî perwerde bike. Çapemeniya nivîskî jî ya dîtbarî jî ya bihîzbarî jî mecbûr in ku vê bikin. Ev jî rewşeke girîng e, di vê çarçoveyê de jî pêdivî heye ku pêşikekê bidin sererastkirinekê. Dema ku em dibêjin pêşik, çapemeniya me ya heyî wekî çêkirina nûçeyan fêm dike. Li vî cihî, *"pêncî lib komun hatiye rêxistinkirin."* Bi ewqas jimarê ve jimartina komunê min qet nebihîstîbû. Tê gotin ku *"binêre me nûçeya komunê da"* û derbas dike. Ev hemû derketina ji rê ne. Ev ji kû derket, çawa ava bû, nizanim, lê bû û derket holê. Lazim e bê sererastkirin.

Piştî wê têkoşîna polîtîk, qada siyaseta demokratîk heye. Tevlîbûna beşên cuda yên civakê ji bo vê siyasetê, tevlîbûna tevgera ciwanan, tevlîbûna tevgera jinê, tevlîbûna tevgera kedkaran lazim e. Tevî cihên wan ên di nava civaka demokratîk de tevlîbûna têkoşîna siyasî jî di çarçoveya perwerde û rêxistinbûna civaka demokratîk de, ew ê li gel bê bidestgirtin.

Pirsgirêkên xebatên pêşikî yên tevgera jinê, pirsgirêkên rêxistinbûnê yên giştî çapemenî-weşana me, pirsgirêkên xeba-

ta ciwanan, pirsgirêkên kedkaran, karkeran û memûran a perwerdeyê, rêxistinbûnê, li ser bingehê konfederalîzma demokratîk tevlîbûna rêxistinbûnê, hene.

Li ser bingehê van qada siyaseta demokratîk heye. Lazim e em vê siyasete jî ne wekî karekî ku komên elît, desthilatdarên dewletê, hin kes dikin, pêşdatir lazim e wekî siyaseta civakê deynin pêş. Em, tevgereke wisa ne ku siyaseta xwe bi spartina rêxistinbûna gel dimeşînin. Siyaseta demokratîk, siyaseta li ser bingehê civakê ye. Ne siyaseta hin kesan, komîteyan, saziyan e, siyaseta civaka rêxistî ye. Wê demê em siyaseta civaka demokratîk rast biteyisînin, saziyên xwe yên siyaseta demokratîk baş binasin. PYD ye, HDP ye, PJAK e, DTP ye, DBP ye, em van baş pênase bikin, rast fêm bikin.

Xebatên dîplomatîk jî wisa ne. Wisa lê hatiye ku niha em bûne dewletparêzên herî elît. Em astê ji Trump, Pûtîn, Macronê naynin xwar. Em bi van re di pêşbirkê de ne. Piştî wê jî em dibêjin, *"em alternatîfa sîstema dewletparêz-desthilatparêz in, rêxistina civaka demokratîk in, siyaseta civaka demokratîk in, alternatîfa hêzên dewletparêz in."* Ew ê kenê xwe li mirovan bikin. Tu ji bo ku karibe serokê dewletekê bibîne, çil teqleyan davêje. Tu ji kû civakperwer e, ji kû dijî dewletê ye. Lazim e em gotinên xwe bibîhîzin. Ya xuya ye ne wisa ye, ji ber vê xeta me ya dîplomasiyê jî ne rast e.

Lazim e çapemenî çi bike? Ew ê çawa pêşikê bide? Ew ê çawa perwerdekar be? Lazim e çapemenî rexneker be. Çapemeniya azad çapemeniya rexneker e, çapemeniyek wisa ye ku rastiye derdixîne ortê, perwerde dike, rastiyê araste dike. Ti rexnekeriyeke çapemeniya me tine ye. Ti saziyên me nayên rexnekirin, ti pêşikiya wê tine ye. Li ser navê xeta Rêbertiyê dîplomasiya dewletparêz mîna xebatên herî xurt dide û di nav civakê de her tim eleqeyê ava dike, daxwazê çêdike û her tim meyldariyek wir pêş dixe. Lazim e wisa nebe.

Şer jî dibe parçeyekî girîng a vê siyasete. Niha em Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî dimeşînin. Şer dibe xebateke me ya be-

riya siyaseta demokratîk. Lewma niha em weşana xwe li ser bingehê vê stratejiye bi bername bikin, helbet ew ê xebatên teorîk, têkoşîna îdeolojîk, rêxistinbûna civaka demokratîk, Şerê Gelê Şoreşgerî, gerîla, hişmendî, rêxistinbûn, perwerdeya xweparastina civakê; piştî wê jî siyaseta demokratîk tê. Niha pêşik ne siyaseta demokratîk e. Hin kes bendewariyekê ji siyaseta demokratîk dikin. Na, ya pêşik Şerê Gelê Şoreşgerî ye. Siyaseta demokratîk girêdayî wê ye. Siyaseta şer li pêş e, rastiya gelê şerker li pêş e. Ji ber wê jî pir girîng e ku hişmendiya xweparastinê pêş bixe, perwerde bike, wê derxîne pêş, lehengtî, wêrektî û fedakariya li qadên xweparastinê bên dayîn.

Bi hezaran şehîdên me çêbûn. Bûyerên lehengiyê ku dikarin dîrokekê saz bikin, pêk hatin. Nirxên mirovahiyê ya çil salên dawiyê, ji aliyê rastiya fedaî-milîtan a PKK'ê, ji aliyê şehîdên wê ve derdikevin, tên afirandin, çêdibin. Lazim e ev bi xurtî bên dayîn. Di civîna me ya dawiyê de ev hat nîqaşkirin, hate gotin ku kêm tê dayîn. Huner vê nake, wêje nake, çapemenî cih nade. Tenê dibe nûçeyeke deh çirkeyan û derbas dike, ewqas. Piştî wê jî kî bi kê re çiqas wextî maye, bi deqeyan vedibêje. Ew nêrîn me li ser piyan nagirin. Yê ku me li ser piyan digirin, şehîdên me ne ku bi qehremanî têkoşiyane. Heke çapemenî vê nebîne, nede, wê demê xetê diçepîne, berê civakê dide rêya ters. Rewşa heyî hinekî wisa xuya ye, lazim e ev bên sererastkirin.

Polîtîkaya rojane wisa dikeve rojevê. Xebatkarî, siyasetvanî, propagandakariya nûçeyê dikare wisa bibe. Em bala xwe bidinê, nûçegihaniya polîtîk-eskerî, rêbaza propaganda-ajîtasyona ku piştî van hemûyan tê, eger li gel van be ew ê roleke rast bilîze, karîger be, pêşketinê bîne. Heke bi van re nebe nikare rolê bilîze. Ew ê çapemeniya me veguhere propagandakariyeke polîtîk a teng û erzan, pir seresere, ekletîk. Wê demê lazim e em di propagandaya polîtîk de jî bi bandor bin.

Di ragihandina encama şerê gerîla, xweparastinê de em lawaz man. Li Cizîrê û Sûrê wisa bû. Em ê van di çarçoveya

Şerê Taybet de vebêjin. Li Cizîrê, Sûrê di warê eskerî de em bi ser ketin, lê xebata propagandayê, çapemeniyê bi me da windakirin. Propagandaya me bi AKP'ê da qezenckirin. Em ewqasî hatin ser lîstokên şerê taybet. An artêşa Tirk, polîsên AKP'ê ketibûn nav *"Sendroma Nisêbînê."* Yek kes jî nikarîbû biketana Nisêbînê. Li Sûrê çar tabûrên şerê taybet şkestibû. Artêşek şerê taybet a TC'ê nebû ku bişîne. Nikarîbûn biketana Cizîrê, bi berxwedanê ve me xwe gihand zaferê. Piştî nûçeyên mîna *"qetil kirin, şewitandin, dijmin hat, em tine bûn!"* em gihiştin Newrozê û em neçar man ku şînê ragihînin. Piştî ewqas qehremantiyê ma ev helwest lê tê? Wan qehremanan me wisa qehremanî kirin? Na. Lê çi bû? Çapemeniya PKK'ê ket nav ruhekî çîna navîn, yên ne berxwedêr, ev gihand gel, gel da girî. Ragihandina encamên têkoşîna polîtîk-eskerî wisa nabe.

Bûyerên li cîhanê, hêzên derve; lazim e ew jî bên dayîn, em bixin nav propagandaya xwe, heta astekê tê dayîn. Lê lazim e hinekî din baldarî hebe. Em nirxên gel, nirxên şoreşgerî derxin pêş. Em çanda gelan ji gelê Kurd re ragihînin, lazim e çapemenî van bike. Feqet em hinekî xetê jî bidin ber çav. Mesela sosyalîstê cîhanê ma ne Madûro ye? Tayîp Erdogan jê re dibêje *"birayê min".* Serokomarê Îranê dibêje *"birayê min."* Li gel serokê dewleta Rûs, dijminê Kurdan e. Qaşo em li ber çavê wî Amerîkagir in, lê yê sosyalîst, dijberê Amerîka ew bi xwe bûye! Jirêderketineke wisa ya sosyalîst heye. Sosyalîzma paradigmaya desthilatdar-dewletparêz ji kapîtalîzmê ne qut e. Rêbertî gotê, *"kapîtalîzma dewleta yekdestdar."* Em ji wan cihê ne. Ji ber ku têgeha sosyalîst bi kar tînin, em jî nikarin bibin hemanên wan. Di çarçoveya TŞYG'ê de em daxivîn, digotin *"çima hûn li ba wan pêwendiyê danaynin?"* Ew me Amerîkangir dibînin. Sosyalîstbûn, dijberbûna DYA'yê bûye. Ewqasî hatiye tengkirin, besîtkirin, girêdayî berjewendiyên polîtîk hatiye kirin. Ti ferqa hegemonyaya Rûs û ya di dema Yekîtiya Sovyetê de tine ye. Ji bo berjewendiya dewletan sosyalîzmê dikin qurban. Xulase lazim e em bi baldarî nêzî paradîgmayê jî bibin.

Lazim e em bizanin ku ji çi re bêjin azadî, koletî, nirxê gel, nirxê sîstema dewletparêz-desthilatdar. Lazim e em kesên gelperwer, civakperwer derxînin pêş, wan esas wergirin. Hinekî têkil hev e, tevlîhev e, lewma guhertin jî baldariyekê dixwaze. Pir ne cewaz e, niha em cewaz dikin. Ji ber vê jî lazim e di vê mijarê de hinekî bê dîqetkirin.

Li ser vî bingehî qasî ku komasiya şoreşgerî ya li Kurdistanê, nirxên wê ji cîhanê re bên ragihandin, ewqasî lazim e em karibin nrixên şoreşgerî sosyalîst ên gelên cîhanê jî em ji bo Kurdistanê veguhezînin. Beşek girîng a bernameya me jî ev e. Li ser bingehê van pêwîst e diyardeyên dîrokî, diyardeyên rojane, utopyayên siberojê bi şiklekî baş bên dayîn.

Me bi hin milan behsê kir, dikare were berfirehkirin, pêşxistin. Eşkere dibe ku pêdivî pê heye ku jinûve were bernamekirin. Dema em dibêjin jinûve, ne ku ev berê qet nîn bûn. Lê her çû me teng kir û anî halekî seresere û teng, ji çarçoveya giştî qut bû. Niha lazim e em dîsa vegerin wê çarçoveyê, vê tengiyê û sereseretiyê bibihurin. Gerek dike ku em jinûve avabûnê, vesazkirinê wekî wezîfeyeke girîng a pêvajoyê deynin ber xwe. Hem em bi bername bikin hem jî em li gorî wê rêxistin bikin, li ser wî bingehî hin tiştan bikin, hazir bikin. Hazir tine ye, em ê rêxistin bikin, wezîfedar bikin, bixebitin, hilberînin, hin nirxan bafirînin ku em karibin civakê perwerde bikin.

## a- Perwerdeya Îdeolojîk û Pîşeyî ya Kadro

## –Sîstema Akademîk-

Em li ser girîngî û taybetmendiyên xebata propaganda-ajîtasyonê rawestiyan. Wekî beşek dirêj jî me hewl da pêşketinên dîrokî yên xebatên çapemenî-weşana me bi şiklekî rexneyî binirxînin. Em li ser xisûsên ku lazim e herî dawî bêne kirin radiwestiyan. Ewil wekî xebateke ku li ser xeta partiyê tê meşandin, gerek dike ku ji nû ve were vesazkirin, destgirtin; wekî duyemîn jî me îfade kir ku lazim e ev xebat li ser vî bingehî ji nû ve were bernamekirin. Mebesta vê ew e ku lazim e xebatên propaganda-ajîtasyonê bi yekparebûneke felsefîk, teorîk, îdoelojîk, polîtîk, civakî, çalakiyê bê destgirtin û meşandin. Xebateke çapemenî-weşanê, sekna medyayê ya ku hatiye tengkirin û pîvanên wê hinekî berpaş hatiye kişandin, li vê ortê hebû. Bêyî ku sekin û bername bê sererastkirin, çiqasî hewl bê dayîn jî me diyar kiribû ku bi şiklekî bi bandor bicîhanîna wezîfeyên propaganda û ajîtasyonê ne mimkun e. Me pêşi bi vê armancê îfade kiribûn.

Li ser vî bingehî wekî gava sêyemîn em dikarin li ser perwerdeyê rawestin. Tevî ku hecmê xebatên me yên çapemenî-weşanê mezin bûye jî, kêmbûna aktîvîteyê, bi têrahî karîgernebûn, jê wirdetir di nav xebat û avaniya rêxistinî de derketina pirsgirêkên cur bi cur, esas ji ber bêperwerdehiyê ye. Hemû xebatên me bêyî ferqek mezin-biçûk, madî-manewî hemû bi perwerdeyê dimeşin. Xwezayî ye, her xebatek pêdivi-

ya xwe bi rêxistinê heye, ji bo avakirina rêxistinê jî perwerde lazim e. Tew îcar li welatekî mîna Kurdistanê ti tiştekî hazir tine ye, tu yê her tiştî amade bikî. Amadekirina mirovên xebatkar, ew rêxistinkirin, xurtkirin, anîna asteke karkirinê, pêdivî bi perwerdeyeke geş û domdar divê, enceq bi perwerdeyeke wisa ve dibe. Bêyî perwerde ti xebat nikare bê meşandin, mezin nabe, naçe serketinê. Lewma lazim e em qebûl bikin ku xebatên çapemenî-weşanê jî xebatên propaganda û ajîtasyonê jî girêdayî vê qaîdeyê ne, ji bo vê derê jî perwerde lazim e. Pêwîst e bê zanîn ku bêyî perwerde ev kar nabe. Îcar xebateke ku wezîfeya wê ya perwerdekirina partî û civakê daniye pêşiya xwe, bi xwe bê perwerde be, ew ê çawa wezîfeyên xwe bîne cih, pir eşkere ye, nikare. Heke xebateke bê perwerde be, rastiyeke pir kifş e ku li wir rêxistinbûn pêş nakeve, her cure takekesîtî, keyfiyet, ligorxwebûn derkevin holê.

Me bi kurtasî anîn ziman, ji van nirxandinan jî bi şiklekî zelal tê dîtin ku pir zêde ligorxwebûn, keyfiyet, takekesîtî, pozbilindî, teqlîdkirina hinan û qutbûyîna ji armancê heye. Hingê têkoşîna çi tê meşandin diyar nabe. Propaganda û ajîtasyona çi tê kirin, ev xebat û tevger girêdayî kîjan xetê ye, pîvanên wê yên qebûl-redê çi ne, ne diyar e. Ev şêlû û tevlîhev bûne, her kesek bûye rêxistinek, partiyek. Her kes li gorî xwe xwedî rastî û şaşiyan e. Dibêje, *"rastiya min ev e"*, ya xwe dike. Derfet û firsendan ji rêxistinê digire, piştre ya xwe dike. Dibêje *"yê herî rast ez im"* û xwe dispêre. Xebateke wisa nikare kesekî bandor bike. Li welatekî mîna Kurdistanê, civakek mîna civaka Kurd ku ewqasî hatiye pelçiqandin, kêmdîtin, rêxistinbûna wê hatiye belavkirin, gelo dikare bide bawerkirin, karîger û perwerdekar be! Ev ne mimkun e. Rastiyeke wisa ya civakê heye ku sîstema serwer bi pelçiqandinê ve derxistiye holê. Tê gotin ku *"eqlê Kurd di çavî de ye"*, tenê bi dîtina xwe bawer dike. Ji ber ku êdî baweriya wê bi gotinan nemaye. Tiştek gotine lê tersê wê kirine. Weed dane, pelçiqandine û îmha kirine. Bi sedan salan, hezaran salan ji hêla hêzên dewletparêz-desthilatparêz

bi êrîşan ve civak hatiye vî halî. Tu yê di nav civakekek wisa de rêxistinê bafirîne, li gorî armancê xebatekê derxîne, lê bêyî perwerde tu yê çawa bike? Heke di perwerdeyeke wisa de tu baweriyê nede, nebe xwediyê gotinên xwe tu yê çawa pêk bîne? Rêber Apo got, *"gel ne li gotinên PKK'yiyan, li kirinên wan, li jiyana wan nêrî, bawer kir û tevlî bû."* Her tişt ewqasî net e. Li holê ye ku li Kurdistanê diyalektîka xebata şoreşgerî bi vî şiklî ye. Hêzên ku ev meşandine wisa diyar kirine.

Li welatekî wisa tevgereke ku xebata perwerdekirina civakî li xwe girtiye, lazim e ji serî heta binî bi perwerde be, rêxistî be. Ji bo perwerdekirina hinan lazim e gotinên xwe pêk bîne, kirinên xwe bibêje, di nav yekîtiyeke tam a ruh, hest, hizir, libatê de tevbigere. Ji ber vê jî wekî rêgez em ê vê tomar bikin. Bê perwerde xebateke propaganda û ajîtasyonê nayê meşandin. Nikare bibe xebatkar û kadroyê çapemenî-weşanê. Xebatên li qada çapemenî-weşanê, bêyî ku perwerdeya îdeolojîk û pîşeyî bê mayindekirin ne mimkun e ku bi serketî bê meşandin. Ewil em ê vê wekî rêgezeke bingehîn qebûl bikin û ji vir dest bi vesazkirinê bikin. Em ê ji nû ve avakirinê ji vir bidin destpêkirin. Qasî pêdiviya vê em ê sîstemek perwerdeya akademîk pêş bixin. Em ê hemû qada xebatê veguherînin qada perwerdeyê, em ê di sîstema dibistanê de bixebitin. Jiyana komunal demokratîk, xebata kolektîf, perwerde û pratîk çawa têkil hev tên meşandin, ji bo ku ji hemû rêxistinbûna me re bibe mînak hê di sala 2001'ê de wextê ku YRD hat damezrandin, bi taybet ji bo Bakur me ev plansaz kiribû. Ji bo Ewrûpayê me plansaz kiribû. Rêber Apo ev li Akademiya Mahsûm Korkmazê pêk anî. Xebata bi terzê Rêbertiyê wisa ye. Me got, heke em ê jî bi terzê Rêbertiyê bixebitin, hingê em mînakên şênber pêş bixin, qasî pêdiviyên vê binesaziyê ava bikin. Çiqas madiyat lazim be, me hemû da, me jê kêm nekir, lê nehat kirin û pêşxistin. Ji ber vê jî ne rewşeke nû ye. Plansaziyeke ji wê demê ye, serketin li vir dihate dîtin. Wekî çawa wisa nehate kirin, her wiha akademiyek jî bi rêkûpêk nehat xebitandin.

Navê Akademiya Gûrbetellî Ersoz hebû, çalakî nebû, pir kêm û teng xebitî. Dibistanên me yên wisa tine ne ku mîna Akademiya Gûrbetellî Ersoz di 2000-2001'ê de hatibe vekirin û ketibe vê rewşê. Tenê çapemenî û çand hatin vê astê. Qada îdeolojîk, qaşo qada perwerdekirina civakê ye, lê ji perwerdekirina xwe direve.

Heke di vê mijarê de bê gotin, *"şert giran e, perwerde zor e, em nikarin vî karî bikin"* wê demê lazim e yên wisa dest ji wezîfeyê berdin. Nabe, hem neke hem jî rayeyê di dest xwe de bigire. Heke tê gotin *"em nikarin jî ji ber vê wisa dibe"* û bi şertan ve tê girêdan, hingê lazim e yên wisa dest ji wezîfeyê berdin. Na heke dibêjin *"pêwîstî bi perwerdeyê tine ye, em wisa dikin"* û ji ber vê girîngiyê nadin perwerdeyê, wê demê ev jî feraseteke jirêderketî ye. Lazim e yên wisa ji wezîfeyê bên avêtin. Ev xebat bi feraseteke şaş ve bi şiklekî rast teqez nameşe. Lewre ji bo pêşxistina sîstema akademîk ji akademiya navendî heta qadan pêwîst e akademî bêne vekirin. Li Bakur, Rojava, Ewrûpayê nebûna akademiyan lawaziyeke pir mezin e. Kêmasiyeke mezin e ku bingehên xebatê mîna li Akademiya Mahsûm Korkmazê pêk nayê, jiyan, xebat komunal û kolektîf têkil hev nayê pêşxistin, bi sedan mirov li gel hev nabin xwedî atmosfereke ku komunal dijîn û kolektîf dixebitin. Ev dikarin bêne kirin. Bi xwe komunal û kolektîf naxebite. Baş e, ew ê çawa nûnertiya xeta PKK'ê bike? Ew ê çawa zihniyet, hest, îdeolojiya Rêberiyê bide civakê? Carakê ew bi xwe qebûl nake û najî. Ji ber vê jî lazim e sererastkirin ji kokê ve û cidî be. Pêwîst e ku li ser perwerdeyê cidî bê rawestandin. Dem bi dem me ev mijar xistin rojevê. Carina dema ku şaxên Akademiya Gûrbetellî Ersozê hatin vekirin, hevalên ji komîteyê jî guhdarî kirin, me rexneyên giran anî ziman, lê bi kenekî kêm derbas kirin. Ez jî rêveberî me û dixebitim. Ji sedî 95'ê xebata min perwerde ye. Ji sedî 5 bi karên din re mijûl im. Baş e, ev çawa dibe? Ji sedî 90'ê xebata Rêber Apo perwerde bû. Ka em bi terzê Apoyî dixebitîn. Ma ne hemû kadro mecbûr in bi terzê Rêbertiyê

bixebitin? Ne kadroyê mînak Rêber Apo ye? Ne terzê rast û serketî terzê Rêber Apo ye? Ruxmî ku terzê Rêber Apo ewqasî li ber çavan e jî em jê qut dibin û terzên cuda yên li gorî xwe pêş dixin. Piştre jî dibêjin, *"em girêdayî Rêbertî ne, em Rêbertiyê didin meşandin."* Ti eleqa vê bi rastiyan re nîn e, em xwe dixapînin, hewl didin hinên din jî bixapînin. Xebata kêm-zêde, xebata baş-xerab cuda; lê xebateke propaganda-ajîtasyonê ya ku xwe naspêre perwerdeyê, mirovan perwerde nake, xwe perwerde nake, nabe. Ew ê çi ji mirovan re bibêje, çi bide, çawa bide bawerkirin? Ev ne mimkun e.

Di vî warî de pêdivî bi xebateke rêxistî, rêkûpêk û pir xurt a teorîk, felsefîk, îdeolojîk a perwerdeyê heye. Lazim e hem sîstema akademîk bi domdarkirinê bê mezin kirin hem jî bingehên xebatê veguhere sehayek perwerdeyê. Li gel vê afirîneriyek zêde dixwaze, bi giranî malzemeyên teknîkî bi kar tîne. Wê demê pêdivî bi perwerdeya teknîkî heye. Taybetmendiyên propagandakariyê, nivîsandinê, tomarkirinê, axaftinê hene. Dibe pir teng û nebes be, lê me hin îfade bi kar anîn. Em li ser van hemûyan rawestiyan ku ev giştî bi perwerdeyê tên qezenckirin. Bêyî xwe perwerde bike dibêje *"ez bûm bernameçêker."* Kamerayê digire destê xwe û pê li bişkokê dike, dibêje *"tomar dikim."* Wisa nabe. Tu yê wisa tiştan bike, lê di encam de wekî berhem çi derdikeve, karê te serketin, bandorkeriyê bi dest tîne yan ne, lazim e em mêzeyî wê bikin. Ji ber wê jî xebateke wisa seresere, bê perwerde, ne rêkûpêk di vê qadê de teqez nabe. Heke bê gotin *"bêyî perwerdeyê jî em dikarin xebatên wisa bikin"* her biçe tenê bi tasfiyeya xwe namîne, ev şoreşa xebatê jî dide tasfiyekirin. Lazim e her kes vê bizane. Kar di vê astê de cidî û girîng e. Lazim e wisa besît neyê destgirtin. Rewş teqez ne wisa ye, ji ber ku pêşbirkek heye û bûye hêza yekemîn. Berê digotin *"Hêza Çaremîn".* Dîsa dihate gotin ku *"di jiyan û têkoşînê de hêza bandorker."* Lê niha ne wisa ye. Hêza yekemîn a jiyan, têkoşîn û şer e. Di vê mijarê de ji bo bandorkirina hinan, ji bo ku li gorî berjewendiyên xwe mirov û

civakê biteşe bikin, çi ji dest wan tê dikin. Ne exlaq, ne hiqûq, ne jî mirovahî hiştin. Her tişt terikandine, tenê karibin li gorî berjewendiyên xwe bandorê li mirovan bikin. Ji ber vê yekê dibe qada herî tevlîhev, herî berfireh a şerê civakî. Li qadeke wisa ya şer, bi seknên lawaz, bê perwerde, takekes ma em dikarin çi bikin? Em dikarin li dijî kê têbikoşin? Em dikarin kê paşde bixînin? Em ê çawa karibin ferasetên xwe bi bandor bikin? Em nikarin. Carekê em ê kîjan ferasetê bi bandor bikin, lazim e di vê mijarê de em net bin. Em dixwazin çi bi bandor bikin? Em dixwazin çi bidin mirovan? Lazim e di vê mijar de em hemû zelal bin, xwedî yek nêrînê bin, hevpar bixebitin ku karibin serketî bin, encam derkeve ortê.

Di van mijaran hemûyan de bi kesayetê ku xwedî pîvanên teng, şêlû, seresere, takekesane, li gor xwe, wisa burjûvatiya biçûk bi ziravî dijîn, ev kar nayê meşandin. Ji bo ku ev kar bi serketî bê meşandin, milîtanbûna Mazlûm lazim e, milîtaniya Gûrbetellî lazim e. Lazim e pîvanên kadro derkevin vê astê. Lazim e pirsgirêkên kadro bi şiklekî cidî bê destgirtin û meşandin. Lazim e şoreşgerê profesyonel jî, xebatkarê welatparêz jî li gorî van pîvanan be. Lazim e hevgirtî û hestiyar be. Bi şiklê, *“ji bo ku li gorî dilê xwe pereyan bi dest bixim û bixwim, wextê xwe dagirim, ez welatparêziyê dikim”* nabe. Berê di çapemeniyê de welatparêz dixebitîn, ne ji bo wergirtina pereyan, ji bo ku xizmetê bikin dixebitîn. Min jî li Ewrûpayê nûçegihanî kiriye. Hemû gelê li Ewrûpayê belavkar bû, dixebitî lê pênc qirûş jî nedigirtin. Dema ji karê xwe derdiket, 3 saetan rojname-kovar-pirtûk belav dikirin. Li seyara xwe siwar dihat, ji cihekî diçû yê din, ji berîka xwe nizanim çiqasî pere xerc dikirin. Digot pereyê belavkariyê jî ev e û pereyê girtî tanî teslîm dikir, yê ku ji berîka xwe xerc kiriye jî ji wir nedigirt. Lê niha rêxistina me mîna çêlekê tê dotin, her tişt veguheriye pereyan, li çapemeniyê jî wisa ye. *“Dibêjim merheba pere bide. Kaxizekê radikim datînim, pereyan dixwazim.”* Ev terzê xebatê xebateke kapîtalîst e. Tê de çiqasî sosyalîzm, komunîzm bê nivîsandin jî

ew xebat xebata burjûva ye, xebata kapîtalîst e, milkparêz e. Ti derbasdariya nivîs û gotinan nîn e, ya derbasdar jiyan û kirin e. Rewşa şênber û pratîk diyarker e.

Di nakokiya teorî-pratîkê de ya diyarker her tim pratîk e. Rêber Apo wisa pênase kir. Mao jî wisa pênase dike. Ji ber vê yekê lazim e neyê gotin *"em dibêjin piştre jî çi dixwazin wê dikin."* Ti kes baweriyê bi gotina te nayne, ji ber ku her kes li kirinên te mêze dike. Jixwe rêxistinên din jî ji me zêdetir digotin *"sosyalîzm"*, zêdetir nivîsandin. Zilamekî bi navê Kemal Bûrkay heye, biçin pê re baxivin, hûn çi bêjin ew ê bibêje *"jixwe min ew nivîsîbû."* Ma tu binivîsî ew ê çi bibe, haya ti kesî ji nivîsên te tine ye. Kî îtîbarê bi te dike, te nivîsî, lê te pêk anî yan ne? Nivîsên te li wir man, kirinên te li cihekî din. Çi bawerî bi te tê. Piştre wekî feqîrê Xwedê tu yê bêjî *"pisîkek min jî tine ye"* û li naverastê bigerî. Ma Rêbertiya şoreşgerî wisa dibe, wisa milîtanî, sosyalîstî dibe. Rebenê Xwedê, ji kesê ku nikare tiştekî bafirîne re çawa sosyalîst tê gotin? Ma mirovê sosyalîst dikare ewqasî feqîr, bêber, bê bandor, belangaz be? Ne mimkun e. Encama takekesiya burjûvaya biçûk ev e. Li qada çapemeniyê, kesayeta ku gelek hevalên me xweziya xwe pê tînin, ev kesayet in. Kesayeta Apoyî nayê ecibandin, xwezî bi kesayeta Bûrkay tê anîn. Wa çi tiştekî baş bûye, nivîsiye, gotiye. Tu yê binêrî ew nivîs, ew gotin çiqasî xwedî qîmet e, çiqasî bandor dike. Ew nivîs-gotin bi bandor-perwerdekar bûn an nivîs-gotinên Rêber Apo bi bandor bûn? Wekî rojê eşkere ye ku ya duyemîn e, ti kes nikare vê înkar bike.

Di vî warî de lazim e mijara perwerdeyê wekî mijareke esasî bê destgirtin, plankirin, li gorî vê jinûve avakirin li qada çapemenî-weşanê bê pêşxistin. Wisa ne tenê li kaxizan bê nivîsandin. Di terzê jiyan, xebat, têkiliyan de guhertin, rastkirineke bingehîn lazim e. Lazim e terzê rêxistinbûnê, terzê jiyanê, terzê xebatê li gorî perwerdeyê bê sazkirin. Perwerde û xebat di zik hev de bên meşandin. Jiyan jî di orta vê de be. Lazim e yekparebûna jiyan, perwerde, xebatê hebe û jev qut nebin.

Yekgirtina fikir-zikir-çalakiyê li qada çapemenî-weşanê yekgirtina perwerde-jiyan-xebatê hebe. Li gor vê ew ê terz û sîstemek pêş bikeve, sererastkirin enceq wisa dibe. Li ser vî hîmî gihiştina teorî, îdeolojîk, pîşeyî pêş dikeve. Mirovên wisa dikarin bi şiklekî bawerdêr, îdeal, utopya û rêgezên xwe yên azadî, wekhevî, parvekar, piştgiriyê, ji civakê re ragihîne. Dikarin mirovan bandor bikin, perwerde bikin, bawerdêr û rêxistinkar bibin. Em enceq bi xebateke wisa dikarin civakê perwerde bikin, rêxistin bikin û ji bo çalakiyê seferber bikin. Xwe bigihînin nuqteyeke ku civakeke nû ava dike. Enceq bi xebateke wisa pêşeng ve, bi perwerdeya propaganda-ajîtasyonê ve em dikarin ferde azad, jina azad, mêrê azad, civaka demokratîk derxînin ortê. Bi şiklekî din nabe. Eger bi rastî jî em xwedî îdîa û bawerî bin ku em ê ferde azad û civaka demokratîk bafirînin, pêwîstî ev e. Na eger em ji bo tenê axaftinê van bi kar tînin, tiştekî jê re bê gotin tine ye. Mîna takekesiyên burjûvaya biçûk tenê ji bo gotina wê bê kirin û derbaskirin, em dibêjin bila li ser wê, hewldana xwe dana jiyandinê hebe, ji yên wisa re tiştekî bê gotin tine ye, ji wir ti serketin jî dernakeve.

Lê heke bi rastî jî em bi gotinên xwe bawer bin, em bawer bin ku ferdê azad û civaka demokratîk dikare bê afirandin û em dixwazin bafirînin, em dibêjin jiyana rast ev e, wê çaxê rêya wê di xebateke wisa ya propaganda û ajîtasyonê re derbas dibe. Lazim e çapemenî-weşana me xwe li ser vî bingehî rêxistin bike û bixebite. Beriya her tiştî lazim e ferdê azad û civata demokratîk di nav xwe de ava bike. Qada çapemenî-weşanê lazim e xwe bigihîne asteke wisa. Ferdê mînak, civata komunal, pêwîst e di nava rêxistinbûna çapemenî-weşanê de, di YRD'ê de derkeve ortê. YRD pêşengtiyeke wisa temsil dike. Bi şiklekî din nabe.

Di vî warî de perwerde milê bingehîn ê sererastkirinê ye. Xetayê esasî yê ku ev rewş aniye, nêzîkatiya li perwerdehiyê ye. Lazim e em vê qebûl bikin. Berpirsên vî karî lazim e qebûl bikin û rexnedayîneke rast bidin. Ti kes ti kesî sûcdar nake,

feqet nêzîkatî şaş e, şaş hatiye kirin. Di terzê Apoyî de nehatiye karkirin. Li gor esasê perwerdeyê xebat nehatiye meşandin. Ev encam ji vê tê. Yên ku ev kar kirin rast nekirine, di terzê rast de nexebitîne, wê demê lazim e rexnedayînê bidin û rast bikin. Pêwîst e şaşî bê dîtin û qebûlkirin. Li gorî wê jî bê sererastkirin. Sererastkirin jî guhertina terzê xebatê ye ku heta niha hatiye. Tu yê bêjî rexnedayîn, lê ya berê bidomîne, wisa nabe.

Di ser pratîka YRD'ê re 18 sal bihurîn, gelek civîn, konferans û nîqaş çêbûn, guhertin-sererastkirin çêbûn. Lê di vî bingehî de ti guhertin nebû. Ji serî ve xetek wisa hat. Kêm an jî zêde xebata hatî meşandin her li ser heman xetê bû, bê perwerde bû. Akademiya Gûrbetellî Ersoz nehate xebitandin. Sîstema akademîk a ku xwe dispêre vê û perwerdeya teorîk, felsefî, îdeolojîk dide, perwerdeya pîşeyî dide, nehate pêşxistin. Lewma jî YRD nebû navendek cazîbeyê. Mirov, ciwan, jin nekişandin, tevlî nekirin û perwerde nekirin, nekirin kadro. Berê ev pir zêde bû. Rewşa pratîkî ya ku ji salên 90'î hat, di destpêkê de dewam kir, lê her ku çû sifir jî xerc kir. Ji ber ku perwerdekar, cazîb nebû, pêş de nebir. Di warê pîşeyî de jî negihand. Halbûkî ti kes nikare van karan qasî milîtanên PKK'ê bike. Mirov bêje, *"hinên din baş dikin, şoreşgerê profesyonel nikare bike",* ew ê bibe heqareteke mezin ji bo şoreşgeran. Her kî wisa bibêje, heta ku were ser îmanê, lazim e mirov bixe hepse. Lazim e bawer bike ku tiştên herî baş, herî xweşik bi destê şoreşgeran çêdibin. Milîtanên fedaî dikin. Takekesên burjûvaya biçûk, yên ku ji bo tasek şorbe xwe difroşin, ma ew ê karên herî baş bikin? Gotinên xweş bibêjin? Fikrên xweşik pêş bixin? Rast tevbigerin? Bibin alîkar, piştevan, wekhevîxwaz? Ev ne gengaz e. Ev nikarin bên qiyaskirin. Wê demê lazim e em hedê xwe bizanin, em ser û mejiyê xwe komî hev bikin, gotinên me bigihêjin guhên me. Heke em bi xwe nikaribin bikin, lazim e em heqê Sezar bidine Sezar, rastiyê berevajî nekin. Em hewl nedin li gor rewşa xwe, lawaziya xwe pênaseya rastiyekê bikin. Qet nebe, em bêjin *"em nikarin bikin"* û rawestin. Li gel vê, tiş-

tekî ku nikaribe bê kirin tine ye, mirov heke bixwaze dikare xwe perwerde bike û bikaribe biguhere dikare pêşketineke pir mezin bi dest bixîne.

Her mirov jî dikare vê bike, lê ya girîng bawerkirin û pejirandine. Xwegihandina pîvanên mirovê azad, pêşbinîkirina jiyaneke wisa ye. Ferdê azad bi civata demokratîk, komuna demokratîk dibe. Ji yê ku jiyana komunal esas digre re *"ferdê azad"* tê gotin. An ne, ji ew ên ku hunerweriyên xwe li bazarê difiroşin, bi mizê ji wir ve hewl didin takekesîtiya burjûvaya biçûk bijîn re nabêjin ferdê azad. Lazim e jê re mirovê xwefiroş bê gotin. Esas mirov jî nayê gotin. Li gorî nirxên civakî ji libatên wisa re *"derketina derveyî mirovatiyê"* tê gotin. Ew dibe pêvajoyeke ku sîstema desthilatdar û dewletê dest bi hewldana tinekirina mirovahiyê kiriye. Ji ber vê jî lazim e mirov ji van xilas bibe.

Sîstem û terzekî wisa lazim e ku perwerdeyê wekî nîzameke jiyan û xebatê rojane 24 saetan bike, rêxistinbûna YRD'ê di nav xwe de bafirîne. Li gel vê, lazim e neyê gotin *"em dizanin."* Zanebûna te têra şaşiyên te nake. Hin tişt tên zanîn, lê çi tê zanîn ne diyar e. Vir de- wir de, çep-rast bi hezaran cure agahiyan kom dikin, piraniya wan agahiyan jî zirarê didin mirovahiyê. Jixwe ji bo wê jî perwerde lazim e. Pêwîst e neyê gotin ku *"ez dizanim, min perwerde dîtiye, ne hewce ye."* Li gel vê, ma te xwe li her tiştî qepat nekiriye, her roj tu ji sîstemî bandor dibe, her roj pêwendiyê li ba hezaran cure agahiyê datîne, te bandor dike û dikşîne şaşiyê. Li dijî van hemûyan ji bo ku tu karibe xwe pêş bixe, li ser rastiyê bimîne, pêwîst e tu xwe perwerde bike. Bi perwerdeyeke domdar ve tu karibe li hemberî wan pîvan û ferasetan hemûyan têkoşîna îdeolojîk bimeşîne. Tu yê enceq karibe rastiyê bi vî şiklî bibîne, di rastiyê de enceq wisa karibe bimîne. Ji ber vê jî pêdivî bi perwerdeyeke zêdetir heye. Bi bandorbûyîna ji virde-wirde mîna *"ez zanyariyan digirim, bi perwerde me, ev bes e, zêdetir ne lazim e"* zêdetir pêdivî bi perwerdeyê çêdibe. Jixwe em ji ber vê dibêin perwerde lazim

e. Li dijî hemû hêleşaşiyan ji bo ku bi têkoşîna îdeolojîk, rexne-rexnegirî û li ser xeta Apoyî bigihêje rastiyê, li qada çapemenî-weşanê jî bênavber perwerde lazim e. Ji ber ku 24 saetan ji derve bandorbûyîn heye, modernîteya kapîtalîst 24 saetan li ser medyayê civakê bomberdûman dike. Rêber Apo ji vê re got *"qirkirina civakê".*

Herî zêde bomberdûman li ser ruhê ew kesên ku bi vê xebatê re mijûl in, li ser hest, mejiyê wan e. Lewma jî mirovên ku vê xebatê dimeşînin ji bo ku li dijî wan êrîşan 24 saetan xwe biparêzin û li ser rastiyê bigirin, lazim e xwe perwerde bikin. Ji bo vê jî qada çapemenî-weşanê lazim e were pozîsyoneke wisa ku 24 saetan perwerdeyê bike, bi perwerdeyê xwe çêbike. Ev xisûseke girîng e. Ev mijareke ferasetê, pejirandin û terzê ye. Heta ku wisa dibe, tiştekî mîna nikare bê kirin, tine ye. Gotina *"em nikarin"* xwe xapandine. Çavkaniya xwe ji ber nexwestina kirinê ye, girêdayî daxwazê ye. Ewqas xebatên takekesî tên kirin, gelo çima xebatên kolektîf jî nebin, jiyana takekesî di ortameke ewqasî zor de tê serxistin, ma çima di ortama komunal de neyê serxistin. Mijara tercîh û daxwazê ye. Heke tu tercîh nekî û nexwazî, tu nikarî ser bikevî, lê bixwazî û tercîh bikî, tu yê serkevî.

Di perwerdeyan de lazim e cihêtî nebe. Perwerdeya pîşeyî jî li ber çavan bê girtin û bê kûrkirin. Di hunera propaganda-ajîtasyonê de, di hunera propagandaya nivîskî- dîtbarî-bihîzbarî de lazim e kûr bibe. Ji bo perwerdekirina civakê pêdivî bi kûrahiyek wisa û pêşxistina rêbazên afirîner heye. Lê destpêka her tiştî perwerdeya îdeolojîk, teorîk, felsefîk e. Hişmendiyeke kûr, felsefe û îdeolojiyek rast ji bo ku jiyana rojane û xebat rast bên meşandin şert e. Tê gotin ku *"zanebûna wî têra şaştiyên wî nake"*, wisa bi agahiyên ser lêvan, bi zaniyariyên çep-rast, bê qerqote, ne xwedî felsefe û diyalektîkê, ev kar nayê kirin, lewma jî serketî nabe. Ji ber vê jî xebateke bênavber lazim e. Mazlum Dogan rojane 500 rûpel pirtûk dixwendin. Ji hemû pirtûkên xwendî jî xulase derdixistin. Def-

terên xwe yên wisa hebûn. 24 saetan dixebitî û wisa kar dimeşandin. Wisa li cihê xwe rûniştî hikum nedidan. Sibehekê rûnişt heta êvarî bi dest nivîsî, broşura li ser *"Berxwedana Hîlwanê"* danî pêşiya Desteya Weşanê. Siharê dest pê kir, êvarî saet 10'an anî, bû jimarek kovarê. Xwedî kûrahiyeke wisa ya hişmendiyê bû, lez dixebitî, tempo ya wî hebû. Em li kê, çi temaşe dikin? Em li ser şopa kê dimeşin? Taybetmendiyên bingehîn ên vê xebatê çi ne? Ji bo zanîna vê, vegotina van xisûsan sûdmend dibe. Lazim e heval kesayetên serketî baş lê bikolin, fêm bikin, bişopînin. Lazim e ti kes nebêje *"wisa nabe."* Ji ber ku li ortê ewqas pratîkên pêkhatî hene.

### b- Xebata Rêxistî- Partî-Sîstem-Rêveberî

Wek çaremîn, li gel perwerdeyê lazim e em xebata rêxistinî jî binirxînin. Perwerde, rêxistinbûn û çalakî di zik hev de ne. Terzê Apoyî, terzê Kemal Pîr, terzê Mazlûm Dogan ev bû. Mazlûm Dogan kesayetekî wisa bû ku perwerde, rêxistinbûn, çalakî di zik hev de kêlî bi kêlî dimeşand. Perwerde ji bo pêşxistina xebata rêxistî lazim e. Perwerde ji bo pêşxistina xebata rêxistî jî lazim e. Xebata rêxistî jî ji bo ku di vî karî de serketin çêbibe lazim e. Bêyî rêxistin serxistin ne mimkun e. Ne mimkun e ku bi hewldanên takekesî ve propaganda-ajîtasyonê têrker bike. Ji ber vê jî jixwe YRD hat damezrandin. An, bêyî rêxistin jî dikarîbû bihatana domandin. Em bala xwe bidinê dema ku guhertinên stratejîk dibin, plansaziyeke nû û li ser vî esasî bi stratejiya têkoşîna siyasî demokratîk berê xwe dide xebatên berfirehtir, yek ji rêxistinbûnên ket rojevê jî YRD bû. Naxwe yek ji bingehên xebata stratejîk e. Naxwe xebateke wisa girîng enceq bi rêxistinbûnê ve dikarîbû bi ser keve. Ji ber vê jî rêxistin ket rojevê, an ne ji ber ku em aciz bûn û me got ka em rêxistinekê damezrînin. Ji bo ku jiyana komunal bê pêşxistin, xebata kolektîf derkeve ortê, lewma jî ji bo xebateke bi

plan-bername, wezîfeyên ku pêdiviya şoreşê pê hene, bi şiklekî herî rast û di dema wê de pêk were, xebata rêxistinî lazim bû. YRD ji bo ku vê bîne cih hate damezrandin. Wê demê hem rêxistin bê damezrandin hem jî rêxistinî nexebite, nabe. Heke me rêxistin ava kiribe wê demê lazim e rêxistinbûna YRD'ê bixebite.

Bê rêxistineke çawa ye, me pênase kir. Me destnîşan kir ku rêxistineke partiyê ye. Girêdayî teorî, felsefe, îdeolojî-polîtîka, xeta rêxistinî ya partiyê ye, hedef dike bernameya partiyê ser bixe. Li gorî rêziknameya partiyê xwe rêxistin dike, dijî û dixebite. Ji bo ku vê di pratîka xwe ya propaganda-ajîtasyonê de bîne cih, rêgezên pêwîst jî di rêziknameya YRD'ê cih digirin. Wê demê em ê li gorî gereken wê bixebitin. Ew ê hemû organên YRD'ê ava bibin û bixebitin. Kordînasyona wê heye, konseya wê ya giştî heye, li qadan konseyên YRD'ê hene, komîte hene, êdî çi hebin, ew ê bixebitin û li gel vê ew ê ber bi jêr ve rêxistinbûnê pêş bixe, xwe bi xwe rêxistin bike. Erê xebata propaganda-ajîtasyonê dike, lê rêxistinbûna ku vê xebatê dimeşîne û rêxistina ku vê xebatê dimeşîne ew ê bi xwe derxîne ortê. Li gel vê, di rewşa heyî de di vê mijarê de jirêketin hene. Erê, lazim e xebat rêxistî bê kirin, lê tê gotin ku *"bila yek were rêxistin bike, xebata rêxistî derkeve ortê."* Kordînasyona YRD'ê, Komîteya Rêveber, li qadan wekî komîte wezîfeyê digirin, lê xebata perwerde û rêxistinkirinê nakin. Mîna ku dibêjin bila yek were û bike. Dibêje partî, kadro bişîne bila were filano rêxistin bike. Baş e, wê demê tu yê çi bikî? Jixwe ji bo ku tu wê bike tu hatiye wezîfedarkirin. Ketina te ya komîteyê, cihgirtina te ya di konseyê de ji bo wan karan e. Ev, helwesteke opurtunîst e. Helwesta axatiyê ye. Ne tenê di çapemenî-weşanê de, kadro wezîfeyê wekî raye û derfetan fêm dike. Mîna ku ew ê karan bigire ser xwe û pêk bîne, fêm nake. Halbûkî wezîfe girtina kar e. Perwerde jî kar e, rêxistinbûn jî kar e. Xebatên din ên pratîkî hemû kar in. Hemû xebatên çapemenî-weşanê kar in. Her kesên ku li vir dixebitin, wekî milîtanê şoreşger,

wekî karkerekî divê bixebitin. Ji ber vê yekê lazim e em xebata rêxistî pêş bixin.

Rêxistinbûna YRD'ê bi qismî heye, lê rêzikên wê tam naxebite. Ji ber ku jiyana komunal pêş nakeve, xebata kolektîf tine ye. Takekesîtî ne tenê di jiyanê de, di xebat û rêxistinbûnê de jî derdikeve pêş. Qaşo komîte, lijne tên avakirin, lê li wir her tim ên bi bandor ferd in. Ne li ser navê lijne-komîteyan, li ser navê ferdan heye. Lijne tê avakirin, herî dawî her tişt li ser yek an jî du kesî tên barkirin. Dema ku wisa dibe jî kes derdikevin pêş. Ev terz ne terzekî baş e. Dibe ku sekreterya, kordînasyona her komîteyê hebe, lê ew jî di vesazkirina wir de xwedî çiqasî rol e? Rewşa heyî hemû kar û rayeyê li hinan bar dike, yên din şiklî dimînin. Komîteyên heyî şiklî ne, baş naxebitin, mirovan tevlî nakin. Pêvajoyên biryara hevpar naxebitin. Lewma jî dema ku nikarin tevkariyê bikin mirov xwe didin paş. Nikarin hunerweriyên xwe, enerjiyên xwe baş bidin xebatê. Moralên wan xerab dibe, dest ji xebatê berdidin û diçin. Li qada çapemenî-weşanê rewşên wisa pir hene. Piştî wê jî her tim kes têne sûcdarkirin. Ma qet berpirsiyariya terzê jiyanê, terzê xebatê, terzê xebitîna rêxistinî tine ye? Halbûkî ew berpirs in. Jixwe kêmasiyên kes hene, ya ku wan perwerde bikin û tevlî xebatê bike avaniya wir a rêxistî ye. Heke ew avaniya rêxistî rast bixebite, komunal bijî, kolektîf bixebite, her kesî tevlî bike, dikare keviran jî bihelîne û bike milîtan. Lê heke ne wisa be, milîtanê herî perwerdekirî jî dema ku xwe bêfonksiyon bibîne ew ê xwe bikşîne goşeyê. Jixwe wisa jî dibe. Lazim e ev nebe.

Di vî warî de xebitîna rêxistinî, xebata rêxistî lazim e bê kêmasî pêk were. Gerekên xebitîna rêxistinî werin cih. Nîzama civînê, nîzama rapor-talîmatan, nîzama jiyana komunal, sîstema komîteyê lazim e bê kêmasî bixebite. Dema ku em dibêjin *"hûn çi dikin"* em dinêrin her tişt tê ber me. Ev, ne sîstema rapor-talîmatê ye. Ji vê re sîstema rapor-talîmatê nayê gotin. Nêrîna xwe tine ye. Mînak rêveberiya Ewrûpayê nêrîna xwe nanivisîne. Çep-rast çi nivîs hatibin, civînek li dar xistiye, gir-

teka wê çi be, hemûyî dişinin jor, komîteya jor hemû hêza xwe bide mêzekirina wê dîsa jî pê re nagihêje. Esas bi vî şiklî rêxistin bê fonksiyon tê hiştin û tê blokekirin. Berpirsiyariyê li xwe nagire, piştre vedigere û dibêje, *"me her tişt şandin, rêveberiya jor pêk nanî."* Nêzîkatiyeke bê berpirsiyarî heye. Rêxistineke wisa nabe. Me çend caran di talîmatan de îfade kir ku ev rewş wisa nayê kirin. Di xebatên Bakur de ev hakim bû, lê di xebatên çapemeniyê de hê zêdetir serwer bû. Tu dibêjî qey tiştekî baş dikin, demekê ciwanan jî dixwestin heman tiştî bikin, me hişyarî da ku wisa nekin, çiqasî rast kirin nizanim. Nîzama raporê ne ev e. Ji ber pêwîstiya xebitîna rêxistinî lazim e her komîte berpirsiyariya xwe bizane. Heke raporên jê re tên hemûyî dişîne jorê, ew komîte ji komîtebûnê derketiye, îstîfa kiriye. Lazim e yên wisa dikin yekser ji wezîfeyê bêne avêtin. Ji ber ku rapor jê re hatiye, yê ku lê mêze bike û têkildarî wê biryarê bide ew bi xwe ye. Heke lazim be têkildarî wê agahiyê bide jorê, lazim e wê demê rapora xwe binîvîse.

Eger rêxistina jorê nebêje *"filan raporê ji me re bişîne"*, ti komîteyên jêrê raporên ku ji wan re hatine nikarin bişînin jorê. Ev, binpêkirina xebitîna rêxistinî ye. Me kordînasyona çapemeniyê, komîteyê hişyar kir. Me got, terzê we rêxistinê ava nake, nahêle rêxistin bixebite, komîteyên jêrê nake komîte, berpirsiyariyê nade, bêbaweriyê çêdike. Ma hûn baweriya xwe bi yên wir naynin, yê li Ewrûpayê jî kadro û mirovê partiyê ne. Tu her tiştî dizane, lê yê li milê din qet tiştekî nizane! Hinekî însiyatîfê bidê bila ew jî kêmekî bikeve nav kar, ket şaşiyê rexne bike û sererast bike. Lê hûn dibêjin tu tiştekî neke, hemû bila ji min re bên, biryara hemûyan ez bidim. Nêzîkatiyeke wisa pir takekesî, eznavendî heye. Di nav YRD'ê de navendîparêziyeke pir zêde heye. Wisa lê hat ku komîteyê her tişt bi xwe ve gireda, niha ji jor ve nikare ti tiştekî bike. Ji ber vê jêr jî naxebite, ji ber ku halekî wê yê meşandinê nemaye. Nikare wisa bike, ortameke wisa ya bi wî terzê xebatê nema.

Nikare ewlehiya xwe jî pêk bîne, cihê xebatê bibîne. Ev ne terzekî baş ê xebatê ye.

Xebitîna rêxistinî ya PKK'ê ne ewqasî navendî ye. Her kes dibêje qey PKK rêxistineke pir navendî ye, lê ne wisa ye. Navendîparêziya demokratîk ji destpêkê ve esas wergirt. Hemû kadro, komîte li qadên xwe berpirs in û xwedî raye ne. Li gel vê guhertina paradîgmayê navendîparêziya demokratîk guhert. Li ser bingehê konfederalîzma demokratîk civakê rêxistin dike ku PKK'ê rêxistinbûna xwe jî wekî feraset, sîstem û xebitîn li gorî gereken konfederalîzma demokratîk guhert. Hin rêxistinên me ji partiyê qut dibin, parçe dikin, lê di nava xwe de felaket navendî ne. Bi ti rêxistinên kêlekê ve parve nakin, li jêr jî ti însiyatîf û îradeyê nadin. Her tiştî hewl didin ji jor ve her tim dîkta bikin. Piştî wê jî kar nameşin. Ev ne karê yek-du kesî ne. Wisa bibûya me rêxistineke mîna YRD'ê ava nedikir. Heke ev kar bi 2 kesan an jî 10 kesan bibûya, me yê ew banîbana gel hev, kar bimeşandana, wê demê pêwîstî bi damezrandina rêxistinê, wezîfedarkirina kadroyan nedima. Ne karekî wisa ye ku ji navendekê bi emiran ve bê birêvebirin. Enceq artêşeke propaganda, ajîtatoran dikare vê xebatê bi serketî bimeşîne. Ji ber ku em xwe û civakê perwerde dikin. Hevalan navê *"Biryargeha Şoreşgerî"* lê danîn, lê ti gereken biryargahbûyînê nanîn cih. Ne di nîzama biryargehê de xebatek heye ne jî jêrbiryargehên vê biryargehê hene. Biryargeha şoreşgerî biryargeha gerîla bû. Gerîla, însiyatîf û îrade ye. Ne însiyatîfeke wisa ne jî îradeyeke wisa heye. Lewma jî dema ku navend hat asta ku nema dikare karan bimeşîne, zemîn ket pêvajoya hilweşandinê. Ewqas pirsgirêk, rewşa lêpirsînê ji vir tê.

Naxwe, yek; lazim e xebata rêxistî were esasgirtin. Dudu; lazim e xebitîna rêxistinî rast fêm bike û bimeşîne. Lazim e di her astê de organ bixebitin. Sisê; lazim e pergala civîn, rapor-talîmatan rast bixebite. Di bin navê talîmatan de pirtûkên 50-100 rûpelî hatin şandin. Her tiştek xwedî usûl û giraniyekê ye. Ji ber perwerde û dibistan ava nekiriye, qaşo her tiştî bi wê ve

hel dike. Ev ji rê ketine. Ew nîzam nebû. Talîmata 50 rûpelan kîjan sazî ew ê kengî bixwîne? Çawa bixebite? Bi hefteyan, heta mehan dibe ku nikaribe bixwîne, ji ber ku di nav pratîkê de ye. Wê demê ti qîmetê nivîsandinê namîne. Lewre jî lazim e her tişt rast bê xebitandin. Di pratîka YRD'ê de xebitîna rêxistinî rast nayê meşandin. Talîmat rast nayê dayîn, rapor rast nayê wergirtin. Ji Ewrûpayê hin tişt hatine, ez deh rojan bixwînim nikarim biqedînim. Ne mimkun e jê fêm jî bikim. Ev terz rêxistinê diqedîne. Lazim e ev terz bê derbaskirin. Pêwîst e ber bi zemînê ve rêxistinbûn rast bê pêşxistin. Rêxistinbûn ne tenê ev in jî. Li gel vê rêxistinbûna xebatê jî girîng e. Erê, em organên propaganda-ajîtasyonê pêş dixin. Hem rêxistinbûna her organî hem jî pêwendiya mabeyna wan pir girîng e. Di nav çapemeniyê de qutbûnên van hene. Rojname-kovar, çapemeniya nivîskî; bi dîtbarî-bihîzbarî re nabin yek, parçe parçe ne. Xebata çapemenî-weşanê bi komîteya qada îdeolojîk re nabe yek, cuda disekine, parçeyî ye. Qada îdeolojîk rêxistin nake, bi akademiya Zanistên Civakî ya wekî qada xebata teorîk e, nabe yek. Li gel akademiyan ku wekî qada perwerdeyê dixebitin, ti têkiliyê daneyne. Ji bo qada huner-wêjeyê ku dikare herî zêde tevkariya perwerdeyê bike, ruh û hestê mirovan perwerde bike, ti berpirsiyariyê nabîne. Pir takekesî û parçeyî ye, dibêje *"ez besî xwe me"* û xwe ji qada îdeolojîk qut dike. Piştî wê jî her organê wê jêv qut dibin, di pratîkê de ne koalîsyonek e jî.

Bakur lawaz bû, berê ne koalîsyonek bû jî. Rêxistinbûna çapemeniya me ya li Ewrûpayê jî ne koalîsyonek e jî. Rêxistinên Ewrûpayê salane konferansekê saz dikin. Kadroyên ku li her derê dixebitin, li her aliyê Ewrûpayê belav bûne, tên cem hev, bi şiklekî rêkûpêk demeke têrker vediqetînin, konferansên xwe li dar dixin. Rexne-rexnegiriyê pêş dixin. Qada îdeolojîk, çapemenî-weşan ti carî di dema xwe de nikare bike, her dibe pirsgirêk. Piştî wê jî dibêjin *"karê me zêde ye, wextê me tine ye"* û tê derbaskirin, nikarin werin cem hev. Dîtbarî nayê cem a din. Hema hema di organekî de xebatên cuda nikarin

pev bên girêdan, berpirsiyariyê nabîne. Ti kes nikare qarişî hev bibe. Ewqasî ji kolektîvîzmê dûr ketiye. Heke kesek rayeyê digire, kar digire ser xwe, xwe ewqasî hakim dike û ji xebatên din qut dikin. Piştgirî û hevkarî tine ye, takekesîtî pir zêde ye. Ne ku em nabînin, fêm nakin. Tê hesibandin ku em pir zêde van karan ferq nakin, lê em di nav de ne, em dizanin û çavdêrî dikin. Lazim e qada çapemenî-weşanê bizane, dema serê xwe dixe nav qûmê nikare xwe veşêre, her tişt vekirî ye û li ortê ye, her kes dibîne. Ne tenê rêxistin, gel û cîhan dibîne. Ti cihekî ku xwe veşêre tine ye. Wê demê ne bi hesabê xwe veşartinê, ya herî rast û aqilane hewldana rastkirina xebatê ye.

Li gel damezrandina YRD'ê, me hewl da hin rêxistinan jî pêş bixin, beşek meşiya beşek nemeşiya. Yên meşiyan çi kirin? Hin organên propaganda-ajîtasyonê hinekî nasname qezenc kirin. Wek nimûne, rojname-kovar, organên weşana dîtbarî-bihîzbarî ne. Hinekî zêde çû, qut bû, vê carê lazim bû ku ji tersê ve bê sererastkirin. Dîsa sîstema ajansa nûçeyan li derveyî welat, parçeyan pêş ket. Beriya wê ev tine bûn. Beriya damezrandina YRD'ê, saziyên me yên wisa, mînak sîstema me ya ajansê, tine bû. Ew bi damezrandina YRD'ê re derketin û bûn xwedî xebitînekê, karîger bûn. Di yekparekirin, gihandina karan de bûn xwedî roleke girîng. Feqet qadên rêxistinî yan jî xebat hebûn ku me biryar da, plan kir û nikarîbû pêk bînin, wextê pratîkkirinê me di nîvî de hiştin. Yek ji van rêxistinbûna tora nûçegihanan û bernameyê bû. Di rêxistinkirina yekeyan, yekîneyan de ku ber bi jêr ew ê xebatên teorîk, îdeolojîk, polîtîk bimeşandana, ji nûçegihaniyê heta lêkolîneriyê xebat bikirana, em zehf lawaz man. Bi nîqaş û biryaran ve hewl hat dayîn ku pêvajoyek bê pêşxistin, lê piştî wê her ku çû sist bû. Niha qasî çavdêriyên me hema hema tine ye. Wek mînak ti yekîneyên YRD'ê yên ku di nava civakê de lêkolîna teorîk dikin, tine ye. Li gel saziyên wisa pêwendî, têkilî jî tine ye. Duyemîn, sîstemeke wê ya nûçegihanan jî tine ye. Xwe daxistiye asta

propaganda û nûçegihantiya rojane polîtîk, lê rêxistina wê ya karibe nûçeyan jê wergire tine ye.

Piştre, kî were ber telefonê vedike û wan dike nûçegihan. Ew jî çi tê bîrê wê dibêje. Dûvre kî çi bibêje dibe nêrîna televîzyonê, rojnameyê, kovarê yan jî radyoyê. Bila MÎT mirovan rêxistin bike, tevlî bike, her roj araste bike. Ji bo şerê taybet rewşeke wekî zêr e. Jixwe şerê taybet çapemeniya me felaket bi kar tîne. Dema ku em hatin beşa şerê taybet em ê vê binirxînin. Ji bo karkirina wan bê fêmkirin, me hin belge jî derxistin. Heke sîstem ev be, her cure oportunîst, xayîn, takekesane, berwendatî (orta yolcu), burjûva, hêza dijmin, sîxur-provakator dikarin me araste bikin. Çima? Ji ber ku kî tevlî dibe em jê re dibêjin *"belê."* Li derekê tiştek bûye, kî zû bike û zaniyaran derbas bike, dibêjin *"ev agahî ye"* û mîna rastiyekê datînin ortê. Çima? Ji ber ku rêxistina me bi xwe tine ye, nûçegihanê wê tine ye. Ji vê re rêxistinbûnek dikare bê gotin? Em civakê tevlî dikin, gel tevlî dikin, lazim e tevlî jî bibe, lê lazim e sînorekî wê jî hebe. Bila ji civakê re vekirî be, lê ev nayê wê maneyê ku rêxistina wê tine be. Ji ber ku tu têkoşîneke xeta îdeolojîk-polîtîk, felsefî dimeşîne. Tu propaganda û ajîteya zihniyetekê dike. Tu hewl dide civakê bi tiştekî ve perwerde bike, agahiyên ku ji her kesên ketober tevlî dibin nikare vî karî bikin. Enceq agahiyên ji mirovên ku te bi xwe rêxistin û perwerde kiriye, dikarin xizmetî armancake wisa bike. Ji ber vê yekê, pir zêde ji wir-vir agahî tên girtin, ev jî di nûçegihaniyê de ne zêde bi bandor e. Nûçeyên wê li ser civakê ne bi bandor e. Çapemeniya me nikare bûyer û diyardeyan zû derbas bike, her ji hinên din werdigire. Jixwe hinên din weşandine, tu dibe versiyona duyemîn an jî sêyemîn. Ew ê kî li te temaşe bike! Ji ber ku rêxistinbûna wê bi xwe tine ye, di kêliyê de nikare nûçeyan ragihîne.

Ev dibe rewşeke pir vekirî ku dikare ji hêla şerê taybet, çîna navîn, her mirov li gorî berjewendiyên xwe, feraseta xwe araste bike. Di vê rewşê de ne mimkun e ku propaganda-

ajîtasyona xeteke îdeolojîk-polîtîk bê kirin. Têkoşîneke îdeolojîk bi vî şiklî nayê meşandin, îstîqametê nagire. Yekparebûna gotinên wê nabe. Pratîkek wisa derdikeve ortê ku bi şiklekî belave cih dide her cure nêrînê; gotin û kirin nabe yek, ev jî perwerdekar nabe, bi xwe nade bawerkirin. Berevajî, serobinokirin ew ê pir zêde bin. Jixwe hat berevajîkirin. Ser meselê, di şerê zivistana 2015-2016'an de di şerê xwerêveberiya demokratîk de yên ku bi navê HPG'ê ji vir-wir tevlî bûn, tam wekî sîstemek şerê taybet xebitîn, şerê ku me serxistiye bi me dan windakirin. Hê jî em hewl didin ji bandora wê rizgar bibin. Halbûkî di warê eskerî de serketineke mezin hatibû destxistin. Artêşa Tirk windahiyên herî giran, herî bijarte yên dîroka xwe ji dest da, ket pozîsyona sendromê. *"Sendroma Nisêbînê"* çêbû. Piştre ji bo me ji ber qenala *"Medya Haberê"* veguherî *"Sendroma Cizîrê."* Tekane berpirsiyarê wê ew qenal e. Rêxistinê bi rê ve nebir, ya ku ew bi rê ve bir hemû navenda şerê taybet bû. Ez nabêjim ê ku li wir axivî, kar kir hemû sîxur bûn, lê araste kirin. Ev kar wisa ye, tu ne bêalî ye. Ji ber ku tu têkoşînekê dimeşîne. Heke tu nizanibe têkoşîna çi dimeşîne, çi li gorî armancan e, li gel vê li gorî vê rêxistinbûn nebe, xwe nespêre rêxistina xwe, hewl bide xwe bispêre tiştên ji vir-wir tên, ha encam dibe ev. Jixwe wisa bû. Ev rewş nayê qebûlkirin.

Nûçegihaniya bê tevna nûçegihanan nabe. Tew di roja me de qet nabe. Di dema rojnameyên rojane de ev rewş pêş ket. Ewqas ajans, tevna nûçegihanan rêxistin kirin. Niha tevna nûçegihanan a ajansên me tine ye. Navend heye, lê mil û baskên wê tine ne, nebes e. Mîna sîstema axatiyê ye. Tu nikare bibêjî *"em rêxistin nakin"*, gerekek vê xebatê ev e. Heke tu dimeşînî, wê demê tu yê rêxistin bike. Tu yê jêderên agahiyan, tevna nûçeyan rêxistin bike, ji jêderên xwe agahiyan werbigre ku karibe agahiyên rast û li gorî armanca te agahiyan bide. Dema ku ji cihekî agahî tên, lazim e jêderên te yên agahiyê hebin ku tu karibe piştrast bikî, li gora wê biweşîne. Tu wisa nebî tu yê şaş bikî. Ew ê xizmeta dijmin bike, ji aliyê şerê taybet bê

bikaranîn. Li gel vê lazim e bernameçêkerê te jî hebe, yekeyên xebatên din jî hebin. Ev hemû karê rêxistinbûnê ne. Tu yê bi sedan, hezaran kadroyan rêxistin bike, perwerde bike, li ser xebatên cur bi cur peywîrdar bike ku karibe weşana televîzyon, kovar-rojnameyê bike. Vê neke, biçe ji hinên din bixwaze, hewl bide bikire, hazir bibîne û bi cih bike. Ya ku hinên din dike ne li gorî nêrîna te, felsefeya te, îdeolojiya te, polîtîkaya te ne. Wê demê heke tu tiştên wî biweşînî, tu yê bibe organekî ku fikrê hinên din diweşîne. Ka tu Apoyî bû, ka tu dengê şoreşê bû! Ma dengê şoreşê fikrên ku ti eleqeya xwe bi şoreşê re tine ye diweşîne? Naweşîne, lazim e neweşîne. Heke biweşîne, wê demê roleke dijşoreşê dilîze. Ew ê rolên ku zirarê dide şoreşê, şoreşê tasfiye dike bilîze. Di van qadan de rêxistinbûn lawaz û nebes e.

Qadeke din a nebes jî qada belavkariyê ye. Me rêxistinên belavkariyê ava kir. Me li Bakur, li Ewrûpayê ava kir, me şirket ava kirin, ji bo ku yek ji karên herî girîng e me bi sedan kadro, mirovên singên xwe ji guleyan naguhezin me dan wir. Hin deman xebitî. Dijmin bi ser de hat, qismek qetil kir û her çû lawaz bû. Xwedî lê nehat derketin, nehat dewamkirin, israrkirin. Piştî wê tê gotin ku *“pirtûk nayên firotin, rojname tîrajê nakin, kovar nayên xwendin, nayên belavkirin.”* Ma wê hin ji ezmanan dakevin, tu yê rêxistinê saz bike û pêk bîne. Ma ew ê sîstem bike, ew ê faşîzma AKP-MHP rojnameya te bifroşe, pirtûk, kovara te belav bike? Ma tu bendewariyê jê dikî? Ma ew ê emperyalîzm, kapîtalîzma Ewrûpayê pirtûk, kovar, rojnameyên te belav bikin? Ma tu hêviyê ji wan dikî? Heke nêrîn ev be, li vir xetek tine ye. Xwe wekî dûvik, parçeyekî modernîteya kapîtalîst dibîne. Ji yên wisa re tiştekî ku em bêjin tine ye. Lê eger em ne wisa bin, em li dijî wan hêza têkoşînê bin, wê demê ew nikarin xebata me bimeşînin, herî kêm em ê vê bizanin. Mîna ew ê mîna dimeşînin nîşan bidin, lê ew ê bincil bikin. Piştre jî tê gotin *“nayê xwendin, em rojnameyê dernexînin.”* Ma her kes ew ê neyê ji çapxaneyê negire, tu li Stenbolê li çapxanê çap dikî, ma miro-

vekî Colemêrgî nayê ji çapxaneya Stenbolê rojnameyê rojane nagire û naxwîne. Ew ê rojnameya te biçe wir, tu yê belav bikî. Parçeyekî vê jî belavkirin e, gihandina civakê ye. Qadek esasî ya vê xebatê, parçeyekî girîng ev e.

Tu yê bike, ti kes ji bo te nake. Heke kar neyê kirin, dibêjin *“pirtûk nayên xwendin, em ê çap nekin.”* Pirtûkên me çawa nayên xwendin, ma ev mimkun e? Lê heke tu ji çapxaneyê dernexî, tabî ti kes naxwîne. Rojname di tîraja herî jêr de ne. Dibe 10 hezar, 15 hezarî derbas nake, tê gotin ku enceq wisa dibe. Li Ewrûpayê Ozgur Polîtîka bi giştî li gor sîstema abonetiyê dixebite. Ewqas abone heye, heke belavkarekî xwe jî hebe, dibe ku bibe rojnameya herî bi tiraj a Ewrûpayê. Heke ewqas aboneyî dibîne, naxwe mirov ewqasî dixwazin bixwînin. Ji ber wê jî hincet hevnegirtî û şaş in. Ji bo hin xebatan nekin her tim di warê nebûnê de li kar tê mêzekirin.

Rêxistinkirina belavkariyê pêwîstiyê bi xebateke cidî ya perwerde û rêxistinbûnê dibîne. Gerek dike ku bi sedan mirov bên perwerdekirin, rêxistinkirin, rêvebirin. Mîna artêşekê ye. Partiya Bolşevîkê rêxistineke wisa bû. Rojnameyek û belavkarên wê rêxistina serhildanê bûn, şoreş bi wê ve hat kirin. Di şoreşê de ku wekî şoreşa herî mezin a cîhanê tê hesibandin, bû rêxistinbûna herî bingehîn a şoreşger. Li gel me jî heval tenezûlî rêxistinbûyîneke wisa nakin. Dibêjin, *“em nakin”*, qebûl nakin, xwedî lê dernakevin. Dûvre jî tê gotin ku *“ez ê xebata propaganda-ajîtasyonê bimeşînim, wezîfedarê çapemenî-weşanê me, dixwazim bikim, lê nabe.”* Ya ku tu dixwazî ew e ku bêyî karkirinê kar were kirin. Bila hin bikin, tu jî wekî axa bibe xwediyê wê. Sîstemeke wisa naxebite. Nabe. Ti kes nake û nabêje, *“min kir, wer ji te re, tu bixebite, bila ya te be.”* Di van mijaran de jirêketin hene. Xwedîderneketina li wezîfeyan heye. Dema ku kar hinekî li zoriyan rast tê, xwe jê dûrkirin heye. Herî girîng jî qada çapemenî-weşanê ji xebata perwerde û rêxistinbûnê direve. Ev der wekî qadeke perwerde û rêxistinbûnê nayê dîtin. Ev der tenê wekî qadeke ku li buroyê dide

xebitandin tê dîtin. Em ê rûnên li buroya xwe, vekin înterneta xwe, em ê ji wir bigirin û li malpera xwe bi cih bikin, bidin weşanê, karê me ewqas e. Kî tîne nayê zanîn, dibêje ez ê ji hinan bigirim, bila hinên din jî belav bike, ew min eleqedar nake. Ev xebateke burokratîk, oportunîst e. Ti eleqeya xwe bi rastiya kar re tine ye. Em nûçeyan, bûyeran dikin halekî nûçeyî. Terzê xebatê ev e. Em hinan kêmekî rotûş dikin, diweşînin, şikil diguhere, cewher naguhere. Ji ber vê jî gelek caran cewherê tê dayîn nêrîn, felsefeya Rêbertiyê û partiyê nateyisîne. Ji kû bigirin, wan diteyisîne, zirarê dide. Gelek weşanên me wekî îdeolojîk, felsefîk, sûdê nade partiyê û Rêbertiyê. Di vê astê de xebateke burokratîk heye. Kesekî wisa dixebite, ne dikare nûçegihanan, bernameçêker, lêkolîneran perwerde û rêxistin bike ne jî belavkaran perwerde û rêxistin bike. Nakeve bin berpirsiyariya wê.

Ev rêxistinên rêzkirî, rêxistinên herî bingehîn ên YRD'ê ne. Wekî rêxistinên bingehîn ên YRD'ê me 2 rêxistin pênase kiribûn. Ew belgeyên ji konferansa YRD'ê ta niha lazim e bên lêkolînkirin. Yek tevna nûçegihanan bû. Ya duyemîn rêxistinbûna belavkirinê bû. Rêxistinên wê yên bingehîn ev bûn. An ne wisa buro, filan organ, navendên nûçeyan, filan komîte bûn. Yek, nûçegihan an jî tevna nûçegihanan. Dudu, rêxistina belavkariyê ye. Ev li gor cihê wê dikarin legal an jî îllegal bêne kirin, lê 2 rêxistinên bingehîn ên ku YRD'ê pêk tînin ev bûn. YRD li ser van rêxistinan heye, lê ev rêxistin niha tine ne, wê demê di halê heyî de YRD jî tine ye, nav heye cisme wê tine ye. Ji ber ku ji rêxistinên bingehîn bêpar e. Ji ber vê jî heke em perwerde û rêxistinbûnê nekin, rêxistinên xwe yên esasî saz nekin, ev xebat pêş nakeve û berbelav nabe. Piştre jî bila gel û rêveberiyê tewanbar bike. Çapemenî her negengaziyê dispêre. Îcar xeta me, me zem dike. Tê gotin ku *"nivîsên we nayên xwendin, gotinên we nayên guhdarîkirin."* Her ji partiyê, xetê revîn heye. Lê ev bi pereyên partiyê dixebite. Min got, dema ku rast dixebite qezencek mezin a malî tîne, lê niha her ji berîkê dixwe. Wê

demê çima em pereyan didin ku? Wekî rêveberî em vê jî nîqaş dikin. Ewqasî zêde tê pirolekirin. Bi dîtina min lazim e li gorî fonksiyona xwe be. Ne pêwîst e ku yên bê fonksiyon vala vala bên tijîkirin û ewqasî pere bêne xerckirin. Lazim e di vê qadê de jî sererastkirinek hebe. Yên xwedî fonksiyon, rolê dilîzin lazim e bimînin. Yên rolê nalîzin, lazim e yan bên rakirin an jî werin halekî ku roleke karîger dilîzin. Pêwîst e ev sererastkirin hebe. Em nikarin bêjin ku tenê bila gotin hebe, dîmen hebe, fonksiyon hebe jî dibe, nebe jî dibe. Heyf e, em ewqasî kedê didin, ewqas mirov dixebitin, ewqas nirxên madî xerc dikin. Ev ne rast e, şaş e. Heke sererast nebe, em vala vala dixebitin, xwe diwestînin. Hemal jî wisa naxebitin, dîsa jî kêmekî encamê digirin. Ew terz ji hemaliyê jî wirdetir, xebateke xerab e. Wê demê lazim e sererastkirin li van qadan hemûyan bên destgirtin û pêşxistin. Lazim e şaşî bên rastkirin. Heke tiştek şaş be mirov tespît bike ku şaş e, nebêje *"me zehf kir jî nebû."* Lazim e em xwe ji teoriya negengaziyê rizgar bikin. Erê, pêkanîna tiştekî girîng e, lê çawa kirina wê hê girîngtir e. Bi vê dîtinê, terz, uslûb, tempoya karkirinê jî girîng e. Li ser wan jî nêzîkatiyeke rastker gerek e.

### c-Uslûp, Tempo, Terzê Karkirinê

Wekî ya pêncemîn jî; pêdivî bi sererastkirina terz, uslûb, şiklê, qezenckirina tempoyê heye. Li qada çapemenî-weşanê sekna cuda ya li gorî ferdan heye. Li gor hin derdoran bila kar bike çawa dibe wisa bibe, heye. Tenê li gorî hin derdoran, di nav tengbûna wê de ev esas tê girtin, di pozîsyoneke pir teng û bêber de dimîne. Takekesîtiyên cur bi cur hene. Ne hewldaneke ku her kes terz, uslûba serketinê bi dest dixe; li gorî fêmkirina xwe, li gorî xweşik, baş, rastiya xwe, li gorî pîvanên xwe yên qebûl-redê nêz dibe û li gorî wê xebatê digire dest, heye. Uslûb, terzekî li ser vî esasî heye. Di vî karî de naverok esas e, lê şikil jî girîng e. Wê demê lazim e rêxistinbûna YRD'ê, qada

çapemenî-weşanê pîvanan deyne. Pêwîst e rêzik, pîvanên her organên weşanê hebe û li gorî wê hereket bike. Mînak kovarek an jî rojnameyek her nivîsê naweşîne. Mîna ku wekî naverok naweşîne, wekî şikil jî dikare neweşîne. Her kesek nikare derkeve ser televîzyonê û bipeyive, bernameyê çêbike. Bi gotina, *"ez dixwazim derkevim, ez ê bernameyê çêbikim"* nabe. Heke pêşkêşvanê nûçeyan be, lazim e rêzik, pîvanek wan hebe. Heke bernameçêker be, lazim e pîvana xwe hebe. Ev li gel me zehf hatine şêlûkirin. Şêlûkirin, têkoşîna îdeolojîk ji holê radike, berevajî zirarê dide. Lîberalîze dike, bê şikil dike. Lewma jî taybetmendiyê xwe yê perwerdekar û xistina nav hereketê dide windakirin, bandora xebatê lawaz dike. Ji ber vê jî girîng e. Ev tenê ne ji bo me wisa ye, em li organên çapemenî-weşanê binêrin, her organê çapemenî-weşanê xwedî pîvan, rêzikên wisa ne. Mînak tevna nûçegihaniyê heye. Ajans bi tevna nûçegihanan ve rêxistî ye. Pirsgirêka belavkariyê bi şirketin belavkariyê re tên çareserkirin. Jê wirdetir, heke tu bixwazî tevlî vê xebatê bibin, li gorî xebatê lazim e tu teşe bigire. Ji ber ku taybetmendiyên xwe hene. Mînak, heke tu yê bibe spîkerê nûçeyan, rêzikên spîkeriyê hene. Ji tonê deng, heta cil û berg, ji şiklê por heta şiklê rûniştinê, şiklê îfadeyê diyar dikin. Li televîzyona CNN binêrin, nûçegihan mîna ku ji yek qalibî derketine dixuyin. Pêşkêşvanên bernameyan eynî ne. Ango pîvaneke xwe hene. Heke tu li gorî wan bibî, dikarî li wir bixebitî. Eger bixwazî bixebitî, tu li gorî wan dibî, yan tu nikarî bixebitî. Li gel me jî dibêje, *"dilê min wisa dixwaze"* û mirov nikare li ekrana televîzyonê binêre. Organa çapemenî-weşanê ya gelekî, partiyekê ye, ne mecbûr e ku wisa be. Kî çi dixwaze wisa dike, wisa cilan li ber dike, wisa şikil digire. Ev ne cihên keyfiyetê ne. Ev ne mimkun e. Dema ku wisa bû, tu dikarî behsa kîjan têkoşînê, kîjan perwerdekariyê bikî. Ji wir re enceq dikare cihên ku kes xwe didin axaftin, bê gotin. Navê vê dikin *"azadî". N*ikare bê gotin ku *"azad e, mîna dixwaze ew ê bike!",* lê ew televîzyon jî xwedî azadiyekê ye, pîvanên wê hene. Heke azadiya kesekî

hebe dikare biçe cihê dixwaze, lê mînak nikare li Medya TV'yê bejn û bala xwe nîşan bide. Tê gotin ku *"ez ê bikevimê, çi dixwazim jî bikim."* Ti kesî destê xwe neda yên wisa û yên wisa hemû reviyan. Têkildarî hemûyan di demê de ewqasî rexne hebûn. Her kesî rexne dikir, me jî rexne dikir. Her kesî li wir xwe dida axaftin. Yên xwe didan axaftin herî dawî bi xwe reviyan. Perwerde nake, naxebitîne, tevlî nake, herî dawî direve. Ma me qencî bi wan kir? Heke di dema xwe de ber bi rastiyê ve bihatana kişandin, bihatana perwerdekirin, dikarîbûn dewam bikirana. Nêzîkatiya wî terzî nabe qenciya wî jî.

Di propaganda-ajîtasyonê de terz, uslûb, şikil, şêwe pir girîng û hîkarîker e. Dibê şêweyê derbaskirina gotinê ji bo jiyanê. Rêber Apo jî got, *"gel ji jiyan, ji libata PKK'yiyan bandor bû."* Wê demê yên ku li ser wir derdikevin wekî kadroyên PKK'ê tên fêmkirin. Bi wî navî derdikevin. Ew xebat xebata PKK'ê ye. Kî mêze dike dibêje *"ev partî ye".* Wê demê lazim e bê kêmasî li gorî partiyê be. Yekî li wir lazim e li gorî pîvanên partiyê be. Bi şiklekî din em nikarin qebûl bikin, lazim e em nekin. Em propagandaya îdeolojî, felsefeya partiyê dikin. Heke yê ku propaganda dike bi xwe wisa nebe, nabe. Kesekî ji serî heta binî takekesane her behsa komunalîzmê, komunê bike jî ti kes bawer nake. Ti kes ji wê gotinê bawer nake. Ew gotin ti kesî perwerde nake. Ji ber wê jî ev rehendên sererastkirinê pir zêde lazim e. Terzekî baldarî, bi pûte û bi rêzik ê rêxistinê lazim e. Lê terzekî wisa tine ye. Wekî pîvanên partiyê jixwe heye, lê yeke, komîteyên berpirs û wezîfedar lazim e pîvanên qadên xebatê deynin. Em ewqasî rêziknameyan amade dikin, rêzik û qaîdeyan datînin, lazim e li wir jî were bicihkirin. Mînak pêşkêşvanê nûçeyan çawa dibe? Ew ê çawa cilan li ber bike, çawa tevbigere? Çawa baxive? Hin wekî takekes derdikevin û kaprîsên xwe didin axaftin. Ma ev dibe? Destûra vê dikare bê dayîn? Rêbertiyê yên wisa diqewirandin. Pîvanên partiyê wisa ne. Bila ti kes Rêbertiyê wekî mirovekî lîberal, bê pîvan nehesibîne. Tersê wê rast e. Mirovekî herî bi pîvan, bi rêgez, di

van mijaran de herî hişk bû. Bi xwe li gorî wê dijî û tevdigere. Dixwaze hawirdor jî wisa be. Ne mimkun bû ku yek kes jî van bin pê bike. Herî kêm li gel, di nava karê berdest de nabe. Li cihekî din be jî ew ê rexne bike û têbikoşe, lê li cem Rêbertiyê, di nava karê Rêbertiyê de yên wisa nabin. Hûn mêze dikin, ti pîvan, rêzik, pûte û dîqet tine ye. Rewşeke ku pir zêde teknîkî bûye heye. Piştre jî libata li gor dilê xwe heye. Dibêjin, *"kes wisa dixwaze"*, lê ew der weşana PKK'ê ye. PKK dixwaze çawa be? Em vê jî bipirsin. Gelo ew ê daxwaza PKK'ê derbasdar be yan daxwaza kes? Lazim e em vê zelal bikin. Wê demê bila her kes were çi dixwaze wê bike. Ma azadî tine ye? Heye. Lazim e azadî wekî keyfiyet neyê têgihandin. Ne wisa ye. Azadî ne lumpenîzm, beradayîbûn e. Azadî wisa nayê fêmkirin.

Em hereketeke partiyê ne, lazim e em hê zêdetir yekgirtî û hevpar bin. Em bibin ew ên ku gotinên herî bedew dibêjin, libatên herî cazîb raber dikin. Em vî karî ji bo pereyan nakin, ji bo xizmeta mirovan û perwerdekirina civakê dikin. Wê demê ji bo perwerdekirina civakê wekî çawa em fikrên herî water dafirînin, her wiha em karibin libatên herî bedew, şêweya herî baş bidinê. Em dikarin armanca xwe wisa ser bixînin. Heke em di serxistinê de bi îdîa bin, em girêdayî armancê bin, ew ê wisa bibe. Lê heke wisa nebe, piştre bêjin *"dixwazim civakê perwerde bikim"* rast nabe, rastiyê nateyisîne. Di vî warî de pûte nîn e. Di terzê çapemeniyê de dîqet û hestiyarî pir zeîf e. Eletexmînî, teknîkî nêzbûna karan pir zêde ye. Israr tine ye. Avakirina rojevê, afirandina têgihandinê tine ye. Binêrin me sloganek ava kir, em kampanyayê dimeşînin. Geh dibêjin *"em tecrîdê bişkînin, faşîzmê hilweşînin"* geh dibêjin *"em faşîzmê bişkînin, tecrîdê hilweşînin".* Du rojan li ser hev heman tişt nayên gotin. Lê li çapemeniya şerê taybet binêrin, bi dehan televîzyon pêwîst be rojane heman gotinê ji bo ku bixin mejî, dilê mirovan wekî wê didin. Lê li cem me pir ecêb e, tîp kêm derdikevin, peyv cuda ne, carekê binî tîne serî, carekê serî tîne dawî. Ji qiseyan tiştên rast nayên derxistin.

Dema ku ez mêzeyî çapemeniyê dikim: dikarim di vê mijarê de hîsên xwe vebêjim. Tu dibêjî qey heval bi zorê tên xebitandin, mîna ku hin mehkûmî wir hatine kirin, meqsed kar be bi zorê dikin. Bila bibe, wext tijî bibe, çawa dibe bila bibe. Em nikarin wisa bibêjin. Çawa dibe bila bibe na; pîvana me ew e ku em ya herî baş, herî rast, herî serketî pêk bînin. Karkirin ne pîvan e; rast, bedew, baş kirin, serketî kirin esas e. Karkirina li gorî pêwîstiyên xetê esas e. Ev herî zêde jî ji bo xebata propaganda û ajîtasyonê derbasdar e. Wê demê lazim e uslûb, terzekî ku ew ê baş, bedew, rastiyê derxîne ortê, serketinê bîne, hakim bibe. Di vê çarçoveyê de hestiyarî û yekparebûnek gerek e. Hem em hemû, her xebatkar qasî ku lazim e baldar, hestiyar bin, hem jî yekgirtineke tam hebe. Lazim e ya ku yekî me kir ê din xerab neke. Yek dibêje *"wisa xweş e"* wer dike, yê din dibêje *"wisa ne xweş e"* xerab dike. Xebatên me li ser hev zêde nabin. Hevûdu xerab dikin, tine dikin. Piştî wê ewqasî xebat, bila ewqasî mirov bixebitin, wekî encam di dest me de di sînorê herî jêr de karek dimîne. Em berhemdar nabin, bi enerjiyeke kêm ve nikarin zêde hilberînin. Em nikarin rast û bedew hilberînin. Em zêde dixebitin, lê mîna hemalan kêm û bê bandor hildiberînin. Ev, ne terzekî Apoyî ye. Wê demê li çapemeniyê pirsgirêkên terz, uslûb, tempo, şêweyê girîng in.

Wek nimûne, di amadekirina rojname-kovarê de wênenivîs pir girîng in. Li şûna kovara *"Ozgur Halk"*ê di salên dawî de kovara *"Toplûm"* derket. Tenê stûnan xet dikin ewqas e. Tu dinêrî ti amadekariyên nivîsê tine ye. Nivîsên dipdirêj ên ku li çep-rast di kovaran de hatine weşandin, serî binî ne diyar e, têne rêzkirin. Di nav de wêneyeke bê eleqe yan hatiye danîn an jî nehatiye danîn. Ma wisa nabe, çi wateya xwe heye. Ew organeke weşanê ye ku pêşketinên rojane dinirxîne, organekî xwedî şîroveya nûçeyan e, mehane xebata welatparêz, şoreşger dinirxîne, xebatkaran araste dike. Lazim e ew bê nirxandin. Ev kovar hatibû girtin, ketina wê ya weşanê min da kirin. Min Komîteya Çapemeniyê tengav kir. Me hevalên ku ji Bakur hati-

ne tengav kir. Herî dawî soz dan, piştre ji nû ve ketin weşanê. Ji bo Bakur pir girîng bû, di vî warî de me pîvanên wan diyar kirin, kovarê dest bi weşanê kir, qet ne wekî nîqaşên me bû. Bû tekane organa weşanê ya ku min bi şiklekî rêkûpêk jê re nivîsî. Çend caran nivîsên min neweşandin. Baş nedidîtin. Kêfa wan ji nivîsên kovarên 3 mehan ên ku hatine weşandin û ti eleqeya xwe bi îro re tine ye dihat. Karkirin heye, li gel vê rast karkirin heye.

Dema ku çûm Ewrûpayê tevlî mîzanpaja Serxwebûnê bûm. Hejmarên bihara 87'an e, hûn dikarin mêze bikin. Me ji vir-wir dîtiye li gorî xwe, lê lazim e teqlîdkerî nebe, ji ber ku teqlîdkerî xerab e. Hevalan li gorî xwe mîzanpajek dikirin. Min got *"em biguherin, bila wisa nebe". N*irxandineke 4 an jî 5 rûpelan a Rêbertiyê hebû. Me li serê her bende wêneyekî Rêbertiyê danî. 25-30 wêne çêbûn. Hat weşandin, Rêbertiyê dît û mudaxele kir. Got, *"ma hûn min teşhir dikin."* Em li cihê xwe req bûn. Qaşo em Rêbertiyê didin nasandin, em dibêjin aktîvîteya Rêbertiyê pêş bixin, lê Rêbertiyê wekî teşhîrkirin fêm kir.

Gelek mînak dikarin werin dayîn. Lê rêgeza ku dixwazim bêjim, nîzam, sîstem lazim e. Em tevgereke Rêbertiyê ne. Em hêza têkoşîna felsefî, îdeolojîk in, xwedî armanc, rêgez in. Em jiyaneke li gorî xwe pêşkêşî civakê dikin. Em dibêjin *"ya rast ev e"* û banga wê jiyanê lê dikin. Li ser wî bingehî ji bo jiyankirina mirovan em hewl didin, perwerde û rêxistin bikin. Rêgezên me, pîvanên me, armancên me û îdeolojiya me heye. Karên ku bi xizmetkirina vê hene. Em ê vê bihizirin. Di her karî de, her libatê de, her gotinê de em ê vê bifikirin. Ew ê hemû xebat girêdayî vê armancê be û li gorî vê be. Lazim e em xebatê li ser vî bingehî bigirin dest û bimeşînin.

Tiştekî bi navê nezaniyê tine ye, agahiyên cuda hene. Agahiyên li gorî xwe, agahiyên şaş hene. Yekî ku bi agahiyên şaş tijî nikare xebateke rast a propaganda û ajîtasyonê bike. Nikare xeta Rêbertiyê û partiyê propaganda û ajîte bike. Zaniyara wî xizmeta çi dike, li gorî çi be, propaganda û ajîtasyona wî jî

xizmeta wê dike. Wê demê kadroyê ku xebata çapemenî-weşanê, propaganda-ajîtasyonê dimeşîne lazim e xwe bi sedî sed li ser xeta Rêbertî û partiyê perwerde bike. Li gorî gereken wê xetê be. Lazim e neyê gotin ku *“ez ê xwe bi xwe bigihêjim.”* Xwe bi xwe tê de bigihêjê, ew ê propagandaya xwe bike, xwe ajîte bike. Partî û Rêbertiyê nade. Wê demê li vir ti kes nikare bibêje *“ez ê li gorî dilê xwe bim.”* Rêbertiyê got, *“ez na, em hene.”* Li wir êdî ferd tine ye, organê weşanê heye, rêxistin heye, civak û armanc heye. Ferd qasî ku bi armancê re bibe yek heye. Nikaribe yekgirtî be tine ye. Heke xwe ferz dike, wê demê ji armancê qut bûye. Tersî wê nêz dibe. Libatên wisa hene. Lazim e em karibin libatên esas wekî pîvan û rêgez, uslûbê herî cazîb, herî perwerdekar, herî dide qezenckirin bi kar bînin. Em karibin libata azadîxwaz li wir biteyisînin, nîşan bidin. Fikrên herî rast bi gotin, libat, bernameyên xwe ve bidin. Gotina navê Rêbertiyê nayê wateya propagandakirina Rêbertiyê.

Ji ber ku me 25 wêneyê wî danîn, Rêbertiyê got, *“hûn teşhîra min dikin.”* Naxwe wisa nabe. Got, *“bi mêzekirina wêneyê min hûn nikarin min fêm bikin.”* Wê demê em ê çawa Rêbertiyê ragihînin? Em ê çawa fikrên wî biteyisînin? Cewherê fikrên wî bidin? Çawa şiklê ku veguheriye jiyanê bidin? Ha wê demê em Rêbertiyê radigihînin. Dibe ku qet navê wî jî nebe, ya girîng ew e ku wekî cewher û teşe fikrên Rêbertiyê bidin. Wisa perwerdekirina civakê ye. Ya ku lazim e li qada çapemenî-weşanê bê kirin ev e. Çarçoveya wezîfe û xebatê ya ku lazim e em bi xebatên propaganda û ajîtasyonê ve ser bixin, pêk bînin ev e. Ji bo vê jî xisûsên ku lazim e bên dîqetkirin hene. Wisa wekî rexnekarekî baş lê bê mêzekirin û li ser esasê xetê dikare were sererastkirin.

Li gel me rexne nayên pêşxistin. Yek jî ya balkêş ev e. Mesela şoreşgerên Rûs li ber çapemeniyê nîqaş dikin. Rexne hene, rexnegirî hene. Esas Rêbertiyê xwest wê di nav me de pêş bixîne. Piştî Kongreya 3’yemîn rexnedayîn girtin û di çapemeniyê de weşandin. Rexne kirin. Got, *“van biweşînin.”* Naxwe

rexne nebe sererastkirin nabe. Em dibêjin bila her di mekanizmaya rêxistinî de be. Di mekanizmaya rêxistinî de jî ti kes nizane. Zexteke civakî çênabe. Kontrola civakî pêk nayê. Lazim e çapemenî ji kontrola civakî re vekirî be. Lazim e ji rexneyên civakê re vekirî be. Ji daxwaz û pêşniyarên civakê re vekirî be. Civaka ku kiriye hedef û hewl dide perwerde bike, çi jê dixwaze, lazim e li vê binêre. Di heman demê de li gorî xeta Rêbertî û partiyê propaganda û ajîtasyonê bike, hewl bide wan ragihîne. Di wî warî de lêkolîn jî ew ê sûdmend bibe. Terz, uslûbê bi bandor çi ye? Civak çi dixwaze, ji çi zêdetir bandor dibe? Lazim e em çawa tevbigerin, çawa baxivin, çi bikin? Ev dikarin bên lêkolandin. Bi lêkolînê ve encam bên derxistin, xebat li gorî wê bê sazkirin, rêxistinkirin. Nêzîkatiyeke wisa dikare serketinê bîne. Ji ber ku em tam nizanin çi zêdetir bandor dike. Em bizanibin, em ê li ser esasê ne ku bi rêgezên xwe re nakok, wan gotin û libatan, uslûb, terzan pêş bixin. Em jê paş de namînin, lê tu nizanibî çi bikî, çawa bikî, tu nikarî li gorî gereken wê guhertin û sererastkirinan pêk bîne. Lê sererastkirinên pêwîst hene ku lazim e bê kirin. Em wekî libat, pîvana jiyana ferdê azad, çi digirin? Mesela em dixwazin çi bi civakê, ciwanan, jinan, mirovan bidin qezenckirin. Ev xebat lazim e bi temamî li gorî wê bin. Bi taybet qada dîtbarî lazim e bi temamî vê biteyisîne. Pêwîst e qasî gereken wê em kadroyan perwerde û hazir bikin. Li gorî vê bernameyan amade bikin. Bername li ser bingehê van pîvanan bê dayîn ku em karibin mirovan perwerde bikin. Em nikarin civakê perwerde bikin. Em perwerde nekin, ew ê şerê taybet perwerde bike. Em çiqasî şer bikin, siyasete bikin, di warê siyasî û eskerî de serketinan bînin, heke em nikaribin têkoşîna îdeolojîk ser bixînin, neynin halê ku li gorî wê bijî, di encam de em ê winda bikin. Kî têkoşîna îdeolojîk ser bixe, ew ê şoreşê qezenc bike. Esasê şoreşê felsefî û îdeolojîk e. Ev jî têkildarî terzê jiyanê ye. An ne têkildarî rêveberiya siyasî, serweriya eskerî ye. Serweriya eskerî her tim dikare were hilweşandin. Rêveberiya siyasî her tim dikare biguhere. Ew

diçe, ev tê. Esasê şoreşê ew e ku rastiya azad, wekhev, adil, demokratîk, parvekar, komunal derxîne ortê. Asta pêşketina şoreşê pêwendîdarî asta pêşketina pîvana terzê jiyaneke wisa ye. Naxwe ya esas perwerde ye, li ser bingehê xeta îdeolojîk perwerdekirina civakê ye. An ne bidestxistina rêveberiya siyasî ye. Ne avakirina hakimiyeta eskerî ye. Ew pîvanên sîstema desthilatdar û dewletparêz e. Pîvanên hereketa civakperwer a demokratîk wisa nabe. Wê demê em ê li gorî pîvanên xwe bin.

Li ser vî bingehî lazim e sererastkirinek li qada terz, uslûb jî hebe. Lazim e neyê gotin ku *"nabe."* Bi gotina *"em nikarin bikin"* lazim e em xwe mehkûmî têkçûnê nekin. Têkoşîn, israr û hewldan lazim e. Qenehkirin jî lazim e. Lazim e kesên ku şaş dihizirin, xwedî fikrên cuda ne jî werin îqnakirin. Ji bo vê jî ji bo ku bê halê ku karekî serketî dike, qenehkirin lazim e. Ji bo nêrîna hevpar jî qenehkerî lazim e. Lazim e ev encam kêm neyên dîtin, besît neyên dîtin. Serketina kar girêdayî sererastkirina van mijaran, qezenckirina rastiyê ye. Ev jî dibe pêkanîna rast û têrker a xeta Rêbertiyê.

Di mijara terz, uslûb, tempo de rexne, nirxandinên hê bi detay û li ser vî bingehî sererastkirin dikare were pêkanîn. Teqez pêdivî bi vê heye. Xebata me ne mehkûmî hin kesan e. Em dikarin rêxistinkirina partiyê ji vir bidin destpêkirin. Ewqas kadro hene. Lazim e kadro ewil ji bo xebata propaganda, wêje-huner, teoriye bên erkdarkirin, piştre ji bo xebatên siyasî-eskerî, xebatên qada civakî bên wezîfedarkirin. Ya rast ev e. Esasê xebata partiyê ev e. Li gel me ters çêbûye, xebateke wisa mîna xebateke partî û şoreşgerî nayê dîtin.

Partî, demek dirêj bi Stratejiya Şerê Gel têkoşiya, wekî gerîla rêxistin bû. Ew elimandin û ferasetan pir zêde bandor kirine. Feraseteke mîna ku her tim di her şert û mercî de partî tenê dibe ew heye û ew der wekî qada pratîkê tê dîtin. Halbûkî pratîka partiyê bi wê re ne sînordar e, hê zêdetir xebatên teorîk-îdeolojîk, perwerdehiyê dihewîne. Wan xebatan esas digire. Êdî lazim e em vê fêm bikin. Lazim e di vê mijarê de em fe-

raseta xwe biguherînin. Lazim e em di zanebûna xwe de israr nekin, ya xwe ferz nekin. Sererastkirineke li ser vî bingehî ew ê aktîvîteya xebatên me zehf pêş bixîne, xurt bike. Em ê li ser rewşa qadên xebatê pir zêde ranewestin, lê hin organên weşanê, qadên cuda yên ajîtasyon-weşanê em dikarin rawestin.

### d-Qadên Cuda yên Propaganda û Ajîtasyonê (Çapemeniya Nivîskî, Dîtbarî, Bihîzbarî û Qada Mecazî)

Bi vî şiklî em dikarin xebatên propaganda-ajîtasyonê hinekî din şênber bikin. Di vê îstîqametê de wekî qada çapemenî-weşana nivîskî, qada çapemenî-weşana dîtbarî, qada bihîzbarî, qada mecazî tên pênasekirin, wisa tên cudakirin. Li gorî amûrên karkirinê, li gorî xîtabkirina lebatên sehekê bi şiklên cuda tên binavkirin. Feqet giştî dibe çapemenî-weşan. Medya tê gotin. Li gorî amûrên kar, xîtaba lebatên sehekê her xebatek xweseriyeke xwe heye, taybetmendiyeke xwe heye. Layên wan ên ku wekî naverok û şêwe bêne dîqetkirin hene. Di çarçoveya perwerdeyên pîşeyî de her hal ew ê li ser van mijaran zêdetir bê rawestandin, detay tên nîqaşkirin, nirxandin û lêkolandin. Qada ku wekî organên weşanê tê binavkirin, lazim e rast bê fêmkirin. Li gel vê lazim e li gorî hemûyan perwerdeyek hebe. Kadroyek mimkun be karibe xwe bîne wê astê ku hemûyan bike. Karibe xwe li gorî vê perwerde bike. Xebatên boneyî hin organan dikarin têrkertir bin, di wan qadan de dikare xwe perwerde bike, berdar û gihayî bibe, lê lazim e karibe di plana giştî de li gelek organan bixebite, bandortir tevlî xebatên propaganda-ajîtasyonê bibe û ev girîng e. Ji ber vê jî lazim e li ser perwerdeyê hemûyan bê rawestandin. Lazim e hewl bidin xwe li gorî her organî perwerde bikin. Nêzîkatiyeke yekmilî û teng nebe.

Di vê çarçoveyê de organên weşana nivîskî organên mîna rojname, kovar, pirtûk, broşurê ne. Wekî xebatên çapemenî-weşana nivîskî tên pênasekirin, nirxandin. Ji bo dîroka mirovahiyê, çapemeniya nivîskî di nav propaganda-ajîtasyonê de bûye xebateke pêşdatir. Pêşî organên çapemenî-weşanê yên nivîskî hebûn. Qada dîtbarî, bihîzbarî mecazî piştre pêş ketin, ew yên nû bûn. Ya kevn organên çapemenî-weşana nivîskî ne. Niha dema ku qada organên weşana dîtbarî, bihîzbarî, mecazî pêş ketin, tê gotin ku bandora organên weşana nivîskî kêm bûye. Ji ber ku hinekî din zehmet e, ji bo lêkolîna wan ji mirovan hinekî din hewldanê dixwaze. Xwendina pirtûkê, rojnameyê, kovarê pêwîst dike ku wextê bidinê, zêdetir hewldanê raber bikin. Gerek dike ku xwende- nivîskar bin. Lê rûniştina ber televîzyon, mêzekirina dîmenan, guhdarkirina gotinan hêsantir dibe. Li gel vê hem xîtabî guh dikin hem jî xîtabî çav dikin. Ji bo mejî têbigihêjê xîtabî zêdetir lebatên sehekê dike. Ji ber vê jî taybetmendiya wê ya fêrker, xwe hakimkirinê zêdetir e. Zorahiyên çapemenî-weşana nivîskî hene. Her wiha di wê astê de xîtabî sehekan nake. Fêrbûn, fêmkirin, pêwîst dike ku zêdetir hewl bê dayîn, enerjiyek zêdetir bê xerckirin. Ev rewş tê fêmkirin. Ji ber vê jî tê gotin ku *"weşangeriya dîtbarî, qada mecazî pêş ket, êdî fonksiyona weşangeriya nivîskî nema, lazim e bi temamî ji ortê bê rakirin."* Hin kesan jixwe ji bo xwe ev rewş ji holê rakirine.

Teqez e ku li gorî berê guhertin hene. Her wiha teqez e ku li gorî berê qada bandorê ya weşangeriya nivîskî guheriye. Ev rastî li ber çav e. Feqet di halê hazir de nikare bê gotin ku bandora wê bi temamî ji holê rabûye, tine bûye, bêbandor bûye, ji ber vê jî lazim e li milekî bê hiştin; tenê qada dîtbarî, bihîzbarî, mecazî ji bo perwerdeyê roleke têrker dilîze. Wisa nêzbûn şaş e. Ji ber ku rewşa ramanî, asta wan a ragihandin û girtina tiştên têkildarî jiyanê cuda ne. Mînak, hunera sînemayê pêş ket, lê bandora wêjeyê, romanê ji ortê ranekir. Berevajî ew zêdetir kir pêwîstiyek. Çiqasî zêde roman pêş bikevin ewqasî

zêde pêşiya pêşketina hunera sînemayê vedibe. Esas lazim dibû ku televîzyonvanî jî wisa bihatana nirxandin. Televîzyonvanî jî çapemeniya nivîskî ji holê raneke. Di hin milan de dema ku organên weşana dîtbarî, bihîzbarî tine bûn her tişt bi çapemeniya nivîskî dihate kirin. Lewre jî dema ku ev çêbûn, hin xebatên çapemeniya nivîskî ji holê radike, ev rast e. Êdî wan dewir digire, lê hesabê ku dikeve şûna hemûyan ne rast e. Aktîvîteyeke diyar a çapemeniya nivîskî heye.

Dibe wisa bibe; di şiklê karanîna kaxizê de guhertin çêbibin. Ne çapkirina pirtûkan, kovaran a li kaxizê; ev bi rêka teknîka kompîterê tên vesazkirin, belavkirin, xwendin. Ev dibe. Ji ber vê em nikarin bêjin weşangeriya nivîskî ji holê rabûye. Tê wê maneyê ku amûrên di weşana nivîskî de guherîne. Berê kaxiz dihate bikaranîn, vê carê qada kompîterê, hafize, flaş û hwd. tên pêşxistin. Dikevin şûna pirtûkê û kaxizê. Ev mimkun e, lazim e ev neyê redkirin. Heke pêşketina teknîkî derfeta vê dide û ev pir hêsantir be, mesela tu dikarî bi sedan pirtûkî bixî cihekî, hêsantir hilgire. Dibe mijareke enerjiye. Dema ku tu enerjiyê dibîne, kengî li kû dixwazî dikarî bixwînî, lê ev dîsa ew çapemeniya nivîskî ye. Li şûna kaxizê, madeyek din tê bikaranîn, guhertin li ser wî bingehî ye.

Ji ber vê yekê, di halê hazir de çapemenî-weşana nivîskî nebe, yên din pir seresere, teng û şiklî dimînin. Kûrahiya teorîk, dahûrandina felsefîk, analîzên stratejîk herî zêde li qada çapemenî-weşana nivîskî pêk tên. Ji ber vê sedemê lazim e çapemenî-weşana nivîskî jî li ber çav bê girtin. Li ser esasê qebûlkirina amûr, madeyên guherîne, lazim e em rola diyarker û girîng a xebatên weşangeriya nivîskî di perwerdekirina civakê, pêşxistina ferdê azad û civaka demokratîk de, qebûl bikin. Hê jî ew rol ji holê ranebûye. Wê demê lazim e em li ser weşangeriya nivîskî bi girîngî û pûte rawestin. Pêwîst e qada herî girîng û sereke ya xebatên me yên propaganda-ajîtasyonê ya bi ser çapemenî-weşanê, medyayê, dîsa çapemenî-weşana nivîskî be. Lazim e pirtûk, kovar, rojname bên hazirkirin,

karîger bibin. Dibe ku ev li ser kaxizê neyên nivîsandin û belavkirin, dikare bi amûrên teknîkî bên kirin, lê wisa jî bibe rojname dîsa rojname ye, pirtûk dîsa pirtûk e. Di avabûna zihniyeta pirtûkê de, di girtina agahiyên teorîk de, di qezenckirina hêza analîzê de cihekî wê yê girîng heye. Dîsa rola wê ya di rastiya civaka dîrokî de, fêmkirina rastiya sîstema desthildar-dewletparêz, îzahkirinê, li ser vî bingehî di pêşxistina zihniyetê de diyarker e. Weşangeriyeke wisa nebe, di wê astê de neyê nirxandin, bi televîzyonvanî, radyokerî, nûçegihaniyê em nikarin ferdê azad û civaka demokratîk perwerde bikin. Em nikarin teşeyê bidin zihniyeta wê. Em nikarin zihniyeteke xurt û kûr bidin qezenckirin. Di qezenckirina zihniyetê de rola pirtûkê pir li pêş e.

Bi şiklekî hevşib, kovargerî jî girîng e. Ferqa mabeyna kovar û pirtûkê çi ye? Pirtûk hê zêdetir wekî giştî mijareke berfireh lê dikole; kovar jî ji nivîsên wisa pêk tên ku mijaran hinekî din teng digire dest û analîz dike. Cih dide nivîsên wisa, mijarekê pirmilî dinirxîne, bi şiklê gotarên cuda dinîvîse, analîz dike. Ew jî qadeke xebata teorîk, avakirina zihniyetê ye.

Ji bo rojnamevaniyê di nûçeyê de, şîroveya nûçeyê esas û bingeh e. Televîzyon bi halê xwe yê heyî heke rojname nebe ti tiştekî ku bide tine ye. Tiştên ku di çapemeniya nivîskî de derkevin ortê dide, xwe dispêre wan. Mîna ku sînema yan jî fîlm ji romanê çavkaniya xwe digire, weşangeriya dîtbarî jî ji weşangeriya nivîskî çavkaniyê digire, ji wir hêzê digire, xwe dispêre wir, wê diteyisîne. Roleke teyisandinê dilîze, esasê kar diyar nake. Ji ber vê yekê lazim e em qada weşangeriya nivîskî girîng bibînin û esas bigirin. Wekî tevgereke Rêbertiyê wekî şoreş wekî tevgereke ku avakirina neteweya demokratîk esas werdigre, lazim e em vê bikin. Ji ber ku Rêber Apo got, *“Neteweya Demokratîk, neteweya zihniyetê ye.”* Wekî taybetmendiyê bingehîn zihniyet diyar kir. Wê demê di avakirina neteweya demokratîk de ya sereke û pêşdatir avabûna zihniyetê ye. Ev dibe qezenckirina sistema ramanê, ew perwerdekirin, hêza fikrê

kûrtir û berfirehtir dike û digihîne fikra hevpar. Ji ber vê jî lazim e em girîngiyê bidin qada çapemenî-weşana nivîskî. Çapemenî-weşana nivîskî çawa dibe? Milên wê yên pîşeyî, pratîkî çi ne? Ev dikarin baştir bên lêkolandin.

Mesela pirtûkek çawa tê amadekirin, çawa tê nivîsandin, ji çi pêk tê? Li naverastê gelek pirtûk hene, gelo em dikarin ji hemûyan re bibêjin pirtûk? Hin ji çep-rast hin tiştan komî ser hev dikin, ji bo ku bibêje *"min jî nivîsî"* navê xwe datîne ser. Hinek pereyên xwe hebin, ji bo ku bibe nivîskar, pirtûkê dide çapkirin. Ne wisa ye. Pirtûk; fikirêkî esasî, bûyerekê, mijarekê bi rehendên dîrokî-rojane bi berfirehî ronî dike, analîz dike, li ser esasê perspektîfekê digihîne îzahekê. Ew perspektîf dibe ku cuda be. Felsefeya wê diyalektîk be, metafîzîk be, ev mijarên cuda ne, lê dahûrandin û îzaheke wisa heye. Ne wisa tenê ketober tijîkirina rûpelan e. Pirtûk tenê wekî hejmara rûpelan pênasekirin, şaş û nebes e. Em nikarin pirtûkekê bi şiklekî nizanim ji çend sed rûpelan pêk tê pênase bikin. Em pirtûkan bi naverokên wê pênase dikin. Bi mijarên ku ronî dike, dadihurînê pênase dikin. Naxwe, ji bo ku em ji tiştekî re bêjin pirtûk, lazim e di wê astê de mijaran bike rojev û analîzekek ronakî bihewîne. An, 500 rûpel jî dikarin bibin pirtûkek, 5 rûpel jî dikarin. Pirtûkbûna tiştekî bi jimara rûpelan nayê pîvandin.

Lazim e amadekirina rêkûpêk a pirtûkan, qasî ronîkirina naveroka wê, di şiklê wê de jî hebe. Ji ber ku tê xwendin, di encam de xîtabî çav dike, lazim e newestîne, kişîner be. Ji sîstema tîpan heta nîzama nivîsê, îmlayê lazim e bi pûte bê amadekirin. Me hin pirtûk dan nivîsandin, dinêrim ti xalbendî, nîzam tine ye, me got *"ev ê çawa bigihêjin îmlayekê."* Hevalan gotin *"niha moda wisa ye". A*ngo rêzika xalbendiyê tine ye, çi tê bîra te tu dikarî binîvîse, ev derbasdar tê hesibandin. Lazim e wisa nebe. Ev dibe rewşeke alafranga. Wekî mînakek lîberalîzma moderniteya kapîtalîst a ku kar çelepeyî dike, cewherê çep dike, derdikeve ortê, lazim e em wisa rast nebînin, qebûl

nekin. Pêwîst e bi taybet weşangeriya me ya pirtûkê hê pûtetir û baldartir be. Lê mixabin di vê mijarê de pirsgirêkên me hene. Li gel me pirsgirêka ziman pir zêde ye. Em hereketek wisa ne ku herî zêde ziman di nav me de tên axaftin, lê em ti zimanî nikarin bi giştî kûrahî û rêzikên wê ve baxivin, binivîsînin. Em ji hemûyan kêm kêm dikin. Ev mezinahiyekê îfade dike, baş e, lê em hemûyî nîv nîv dikin, ew jî kûrahiyê ji ortê radike. Em nikarin tiştên ku karên baş dikin bibînin. Ji ber vê pirtûkên me di kîjan zimanî de dibin bila bibin ne zêde têrker in.

Parazname bi xwe jî gelek caran hatin redaktekirin. 40 caran werdigerînin Kurdî, Erebî. Tê gotin ku ev derê wergerê kêm bûye, em careke din werdigerînin. Wisa rewşeke tevlîhev derdikeve ortê. Ev pirsgirêka hakimiyeta ziman e. Zanebûna ziman, dîtina perwerdeya rêziman girîng e. Dema ku gelek zimanan di zik hev de bi kar tîne, kûrahiyê qezenc nake. Lê em ji dewlemendiya din qezenc dikin. Esas bi şiklê ku çima em pirzimanî ne, neyê rexnekirin. Gerek em nebêjin *"em pirzimanî ne ji ber vê di ziman de kûrahî nabe".* Dibe bandoreke wê hebe, lê wisa be jî lazim e sererastkirin ne di vegera tek zimanî de, çare ew e ku xwe di fêmkirina hemû zimanan de bîne asta hê baştir, perwerdeya ziman hê xurttir bike. Yekzimanî nabe. Di Kurdî de jî lazim e yek zarave nebe. Netew-dewlet tekîtiyê pêş dixin, her diçe tê gotin ku *"ew ê cîhan bibe yekzimanî."* Erê, hemû cîhan dikare fêrî yek zimanî bibe, lê ti kes dest ji zimanê xwe bernade. Mirov nikare bi yek zimanî jî bijî, nayê wê rewşê.

Di nivîsandina pirtûkan de jî lazim e em li îmlayê, paragrafê, hevokê, xalê, bêhnokê baldar bin. Tiştên hevşib ji bo kovar û rojnamegeriyê jî zêdetir pêwîst e. Em jî xebitîn, lê berê bû, em kêm xebitîn. Niha derfetên nû yên teknîkî pêş ketine, ev derfet li şûna ku kar hêsantir bikin, bi hin milan ve dikin xerabker. Pêşketina derfetan dikin hinceta xerabûnê. Ev ne rast e. Lazim e nêzîkatiyeke wisa jî nebe. Derfetên teknîkî çima îmlayê, şiklê xerab bikin, berevajî di wî warî de xebatan hêsantir dikin. Li ser vî bingehî kovargerî-rojnamevanî dibe her yek

wekî qadên cuda cuda, li gorî xwe dibin xwedî taybetmendiyan. Li gel vê kovargerî qadek e, lê her kovar ne eynî ne. Di kovargeriyê de jî cudahî hene. Organên weşanê yên teorîk, felsefîk hene. Ew zêdetir bi analîza teorîk re mijûl in. Kovarên ku pêşketinên polîtîk-pratîk dinirxînin, analîz dikin hene. Zêdetir çalakiyê, pratîkê rexne dikin, analîz û krîtîk dikin. Ji wir dersan derdixin û zêdetir bi fonksiyoneke ku pratîkê araste dike radibin. Kovarên wisa hene. Her kovar jî ne yek û heman in, wisa neyê dîtin. Lazim e çarçoveya wezîfeyê ya ku rol û misyona wê pêşbînî dike, bê diyarkirin û li gorî wê naverokşekil bên avakirin. *"Kovara mehane ya polîtîk-pratîk"* tê gotin, lê piştî wê zêde zêde nivîsên pirtûkan bi cih dike. Qet nivîsên têkildarî analîza polîtîka û pratîkê tine ye. Ev ters e, lazim e wisa nebe. Ev kar ketober nabin. Her yek li gorî xwe xwedî pênaseyekê ne. Her tim pirsa *"çawa"* bê pirsîn, li gorî wê bersiv bên dayîn, li gorî naveroka wan bersivan jî bikevin nav pratîkek guncav.

Mînak, dema ku me ji bo Bakur pêşbînî dikir, me xwest kovareke ku karibe xebata rêxistin û çalakiyê araste bike, pirsgirêkên wê lê bikole, krîtîk bike, rexne bike, pratîkê di rûpelên xwe de bi cih bike, di pratîkê de kadro araste bike û perwerde bike, bê derxistin. Lê qet fonksiyoneke wisa nedît. Ji bo ku wisa bibe lazim e pratîk bê lêkolandin, şîrovekirin. Lazim e çalakî bên şîrovekirin. Bi şiklê nûçe-şîrove nivîs hebin. Ev bi wêneyan bên destekkirin. Ji bo wisa rûpelan tijî bike, ji bo avakirina hejmarek rûpel, nivîs nebe.

Çapemeniya şerê taybet, çapemeniya AKP'ê em dîqet bikin ji bo ku civakê li gorî gereken şerê taybet araste bike, motîve bike, mîna mejiyan bişo çi ji destan tê dike. Ji yek destî tiştên wisa tên serwîskirin û hemû heman tiştî nîşan didin. Em nikarin wisa bikin. Em perwerdeya xeteke îdeolojîk dikin. Lazim e em li gorî gereken wê şikil bidinê. Pêwîst e nivîs li gorî wê bin, ji ber ku armancek me heye. Em tenê rûpelê tijî nakin. Em hedef dikin ku xwendevan tiştekî jê fêm bike, li gorî wê amade

bikin. Lazim e em wisa amade bikin, li gorî wê rengan bidinê, wêneyên wê li gorî vê bin, manşeta wê li gorî vê be, mezinbûna nivîsan li gorî vê bin. Girêdayî armancekê ye, lê hunerek e jî. Ji şikildayîna baş, wêneyên girîng heta nivîsan, heta manşetan karîgerî girîng e. Wisa ye ku carina naveroka wê qet tine ye, lê di hunera çapemeniyê de digihêje, li gorî pêwîstiyên wê dikin, kî çav lê dikeve bandor dibe, dihêlin ku zêde bê xwendin. Lê hin tişt rastiyê didin, gelek nivîs tê de hene, lê baş nehatiye amadekirin, ne hîkarîker e. Lewma bandor nake, belavkirinê bandor dike, dema ku mirov berê xwe didin xwendinê, pir ji dil nabin. Gelemperî gotinek heye, *"xwendin-nivîsandin kêm bûye"* û civak ji vê berpirs tê dîtin. Feqet li gel vê organên ku ew ê xwe bidin xwendin, lazim e di vê mijarê de bên rexnekirin, berpirs bêne dîtin. Nikare xwe bide xwendin. Lazim e xwe bide xwendin. Rojname xwe bide xwendin, kovar xwe bide xwendin, pirtûk xwe bide xwendin. Lazim e bi şikil, herikbarî, îmla, renk, wêneyên xwe ve di her alî de xwendin bê hêsankirin, bê xwendin, cazîbeyek wê hebe.

Ev çawa dibin, manşetek çawa dikare bê derxistin? Bicihkirina wêneyekî çawa dibe? Rûpela yekemîn çawa tê vesazkirin? Rûpelên din çawa tên vesazkirin? Rojnamevanî tiştekî pir cuda ye. Detay ew ê di dersên din de werin nîqaşkirin. Lazim e ev wekî dersê bin. Di plana giştî de wate, girîngî, rol û fonksiyona pirtûkê çi ye, kovarê çi ye, rojnameyê çi ye? Lewma jî van çawa tîne cih? Wekî naverok û uslûb dikarin çawa bên hazirkirin? Li gorî van amadekarî lazim e. Lazim e ku xebat li ser vî bingehî bê meşandin û rêxistinkirin. Teqez lazim e ku ev kar bên zanîn, fêmkirin, hînbûn, li gorî pêwîstiyên wê xebat bêne meşandin. Em bi şiklekî din bixebitin, em nikarin serketî bibin.

Di beşên pêşî de em li ser têgeh û mijarên terz, uslûp, hestiyarî, pûteyê, dîqetê rawestiyan. Qada ku ev herî zêde derbasdar in jî qada çapemenî-weşana nivîskî ne. Qadeke wisa ye ku herî kêm tê dîqetkirin, herî zêde xeta têne kirin. Min got li gel me hinekî jî ji ber ziman e, lê tam jî ne wisa ye. Bi rastî jî

bêbaldariyek, hestiyarnebûnek, pûtepênedanek heye. Ev jî dibe mîna jixwedûrxistinê. Nêzîkatiyeke mîna bila biqede, çi dibe bila bibe, heye. Halbûkî em ji bo pereyan nakin, ne wisa rasthatî ye jî. Ji bo perwerdekirina civakê em dikin. Wekî xebateke şoreşgerî dikin. Wê demê lazim e em pir baldar, bi pûte, bi hendazetî nêz bibin. Lazim e terzê me li ser bingehekî ku dikare ya herî bedew, herî duzgin derxîne ortê be. Lê em ne wisa ne. Gelemperî bêdîqetiyên li qada eskerî, qada civakî, siyasetê diteyisin, herî zêde li vir jî derdikevin ortê. Tê dîtin, dikeve ber çavan, zirarê dide. Nerêkûpêkî zehf e. Manşet duzgin dernakeve, wênedarkirin duzgin nabe, hevûdu nagirin. Vesaziya xalbendiyê kêm e.

Hê di 79'an de wextê talîmata yekemîn a partiyê tê bîra min, ji ber bêdîqetiyê, pûtepênedanê çapemenî hatibû rexnekirin. Hejmarek taybet bû ku gotara Rêbertiyê ya *"Li Ser Girîngiya Îdeolojî û Polîtîkayê"* esas girtibû. Navbernavê di destpêka kovarê de wekî manşet, li sernivîsa qapaxê hatibû danîn, sernivîs jî winda bibû. Wê demê rêveberiya partiyê gotibû, *"bêdîqet û bêpûte nêz dibe."* Lewre xetayan dike, xeta jî aktîvîteya kar kêm dike. Halbûkî ked tê dayîn, em wezîfeyan dimeşînin, lazim e em encamake ku xetayan dadixe asta herî jêr esas wergirin. Feqet li gel me di van mijaran de pir xeta hene. Bêyî ku baş bê fêmkirin û hînbûn, hewla kirina van karan heye. Ligorxwebûn, xwe dana rehetiya kar heye. Lawaziya dîqet, hestiyarî, hendazetiyê heye. Lazim e ev nebin. Rewşên wisa encam, berhemên keda hatî dayîn zeîf dikin. Bandora encamên xebatê kêm dike, serketinê di bin taldê de dihêle. Lazim e bê dîqetkirin.

Li milê din weşangeriya dîtbarî û bihîzbarî heye. Qasî ku em dizanin, di serî de pirtûk, kovar, rojnamegerî hebû. Bi pêşketina teknîkê ve weşangeriya radyoyê pêş ket. Di pêşketina amûrên ragihandinê de zehf girîng bû. Guhertineke di asta şoreşê de derxist ortê. Piştre weşangeriya televîzyonê, weşangeriya dîtbarî pêş ket. Niha sosyal medya, alema mecazî heye.

Esas ji sosyalbûnê zêdetir mecazbûn heye, ew pir berbelav û bi bandor e. Ev hemû gelemperî pêşketinên 100-200 salên dawiyê ne. Ya herî zêde jî 100 salên dawî, heta di 50 salên dawî de pêşketinên di şoreşa teknîkî ya zanistê de xwe gihand asteke pir li pêş. Organên ragihandinê pir pêş xist, nû kir. Bi spartina vê ve yên ku ev serdem wekî *"çaxa ragihandinê"* pênase kirin jî derketin.

Ragihandin pir bi bandor bû û bû hêza yekemîn. Di boriya nêz de wekî "Hêza Çaremîn" an jî "Hêza Şeşemîn" dihate pênasekirin. Di jiyana civakê de bandorên wê hebûn, lê li gorî şer, li gorî siyasetê li planeke pir paş dihat dîtin. Niha ev hemû girêdayî ragihandinê, medyayê hatine kirin. Rol û girîngiya propaganda-ajîtasyonê wisa zêde bû û şer veguherî şerê taybet. Siyaset, şiklê siyaseta şerê taybet wergirt. Di vî warî de ji bo perwerdekirina civakê derfet, firsend zêdetir bûn. Weşangeriya radyoyê hê zêdetir xwe dispêre teknîkê. Ji ber vê jî lazim e di naverok, hestiyariyê de baldarî hebe. Di atmosfera weşangeriya dîtbarî, hebûna alema mecazî de radyogerî wekî tiştekî pir kevn tê dîtin, pir bêbandor tê fêmkirin, bêfonksiyon tê dîtin, lê ne wisa bû. Dema ku weşangeriya dîtbarî û alema mecazî tine bû di ortama ku tenê çapemenî-weşana nivîskî hebû de radyogerî di bandorkirin, perwerdekirina civakê de, xurtkirina propaganda-ajîtasyonê de wekî amûrekî roleke pir bi bandor lîst û derket pêş. Bi taybet sîstemên dewletê radyogerî bi kar anîn. Netew-dewletan radyo bi zêdehî bi kar anîn, niha wekî amûrê şerê taybet televîzyonê bi kar tînin. Hatin asta ku xîtabî her tiştên civakê dikin. Darbekaran jî radyogerî bi kar anîn. Bi dîtina min lazim e heval bizanin. Weşangeriya radyoyê di kêliyê de bi rehetî û yekpare dikare civakê bandor bike. Rojname, kovarê nikarîbû ev bikirana. Gêrçî Şoreşa Cotmehê bi rêka rojnameyê pêk hat. Heke tu weşangeriya rojnameyê, tevna belavkariyê baş rêxistin bike, wê demê bi bandor dibe. Derketina rojnameya rojane, nûçeyên rojane digihîne her derê. Lê radyo ne rojane, weşana xwe bi deqeyan û kêliyan

dike. 24 saet li gorî weşangeriya radyoyê demeke pir dirêj e. Rojnameyê bi 24 saetan, kar bi rê ve dibir. Enceq ji ber ku ragihandina nûçeyan li gorî wê dikir, Lenîn got, *"di 24 saetan de guhertina taktîkê."* Şoreşa Cotmehê bû şoreşek ku bi rêka rojnamevaniyê pêk hat, lê di orta sedsala 20'emîn de di pêşxistina şoreşên rizgariya neteweyî de di darbekariya netew-dewlet de jî radyo bi bandor hate bikaranîn.

Amûra ku PDK-YNK'ê jî herî zêde bi kar tanî, radyo bû. Li Başûrê Kurdistanê ya ku wekî organê propaganda-ajîtasyonê tê zanîn, tê destxistin, bikaranîn radyo bû. Di kêliyê de agahiyek gihandina hemû beşên civakê, derfeta arastekirina civakê da. Di vî warî de netew-dewletan di arastekirina civakê de radyogerî bi kar anîn. Sîstema nûçeyên rojane zêdetir pêş ket. Cihên ku rojname negihiştinê, radyoyan xwe gihandinê û 24 saetan bûyerên ku li çar aliyên welat diqewimîn her kes fêr dibû. Civak dema ku wisa bi weşana radyoyê hate girêdan, di warê jiyanê de navenda radyoyê di rêvebirina civakê de bû amûrekî pir girîng. Yên xwestin darbeye bikin, pêşbînî kirin ku mala radyoyê desteser bikin. Wisa darbe kirin. Artêşa Tirk darbeyên xwe wisa dikarîbû bike. Yên ku mala radyoyê desteser kirin, weşan kirin, darbe kirin, yên ku mala radyoyê desteser nekirin, nikarîbûn darbeye bikin. Herî dawî di 2016'an de jî xwestin darbeye wekî berê bikin, artêşê dihesiband ku tenê yek qenala televîzyonê heye, tenê weşanek radyoyê heye, dema ku ev tenê ne, bi ser de digirin û desteser dikin, nûçeyên din radiwestînin, wekî hêz xwe nîşan didin, lewma jî dest datînin ser rêveberiyê. Wisa jî civak araste dikirin, lê niha derket ortê ku ne wisa ye. Her çiqasî darbekar bi desteserkirina hin deveran ve hewl didin xwe wekî serwer nîşan bidin jî li ser organên din ên weşanê jî hêzên dijber ketin nav tevgerê, darbe veguherî şer. Berê dema ku tenê radyoyek û navendek weşanê ya radyoyê hebû, pêdivî bi rêxistinbûneke zêde nedima, bi rehetî darbe dikirin. Ewil pêşbîniya desteserkirina mala radyoyê dikirin. Naxwe di rêveberiya civakê de weşangeriya radyoyê

bû amûrekî zehf bi bandor. Di darbeyan de jî wisa ye. Darbekarên artêşa Tirk jî wisa kirin, radyo bi kar anîn. Lê dema ku teknîk pêş ket, dema ku ne ji yek navendê, ji her qadê weşana radyoyê hate kirin, weşangeriya televîzyonê ket rojevê, bidestxistina hemûyan hêsan nebû. Em bala xwe bidinê, Artêşa Sor a Yekîtiya Sovyetan ku cîhan dilerizand, li dijî rêveberiyeke mîna Gorbaçov lawazbûyî nikarîbû darbeyekê bike. Herî dawî artêşa Tirk jî ev sernexist. Kenan Evren ê ku di 12'ê Îlona 1980'ê de darbe kir, wextê ku artêşa Sovyetê nikarîbû darbe bikirina gotibû, *"bila ji me fêr bibin."* Lê artêşa wan bi xwe jî herî dawî nikarîbû darbe bikirana. Pêşketina di ragihandinê de rolek girîng lîst. Lewma jî lazim e em hêza rast a weşangeriyê, qada ragihandinê ya perwerdekirina civakê, bandorkirinê, rêvebirinê, arastekirinê bibînin.

Weşangeriya radyoyê çawa tê kirin? Lazim e heval wê di dersên din de bibînin, lê weşangeriya dîtbarî pêş ket. Li gel vê xîtabî zêdetir sehekan dike, hê bibandortir e. Ev rast e, feqet nêrîna ku weşangeriya dîtbarî weşangeriya nivîskî bêbandor kiriye, radyogerî bêbandor kiriye, tam ne rast e. Weşangeriya nivîskî di perwerdeyê de, di şikildayîna civakê de xwedî cih û girîngiyek cuda ye. Dema ku tenê serê xwe organên çapemenî-weşana nivîskî hebûn, aktîvîteya wê hê zêdetir bû. Pêşketina amûrên din ew aktîvîte hinekî din sînordar kir, lê nikare bê gotin ku bi temamî ji holê rakir. Li milekî jî anî asteke ku xwedî fonksiyoneke berbelavtir. Heman tişt ji bo weşangeriya radyoyê jî derbasdar e. Hêza bandora weşangeriya dîtbarî pir zêde ye, feqet girîngiya weşangeriya radyoyê jî ji ortê ranebûye. Çima? Ji ber ku bi rehetî tê kirin. Dikare ji her derê weşanê bike, hêsanî bê veguhestin. Dikare ji her derê bê şopandin. Niha her diçe televîzyonvanî jî tê wî halî, lê çi dibe bila bibe ji bo ku televîzyon qasî radyoyê hêsan bê şopandin, pêdivî bi demeke diyar heye. Mirov dikare vê bibîne.

Bi rêka telefonan hewl didin vê bikin. Neyê hesibandin ku ew ê ewqasî pêşwaz bibe. Di warê herikîna nûçeyên rojane,

demkî de wisa ye, lê ji bo yên derveyî wê ne wisa ye. Ji ber vê jî tam ne wisa ye. Ji bo vê jî weşangeriya radyoyê mîna weşangeriya nivîskî girîngiya xwe diparêze. Di weşangeriya radyoyê de amûrên teknîkî girîng in. Zêdetir weşanê dikin, hêsantir tê şopandin. Hêsantir ji her derê dikare bê guhdarkirin. Li qadek firehtir dikare weşanê bike, dengê xwe bigihînê. Li gorî dîmen, ev taybetmendiyên xwe jî hene. Xwe dispêre hin derfetên teknîkî jî. Derfetên madî jî dihewîne, vê jî îfade dike. Ev mijarên cuda ne, ji ber ku em li ser taybetmendiyên weşangeriyê bi xwe radiwestin. Di weşangeriya radyoyê de jî rêzikên ku lazim e bê dîqetkirin hene. Lazim e nîzam, dîsîplîn, cidiyeteke xwe hebe.

Mînak, kîjan wextê ku te xwest tu dikarî pirtûkê derxîne, kovar mehane be, 2-3 mehan carekê be, çend rojan dikarî dereng derxîne. Rojnameya rojane hinekî din pûtê bi demê dide. Lazim e her roj di demeke diyar de bê derxistin, lê 1-2 saetan tu dikarî li wir jî dereng bixî. Lê dema kar tê ser weşangeriya radyoyê êdî çirke bi çirkeyê ye. Çirkeya karkirinê, dîsîplîneke rêxistinî ya ku lazim e pêwîstiyên wê bêne kirin, gerek dike. Dîsîplîna xebatê pêwîst dike. Wisa tavilê tu nikare weşanê biguherîne. Li gel vê, her diçe 24 saet weşangerî di çarçoveya bernameyeke 24 saetan de, lê her mijar jî weşan jî bi şiklekî ku karibe di demê de bide, xebateke bi plan, rêxistî û dîsîplîn dixwaze. Ji bo ku ev were kirin, perwerde, li gorî wê pêşkêşvanî, li gorî wê jî komkirina materyalan girîng e. Di weşangeriya radyoyê de xîtab pêş dikeve. Di rojname, kovar, pirtûkê de xîtaba nivîsê pêşdatir e. Ji wê re jî *"zimanê nivîsê"* tê gotin. Di radyoyê de ziman û uslûba axaftinê esas e, derdikeve pêş. Li gorî vê uslûp, xîtabet, eyarkirina deng, tonê deng, perwerdeya deng, li ser vî bingehî karîgerî derdikevin pêş. Mesela me dikarîbû weşangeriya radyoyê bibandortir bi kar banîbana, lê me bi kar nanî.

Bi xebatên Rêbertiyê re xebata pirtûkê zêde bû. Beriya wê têkildarî Kurdistanê zêde pirtûk tine bûn. Neyê hesibandin ku

her der bi pirtûkên Kurdistanî tijî bûn. Berevajî di pirtûkên heyî de jî –pirtûkên Tirkî- aîdî Kurdan her tişt hatibûn derxistin. Navê Kurd û Kurdistanê hemû hatibûn derxistin. An nediyar hiştibûn an jî kiribûn malê hinekan. Xerakirinên wisa ji aliyê pir dewletan hatibûn kirin. Pirtûkên têkildarî Kurdistanê hatine nivîsandin, kovarên hatî derxistin qasî serê derziyê bûn. Ev bi PKK'ê re pêş ketin.

Li milekî PKK'ê amade kir, li milê din hêzên hevrikê PKK'ê amade kirin. Lewma jî zêde û dewlemend bû. Pirtûk, kovar, rojname zêde bûn. Radyo jî, her çû televîzyon jî zêde bûn. Bê qenalên televîzyonê çawa hatin vekirin me di beşa dîrokî de vegotibû. Di roja me de ew zêde bûn. Me hê zêdetir weşangeriya kovar û rojnameyê bi kar anî. Esas em dikarin bêjin me rojname bi kar anî. Demek dirêj nebû, lê salên 80'yî li Ewrûpayê, 90'î jî li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê wekî amûrekî bi bandor me bi kar anî. Weşangeriya radyoyê hê rehettir bû, dibe ku hê bandortir jî bibûya. Em nikarin bibêjin ku me weşangeriya radyoyê bi heman rêjeyê, di heman asta karîgeriyê de bi kar anî. Me li hin deveran hewl da parçe bi parçe weşanê bikin. Li Bakur radyoyên xwecihî jî hatin avakirin. Me li gel televîzyonê radyo jî ava kir, tê guhdarkirin. Ne ku me qet bi kar nanî, lê li gel televîzyonê hat bikaranîn. Halbûkî li cîhanê di wê dema navberê de ku wextê ji çapemeniya nivîskî derbasî weşana dîtbarî bû, pêvajoyeke ku weşangeriya radyoyê raser bûye heye. Tevî ku hêsantir bû, me radyo wisa bi bandor nikarîbû bi kar banibana. PDK-YNK'ê xebatên xwe zêdetir spartin radyoyê. Esas em hereketeke wisa bûn ku me dikarîbû bi berbelavî bixebitandana. Li gorî terzê me bû. Di terzê gerîla de, di warê rêxistinan de jî, weşangeriya radyoyê di warê propaganda û ajîtasyonê de zêdetir guncav bû. Me dikarîbû karîgertir bixebitînin. Destpêkê em li ser çapemenî-weşana nivîskî sekinîn, me xwe rêxistin kir, di nîzama xebatê de me ew esas girt. Em bûn ew ên ku di nav civaka Kurd de çapemenî-weşana nivîskî pêş xistiye. Ji wê em yekser derbasî dîtbarî bûn. Di

95'an de bi vekirina MED TV ve me wisa weşangeriya demeke navberê ya radyoyê nekir. Tevî ku li gorî terzê me jî bû, me di pratîkê de pêk nanî. Pêşketina pratîkî ne li gorî wê bû. Ev ji bo bibe agahiyek, em dikarin wisa diyar bikin.

Televîzyon dibin amûrê esas ê weşangeriya dîtbariyê. Li Kurdistanê cara destpêkê yê ku rêxistinbûna qenala televîzyonê kir em bûn. Ji bo ku bandora me kêm bikin, ji bo ku civaka Kurd tenê bi MED TV neyê perwerdekirin, navenda şerê taybet bi PDK û YNK'ê ve qenalên televîzyonê da vekirin. Televîzyonvaniyeke alternatîf a Kurd ava kirin. Ji derveyî radyoyê, esas me weşangeriya televîzyonê bi bandor meşand. Ji ber ku di qada nivîskî de daneheveke me ya girîng hebû, ezmûneke diyar çêbibû. Daneheva kadro derketibû ortê, me ew nirxandin. Dîsa me ji hin mirovan sûd wergirt ku di weşangeriya radyoyê de xebitîbûn, di televîzyonên dewletên din de bibûn xwedî tecrûbe. Di pêşxistina televîzyonvaniyê de tevkariyên wan jî çêbûn. Bi van spartekan, di atmosfereke wisa de ku gelek derdoran bawer nedikirin ku em dikarin bikin, me weşangeriya MED TV'yê, her çiqasî di serî de xeta, kêmasî, nebesî hebin jî bi şiklekî bibandor da destpêkirin û pêşxistin. Bi şiklekî berbelav û bi bandor jî hat bikaranîn. Daneheva behskirî ji bo weşangeriya televîzyonê bes bû. Hêz dayê. Ji ber ku cara yekem bû, di nava civaka Kurd de gelek derdorên Kurd ên meyldarê vê yekser tevlî vir bûn û xwe di wir de îzah kirin, îfade kirin. Bi saya vî derfetî, wan jî di komkirina kar de cih girtin. Wisa jî me hê bandortir pêş xist. Weşangeriya dîtbarî girêdayî pêşketina cîhanê li gel me jî di asteke pêş de ye. Gelek qenalên televîzyonê hene. Ji derveyî me jî, gelek qenalên Kurdan, rêxistinên din hene. Nîzameke me ya xebatê û herîkîneke me ya weşanê heye ku bi hemû zimanên Rojhilata Navîn û her wiha bi hin zimanên Ewrûpayê bernameyan diweşînin.

Bi televîzyonê re çapemenî-weşana nivîskî hinekî teng bû, lê li ba me karîgeriya wê dewam kir. Me bi şiklekî têrker hêz nîşan neda ku em wan amade bikin, derxînin û belav bikin.

Damezrandina YRD'ê hedef dikir ku vê kêmasiyê bide derbaskirin û xwe têrker bikin, lê di vê mijarê de jî mîna ku xebatên rêxistinî-pratîk plan dike, me nikarîbû bimeşandana, em lawaz man. An ne ji ber ku aktîvîteya wê kêm bûye wisa lê hatiye.

Weşangeriya dîtbarî li gel me roleke gelekî girîng lîst, bi bandor bû. Rêbertiyê di serî de 3-4 salan bibandor bi kar anî. Di nava civakê de televîzyonê di pêşxistina perwerdeya li ser bingehê propaganda-ajîtasyonê de roleke pir girîng lîst. Ji ber vê yekê eleqeya civakê zêde bû. Niha komasiyeke diyar a ezmûnê derketiye holê, derfet bi zêdehî hene. Daneheveke diyar a kadroyan hat afirandin, tecrûbeyek cidî heye. Tevnek berfireh a xebatkaran çêbû. Pêşketina sîstema ajansê, hêzek zêde tevlî weşangeriya televîzyonê kir. Em li ser vî bingehî xebatan dimeşînin. Feqet çiqasî bi bandor dibe, çiqasî bes e; di warê naverok, şekil, pêşkêşiyê de çiqasî bi bandor e, em van jî nîqaş dikin. Dîsa ji ber ku em weşanê li derveyî welat dikin, hêza frekansê, asta temaşekirinê jî girîng e. Di van xalan de jî tên nirxandin. Zêdetir, pêşdatir weşangerî li Ewrûpayê eynî mîna çapemeniya nivîskî kom bû. Ewrûpayê gelek caran girt. Weşangeriya ku ji MED TV ve dest pê kir, heta niha 4-5 nav guhertin, li gel vê zêde bûn. Li Bakur, Tirkiyeyê di pêvajoya bihurî de hinekî berfireh bû. Dema ku êrîşên faşîst-qirker zêde bûn, hate tengkirin. Li Bakur tiştekî wisa nema. Girêdayî şaredariya Amedê televîzyonvaniya xwecihî hebû, li ser wê televîzyonvaniya li Bakur dest pê kir. Demek dirêj di bin navê *"ew veguherandina televîzyona neteweyî"* de hin kesayetan nehiştin em li Bakur weşangeriya televîzyonê pêş bixin. Gotin em ê bikin û bi salan hêvî dan, bendewarî afirandin, lê nekirin. Esas em ji deh salan zêdetir hatin astengkirin. Ev rewş ji 2001'ê heta 2013-2014'an dewam kir.

Taybetmendiyên weşangeriya televîzyonê çi ne? Televîzyon ji radyoyê cihêwaz e. Hem dîmenê wê heye, hem denge wê hem jî xîtabî çav û guhan dike. Wisa jî xîtabî hemû lebatên sehekê dike. Radyoyê xîtabî guh dikir. Çapemeniya nivîskî xîtabî

çav dikir. Çapemeniya dîtbarî xîtabî hemûyan dike. Ji ber vê jî asta bandora wê zêdetir e. Hat rewşeke wisa ku televîzyon veguherî amûreke mirovan bi xwe ve dide girêdan. Di roja me de sîstema modernîteya kapîtalîst, navendên şerê taybet vê ji bo ku karibin serweriya xwe bidomînin, avaniya hişmendiya civakê li gorî berjewendiyên xwe ava bikin, araste bikin, di çarçoveya şerê psîkolojîk de wekî amûrê mejîşûştinê bi şiklekî herî xerab bi kar tînin. Medya dîtbarî veguherî amûrê herî xurt ê şerê taybet. Bi şiklekî xerab jî tê bikaranîn.

Rêbertiyê ji vê re got, *"civak tê qirkirin."* Amûrê bingehîn ê qirkirina civakê medya ye. Bomberdûmana propagandaya îdeolojiya netew-dewletê ya li ser mirovan bi rêka medyayê tê kirin. Rojname jî di vê de heta astekê karîger e. Pirtûk jî hinekî rolê dilîzin. Radyoyê jî bi kar tînin, lê bandora televîzyonê ji yên din qat bi qat zêdetir e. Lewma jî televîzyonvanî mejî û hestan ko dike, kotromî dike, bandor dike, bi şiklekî zehf berbelav û bibandor, ji aliyê sîstema şerê taybet a faşîst, sîstema netew-dewletê tê bikaranîn. Şerê herî zêde boneyî civaka Kurd tê bikaranîn, ev e. Êrîş wisa pêş dikeve.

Weşangeriya televîzyonê, ji weşangeriya radyoyê zêdetir teknîkê dixwaze. Beşa wir a teknîk zêdetir e. Feqet beşa wê ya din jî li gorî ya weşangeriya radyoyê tevlîhevtir e. Ne tenê bi dîsîplîneke xebatê û perwerdeya deng dibe. Di heman demê de ji bo amadekariyê xebateke zêdetir rêxistî, bi dîsîplîn gerek dike. Em ji sîstema nûçegihanan bigirin heta bikaranîna weşana zindî ev wisa ye. Rêxistinbûneke zêdetir, hawirdoreke pir berfirehtir bikeve nav kar, bixebite pêwîst dike. Di heman demê de tenê hêza ziman, perwerdeya deng, uslûp na, heman demê şikil û şêweyê dixwaze. Nîzama libatê dixwaze. Ji ber ku bi dîmen e, lazim e gotin û libat hevûdu bigirin, qasî hêza ziman hêza bedenê jî rast bê bikaranîn, xîtab ne tenê bi ziman bi libatê jî pêş bixîne. Rehendekî girîng ê kar jî ev e. Xebat wisa dimeşe. Ji ber vê jî zêdetir xebatkaran dixwaze, zêdetir kedê dixwaze, zêdetir perwerdeyê dixwaze. Lazim e xebatkar di her

warî de bêne perwerdekirin. Perwerdeya teorîk, felsefîk divê. Perwerdeya îdeolojîk-polîtîk divê. Perwerdeya ziman, uslûp divê. Perwerdeya libatê divê. Ne karekî wisa hêsan e, zehf zêde xebatê dixwaze.

Heke em ê vî amûrî bi kar bînin, em ê xebata propaganda-ajîtasyonê bimeşînin, perwerde û rêxistinbûneke pirmilî lazim e, ji ber ku xebat berfireh e. Ji ber ku dîtbarî ye, pir zêde hestiyarî û baldariyê dixwaze. Tu dikarî wekî radyoya bi dîmen bi kar bîne. Hin tenê bername, klîbên amadekirî diweşînin. Ew jî wekî weşangeriyekê derbas dibe, lê belê em behsa xebata şoreşgerî, propaganda û ajîtasyonê dikin ku li vir wisa nabe. Halbûkî lazim dibû ji radyoyê cudatir bûna, ji ber ku asta wê ya bandorê cuda ye. Ji ber wê jî bikaranîna weşana zindî, di nav rêxistiniya xebatê de girîng e ku bernameyên pir dewlemendtir çêdike. Li gel vê di warê bernameyan de lazim e hê dewlemendtir be. Bi şiklê ku ew ê pêdiviyên girseya hedef bîne cih, dewlemendiyek, pûte, dîsîplîneke hê mezintir lazim e.

Hêza weşangeriya televîzyonê zêde ye, dubarekirina wê sûdmend e. Amûrekî pir xurt e. Heta demeke nêz jî bi xwespartina weşangeriya televîzyonê darbe dihatin kirin, darbekarî bi xwespartina televîzyonan dikare li dijî darbeyên hê bibandortir rabe. Di pozîsyona amûrekî pir xurt de ye ku dikare civakê araste bike. Heke em rast bi kar bînin, bi rastî jî amûrekî wisa ye ku dikare perwerdeya ferdê azad û civaka demokratîk herî xurt pêş bixe. Qasî dixwaze dikare fikrê jî, libatê jî bide qezenckirin, şikil bide ferd û civakan. Bes xwe bi bername bike, plan bike, xwe li gorî wê rêxistî bike, amadekariyê bike û xebatê bimeşîne. Eger li gorî pêwîstiyên kar tu van hemûyan tam bikî, ew ê bandora wê ya li ser civakê ji sedî sed be. Tu dikarî li ser civakê tam arastekirinekê bike, tam şikilekî bide kesayetan. Derfeta vê dide. Dikare vê bi temamî pêk bîne. Amûrekî wisa karîger û xurt e.

Lazim e weşangeriya dîtbarî, televîzyon bêne bikaranîn. Hêzên şoreşger pir zêde bi kar nanîn. Hinekî hewl didin bi kar

bînin, lê heta niha mirov nikare bibêje ku bi bandor bi kar anîne. Bi taybet hêzên reel sosyalîst ên Tirkiyeyê hê jî radyogerî nebihurandine. Ew tenê di kovargeriyê de mane, nikarin rojnamegeriyê jî bikin. Di salên 1970'yan de komên ku navê xwe bi kovarê dan nasîn, hê jî bi kovargeriyê dimeşînin. Ji ber ku Lenîn bi *"Îskra"yê* şoreş kiriye, hê jî her kes li wê nuqtê ne, ewqasî qalibger û dogmatîk in. Nikarin karan pêş bixin, berfireh bikin. Nikarin propaganda bikin, xwe vedişêrin. Me pêwendî-tifaq ava kir, lê wekî YŞYG'ê em nikarin panelekê jî li dar bixin. Hemû veşartî ne. Yek ji wan jî xwe nîşan nade. Di roja me de mirovên ku rêveberiyê nas nekin ma tevlî rêxistinê dibin? Ewqasî rêveber nas kirine. Pê dihesin ku hemû rêveber çi dixwin, çi vedixwin. Rêxistinên çepgir ên Tirkiyeyê kî ne, dewlet van hemûyan dizane. Kî Komîteya Navendî ye, kî rêveberî ye, van dizane. Xwe ji civakê vedişêrin. Çima? Hinekî din rehet digerin. Diçin bajêr û tên. Tu wisa bibe ew ê civak jî nas bike, polis jî zêdetir bi ser te de were, tenê ji bo ku wê jiyana xwe ya takekes bidomînin di çaxê propagandaya beriya sed salan de mane. Pêşketina sed salan red dikin, wê bi kar naynin. Me bi ti şiklî nikarîbû propagandayê pêş bixin.

Çima Tevgera Şoreşa Yekbûyî ya Gelan pêş nakeve? Ma propagandayê nake ku pêş bikeve. Her du mehan carekê li Ewrûpayê kovarê derdixe, naveroka wê jî çi ye ne diyar e. Carina em jî dinîvîsînin û dişînin. Kovara li Ewrûpayê ew ê çawa civaka li Tirkiyeyê bixe tevgerê, rêxistin bike? Em amûrên wirdetir ên propagandayê bi kar naynin. Yên ku propagandayê nekin nikarin rêxistinê ava bikin, nikarin çalakiyê bikin. Ji ber vê jî kar pêş nakevin, rewşeke paşdemayînê heye. Teknîka heyî ji aliyê tevgera çepgir siyasî, şoreşgeran baş nayê bikaranîn. Lenîn wê demê rojname baş bi kar anî û şoreş kir. Niha di pêvajoyeke wisa de ku pêşketina herî dawî ya teknîkê çêbûye, li şûna ku şoreşger bi heman hostatiyê bi kar bînin, nakin. Ji ber ku bi kar naynin, nikarin rêxistin û çalakiyê pêş bixin, nikarin bibin girseyî, berfireh bibin. Nikarin gel rêxistin bikin û

ber bi xwe ve bikşînin, qezenc bikin. PKK bi berxwedana gerîla ve bû tevgera gel, lê gerîla propagandaya çekdarî meşand. Dûvre jî çapemenî-weşan, propaganda-ajîtasyon domand. Bi rojname, kovar, televîzyonê li ser piyan ma. Girse bi wan ve li ba xwe girt û zêdetir berfireh dike, didomîne. An nikare karîgeriya xwe bidomîne. Yên din wisa nakin. Propaganda-ajîtasyonê dixwazin tenê bi kovareke mehane bidomînin. Tîraj çend sed e, ne diyar e, enceq bi xwe dixwînin. Ango wisa xwe bi xwe propaganda dikin, dikevin rewşa hereketeke ku bi xwe guhdar dikin.

Yên din hene, dibêjin *"Alema Sanal", "Sosyal Medya", "Alema Înternetê".* Em hê pir zêde derbasî tiştekî wisa nebûn, lê tê dîtin ku bibandor bûye, leztir bandorê li civakê dike, hêsantir organîze dike. Serwerî û zordestiyeke hiqûqê li ser weşangeriya radyo, televîzyonê heye. Ev rewş esas di medya mecazî de zêde tine ye. Ji ber vê jî gotina *"mecazî"* hê rasttir e. Tiştekî wisa ye ku li ser kontrol nayê avakirin. Di demên dawî de hewl didin li ser kesên ku ev ava kirine zextê bikin, asteng bikin, lê ji ber ku pir berbelav bûye zor e. Dema wisa dibe, berpirsê wê tine ye, her kes bi rehetî dikare wan amûran bi kar bîne. Bi şiklekî îllegal dikare bên bikaranîn, ti kes nikare asteng bike. Ev jî dihêle ku zêdetir derfetê xistina nav tevgerê bê destxistin. Alema Mecazî ne ajîtator e. Di televîzyonê, weşangeriya dîtbarî de tu dikarî hem propaganda hem jî ajîtasyonê bike. Ji herduyan re jî vekirî ye. Weşangeriya televîzyonê bi rastî jî weşangeriyeke pir bibandor e, lazim e wisa qet kêm neyê dîtin. Ev amûr mirovan ber bi kû ve dibe, ew ê rizgar bike yan jî hilweşîne, ew ê di pêvajoya pêş de bê dîtin. Tam ne diyar e. Dibe ku herdu jî bin. Amûrekî ewqasî bibandor e. Lê Alema Mecazî ne perwerdekar e, ne alema propaganda-ajîtasyonê ye. Bi hevokan diçe. Tweetê davêjin. Serokê Amerîkayê bi rêka wê ve hewl dide dinyayê bi rê ve bibe. Sîstema modernîteya kapîtalîst hema hema xwe aniye wê astê ku li ser vî bingehî dixebitîne, rê ve dibe. Qada mecazî hinekî ji avakirina tevlîhe-

viyê re vekirî ye. Mirovan bi rehetî dixe hereketê, kontrol tine ye, lê ji her cure tevlîhevkirinan re jî vekirî ye. Rojekê ji ber wê şerê nukleerî dernekeve baş e. Yên ku hewl didin cîhanê wisa bi rê ve bibin, dikarin her cure tevlîheviyê derxînin. Avaniyeke wê ya ji vê re vekirî jî heye. Bibandor e, di carekê de dikare xwe bigihîne hawirdoreke pir berfireh. Ev ê mirovahiyê heta kû derê bibe, nayê zanîn.

Em çiqasî dikarin bi kar bînin? Hê me ew pir zêde neceribandiye. Ev demek e em dixwazin tenê li dijî şerê psîkolojîk bi kar bînin, lê em pir zêde serketî jî nebûne. Caran hin derdor bi kar tînin, lê ew jî sînordar e. Ne pir berbelav û bi bandor e. Di demên pêş de ew ê çawa bibe, em vê nizanin, lê niha ne di pozîsyoneke wisa de ye ku hereketeke mîna me zêde bi kar bîne. Em di ragihandinê de, komînîkasyonê de bi pirsgirêkan re hevrû dibin. Li ser her tiştî teknîk ava kir. Lewma jî hêzên li ser teknîkê serwer, ragihandinê kontrol dikin. Navendên ku teknîk afirandine, kontrol dikin. Navendên siyasete yên ku wan navendên navborî di dest xwe de digirin, kontrol dikin. Amûrên mîna telefon, bêtêl, înternetê kêlî bi kêlî dikarin ji hêla navendên cuda bên şopandin. Dema wisa dibe jî wekî amûrê ragihandina rêxistinê bikaranîna van pir xeter dibe. Di kêliyê de tu xwe îxbar dikî. Dema tu dibêjî ez ê kar bikim, xebatê bimeşînim, tu xwe îxbar dikî û bi êrîşan re hevrû dibe. Ji ber vê jî pêşketina teknîkî di warê propaganda-ajîtasyonê de derfet afirandin, lê di mijarên xebitîn, ragihandina rêxistinî de pirsgirêkên cidî anîn.

Bikaranîna telefonê pir berbelav e, me hewl da vê asteng bikin, lê em nikarin bi temamî serketî bibin. Ji ber bikaranîna telefonê wekî rêxistinî me pir zirar dîtin. Lazim e ev jî bê zanîn. Hê jî em nikarin sînordar bikin. Ji ber ku em teknîkê nizanin. Yên ku bi kar tînin nizanin bê çawa dixebite, karê xwe dike. Ji ber kar tê kirin jî difikire ku baş e. Temam, gelo bandorek ters dike, zirarê dide, wê nizane. Heke ji wê yekê qezenc dike, tavilê pêncan winda dike, ne di ferqa vê de ye. Ew tenê qezenckirina

xwe dibîne. Ji ber vê jî bawer nake. Ev tiştekî wisa ye ku tu nikarî qedexeya rêxistinî li ser deyne. Ev rewş bi perwerdeyê, ferasetê, zaniyariyê ve dikare çêbibe. Rewşeke wisa ye ku lazim e her kes bi zanebûn bike. Li gel me fêmkirina wê pir zor e. Bikaranîna wê ya erênî, ya kêrî wê tê dibîne, derveyî wê nabîne. Ji ber ku nabîne bawer nake û nêzîkatiya sûdegir pir zêde dubare dubare dide bikaranîn. Qasî pêwîst em bi kar bînin, bi kontrol em bi kar bînin, lê belê hemû dikeve bin kontrolê. Tiştê ku bi telefonê tê bikaranîn di kêliyê de digihêje ber destê netew-dewletan. Wek nimûne, DYA di her kêliyê de dikare li hemû xwediyên telefonan guhdar bike. TC jî wisa dike. Di hemû xebatên îstîxbarata herî bi bandor de qada ku di komkirina agahiyan de herî bi bandor, şopandina cihazên mîna telefon-înternetê ne. Ji wir agahiyan kom dike û êrîşên xwe dispêre wê. Bibandor jî dibe. Lazim e neyê gotin tiştek nabe. Enceq ên ku derdikevin derveyî wê, dikarin derkevin derveyî kontrolê û xwe biparêzin. Yên ku dernekevin derveyî kontrolê winda dikin. Ji ber ku hêza teknîkî xwe dispêre wan. Derfeta her cure êrîşê dide.

**e-Xeta Weşanê:**

**(Rêbertî, Têkoşîn, Gerîla, Şehîd, Serhildan, Partî û Tevger, Gel, Jin, Ciwan, Kedkar, Welatparêz, Ax-Welat, Dîrok, Herêm û Cîhan)**

Xeta weşanê, wekî beşekê dikare were destgirtin û nîqaşkirin. Jixwe di nava vegotinan de jî di astek girîng de cih girt. Ev mijar her tim bi civînan tê nîqaşkirin, nirxandin, dibe nivîs û tê pêşkêşkirin. Feqet pêşikên xeta me ya weşanê çi ne? Taybetmendiyên wê çi ne? Lazim e em miqateyî çi bin? Van xisûsan digire nava xwe. Ev xisûs piranî tên zanîn, tim bi tim tên nirxandin. Dikare wisa jî bêne bidestgirtin, nirxandin. Xeta

me ya weşanê ji çi pêk tê, pêşdatirên wê çi ne? Çi di çapemeniya nivîskî de be çi jî di qada dîtbarî-bihîzbarî de be, em ê çiqas cih û pêşikê bidin çi? Ev jî girîng e. Ji ber ku em tevgereke Rêbertiyê ne. Xeta me ya îdeolojîk-polîtîk heye. Xeteke me ya ji van pêk tê heye. Lewma jî xisûsên ku em datînin pêş hene. Wisa her tişt nabin rojeva propaganda-ajîtasyona me, weşana me. Helbet her tişt di heman astê de cih nagirin. Pêşdatirên rêza giştî hene. Lazim e em di sîstema nûçeyan de jî pêşdatirin rêzê li ber çavan bigirin. Bultenên nûçeyan li gorî dilê kesan nayên avakirin. Di vî warî de rastiyeke me ya xeta weşanê heye. Lazim e ev bê zanîn. Di xebatê de lazim e gerekên xetê li ber çavan bê girtin, rêza pêşikî bê pêşbinîkirin. Taybetmendiya xeteke wisa ji çi pêk tê? Pêşdatirên wê çi ne? Dema ku em wisa dipirsin, bêguman wekî tevgereke Rêbertiyê, dayina rastiya Rêbertiyê, taybetmendî û pêşika yekemîn a xeta me ya weşanê ye.

Rastiya Rêbertiyê, cewher û çarçoveya teorîk a felsefîk-îdeolojîk a hemû propaganda-ajîtasyona me pêk tîne. Em wê esas werdigirin. Ango em ne bêalî ne. Em wezîfe û karekî dikin. Em behsa rastiyekê, heqîqetekê dikin, vedibêjin, ji civakê re radigihînin. Ji bo vê em propaganda-ajîtasyonê dikin. Medya ji bo kirina vê heye. Esas ev heqîqet, heqîqeta Rêbertiyê ye. Wekî felsefî-îdeolojîk, wekî xeta rêxistinî-polîtîk, wekî têkoşîn em vê esas werdigirin. Em hedef dikin ku zihniyet, sîstem, terz, uslûb, tempo, rastiya Rêbertiyê ji civakê re veguhezin, fêrî ferd û civakê bikin û bidin qebûlkirin. Hewldana me ya esas ev e. Layê wê yê xebatên me diyar dike jî ev e. Rêgezên wê pêk tînin. Ev, çarçoveya wê xet dike. Armanca wê ew e ku heqîqeteke wisa bigihîne civakê, ji gel û gelan re bibe. An em wisa mîna saziyeke xêrê naxebitin. Em wisa rasthatî jî hewldanê xerc nakin, em ne bê armanc in.

Em hewl didin wezîfeyeke dîrokî bînin cih. Ev wezîfe jî ew e ku em ê heqîqeta Rêbertiyê ji civakê re ragihînin, di serî de civaka Kurd em ê mirovahiyê li ser vî bingehî perwerde û çalak

bikin, bihêlin bijî. Hedef û armanca me ev e. Diyardeya esasî ya ku wezîfeya me diyar dike, ev e. Di vî warî de lazim e em hemû rastiyên aîdî Rêbertiyê derxin pêş çavan, bi şêweyên guncav bişuxilînin, nivîskî-dîtbarî-bihîzbarî di her astê û firsendê de bi uslûp û rêbazên ravekar, fêrker ve ji civakê re ragihînin.

Li gel vê, pêşika me ya duyemîn bêguman şehîd in. Em di heman demê de tevgereke şehîdan e. Rêber Apo got, *"PKK, partiya şehîdan e."* Em dibêjin, *"Tevgera Rêbertiyê ye."* Rastiya vî karî ew e ku partiyeke Rêbertî û şehîdan e. Şehîdên me rastiya nirxên bingehîn e ku heqîqeta Rêbertiyê herî baş fêm kiriye, jiyaye, temsil kiriye. Lewma jî pêkhatina Rêbertiyê temsil dikin. Heke heqîqeta Rêbertiyê ji bo me kombûna rastiyan be, rastiya şehîdan jî rastiya madîbûyî, bûye cîsim, jiyanîbûyî ya komkirina van rastiyan e. Lazim e em vê wisa bibînin, bizanin, binirxînin.

Di vê wateyê de wezîfeyeke me ya herî bingehîn ew e ku rastiya şehîdan, ruhen wan, hest, berxwedan, lehengî, armanc, hesretên wan, mêzekirina wan a jiyanê, xemgînî, keyfxweşiyên wan bi şiklên guncav saz bikin; bi şêwazên huner, wêje, zanistên civakê, biyografî û hwd. bê şixulandin, bîne asteke fêmkirinê, pêşkêşî civakê bike. Ev di heman demê de emirek, wasiyetek, bangeke Mazlûm Dogan e. Dema ku ji zindanê ve pêvajoya berxwedanê pêş ket, ev bangawazî kir: *"Çalakiyên me, sekna me ya li dijî faşîzmê, berxwedana me lazim e teqez ji civakê re were ragihandin. Bigihînin mirovahiyê, ji gelan re ragihînin."* Ew ê esasê xebata şoreşgerî, propaganda-ajîtasyona me çi be, bi vî şiklî îfade kir, nîşan da, rave kir. Hem bang kir hem jî di wateyek rastî de emir da. Niha em helbet ji bo bicîhanîna gerekên vî emrî dijin û dixebitin. Hemû hewldan û têkoşîna me ji bo vê ye ku gerekên vî emrî rast û serketî werin cih. Rêber Apo got, *"ez berdevkê şehîdan im."* Rastiya şehîdan, pêkhatin û pêşketina Rêbertiyê îfade kir, derxist holê û temsîl kir. Lewma jî heqîqetekê pêk tînin. Em hewl didin taybetmendî, rêgez û pîvanên vê heqîqetê fêm bikin, rave bikin û

vebêjin. Esasê propaganda-ajîtasyonê ew e ku taybetmendiyên vê heqîqetê di serî de gel û jinên Kurd, vegotina ji bo hemû gelên herêmê û giştî mirovahiyê ye. Gihandin, birin, vegotina ji bo wan deveran, bangawaziya vê jiyana azad ji hemû mirovahiyê re ragihandine.

Li ser vî hîmî, dema ku em dibêjin *"xeta weşanê"* em van rastiyan esas werdigrin. Li gel van, di nava yekgirtinekê de, wekî plana sêyemîn jî şixulandina rastiya têkoşînê û veguhestina ji bo civakê wezîfeyeke me ya pêşdatir bingehîn e. Wezîfeya herî bingehîn a xebatên me yên propaganda-ajîtasyonê, xebatên çapemenî-weşanê ew e ku di serî de têkoşîna gerîla, giştî têkoşîna gel, têkoşîna jin, ciwanan, têkoşîna azadiyê, lehengiyên şerê gelê şoreşgerî, pêşketin, encam, egîdî, wêrekî, fedakariyên wê, rastiya mirovê ku bi şerekî wisa re afirî bê şixulandin û ji civakê re bê ragihandin. Ya ku rojeva medyaya me diyar dike ev in. Esas ji bo şixulandina van, bike heyîn, ji civakê re ragihînin, em organên navborî yên weşanê rêxistin dikin, derdixînin. Em xebatên ku me hewl da îfade bikin, dimeşînin. Ne ji ber ti sedemên din e. Têkoşînên ku em behsê dikin jî bi rastî têkoşînên mezin in. Îfadeyek wisa ye ku di şertên herî zor de bi spartina derfetên herî kêm li dijî êrîşa herî hovane ya dijmin îfadeya wêrektî, fedakariya herî mezin a dîrokê ye. Di pêşketina fezîletên mirov de nûnertiya lûtkeyê dike. Lazim e wisa besît neyê destgirtin, hêsan neyê dîtin. Ji ber vê yekê wezîfeya me ya bingehîn ew e ku rastiya têkoşînê, di serî de gerîla, bên destgirtin, şixulandin, hilgirtin; di pirtûk, rojname, kovar, radyo, televîzyonan de wekî mijarên bingehîn bêne bicihkirin, şixulandin, vegotin, bi civakê dana fêmkirin, têgihiştin. Lazim e ev wezîfe û rastî neyê paşguhkirin.

Li ba têkoşînê lazim e em rastiya xwe ya rêxistinî jî tevgera xwe ya azadyê jî bi yekpareyî bidin. Girîng e ku bi giştî armanc, rêgez, teorî, jiyan, pîvan, îdeolojî, polîtîkaya wê bê vegotin, ragihandin. Di vê çarçoveyê de pêwîst e ku rastiya partiyê, pîvanên partiyê, xeta partiyê wekî pêşengtiyek esas bê destgir-

tin, şixulandin, bike mijara çapemenî-weşanê, propaganda-ajîtasyonê. Li milekî lazim e felsefe, îdeolojî, rêgezên partiya me-bi taybet ev felsefa Rêbertiyê, rêgezên Rêbertiyê ne jî- bên dayîn; li milê din jî were destgirtin, lêkolandin ku li gel rehendê wê yê rêxistinî bê di rastiya şehîdan de jiyan çawa tê temsîlkirin, di têkoşînê de çawa şênber dibe; di jiyana partî de, sîstema KCK'ê de, jiyana gerîla de çawa şênber dibe; di jiyana partî, sîstema KCK'ê, jiyana gerîla de çawa şênber dibe. Pêşengiya partî, jiyana gerîla, rastiya jiyana neteweya demokratîk yek ji pêşikên rêgezên bingehîn a polîtîka weşana me, xeta weşana me ye. Piştî rastiya Rêbertî, şehîdan û têkoşînê di rêza çaremîn de em ê cih bidinê, esas bigirin, bişixulînin.

Di pey vê de ya esas ew e ku tevgera jinê, xeta azadiya jinê, nirxên azadiyê, têkoşîna jina azad, her wiha wekî qadeke pêşdatir bingehîn pir girîng a xeta weşanê bigirin dest, hemû rastiyên dîrokî, civakî, siyasî, rojane yên aîdî jinê derxîne holê, li ser xeta azadiya jinê azadbûneke civakî; li ser vî bingehî rêxistinbûna Herêmên Parastina Medyayê, têkoşînê, pêşketin û nirxên derketine holê bên destgirtin. Ev jî dibe esasê xeta me ya Rêbertiyê û partiyê. Lewma jî rehendekî bingehîn girîng ê xeta me ya weşanê, taybetiya xelekek bingehîn pêk tîne. Bi taybet jî wezîfeya herî esas ew e ku nêzîkatiyên boneyî metakirina jinê a di bin navê azadiya takekesî ya modernîteya kapîtalîst û çarçoveya kara azamî de, hewldanên metakirina jinê vala derxîne, cîbicîkirina xeta azadiya jinê ya ku bingehê azadiya civakî pêk tîne, her cure çepandina modernîst, êrîşa şerê taybet li ser vî bingehî bê valaderxistin. Bêyî ku ev pêk were pêşxistina ferdê azad, civaka demokratîk, jiyana azad, di nava civakê de pêşxistina azadî, wekheviya li ser esasê cudahiyan, komunalîzm, parvekarî teqez ne gengaz e. Gerek dike ku her cureyê koletiyê bê derbaskirin, xeta azadiya jinê rast were destgirtin, jiyanî bibe. An bi şiklekî din teqez ne mimkun e, pêşketineke ku dinyaya koleyan dibihure, xwe digihîne dinyaya azadiyan bijî.

Dûvre girîng e ku wekî pêşengê têkoşîna xwe ya neteweya demokratîk, rastiya ciwanan, beşa ciwanan, hestên ciwanan, lêgerîn, dînamîzm, dilpakî, têkoşerî, parvekariya ciwanan bê destgirtin, şixulandin. Ciwan li ser bingehê xeta Rêbertiyê perwerdekirin, rêxistinkirin, kişandina nav têkoşînê, hewldan, xebateke me ya girîng pêk tîne. Beşên civakî yên karker û kedkar piştî vê tên. Em tevgereke gel in. Em tevgereke civakparêz û gelperwer in. Enceq di nava civakê de wekî gereka vê pêşikên me hene. Em pêşengtiya jin û ciwanan esas digirin. Em xwe dispêrin gelê kedkar. Em hereketeke kedkar in. Navê me diyar e, em *"Partiya Karkeran"* e, partiya kedkaran e. Rêbertiyê di paraznameyê de PKK mîna *"meyla azadiyê ya gel"* pênase kir. Em rastiyeke wisa temsil dikin. Lewma jî girîng e ku rastiya gelê kedkar bê dayîn, pirsgirêk, taybetmendiyên jiyanê, pêdivî, têkoşîn, pêwendiyên wê bêne destgirtin, nirxandin, bi afirandina çareseriyan ve bike xaleke xeta xwe.

Li gel van bêguman beşek girîng a xeta me ya weşanê jî ew e ku têkoşîna azadiya gelên cîran, encamên van têkoşînan, nirxên demokratîk şoreşgerî, nirxên ku di têkoşînên li ser navê azadî û demokrastiya mirovahiyê meşandine, bêne destgirtin, şixulandin, ji Kurdistanê re bên veguhestin, pêşketinên li Kurdistanê her wiha ji van gelan, mirovahiyê re bên ragihandin.

Helbet beşek girîng a xeta me ya weşanê jî ev e ku rastiya welat bê lêkolandin, hezkirina welat, hezkirina gel, girêdanbûna xakê, yekparebûna bi xwezayê re, nêzîkatiya rast û watedar li beramberî nirxên xwezayê, pêşxistina hişmendiya ekolojîst e. Pêwîst e ku rastiya civaka dîrokî, civaka me ya îro di nav pêşketina dîrokî de bê destgirtin, li ser vî bingehî nirxên ku gelê Kurd, gelan û mirovahiyê di nava dîrokê de derxistine holê kifş bike, watedar bike. Dîsa xelekek din a girîng a xeta weşanê ew e ku hişmendiyeke rast a dîrokê bê pêşxistin û ji civakê re bê ragihandin.

Rehendên ku em têkildarî xeta weşanê bigirin dest, wezîfeyên ku di wateya xeta weşanê de em bikin rojev û ber-

pirsê bicîhanînê ne, ev in. Ya esas û girîng ew e ku îstîqameta esas a xetê neyê windakirin. Derxistina bernameya xebatê jî bi milekî xwe dispêre van. Me hewl da hinekî îfade bikin, lê dema ku plansaziyên rojane, heftane, mehane tên amadekirin, lazim e ya rojane jî bê dîtin û nirxandin. Pêwîst dike ku rojev li gorî xeteke wisa bê destgirtin û nirxandin. Heke xeteke wisa nebe, rêza pêşikan dernekeve ortê, em nebin xwedî paradîgmayekê, em dikarin serobino bibin. Dema ku em dibêjin rojane baş bê tespîtkirin, ya ku lazim e li herî dawî cih bigire, dikare were serî jî. Ya ku em ê herî kêm bikin rojev, em dikarin bixin destpêkê û wê bikin rojeva herî zêde. Wisa em dikarin çepeve bibin. Em dikarin xwe berevajî bikin. Dema ku berevajî dibe jî em çiqasî bixebitin jî ew ê hewldanên me encameke serketî nede, hedefa me pêk nayê, daxwazên me nayên cih. Ji bo ku em serketî bibin, girîng e ku em rast bixebitin, li ser xetê bixebitin. Lazim e em berevajî nebin. Ji nêrîna paradîgmayî qut nebin. Xeta weşanê, paradigmaya weşanê ye, pêrista nirxan e. Pêrista pêşikan e. Em ê di propaganda-ajîtasyonê de çi li gorî kîjan rêzê çiqasî bidin? Em ê di propaganda-ajîtasyona nivîskî de, di devkî, dîtbarî, bihîzbarî de di kîjan astê de kîjan mijaran li ser esasê pêşikiyek çawa binirxînin? Ha lazim e em van bizanin. Xeta weşanê van dide me.

Tevgerek wisa ya partiyê, bûyîna tevgera Rêbertiyê, bûyîna dengê şoreşa azadiyê, rastiya bûyîna me ya tevgerek wisa ya xetê derdixe ortê ku wekî baskê propaganda-ajîtasyonê yê tevgera xeta giştî, helbet xeteke me ya weşanê, xeta me ya propaganda-ajîtasyonê heye. Em ne wisa bê pîvan, bê rêgez in. Her tiştî danaqurtîne, qebûl nake. Her tiştî bi heman astê bi cih nake. Rêza yekemîn heye, duyemîn heye, sêyemîn heye, yê digire destpêkê heye, dawiyê heye. Mînak, yê dike manşet heye. Yê ku li rûpela dawî tê hiştin heye. Di hemû xebatên nivîskî, dîtbarî, bihîzbarî de em ê çi çawa bigirin dest, binîvîsînin, cîbicî bikin, baxivin, nîşan bidin? Ev hemû ji aliyê

xeta weşanê tê diyarkirin. Lazim e xebatên me nekeve rewşeke derveyî xetê.

Wek nimûne, heval temaşeyî televîzyonê dikin, radyoyê guhdar dikin, pirtûkê dixwînin, li kovaran mêze dikin, rojnameyan dinêrin; dema ku em dinêrin, dixwînin, lazim e nêrîneke me ya rexneyî hebe. Em rexne dikin û dibêjin rexnedayîn pêwîst e. Em ji hinan re rast, ji hinan re jî şaş dibêjin. Lazim e em karibin rexneyî lê mêze bikin. Baş e, em ê li gorî çi rexneyî nêz bibin? Ew ê xeta me ya rexneyê çi be? Ji bo ku em rexne bikin ew ê rastiyên me çi bin, şaşiyên me çi bin? Heke xeteke me ya wisa rexneyî tine be, em nikarin rexne bikin. Ha ya ku ew ê hêza rexnekirinê bide me, xeta me ya weşanê ye. Heke em li ser xeta xwe ya weşanê hakim bin, baş bizanin, wê demê em dikarin her weşana televîzyonê, her weşana rojname, radyoyê, her kovarê, her hejmara ku li ber xwe bi rehetî binirxînin ku çiqasî rast, çiqasî şaş, çiqasî bi xeta, çiqasî bi kêmasî, çiqasî serketî çêbûye, birehetî binirxînin. Em dikarin xeta û kêmasiyan rexne bikin. Rastiyên wê bibînin û bêjin, *"ev rast in serketin anîne."* An em tenê bi tîrajan nikarin binirxînin. Tîraj qistasek e. Guhdarîkirin, temaşekirin qistasek e, feqet pêkhatina pîvanek wisa jî girêdayî pêkanîna xeta weşanê ye. Niha xeta me ya weşanê, pêşika me ya weşanê li gorî hinên din nabe. Naşibe civakên din. Dikare bê gotin ku pêşikek wisa ji aliyê mirovên nizanim li kû deverê cîhanê ve esas nayê girtin, temaşe nakin, rast e. Lê em weşangeriyeke Kurdistanî dikin. Me perwerdekirina civaka Kurd daye pêşiyê. Em civaka Kurd ji gelên din qut nakin, nakin dijber, lê em tevger û rêxistineke wisa ne ku perwerdekirin, rêxistinkirina gelê Kurd wezîfeya xwe dibînin. Em xebateke wisa dimeşînin. Bi weşangeriyeke ku qet cewaziyê nake, pêşikan ava nake, hewl dide her kesî di heman astê de bi cih bike, nikare civak, mirovê Kurd bandor bike. Em nikarin bala Kurdan bikşînin, baweriyê bidin. Ji ber vê jî xeta me ya weşanê li gorî armanca me, xeta me ya îdeolojîk-polîtîk tê diyarkirin. Li gorî armancên me yên bernameyê tê diyarki-

rin. Bi serketina wezîfeyên demê yên ku me danîne pêşiya xwe, tê diyarkirin.

Em tevgereke şoreşgerî ne, rêxistî û bi plan dixebitin. Bername û armancên me hene. Wezîfeyên me yên demdirêjî hene, wezîfeyên me yên bi wadeya navîn hene, bi wadeya kurt hene. Xeta me ya weşanê wezîfeyên me yên demdirêj dide ber çavan, wezîfeyên me yên wadeya navîn li ber çavan digire. Serketina wezîfeyên me yên wadeya nêz esas digirin û li gorî wê teşe digirin. Lazim e wisa bibin. Di vî warî de ji ber em hereketa partî ne, girîng e ku em li gorî esasen partiyê bixebitin. An ew ê mirov nizanibin ka ew ê li gorî çi bixebitin. Çi were bîra wan, ji çi bandor bibin ew ê li gorî wê bixebitin. Ew ê xebateke rasthatî bimeşînin, ji armancê, pêşikê, rêzkirinê qut bibe, di encam de xwe serketî jî bihesibîne. Ji ber ku nizanin bê ew ê li gorî çi serketî bihesibînin. Çi kiribin ew ê jê re serketin bibêjin. Ji bo ku wisa nebe lazim e xebat li ser bingehê xetekê be, pêşikên xetê werin pêşbinîkirin û destgirtin. Ev dikarin berfirehtir bêne ravekirin. Li ser van mijaran mirov dikare zêdetir raweste. Bi taybet dema ku derbasî nav xebatê bû, xebat meşand, li ser detayan lazim e zêdetir bê rawestandin. Feqet bi wateya herî gelemperî dema ku diçe xebateke wisa, dema ku bi boneya serxistina xebatê amadekariyan dike, lazim e em bizanin ku em xwedî xeteke wisa ne, pêwîst e em li gorî esasen xetê xebatê bimeşînin.

### f-Têkoşîna Li Dijî Şerê Psîkolojîk

Di vê beşê de herî dawî em dikarin li ser têkoşîna li dijî şerê psîkolojîk rawestin. Şerê psîkolojîk, dibe baskê herî çalak, herî girîng ê şerê taybet. Ji bo şerê îro jî esas şerê taybet tê gotin. Esas ji bo şerê sîstema netew-dewletê ya hêzên desthilatdar û dewletparêz dimeşînin, şerê taybet dikare bê gotin. Teorîsyenên şer bi şiklên cur bi cur nîqaş dikin, dinirxînin. Wekî dîrokî pêşketina şer mîna şerê meydanê, şerê konvansiyonel,

şerê nukleerî, şerê fezayê, şerê behrê, şerê çiyê didin. Şerekî ku gel jî dimeşîne heye. Em ji vê re esas şerê gerîla dibêjin. Şerekî wisa ye ku gelên di bin zext û mêtingeriyê de ji bo azadiya xwe dimeşînin. Çima di bingehê şerê azadiyê de gerîla cih digire? Ji ber ku bi terzê gerîla gelên di bin zext, mêtingerî, zordestiyê de dikarin xwe perwerde bikin, rêxistin bikin, şerê dijminê xwe bikin û serbikevin. Baş e, terzê gerîla çi ye? Ev pir zêde tê pênasekirin. Tê gotin ku şerê zeîf li dijî hêzdar, biçûk li dijî mezin, kêm li dijî zêde, gêrik li dijî fîlê ye. Şerekî wisa qezenckirin çawa mimkun dibe? Li dijî hêzdar, ew ê zeîf çawa şer bike û serkeve? Ha lazim e taybetmendî, rêbaz, terzê qezenckirina vê zaferê mirov bibîne. Ji van giştî re gerîlatî tê gotin. Gerîlatî ji rêgezan pêk tê ku zeîf li dijî hêzdar, biçûk li dijî mezin serketinê bi dest tîne. Çi ne ev rêgez? Bingeh ew e ku tu yê li dijmin bidî û xwe biparêzî. Ji bo vê taktîka *"lê bide- bireve"* tê gotin. Vê esas digire.

Li milekî darbeyê li dijmin dide, li milê din jî xwe perwerde û rêxistin dike. Terzekî wisa yê şer e ku perwerde, rêxistinbûn û çalakî di zik hev de ne. Terzekî wisa yê jiyan û têkoşînê ye ku her tim li derveyî venêrîna dijmin e. Tu yê li dijî hêza mezin şer bike, ji bo ku tu karîbe şer bike, lazim e tu li derveyî kontrola wê be. Ango lazim e tu xwe derxîne derveyî serweriyê û xwe azad bike. Dema ku te ev kir, li ser vê bingehê tu dikare dijminê xwe bişopîne. Di kêliyek zeîf de û ji cihekî wê yê zeîf lê bide. Ha gerîla wisa dibe. Her tim derveyî kontrola dijmin e, dijminê xwe her tim dişopîne, di kêliya zeîf de ji cihê zeîf lê dide, xwe rizgar dike, ewlehiya xwe pêk tîne. Ji vî terzê têkoşînê re gerîlatî tê gotin. Ev di şer de dibe, di propagandayê de dibe, di siyasetê de dibe, di dîplomasiyê de dibe. Ev terzek e. Ji ber ku zêdetir li qada eskerî kifş bûye, ji hêla hêzên çekdar hatiye bikaranîn, wekî terzekî eskerî tê nirxandin. Esas terzek e. Rêber Apo got, *"terzê xweîfadekirina mirovê azad e."* Terzê gerîla, terzê jiyan û têkoşîna mirovê azad e. Niha terzê têkoşîna ku bindest pêş dixin, terzekî wisa yê gerîla ye.

Ha ji bo şerê ku sîstema modernîteya kapîtalîst, avaniya wê ya netew-dewletê li dijî gerîla dimeşîne jî *"Şerê Taybet"* tê gotin. Çawa ku gerîla pêşbînî dike ku li derveyî kontrola dijmin, xwe bispêre hêza xwe; erdnîgariyê û hêza gel bi kar bîne, parçe parçe, biçûk biçûk li dijmin bide, sîstemên serweriyê yên mêtinger-qirker têk bibe; ji bo terzê şer ê ku pelçiqandina berxwedaneke wisa ya gerîla dide ber xwe jî şerê taybet tê gotin. Şerê taybet bi hin milan ve ji şerên din cuda dibe. Şerên din di mabeyna hêzên şer de diqewime, mabeyna artêşan de diqewime. Di Serdema Berê de şerê meydanê, şerê Serdema Navîn tê zanîn. Du artêş, nîzanim çend sed hezar kes tên û li meydanekê beramber li hev didin. Kî wê kê têk bibe? Ha di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de artêşan bi tank, top, bi hemû hêza xwe ve bê kî dikare serkeve, li hev didin. Bê dîqetkirin her diçe ji şerekî wisa civak jî zirarê dibîne. Hêzên êrîşê yên ku civakan dipelçiqîne, qetil dikin derdikevin ortê. Lê, bûyereke ku gel û artêş şer dike û ji vê re şer tê gotin, tine ye. Artêş li dijî hev şer dikin. Şerê Taybet ew şer e ku hêzên eskerî, netew-dewlet li dijî gel dimeşînin. Şerê ku netew-dewlet li dijî şerê berxwedana gel a ku bi terzê gerîla xwe perwerde û rêxistin dike dimeşîne, şerê taybet e. Lewma jî şerê taybet şerekî li dijî gel e. Ne şerekî mabeyna artêşan e.

Rehendên şerê taybet, rehendên jiyana gel û civakê ne. Ji bo ku karibe di her rehendan de li dijî gel şer bike, di hemû rehandên çavkaniya hêza gel de êrîşkirina gel pêşbinî dike. Terzekî wisa ya şer e. Îlker Başbûg ê ku 2009'an li Tirkiyeyê hat girtin, Seroktiya Serkana Giştî ya Leşkerî kiriye, di bernameyekê de domahiya 2 saetan panoramayeke berfireh a şerê taybet ku TC'ê li Akademiya Herbê pêş xistiye, vegot. Rêgezên wê, rehendên wê danîbûn ortê. Esas AKP teoriya wî pêk tîne. Şerê taybet di sîstema TC de gihiştiye lûtkeyê. Encamên ji ezmûnên şerên ku hemû dewletan di 200 salên dawiyê de li dijî gelan meşandine, bi ezmûna şerê li dijî gelê Kurd kir yek û şerê taybet anî halekî herî rêxistî, herî pirmilî, herî berfireh.

TC ji serî heta binî ketiye halekî sîstema şerê taybet. Rehendê şerê taybet ewil qismî kêm bû. Dema êrîşên li dijî îsyanan, di pelçiqandina wan de qismeke wê bi kar anî, lê bi gerîla re hevrû nebibû. Piştî ku bi Pêngava Gerîla ya 15'ê Tebaxê re hevrû bû, di 1987'an de Rewşa Awarte îlan kir. Li Kurdistanê Parleşkeriya(kolordu) Taybet damezrand, herêma taybet hat îlankirin. Hêrêma Rewşa Awarte pêvajoyeke wisa da destpêkirin ku şerê taybet esas werbigre, li ser bingehê şerê taybet dewletê vesaz bike, vê pêş dibîne. Ev heta roja me bi kûrkirinê anî û li ser hemû TC'yê serwer bû. Îro sîstema TC bi temamî sîstemeke şerê taybet e ku li Kurdistanê li dijî şerê azadiyê hatiye teşekirin.

Ji ber ku esasê sîstema şerê taybet şerê li dijî gerîla ye: ji bo girtina masî ziwakirina avê lazim e. Li vir gerîla dibe masî, gel jî dibe av. Wê demê ji bo tinekirina gerîla ziwakirina avê lazim e. Jixwe *"ziwakirina çiravê"* tê gotin, ev jî îfadeya şerê li dijî gel e. Hedef dike ku gel nebe gerîla û destekê nede gerîla. Ne tenê qutkirina gel ji gerîla ye, şerekî bi hedefkirina gel e. Ji ber vê jî rehendê ekonomik a vî şerî heye, rehendên civakî-siyasî, dîplomatîk, hiqûqî, eskerî, îdeolojîk, psîkolojîk hene. Îlker Başbûg pênaseya şerekî 7 rehendan dikir. Di bin rêveberiya AKP'ê de rehendên şerê taybet heta dawiyê hatin rêxistinkirin û ji nû ve hatin avakirin.

Di demên agirbestê de tê gotin ku *"PKK'ê sûd ji agirbestê girt, amadekarî kir."* Ev hemû derew in. Bi xwe amadekarî kirin. Ji atmosfera agirbestê sûd wergirtin, rehedên şerê taybet yên boneyî civakê derxistin asta herî jor. Rehendên aborî, sosyal, kulturî, îdeolojîk, hiqûqî, siyasî, dîplomatîk hemû pêş xistin. Mirov bi xwe kirin amûr. Rêbertiyê got, *"bîo desthilatdarî ava kirin."* Lawaz dike, herî dawî bi pereyan dikire. Niha hemû tiştên ku dibêjin Tayîp Erdogan qaşo destekê ji gel digire, ev e. Hemû hatine kirîn. Hemû derfetên dewletê, nirxên welat, civakê desteser kirin, civak feqîr kirin, di bin zext, terorê de pelçiqand, dûvre hêdî hêdî belav kir û berê her kesî dide qetlîama

Kurdan û şerê Kurdan. Her kesî li dora xwe kom dike. Ji vê re *“bîo desthilatdarî”* tê gotin. Şêweyekî şerê taybet e. Yek ji rehendên herî bibandor ê sîstema şerê taybet jî şerê taybet ê psîkolojîk e. Şerê psîkolojîk şerekî li ser derew, dekûdolab, lîstokan e.

Organên şerê psîkolojîk jî medya ye. Ji bo bikaranîna çapemenî-weşanê rêxistinên îstîxbarî saz dikin, rêxistinên kontrgerîla ava dikin, navendên ewlehiyê çêdikin. Terzê şerê psîkolojîk ji aliyê wan tê diyarkirin û arastekirin. Şerê taybet bi xwe li ser esasê hîle û lîstokan, derewan e. Ya ku vê herî bibandor dide jî medya ye. Ji ber vê yekê AKP ewqasî girîngiyê dide çapemeniyê, yekdestdar dike. Ji ber vê yekê beriya her tiştî li ser çapemenî-weşanê ewqasî bandora xwe ava kir, yekdestdarî pêş xist. Beriya her tiştî şerê bidestxistina çapemeniyê meşand. Serweriyek girîng bi dest xist. Niha li hemberî me êrîşeke şerê taybet a psîkolojîk heye. Nûçegihanî yan jî rojnamegerî tine ye. Medya tine ye. Jê re medya dibejin, lê ev hemû derew in. Şerekî wisa ye ku bi temamî derew û hîleyan dike rojev, bûyer û diyardeyan berevajî dike, di civaka hedef de pêş dibîne ku moralê xerab bike, îradeyê bişkîne. Li ser civaka ku dixwaze serweriya xwe ava bike jî xebateke ku hestên nîjadperest, şoven, miletperest pêş dixîne dimeşîne. Li milekî di şerê îmha û qetlîamê de hewl dide spartekeke diyar a civakî ji bo xwe ava bike, li milê din jî gelê ku şerê gerîla, şerê gelê şoreşgerî dimeşîne bi hêza çors, zext, teror, êşkenceyê bipelçiqîne. Lê ev jî têrê nake, li milê din jî bi derew, hîle, lîstokan dixapîne û moralê xerab dike. Hêviya civakê dişkîne, îradeya wê zeîf dike. Baweriya wê tine dike. Hewl dide ku li cem wî gelî hêvî, wêrekî, hêza şerkirin û serketinê nehêle. Qasî ku vê bike, li holê berxwedaneke ku bi hêza çors bipelçiqîne namîne. Jixwe gelê li hember nema dikare bibandor têbikoşe. Beriya bikeve şer, berê xwe bide berxwedana gerîla, gelê qalkirî ji taqat dikeve, tê wî halî ku nema dikare têbikoşe. Wisa jî şer qezenc dike.

Carna em hemû mêze dikin, hêrs dibin û dibêjin, *“ma ewqasî jî nabe.”* Li ber çavan derewan dinîvîsînin. Qet ne li xema wî ye. Jixwe esasê şerê psîkolojîk ev e. Lîstokan pêş dixe. Cewherê şerê psîkolojîk ev e. Esasê şerê taybet dekûdolab in. Musteşarê Ewlehiya Dewletê çû serdana Rêbertiyê, qaşo çareserî nîqaş dikirin: piştre derket holê ku ew musteşar “Plana Çalakiya Çokşkandinê” amade dike. Mesela di 11’ê Îlona 2016’an de berxwedan hebû, ji bo ku berxwedanê pasîfîze bikin, bişkînin hevdîtin dikirin. Rêbertiyê hişyar kir.

Di 12’ê Çileyê de ji bo ku bi Leyla Guvenê greva birçîbûnê bidin berdan, roja Şemiyê hevdîtin bi Rêbertî re kirin. Têkildarî vê hevdîtinê ti qeyd tine ye. Eşkere dibe ku berê jî qeyd negirtine. Rêbertî dema ku digot *“em muzakereyê bikin, lazim e mase hebe”*, ango digot *“em qeyd bikin.”* Heke qeyd girtibûna niha nikarîbûn Îdrîs Balûken, Selahattîn Demîrtaş, Sirri Sureya Onder bixistana hepsê. Ev hemû Tayîp Erdogan bi xwe da kirin, lê nikarin îspat bikin, ji ber ku di dest de ti qeydên wan tine ye. Qeydê li pey xwe nahêlin. Roja Şemiyê birin, hayê ti kesî jê tine ye, bêqeyd hevdîtin kirin. Şeva Şemiyê digihîne Yekşemê saet 12’an parêzer ji bo girtîgehê, Leyla Guvenê şandin. Gotin, *“Li Îmraliyê hevdîtin çêbû, Rêbertiyê bangawazî kir ku grevên birçîbûnê bên qedandin.”* Hê roja Yekşemê neqediyabû, rastî nehatibûn fêmkirin, xwestin grevên birçîbûnê bidin şkandin. Armanc ew bû ku Leyla Guven dest ji greva birçîbûnê berde. Diyar bû ku rewşa Leyla Guvenê zorî li wan dikir. Bi Leyla Guvenê bidana berdan, her hal ew ê êrîşî girtiyên din bikirana. Rêveberiya me mudaxele kir, yên ku greva birçîbûnê bi rê ve dibin daxuyanî dan, ev lîstok şkest. Lîstoka şerê taybet ji ber ku li ser fêlbazî û derewan e, wextê ku tu eşkere dikî li xwediyê xwe dide. Heke serketî bibe, ew ê aliyê dijber bixapîne. Bêyî şer bike, şer bi ser dixîne, lê mîna ku meşa li ser lêva kêrê ye. Erê li xwediyê xwe da, faşîzma AKP-MHP ket plana dawî, darbe xwar. Li ser vê neçar man ku Leyla Guvenê berdin. Xwestin wê jî bikin parçeyekî şerê taybet. Di hevdîtina

12’ê Çileyê de nikarîbûn bixapînin û greva birçîbûnê bidin berdan, Ji bo bandora çalakiyê kêm bikin ji girtîgehê derxistin. Ji bo berxwedan pasîfîze bibin, bişkên ev di çarçoveya şerê taybet de kirin.

Şerê taybet şerekî wisa ye. Şerê Psîkolojîk jî şerekî wisa ye ku ev dekûdolab rast in, bêyî guhdarî ti pîvanên exlaq, hiqûqê bikin, mîna ku her cure derew rastî ne, bi israr didin pêş, bi şiklê bêhnçikandinê diçin ser civakê û wisa jî dixwazin civaka beramber nikaribe xwe rêxistin bike û bikeve nav şerê gerîla, beriya ku berê xwe bide şer di warê psîkolojîk de difetisîne, îradeya wê dişkîne, têk dibe, têk dişkîne. Ji vê re şerê psîkolojîk tê gotin. Rehendên şerê psîkolojîk ên êrîşên TC’ê zêde ne. Em wekî esas bi şerekî taybet re hevrû ne. Hem jî mîna ku min gotî, bi êrîşeke şerê taybet a ku hemû encamên şerê taybet ê giştî sîstemên netew-dewletên di dîrokê de kom kirine. Di sîstema TC de terz û taktîkên şerê taybet gihiştine lûtkeyê. Bi şiklekî wisa êrîş dikin. Yek ji rehendên herî girîng ê vî şerê taybet jî şerê psîkolojîk e. Şerê psîkolojîk jî medyayê bi şiklekî karîger bi kar tîne. Lewma jî ji bo gelekî ku li dijî şerê taybet, li dijî şerê psîkolojîk li ber xwe dide, qada herî girîng a têkoşîna şerkirinê propaganda-ajîtasyon e. Li dijî şerê psîkolojîk di têkoşînê de dibe pêşxistina propaganda û ajîtasyona şoreşgerî. Çapemenî-weşana şoreşgerî bi giştî dibe xerakirin, valaderxistina bandora şerê psîkolojîk, lîstok, dekûdolab, fêlbaziyên wê, lewma jî têkbirina şerê psîkolojîk.

*“Plana Çalakiya Çokşkandinê”* hatibû avakirin. Ez dibêjim qey versiyoneke wê ya nû heye. Ji ber vê jî cihê pênaseya şerê psîkolojîk çiqas e? Hêzên şerê me dikin gelo li çapemenî-weşanê ya ku em jê re medya dibêjin, mîna xebata çapemenî-weşanê pênase dikin, çawa mêze dikin? Kîjan wezîfe, rol, mîsyonê lê bar dikin? Bi rastî jî li ortê nûçegihaniyek heye, weşangeriyek heye an şerekî psîkolojîk e ku pir zêde hatiye plankirin, rêxistinkirin? Em dikarin vê bibînin. Bi navê *“Ji bo Yekeyên Pêwendîdar ên Midûriyeta Şaxa Stratejiya Serkana*

*Giştî”* belgeyek li ser destan bi şiklekî veşartî tê şandin. Dema yek-du bend têne xwendin, tê fêmkirin. Ji bo artêşê emir daye ku li gorî keyfa xwe lê bide. Ji bo polîsan jî ev emir dane. Ji bo esker û polîsan, çeteyên faşîst ên xwedî çek dibêjin, *“ma tu dixwazî bikevî nav darbestê, yan dixwazî derkevî pêşberî dozgeriyê.”* Ango dibêje ji ber ku te hin tişt kirin û derket pêşberî dozger, netirse, derketina pêşberî dozger ji ketina nav darbestê çêtir e. An tu yê bikevî darbestê. Wisa jî gefan dixwin. Dixwaze bibêje, *“dema tu derketî pêşberî dozger qet netirse. Ew ê dûvre hêdî hêdî nêzîkatî, helwestên ku te rizgar bikin pêş bikevin.”*

Wisa dibêje: *“Ew ê ji bo hemû personelî bê teblîxkirin û fêrkirin ku li hember her cure serdegirtin, sabotaj, tacîz û êrîşan teqez bi guleberanê bersiv bê dayîn. Hemû personel lazim e kêliyekê jî ji bîr nekin ku ew ê encama libata personelê ku ji ber tirsa derketina pêşberî dozger çeka xwe bi kar nayne giran be, ji ber vê sedemê em karin şehîdan bidin, bi vê libatê dikare bekaya dewlet-milet bixe xeteriyê, ew ê xayinên welat, terorîst û dijminê dewletê ji wan hêzê bigirin. Lazim e ji hêla hemû personelî bê qebûlkirin ku li şûna bi êrîşeke xayin bikevin nav darbestê, ew ê derketina pêşberî dozger bê tercîhkirin. Emîr wê ji bo personel bê teblîxkirin û lazim e neyê jibîrkirin ku dewleta me di pêvajoyeke zor re derbas dibe. Di mijara bikaranîna çekê de lazim e prosedurên yasayî neyên fikirandin. Divê neyê jibîrkirin ku seferbertî û rewşa awarte heye. Lazim e bê zanîn ku ew ê li mehkemeyên eskerî her cure vesazkirinên pêwîst bêne kirin.”* Ev xisûs têkildarî şer û çekê ne. Em li ser beşa têkildarî şerê psîkolojîk radiwestin. Rûdawên li Bakur hene, nêzîkatiyên boneyî Başûr hene, têkildarî Sûriyeyê, bakurrojhilatê Sûriyeyê tiştên ku divê bên kirin hene. Beşa herî dawî jî wisa ye; *“Di teyisandina harekatê de lazim e pûte pê were dayîn ku provakasyon û dezenformasyon bêne astengkirin, raya giştî bê agahdarkirin û moralê hêzên me yên ewlehiyê neyê xerabkirin.*

*Belavkirina agahî û dîmenan ew ê ji aliyê Ajansa Anadolûyê bê kirin. Heta pêwîst nekir, nûçegihanên rojname û ajansan lazim e li qadê nemînin. Ev wekî çawa ji bo silameta operasyonan lazim e, her wiha dema ku pêdivî pê hat dîtin, bi destûra ji fermandarên operasyonê pêwîst e bikevin qadê, dîmenên pêwîst bêne girtin û ev bêne weşandin. Li qadan lazim e bi taybet nûçegihanên Ajansa Anadolûyê û TRT'ê hebin, nûçe, dîmen bi dezgehên din ên çapemeniyê re bêne parvekirin, çapemeniya biyanî jî di bin venêrîn û kontrolê de bê girtin û neyên derbaskirin. Lazim e çapemenî bi taybet di jimara terorîstên kuştî de serbest bê berdan, berevajî jimarên rûtîn ew ê di mejiyê raya giştî de tevlîheviyê bafirîne. Bi vê zanebûnê ve lazim e bi taybet di vê mijarê de hesasbûnek hebe. Di bin berpirsiyariya personelên rêveber de ye ku lazim e pêşî li bihîstina kuştina sivîlan bê girtin, nûçe û dîmenên ku dikare hêzên me yên operasyonê di warê moral de hilweşîne neyên bikaranîn. Lazim e binavkirina harekatê, bikaranîna îfadeyên ku li herêmê rêxistina terore biçûk dixe û wekî moral têk dibe, ji hunerweriya rêveberiyên çapemeniyê re bê hiştin. Lazim e neyê jibîrkirin ku ling û sparteka herî girîng a operasyonê çapemenî ye."*

Her hal rastî hatin fêmkirin. Bê çapemeniya bêteref, çapemeniya azad, çapemeniya li ortê xizmeta çi dike, çi ye, me fêm kir. Derdikeve holê ku bê navenda şerê taybet ê qirker çapemeniyê çawa pênase dike, şerê îmha û qirkirinê li Kurdistanê esas xwe dispêre kê, bi çi tê meşandin. Lazim e em vê rastiyê wisa bibînin. Di rewşeke wisa de di têkoşînê de ku li dijî êrîşa şerê taybet-psîkolojîk tê meşandin, lazim e organên çapemenî-weşana şoreşger çawa bin? Propaganda û ajîtasyona şoreşgerî lazim e çawa û bi çi şiklî bê meşandin? Lazim e em vê bibînin. Bi gotina, *"astenga hiqûqa vir heye. Em wisa guncav dibînin"* nabe. Çapemenî-weşaneke ku xwedî li têkoşînê dernakeve, bi ser dijmin de naçe, şerê psîkolojîk naşopîne, ji bo valaderxistina derewa wê lê hûr nabe, ew ê serketî nebe, encamê negire. Jê wêdetir, heke rêxistî û baldar nebe, dikare bibe amûrê şerê

taybet jî. Halbûkî beriya hevdîtina 12'ê Çileyê bi 2 rojan, me civînên ku çapemenî jî tevlî bûn, li dar xistin, me nîqaş meşandin. Me hişyar kir ku lazim e her kes baldar be. Me got ew ê serî li fêlbaziyan bidin. Rojek neçû ew hevdîtin dan kirin. Çapemeniyê hema di cih de behsa hevdîtinê kir. Şev heta siharê me hewl da xwe bigihînin çapemeniyê, enceq me da sekinandin. Çapemeniya me bi gotina hevdîtin çêbû, hema hema dikira berxwedan bidana rawestandin.

Em şerê Cizîr, Sûrê yê 2015-16'an bigirin dest. Di warê eskerî de rewşa me pir baş bû, dijmin derbeyeke pir giran xwar. Yê me jî windahî hebûn, lê şer e, me ew bedel dabû ber çav. Yê ku hildiweşiya, têk diçû dijmin bû. Wisa di carekê de li Cizîrê ew şewitandin xistin rojevê. Me wekî rêveberî di demeke wisa de hewl dida teqwiyeya hêzê bikin. Dema ku em li dorpêçê rast hatin û hêz teqwiye nebû em ketin nav lêgerîneke wisa *"em dikarin çareseriyeke çawa bibînin."* Wextê em di nav vê lêgerînê de bûn, di carekê de çapemenî ket dewrê, HDP'î bûn nûçegihan. Gotin, *"dişkê, tê şewitandin, êrîş heye, dewlet ewqasî hêzdar e"* û hwd. Me jî nikarîbû dest lê werdin. Heke 2 kes derketibana û bigotana *"tiştekî wisa tine ye, berxwedan heye"* û di weşana zindî ya televîzyonê de pêşiya gotina *"li Cizîrê agir berdidin me"* bihatana girtin, çapemeniya AKP'ê qasî ku dixwaze bila propaganda bikira, ew ê zemîna me bandor nebûya. Ti kesên ji me temaşeyî wan nakin. Lê ev bi Medya TV dan kirin. Televîzyona me bi kar anîn. Ha şerê psîkolojîk ev e. Herî dawî di şerê têkçûyî de pozisyona xwe guhertin. Ji Sendroma Nisêbînê xilas bûn. Hema hema dikirana em bixistina nav Sendroma Cizîrê. Tevgera ku ewqasî li ber xwe dide, berxwedana herî mezin a dîrokê nîşan dide, li şûna ku bi berxwedanê geş bibe, bi coş û moraleke mezin rabe ser piyan, ber bi şînê ve birin. Me nikarîbû ev asteng bikirana. Berpirs rêveberî ye, em nikarin ji vê re tiştekî bibêjin. Faşîzma AKP-MHP"ê tenê çapemeniya xwe bi kar nanî, çapemeniya me jî bi

kar anî. Nêzîkatiyên ku şerê psîkolojîk fêm nakin, bûn amûrên wê. Qaşo teşhîr dikirin.

Lazim e ev bê fêmkirin: şerê psîkolojîk, şerê taybet xwe dispêrên derew û hîleyan. Tê gotin ku şerekî mîna meşa li ser lêva kêrê ye. Heke tu pir baldar be, xetayan neke, tu dikarî li dijminê xwe bidî. Lê heke tu xetayekî pir biçûk jî bikî, tu yê derbeyê bixwî. Şerê psîkolojîk şerekî wisa ye. Teşhîrkirina dijmin jî ji bo çapemeniyê lazim e. Ji bo şkandina şerê psîkolojîk teşhîr gerek e, lê di bin navê teşhîrê de mîna li Cizîrê bêjî *"hêzek mezin a dijmin heye, dişewitîne-hildiweşîne",* tu yê gel bi asteke pasîfîzekirinê, çewisandinê bibe, tu nikare êrîşa faşîst-qirker teşhîr bike. Tu yê gelê Kurd bixe nav pasîfîkasyonê, psîkolojiyê xerab bike, moral bişkîne, jixwe ya pêk hat jî ew bû. Qaşo me yê êrîşa faşîst-qirker teşhîr bikirana, me yê rûyê wan ê qetlîamkar kifş bikirana, me yê li hemberî wê bertek ava bikirana, lê me nikarîbû baş eyar bikirana, rast bimeşandana. Di encam de me şîn danî. Şerê psîkolojîk di civaka Kurd de şkestin çêkir, moral xera kir. Êrîşa pasîfîkasyonê di çarçoveya şerê psîkolojîk-taybet de hate meşandin, bi pêş ket. Piştre jî li beramberî ewqas tengbûnê, lawazbûnê, têkoşînê xisûsên mîna bêhêvîtî, pênebawerî gav bi gav pêş ketin.

Wê demê lazim e ti kes çapemeniyê mîna derveyî têkoşînê, şer, bêalî pênase neke. Ti rastiya çapemenî-weşaneke wisa tine ye. Azadiya çapemeniyê ne ev e. Çapemenî-weşan di roja me de ne hêza sêyemîn an jî çaremin e, di şer de hêza yekemîn e. Lewma jî hêza yekem a şerê taybet a faşîst-qirker jî medya ye. Yekemîn hêza şerê gelê şoreşgerî jî medya ye. Ji ber vê yekê, hêza têkoşînê, hêza şer a yekemîn a Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî ya ku me di 1'ê Hezîrana 2010'an de îlan kir, çapemenî-weşana şoreşgerî ye. Gelo çapemenî-weşanê ev wezîfe li xwe girtiye? Xwe li gorî meşandina vî şerî bi plan kiriye, rêxistin kiriye, bi mewzî kiriye? Li gorî vê pratîk dibe? Xwe wekî hêza yekemîn a vî şerî dibîne? Wê demê çawa li dijminê xwe dixe? Civakê çawa perwerde dike? Kîjan serketinan bi dest tîne?

Propaganda-ajîtasyon hedef dike ku agahiyan bide, moral bide, hêzê bide, dijminê xwe jî lawaz bike. Ji bo bê gotin, ji bo cudahiyek bibe, ji bo xwe biwestîne xebateke wisa nayê kirin. Armanca xebatê dijminê xwe lawazkirin, xwe xurtkirine. Ev jî kifşkirina milên lawaz ên dijmin, eşkerekirina milên neheq, neyênî, bêhiqûq, bêexlaq; li gel vê rastiyên xwe îfadekirin, propagandakirina heq-hiqûqa xwe, avakirina baweriyê dihewîne. Di şertê şerê taybet de ev rewş pirsgirêkê tîne. Wisa dûz nabe, eger di wê demê de şerê taybet ketibe rojevê, xwe xurtkirin û dijminê xwe lawazkirin mîna şertên normal bi nêzîkatiyeke dûz nabe. Pirsgirêk hinekî ji vir derdikeve.

Di nav şert û mercên şerê taybet de propaganda û ajîtasyon zêdetir ziravî, dîqet û cidiyetê dixwaze. Mesala tu bikaribî dijmin pir lawaz, xwe jî pir xurt nîşan bidî, wê demê mîna ku xurtek êrîşî lawazekî dike xuya dibe, tu xwe dixe pozîsyoneke pir neheq. Lê tu xwe lawaz, dijminê xwe xurt nîşan bidî, bi şiklê *"dişewitîne, hildiweşîne, bêhiqûq e, bê exlaq e"* bixwazî neheqî, bêexlaqî, êrîşkariyê vebêjî, tu dikarî hêza wî zêde bikî. Naxwe wê demê ew pir xurt, tu jî pir lawaz e. Şer e, dixwaze xwe xurt bike. Wisa jî tu wî xurt dike. Vê carê tu yê dijminê xwe xurt bikî, xwe jî lawaz bikî. Ev jî tê maneya hêzeke zeîfketî, moralê wê xerabûyî. Hêzeke wisa nikare têbikoşe û ji vê rewşê dijmin qezenc dike. Tu yê xebata propaganda û ajîtasyonê bikî, xebateke ku te xurt dike, dijmin zeîf dike bimeşîne.

Gelo ev ê çawa bibe? Hem tu yê hêza xwe deyne holê, moralê bide hem jî dijmin teşhîr bike. Dema ku neheqî, bêhiqûqiyên dijmin tên vegotin, lazim e eyarekî baş bê dayîn. Dema ku neyêniyên dijmin teşhîr dike, tu dikare hêza xwe nîşan bide. Tu dikare hêzeke zêde jî nediyê. Wê demê di armancê de li eniya xwe tu yê bêbaweriyekê wisa ava bike ku wê bê gotin ev dijmin xurt e, em nikarin pê. Wextê tu dibêjî ez ê dijmin teşhîr bikim, tu dikare dijmin xurt nîşan bide. Ji bo eniya xwe jî tu yê bêjî di rewşeke pir zoriyê de ye, nikare tiştekî bike. Wê demê eniya te nikare şer bike. Ew jî tê wê maneyê ku

dijmin serdestî bi dest xistiye. Halbûkî armanca propagandayê xwe raserkirin, dijmin jî paşxistine. Ha dema ku tu baş eyar neke, tersê wê dikare derkeve ortê. Baş e, ma tu yê dijmin teşhîr neke? Ewqasî dişewitîne, hildiweşîne, qetlîaman dike, helbet lazim e bê teşhîrkirin. Tu teşhîr bike ku karibe wî zeîf bike, lê tu yê eyara wê, uslûba wê di wê astê de bigire ku ya tu dikî wê bibe teşhîr, ne pesindayîna dijmin. Dema ku tu xwe vedibêje jî tu yê di wê astê de vebêje ku ne mîna her tişt pir xweşik, gul û gulîstan e. Wê demê yê dijber tine bûye, hingê ti kes pêwistiyê bi têkoşînê nabîne. Te propaganda dikir ku mirovan bikşîne têkoşînê, wê demê tu nikare bikşîne têkoşînê, jixwe têkoşîn dimeşe. Her kes bi serketî ji halê xwe memnûn dibe. Naxwe ev rewşeke hesas e, lazim e pir were dîqetkirin.

Li Cizîrê, me got em teşhîr bikin, li şûna wê feraset, nêrîn, hewayeke ku dijmin pir xurt e, dikare her tiştî bike, bi vî dijminî re şer nabe derketin holê. Hikûmeta AKP'ê jî ji vê moralekî mezin girt, got *"binêre em zaferê qezenc dikin, jixwe em ê tine bikin."* Vê di nava civakê de bêhêvîbûn, bêbawerî derxist ortê. Halbûkî yên hatî gotin teşhîr bû, ne şaş bûn. Tiştên ku nehatî kirin nehatin gotin, tiştên pêkhatî hatin gotin, hewla teşhîrkirinê hate dayîn. Hate xwestin ku rûyê hov ê dijmin kifş bibe, lê heke tu eyara rast nediyê, dozaja wê eyar neke, ha digel tu bêjî ez ê teşhîr bikim, berevajî tu yê xurt bikî. Tu yê nekî, tu yê bizanî. Naxwe ev kar zêdetir hestiyarî, baldarî û hişmendiyê divê.

Di nav şert û mercên şerê taybet de siyaset jî propaganda û ajîtasyon jî bi rastî zor tên kirin. Zorîtî ji vir tê; tu yê pir kûr bibe, pir dîqet bike, pir baş eyar bike, ne di bin navê teşhîrkirinê de tu yê dijminê xwe pirole bike, ne jî bi navê ez ê pesnê xwe bidim, mirovan bêtêkoşîn bihêle, tu yê eyareke baş bide vê. Enceq wê demê tu dikare serketî bibe, wisa bike dikare serketinê bi dest bîne.

Mesela ji bo li ba dijmin tirsê bafirîne, sawê çêdike, dişewitîne, hildiweşîne, heger li ser xeteke zirav tu teşhîr bike,

zalimtiyê derxîne holê û karibe di nav civakê de bertekê çêbike, wê demê ew ê hilweşe. Bi tiştekî wisa sawnak, tirsê dafirîne, bixwazî dijmin bişkîne, qezenc bike, dikare ji beramber bi bertekek mezin hevrû bibe. Ew eyar baş nedayê. Esas şerekî wisa ye ku di her warî de dîqetê lazim dike. Heke tu karibe di şerê taybet de baş eyar bike, baş bimeşîne, tu yê karibe serketinên rehet jî bi dest bîne. Lê heke tu uslûb, dozajê baş eyar neke, tu dikare pir rehetî winda bike. Jixwe wisa jî bû, wisa dibe. Ji ber vê jî ne propagandayeke normal e. Em di wan şert û mercan de naxebitin.

Em di sala 2019'an de ne. Ji 1'ê Hezîrana 2010'an ve me dest bi Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî kiriye. Em dikin 9 salan temam bikin. Em bilançoya van salan derxînin. Em rexnerexnegiriya wê, pêvajoyên bihurî binirxînin. Di şerekî wisa de dijmin dibêje, *"hêza esasî çapemenî ye."* Hêza esasî ya şerê şoreşgerî jî çapemenî ye. Wê demê lazim e xebatên me yên çapemenî-weşanê xwe wekî hêza yekemîn a şer bibîne, li gorî wê xwe birêxistin bike. Çapemeniya me xwe di nava şer de jî nabîne. Yên di çapemeniyê de ne, xwe di nava şer de nabînin, bêalî dibînin. Xwedî li nirxên şer, xwedî li şer dernakevin. Em li çapemeniya TC binêrin, dibêjin *"me li wir lê da, em dişkînin."* Çapemeniya me bêalî ye. Medya Haberê jî vekin bêalî ye, li cihekî mabeyna dewlet û PKK'ê ye. Xwedî li berxwedana gel jî dernakeve. Bi hesabê ew ê bibêjin *"terorîst"* hema hema ew ê li grevên birçîbûnê jî xwedî dernekeve. Kî ye bêje terorîst, qaşo Ewrûpa dibêje terorîst. Dibêje bila bêje, ma qey em ji bo Ewrûpayê hene, ma Ewrûpa xeta me diyar dike!? Ji bo ku Ewrûpa me qebûl bike, ma em nikarin ji xeta xwe derkevin. Em ê dîqet bikin, hestiyar bin, lê ya din heger tê asta çepandina xetê, bila bê girtin baştir e. Heke tiştên wisa neyê bihîstin, em ê gerîlatiyê bikin. Ji 80'ê heta 90'î me wisa gerîlatî jî kir, li cîhanê hayê kesî jî jê tine bû, lê di 90'î de li Kurdistanê şoreşa vejînê pêk hat. Seranser serhildan çêbûn, gerîla serket, em ê dîsa serkevin.

Di vî warî de lazim e bê zanîn baskê yekemîn ê şerê îmha û tasfiyeya ku şerê taybet ê TC dimeşîne çapemenî-weşan e. Lewma li dijî vê lazim e têkoşîn jî bi serketî bê meşandin, li ser vî bingehî baskê yekemîn ê Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî propaganda û ajîtasyona şoreşgerî ye, hêza yekemîn xebatên çapemenî-weşana şoreşgerî ye, têkoşîna demokratîk siyasî esas têkoşîneke propagandayê ye, şerê gerîla jî bi propagandayê tê qezenckirin.

Dema ku em ketin pêvajoyeke wisa ya şer, HPG, YJA-Starê mêze kir, dîtin ku nabe, bi sedan kamera stendin. Ji her tîmek 4 kesan yekî perwerdeya kameravaniyê dît, kamera dan destê her kesî. Gotin, *"Heke hûn kar dikin tomar jî bikin, em propaganda bikin. Çalakiya ku bi propagandayê re nabe yek, hebûn û nebûna wê nediyar e"*. Tu bi sedan dijminî jî bikuje vedişêre, nayê bihîstin, lê qasî propagandakirina te qîmetê karê te jî çêdibe. Wê demê propaganda di destpêka şer de tê. Şiklekî esas a ku ew ê bi Şerê Gelê Şoreşgerî ve bide qezenckirin, şer veguherandina propagandayê ye, serhildan veguherandina propagandayê ye. Ha niha lazim e wisa bê bidestgirtin.

Ev demek e em nîqaş dikin û me ev dît: Qada îdeolojîk xwe ne di nava têkoşînê de, xwe li derveyî pratîkê dibîne. Her kesên li qada îdeolojîk dibêjin *"em ê biçin pratîkê".* Hevalên li çapemeniyê xwe di nav şer de nabînin. Yên ku dixwazin têbikoşin dibêjin, *"em dixwazin biçin şer."* Çapemenî, hêza yekemîn a şer e, hayê xwe jî ji vê tine ye. Şerekî wisa nameşînin. Heke em xwedî vê ferasetê bin, em nikarin serbixînin. Ji ber ku esasen têkoşîna şoreşgerî ya ku lazim e em bimeşînin çi ne, esasen êrîşa li dijî me çi ye, ew ê çawa bê valaderxistin? Wezîfe û berpirsiyariya rast a vê demê çi ye? Ev nayên zanîn. Raman, nêrînên ku di vê mijarê de derdikevin ortê hem jî ji aliyê hevalên herî zana nayên qebûlkirin, xwedîlêderketin û xebat wisa nayê meşandin.

Em wisa tevbigerin nikarin zaferê bînin. Digel ku em dikarin bi hêsanî li hedefê bidin, em lê nadin. Em xebata ku ew ê

dijmin têk bibe nakin. Em ê çi bikin? Rêbertiyê got, *“ez dibêjim xeta întixarê, Abbas dibêje lehengtî.”* Hevalên me vê lehengtî dihesibînin. Wisa dihesibînin ku wezîfe û têkoşîn tenê wisa tê meşandin. Ev di salên 1980’yan de wisa bû, lê piştî 90’î guherî. Pîvanên xebata salên 80’yî li ser me wisa hakim bûye ku tiştên ku li ser navê guhertin-veguhertinê em dibêjin hemû li valatiyê dimînin, derbasî pratîkê nabin. Guhertin-veguhertin nabe. Hê jî em nikarin bibêjin ku guhertin-veguhertineke cidî çêbûye, gerîla li gorî pêwîstiyên Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî hatiye rêxistinkirin. Di demên dawî de me li gel Biryargeha Navendî nîqaşên wisa kirin. Heval dibêjin, *“me fêm kir, em ê li ser bisekinin.”* Lê çiqasî hatiye fêmkirin, li gorî gerekên pêvajoyê çiqasî guhertin-veguhertin heye, wekî tevger bi giştî em ê çiqasî biguherin, ev mijara nîqaşê ye. Ji ber ku dema em vê dibêjin wekî dijmin tenê artêşê dibîne, wekî çalakî lêdana eskeran dibîne. Rewşeke ku di hedefê de teng, di zemînê de teng, li wir kilîtbûyî heye. Ya ku wekî şer tê gihandin ew e ku şerê eskeran bike, biçe li ber qereqolekê li xwe bide. Heke em nikaribin vê rewşê biguherin-veguherin, em nikarin bêjin guhertin-veguhertin çêbûye. Em nikarin bêjin ku me li gor gerekên guhertina paradîgmayê xwe perwerde kir, ava kir, plan kir, li ser bingehê plansaziyê em têdikoşin. Ya rast ew e ku a kevn didome. Tenê wekî çendanî diguhere, hejmar tê kêmkirin, çawanî û terz eynî ye. Karê tê kirin eynî ye, tenê çendaniyên dikin diguhere. Ev jî ne guhertine.

Gelo em şerê propagandayê wekî şerê yekemîn dibînin? Rêxistina me ya propagandayê xwe wekî hêza yekemîn a Şerê Gelê Şoreşgerî dibîne? Li gorî vê xwe plan dike? Li ser vî bingehî têkoşînê dimeşîne? Ji bo têkbirina şerê psîkolojîk ê dijmin, ji bo moral bide civakê û rake ser piyan, propaganda-ajîtasyona pêwîst tê meşandin? Tine ye. Di 24’ê Tîrmeha 2015’an de dema ku êrîşa dijmin dest pê kir, ya ku diviyabû li Bakurê Kurdistanê bibe, serhildan bû. Pêşengiyek baş a propaganda-ajîtasyonê dikarîbû serhildaneke wisa bi rehetî pêş

bixistana. Ya ku lazim dibû di Îlona 2016'an de pêk were ev bû. Ya di Cotmeha 2017'an de bibe, ev bû. Niha parçe parçe jî be, hinekî lawaz be jî em hewl didin bikevin nuqteyeke wisa.

Daxuyaniyên Leyla Guven hene, bila heval baş guhdar bikin, hewl dide pêvajoyê baş bixwîne. Gotina wê hat vir; *"jiyana min a 20 salan heram bû. Lazim dibû ku beriya 20 salan min ev bikiribana."* Beriya 20 salan lazim dibû ku ti kesî komplo qebûl nekiribana û ji bo têkbirina komployê çi pêwîst bûna bikiribana. Hevaltiya nebes, ew şoreşgertî ye ku nikare vê bike. Me li 20 salan belav kir, lê hê jî di hilweşandinê de em dudil in. Gelo em bikevin têkoşîna hilweşandinê an nekevinê, em vê nabînin. Li şûna wê herî zêde em têkoşînên ku xwe ji bo mirinê datîne tercîh dikin. Em ewqas in. Wisa nabe. Ev seknên şaş, nebes, bi kêmasî ne. Ji ber vê kêmasiyê, ewqas derfet û firsend li ser xeta zaferê têrkerî nayê nirxandin. Ji ber vê jî berxwedana topyekun nagihêje aktîvîteyeke hilweşandina faşîzmê. Em nikarin civakê sewqî serhildanê, berxwedanê, têkoşînê bikin. Di wê astê de em nikarin propaganda-ajîtasyoneke wisa bikin. Em nikarin perwerde bikin, ajîte bikin. Di şoreşeke wisa de ku hema hema 40 caran me zafer bi dest xistine, wekî psîkolojîk em ê têk biçin.

Rêveberiya KCK'ê tespîtek wisa kir, *"di warê îdeolojîk de serwerî ketiye destê dijmin."* Heke ev rast be û ew ê kûr bibe, ev tê maneya têkçûna me. Em nikarin vê wisa qebûl bikin. Li Başûr ev pêşketin hene, li Rojava şoreş çêbûye, li Bakur ji 90'î ve Şoreşa Vejîna Neteweyî 29 sal in dewam dike. Rojhilat di kêliya teng de radibe ser piyan. Faşîzm dike hilweşe, bi xwe dibêjin, *"em ketine seferbertiyê, em ê hilweşin."* Di rewşeke wisa de em jî ji xwe re dibêjin *"em têk diçin."* Ev pêwendiyeke vê ya xurt bi propaganda-ajîtasyonê re heye. Wê demê di sekna îdeolojîk de, xebata propaganda-ajîtasyonê de naxwe lawaziyên me hene, nebesiyên me hene. Lazim e em teqez vê lawazî û nebesiyê bişkînin û derbas bikin. Ev kar wisa li gor xwe nabe. Lazim e em li gorî gerekên şer bin, ji ber vê jî lazim e

em şer baş û rast fêm bikin. Lazim e em wezîfeyên têkoşîna ku ew ê dijmin têk bibe, bizanin û li gorî pêwîstiyên wê xwe rêxistin bikin, plan bikin û sewqî têkoşînê bikin. Ma armanca me ne serketin e? Armancek me ya din heye? Na, tine ye. Ti kes neketiye pey ti armancên din, her kes ji bo zaferê dişewite. Wê demê lazim e em rê, rêbazê zaferê rast bibînin û bizanin. Pêwîst e em bi çar lepan wê bigirin, bi terz, taktîkên afirîner, bi uslûbekî dide qezenckirin em têbikoşin û teqez serketinê bizanin.

Me diyar kir bê dijmin di Plana xwe ya Çalakiya Çokşkandinê de çi rolê dide şerê psîkolojîk, çapemenî-weşanê. Naxwe li holê pir zêde çapemenî tine ye. Şerek heye. Lazim e wisa bê dîtin. Çapemenî, propagandayeke ku wisa bê têkoşîn, sekneke ku bêalî, li ortê dimîne, tine ye. Rastiyeke wisa tine ye. Tê gotin ku em ê li gorî rêzikên hiqûqa gerdûnî bin, em alîgirê aştî û edaletê ne. Ti rastiyên van tine ye. Li vê cîhanê muqabeleyî vê tine ye. Têkoşîn heye, şer heye. Sîstema desthilatdar-dewletparêz li ser vî bingehî saz bûye. Modernîteya kapîtalîst ev gihandiye asta qirkirinê, dimeşîne. Yên ku van rastiyan dibîne, li gorî vê nabin xwedî helwest, ew ê şipya bimînin. PKK'ê jî ji destpêkê ve li ser vî bingehî derketin kir. Ev, helwest û ferasetên bêalî yên ji bo her kesî derbasdar in, xeta burjûva ye. PKK'ê ew wekî xeta miletperest reformîst pênase kir. Têkoşîna herî mezin a îdeolojîk li dijî vê xetê meşand. Xwe esas wekî qutbûna ji vê xetê nirxand, pênase kir. Xeta xwe ya îdeolojîk jî li ser bingehê qutbûna ji vir ava kir. Xeta xwe ya siyasî-eskerî li gorî vê pêş xist. Çalakiya 40 salan jî li ser vî bingehî meşand. Niha li dora PKK'ê pir zêde zihniyetê burjûvaya biçûk heye. Ji her milî ve li ser PKK'ê ferz dikin. Rast e, dihizirin ku ferasetên PKK'ê ew feraset in, wisa tê gotin. Heta hewl didin bikin malê Rêbertiyê jî. Heke Rêbertiyê nikarîbûya parazname binivîsandana, îhtîmaleke mezin hinekên ku ew ê hewl bidana bigotana fikrên Rêbertiyê ne derketibana. Feqet Rêbertiyê pêşî li hemûyan girt, mehkûm kir. Sîstema modernîteya kapîtalîst û

di şexsê wê de sîstema desthilatdar dewletparêz, lîberalîzm, hezar cure rûyê wê, zanistperestiyê, olperestiyê, cinsiyetperestiyê, desthilatdariyê rexne kir, mehkûm kir, darizand. Rastiya civaka demokratîk derxist pêş, danî holê û ji bo ev pêk were jî pêşbîniya têkoşîneke pir mezin kir.

Li ser bingehê van hemûyan, me şaşiyek çawa kir? Binêrin parazname hatine nivîsandin, dinirxîne, rexne dike, mehkûm dike. Rêbertî dibêje *"rastî ev in"*, dema ku em dixwînin, em dibêjin ha temam bû. Tu dibêjî qey, Rêbertiyê nivîsî, rastî pêk hatin, net bûn, her kes ew ê qebûl bike, êdî têkoşîn, her tişt qediya. Em ketin nav têgihandineke wisa. Di hundirê me de meyla burjûvaya biçûk li ser vî bingehî derket holê. Pir jî bibandor bû. Feqet şerê deh salên dawî nîşan da ku rastî ne wisa ye. Helwest, êrîşên zihniyet û siyaseta faşîst-qirker ji nû ve rastî nîşanî me dan. Her hal lazim e êdî em ji wê xewa xefletê şiyar bibin. Rêber Apo gotibû, *"xeflet ji îxanetê xetertir e."* Lazim e wekî xefletek burjûvaya biçûk bê dîtin, bê nirxandin ku ti tişt bê têkoşîn, bê berxwedan, bê bedel nabe. Bêyî şer nayê qezenckirin. Dema ku xeta şer pêş xist jî di destpêka 80'yan de jî wisa bû. Dema ku *"Li Kurdistanê Rola Zorê"* tê xwendin jî yên ku dihesibînin ew ê bêyî pratîk, bêyî lêdanê encam bê girtin, wextê bi şîdet, sawa şer re hevrû bûn, reviyan. Yên ku rast fêm kirin jî şer kirin. Nêzîkatiya burjûvaya biçûk şaş e, lazim e em fêm bikin. Wê demê her tişt bi têkoşîna mezin dibe, ew ê bibe. Me ev rastî dît, fêm kir. Ji ber vê dibêjin. Wê demê hemû xebatên rêxistinbûnên şoreşgerî, rêxistinbûneke mezin a şer û têkoşînê ye. Xebatên hunerê, xebatên wêjeyê, xebatên çandê û xebatên çapemeniyê jî wisa ne. Xebata jinê jî wisa ye, xebatên meclîsê jî wisa ye. Ev ne ji bo oportunîzm û pasîfîzmê, hemû jî ji bo têkoşînê ne.

Ti tiştek wer ji ber xwe pêk nayê. Wekî teorîk nivîsandina hin tiştan nayê wê wateyê ku di pratîkê de pêk hatiye. Tenê ji bo ronîkirinê ye ku bê em ê di pratîkê de çi bikin. Em dîqet bikin, dijmin ji berê zêdetir êrîş dike. Min çend xalên "Plana

Çalakiya Çokşkandinê” xwend, heval dibêjin, *“me ji çapemeniyê re şand, nekirin nûçe jî.”* Hê her hal lêkolîn dikin. Naxwe wisa agahiyan kom dikin, li ser vî bingehî raveyek berfireh dikarin bikin. Yên ku min herî dawî xwendin jî şiklê wê yê nûjen e. AKP-MHP seferberiyekê dimeşînin. Şerê psîkolojîk, şerê taybet di asta herî jor de didomînin. Eger Gerîlla TV nebûna, HPG û YJA-Starê nikarîbûn hebûna xwe jî ispat bikirana. Jixwe hêviya wan ev bû. Taktîkên mîna tomarkirina dîmenên çalakiyan, dema ku çapemeniya li Ewrûpayê neweşand, wekî Gerîlla TV weşandin, bi hostatî bûn. Şerê psîkolojîk deşifre kir û xera kir. Hesab û hêviya wan wisa bû. Wisa nebûya ew ê bigotana, *“me lê da, şkand, tine kir”.* Heke li ser vî esasî nehatibana deşifrekirin, gerîla lê bidana ew ê çi bibûya, nizanim deh leşker mirine, bîst lib mirine, ji bo wan çi girîngiya wê heye. Jixwe hemû eskerên bi pereyan e, cenazeyên wan vedişêrin. Ew ê di hemû organên çapemenî-weşanê de bêjin *“tiştekî wisa tine ye”* û bigotana *“min gerîla qedand.”* Gerîlla TV ev lîstok xera kir. Ji ber vê jî hê dibêjin *“em di zoriyê de ne.”* Heke gerîla biqediya ew ê hêza berxwedana gelê Kurd jî nemabûna. Heke gerîla têk çûbûna û qediyabûna, ew ê bi çi xwe bispartana çi, bi çi têbikoşiyana? Ew ê ji kû moral, hêz, cesaret bigirtana? Gerîla nebûna, hêza fedaî pêşeng a li dijmin dide nebûna, gel ê çawa tevde bibûna, têkoşîna azadiyê bimeşandana, daxwaza azadiyê bikirana? Ev hemû bi sekin û têkoşîna fedaî ya gerîla ve dibe. Li ser bingehê pêşengtiya gerîla dibe, em van baş dizanin. Gerîla xwe bi wê televîzyonê rizgar kir. Şerê psîkolojîk, giştî şerê taybet wê vala dexist, bi rêbazên cudatir, me dikarîbû bêtir vala derxînin. Me rave kir, dema ku kêmekî valatî dît çi anî serê berxwedanên xweseriya demokratîk. Heke em baldar bûna, wisa nedibû.

Li qada eskerî jî heke em hedefan zêdetir berfireh bikin, em karibin taktîka gerîla ya ji cihê herî zeîf di dema herî zeîf de li dijmin dide bi pisporî bi kar baniyana, me dikarîbû faşîzma AKP-MHP’ê têk bibirana. Ez dikarim vê net bibêjim. Ya ku wekî

eskerî hatine kirin jî nebes bûn. Guhertin-veguhertin têrker nehatin kirin. Em ji cihê zeîf lê nadin, em hewl didin ji cihê xurt li dijmin bidin. Tu diçe ser hêza ku xwe amade kiriye, xwe gurçûpêç kiriye, tu lê bide jî herî kêm tu carekê jî dixwe, jê wirdetir, teknîka wî xurttir e, tu bi 3'yan, 5'an dixwe. Halbûkî tu biçe cihê wî yê lawaz, her tu yê lê bide. Gerîlayê ku li dijîmin dide wisa ye, xwe diparêze. Gerîla bi xwe naxwe. Tu nikare bibêje *"teknîka dijmin xurt e ji ber wê wisa dibe".* Jixwe dema ku dijmin xurt e, gerîla derdikeve. Di şertên wekhev de gerîlatî nayê kirin. Hêzên eskerî, heke hevsengiya hêzê hebe, şerê gerîla nakin. Li cihê ku yek pir xurt e, yê din lawaz e, ji terzê têkoşîna yê lawaz re *"gerîla"* tê gotin. Jixwe di warê teknîkê de yê xurt raser e. Ji bo pêşxistina terz û taktîkên ku ew ê vê teknîkê vala derbixîne, gerîlatî tê gotin. Ew jî kîjan hedefê dikaribe, ew ê lê bide. Bi hezaran, deh hezaran hedefên ku em dikarin lê bidin hene, lê em lê nadin. Dijmin bi wateya *"were lêde"* kû derê tahkim kiribe, em diçin xwe li wir didin. Em wekî korên çavgirtî ne. Me anîn terzeke wisa. Ew ê bi şerê psîkolojîk jî bigotana *"me xeniqand, qedand."* Ew weşana li ser malpera înternetê, tomarkirina çend çalakiyan, ew lîstok xera kir. Gerîla heye, li ber xwe dide.

Wê demê hemû propagandayên AKP'ê li ser vê derewê ne, vala ne. Şer heye erê, lêdide, feqet dixwe jî. Ji ber vê dikevin zorê jî. Civakê dixapîne. Civaka Tirkiyeyê bi gotina *"tine dikim"* xapand. Civakê dît ku ne wisa ye, ew bi xwe dixwe. Civaka Kurd bi şiklê, *"min te tine kir, gerîlayê te qedand"* dixapand. Kurdan jî dît ku ne wisa bû. Moral girtin, hê zêdetir li ber xwe didin. Niha berxwedana civakî bi propagandaya wê têkoşîna gerîla pêş dikeve. An heke propagandaya Gerîlla TV nebûna ewqas berxwedana civakî nedibû. Em nikaribin propagandaya gerîla bikin, em nikarin propagandaya pêşeng bikin, me nikarîbû berxwedaneke wisa bidomandana.

Ji ber vê yekê lazim e em girîngiyê pê bidin. Beriya her tiştî lazim e çapemenî-weşan xwe ji pênasekirina xwe ya li gorî xwe

berde. Xwe wekî xebateke partî û şoreşê bibîne, li gorî vê xwedî li rol, misyon, wezîfeyên xwe derkeve û gerekên wê bîne cih. Heke neyne cih lazim e mirov pê bide kirin. Rêxistin ew ê niha bi ser çapemeniyê de biçe, lazim e ev bê zanîn. Ya heta niha hinekî tawîz bûn, rexneyên sînordar çêbûn, lê heke çapemenî wisa bimîne, dijmin şerê taybet ewqasî zêde bike, ewqasî cih bide medyayê, çapemeniya me jî hê bêje, *"em çi bikin, em wisa ne, dest li me nedin",* rêxistin vê qebûl nake. Heke qebûl bike ew ê têk biçe. Ji bo nebe, ew ê vê sekna çapemeniya qebûl neke. Ew ê ji çapemeniyê bixwaze ku di Şerê Gelê Şoreşgerî de mîna HPG, mîna YJA-Starê organê yekemîn e, jê bixwaze bibe hêza şerker û ew ê vê bide kirin. Ew ê li gorî vê têkoşîn û xebatê bimeşîne. Tiştekî din nayê qebûlkirin.

Ji ber vê jî lazim em di qiraxên wezîfe û berpirsiyariyan de nemeşin. Em nedin milekî. Lazim e em xwedî lê derkevin û li xwe bigirin. Lazim e em çapemeniyê rast pênase bikin. Wezîfeyên propaganda-ajîtasyonê li ser vî esasî lazim e rast bê destgirtin, meşandin. Wekî esas em dikarin vê îfade bikin. Lazim e çapemeniya me jî li ser vî bingehî be. Wekî organê xebateke mezin a şoreşgerî lazim e karîger bibe. Xwedî misyon be, rolê bilîze, xwe ber bi bayê ferasetên cuda bernede. Çep-rast li ber ba nekeve. Lazim e azadiya çapemeniyê şaş fêm neke. Xwe pir zêde bi bayê zemînê hiqûqî bernede, nekeve asteke ku otosansurê dike. Lazim e em xwe bi xwe sansur nekin. Rewşeke wisa heye. Lazim e em teqez ji van rizgar bibin. Di warê şerê psîkolojîk-taybet û têkoşîna dijî wê de jî ev dikarin bên gotin. Tabî ev xisûsên ku dikarin berfirehtir bêne destgirtin. Ev mijar dikarin hê zêdetir bêne hûrkolandin.

Di civîna Cotmeha 2017'an de hin hevalan ev anîn rojevê; *"em li dijî şerê taybet rêxistineke têkoşînê damezrînin û bimeşînin."* Ya ecêb jî ev nêrîn ji aliyê hevalên ku xebatên çapemeniyê dimeşînin, hate ziman. Di demek nêz de me civînek din li dar xist. Komek hatiye dibêje, *"em li dijî şerê taybet têdikoşin."* Baş e wê demê, têbikoşin û me rizgar bikin, heke hûn

têdikoşin, ma hûn çi ji me dixwazin. Ev çepandin e. Êrîşa li dijî me hemû şerê taybet e, têkoşîna em dimeşînin hemû li dijî şerê taybet e. Niha 3 kes li cihekî dane rûniştandin, ew ê li dijî şerê taybet têbikoşin û hilweşînin. Em têkbirina şerê taybet ji wan hêvî dikin, her hal em ê jî pê bavêjin ser pê. Ma wisa dibe? Xwe bi xwe avêtina derveyî rastiyan rewşeke pir zêde xeter e. Nabe ku mirov xwe ewqasî ji rastiyan qut bikin, li gel me reva ji wezîfe û berpirsiyariyan heye. Şerekî têkoşînê ya herî dijwar, herî tûj, herî kûr heye. Êrîşa qirker faşîst bi şiklekî topyekun heye, em jî bi şiklê seferberiyê topyekun li ber xwe didin.

Kar zor in, atmosfer tûj e, wezîfe giran in, lê ji ber ku wisa ye, wezîfe li naverastê hiştin û jê revîn jî oportunîstî ye. Wisa nabe. Lazim e em li dijî hemû meyla oportunîstiyê têbikoşin. Ji ber ku zor e, em nikarin li rehetiyê bigerin, lazim e em bi ser zorê de biçin. Zor jî be lazim e em wezîfeyan serxînin. Şoreşgeriya Apoyî wisa ye. Wezîfe zor in, dijmin êrîş dike, mijûlbûna bi çareseriya pirsgirêka Kurd sêdarê tîne, ma gelo Rêbertiyê ji ber vê tiştekî wisa got, *"ez nekevim nav vî karî!"* Na, negot. Rêbertiyê got, *"Pirsgirêka Kurd min nafirand, ev pirsgirêk li ber çavên her kesî bû, her kesî çav lê digirt. Min mîna herkesi nikarîbû çavê xwe lê bigirim û derbas bikim, min got pirsgirêk heye û li ser min ma. Lê min got heye, min rastî got, ez ê bêjim."*

Apoyî ev e. Nêzîkatiyên wekî zorî hene, kar zêde ne, wê demê ez li goşeyekê bisekinim, xwe bidim a rehet, bendewariya wezîfeyê ji hinên din bikim, şaş in, oportunîstî ne. Teqez ne terzê nêzîkatiya şoreşgerî ne. Lê rewşeke wisa di nav me de bi zêdehî heye. Rewşeke bendewariyê heye, her kes li hev dinêre. Binêrin ez li ser vî karî me, mîna neynikê ye. Dema ku tu ji jor ve li PKK'ê dinêre, kî çi ye baş tê dîtin. Bila tu kes nefikire ku xwe vedişêre. Bila nebêjin rêveberiya jorê nizane. PKK mîna neynikek pak e, kî oportunîst, kî şoreşger, çi xeta hene, net dibîne. Xwedî li wezîfeyan nayê derketin, ewqas parçebûna rêxistinî ji ber vê ye. Her kes xwe dide goşekê. Yê din rexne dike, jê dipê. Ewqas rexnekerî heye, ev jî tê wateya ben-

dewariyê. Tê wê wateyê ku wezîfeya xwe li hinên din bar kiriye. Rexnekirin tê wê maneyê. Bendewariya ji hinan, ango tê wateya reva ji wezîfeya xwe. Em nahêlin û naçin, lê em pêwîstiyên wezîfe û berpirsiyariyan jî naynin cih. Bi sedan dibêjin em kadro ne, wekî milîtanê şoreşger ê komple, çep-rast digere. Mesela li Bakur faşîzm êrîş dike, ji ber bi Kurdî axiviye lînç dikin, çavê xwe lê digire. Dest ji Apoyîtiya wî, şoreşgeriyê berde, lazim e mirov gumanê ji mirovatiya wî jî bike. Ma wisa milîtan dibe! Nizanim tu yê bêjî, *"ez rojnamevan im, nûçegihan im, endamê çandê me",* lê bizane ku beriya her tiştî tu şoreşger î. Mesela rêxistineke me ya baş a çapemeniyê hebûya, niha me yê li Bakur qira wan banîbana. Her roj ew ê bikarîbana yek-du îtîrafkarê sixur bi erde re bikirana yek. Jixwe digirin, dibêjin ev milîtan in û digirin. Wê demê lazim e em bibin milîtan.

Li gel vê, zêdetir bendewarî û hesabekî ku ew ê çareseriya demokratîk, siyaset bibe çêbû. Bi şiklekî pir zêde em bi bayê *"çareserî çêbû"* ketin. Rêber Apo got, *"min kengî ji we re gotiye ew ê HDP şoreşê bike."* Lê me negot HDP wê bike, me got kiriye. Di wê astê de me her tişt dan HDP'ê. HDP, mîna ku PKK'ê bi rê ve dibe derket, çi eleqeya wê pê heye. Niha derket holê ku hemû nêzîkatiyên derveyî rastiyê ne. Ji ber vê jî yê ku dibêje *"ez vî karî dikim, yê din nakim"* esas dixwaze bêje, *"ez nûçegihan im, têkilî ti karên din nabim."* Yê ku vê dibêje oportunîst e. Ji milîtaniyê qut bûye, çapemenî wekî pîşeyî tercîh kiriye. *"Ez hunermend im, lê ne şoreşger im",* ne bi vî şiklî ye jî.

Mazlûm Dogan, berxwedana Hîlwanê û encama ji sekna ku li hemberî qetilkirina hevalê Hakî Karer derxistiye holê bi hevokekê xulase kir; *"Ji bo şoreşgerê Kurdistanê lazim e di destekî de çek, di destê din de pirtûk hebe. Yê ku wisa bibe dikare bibe şoreşger, wezîfeyê bimeşîne. Yê ne wisa be, nikare bimeşîne."* Niha pîvan ev e. Rêxistina ku Mazlûm Dogan damezrandî, heke xwe ji gelek wezîfeyan sînordar bike, teng bike, ji hemû wezîfeyan bide revandin, bibêje *"ez tenê ev im"*, wisa nabe. Mazlûm Dogan wisa nexebitî. Ji ber ku ez pê re xebitîme,

şahid im. Negot, *“ez propagandakariyê dikim, kovarê derdixim. Nikarim bi rêxistinbûyînê re mijûl bibim, perwerdê re mijûl bibim, şer re mijûl bibim.”* Tevlî biryardana, plansaziya çend çalakiyan bû û meşand? Heta hate girtin jî dimeşand. Çapemenî wisa bû. Xebatên çapemeniyê xebatên wisa bûn. Niha di bin navê damezrandina rêxistinên cuda de ji wezîfe û berpirsiyariyên xwe direve. Wezîfe û berpirsiyarî ji hev tên qutkirin. Ev parçekirina giştî ye, parçekirina jiyanê ye, parçekirina heqîqetê ye. Ev jî parçekirina civakê ye. Civak ne parçeyî, yekpare ye. Em hemûyî dinirxînin. Di wî halî de nabe. Nêzîkatiyên wisa çepandin e, lazim e em sererast bikin.

Şerê taybet û têkoşîna li dijî wê fêrî me dike ku lazim e herî zêde em xwe bi vî şiklî sererast bikin. Lazim e em vê bibînin. Her kes ji her cure karî ji her tiştî wezîfedar e. Apoyîtî, milîtanî tek e, hemû wezîfe wezîfeyên her milîtanî ne. Ji giştî xebat û têkoşînên îdeolojîk, polîtîk, rêxistinî, eskerî, civakî her şoreşger berpirs e. Yên ku dibêjin *“ez vî karî dikim, ji ber vê jî yê din nakim”* û ji wezîfeyê direvin hene. Ango bi kurtasî ev bi qurnazî ji hin wezîfe û berpirsiyariyan direvin, lazim e em dest ji van qurnaziyan berdin. Lazim e em xwe ji rewşên wisa li ber ba dikeve rizgar bikin. Em şerê taybet jî rast û yekpare fêm bikin. Li dijî şerê taybet rast û yekpare fêmkirina Şerê Gelê Şoreşgerî û bi yekpareyî xwedîlêderketin lazim e. Enceq wê demê em dikarin serkevin. Wê demê ew ê her kes çalak bibe. Her der ew ê guregur şer bike, bixebite. Ew ê pêşketina şoreşgerî bafirîne. Ew ê xebat yekparebûnekê bi dest bîne. Ji ber vê jî cudahiyê wekî hin cih pratîk in, hin ne wisa ne, ew ê ji holê rabe. Ew ê nirxandin û şaşiyên mîna hin xebat girîng in, hin na, ji holê rabin. Li her derê lazim e her cure wezîfe û berpirsiyariyê di asta şert, merc, derfet û firsandan de bike. Şoreşgerek xwe wezîfedar dibîne û hîs dike ku li her devera lê hemû wezîfe û berpirsiyariyan bîne cih, bimeşîne. Wate û pîvana milîtaniya Apoyî ev e.

## Encam

Me hewl da rewşa xwe ya giştî analîz bikin. Ji bo qada têkoşînê ya ku hêza yekemîn e, pirsgirêkên heyî çi ne, wezîfeyên ku lazim e werin cih, li ser vî bingehî çi dibe pirsgirêk, ji kû tên, rêyên çareseriyê çi ne, ji bo rêyên çareseriyê bixebitin lazim e em çi bikin? Wezîfeyên dikevin ser milên rêveberiyê çi ne? Wezîfeyên dikevin ser milê tevgera giştî çi ne? Wezîfeyên li ber giştî pêşengiya Partiya me çi ne? Wezîfeyên rêxistina YRD'ê ku bi şiklekî xweser ji bo meşandina xebatên propaganda û ajîtasyonê hatiye rêxistinkirin, çi ne? Lazim e Komîteya Giştî ya YRD'ê çi bike? Komîteyên Jêr çi bikin? Bi giştî xebatên YRD'ê, lazim e di nav vê atmosfere de çawa bê plankirin, rêxistinkirin û meşandin? Di çarçoveya van pirsan de me hewl da nêrînan diyar bikin. Li gorî xwe me hin çareserî danîn ortê. Ev ne ku nayên zanîn, nû dernakevin holê. Dema ku YRD dihat sazkirin jî em bi heman pirsgirêkan re hevrû bibûn.

Me mijar nîqaş kirin, pêwîstî diyar kirin. Beşek hat çareserkirin, feqet di nav pêşketinê de pirsgirêkên nû derketin û mezin bûn. Ji ber vê jî di rojevê de hê jî gelek ji wan nehatine çareserkirin. Hin gav hatin avêtin, lê rewşeke ku bêçare mayîn tê nîşandan, em vê red dikin.

Lazim e bi îdîayek mezin, bawerî, daxwazê ve em van wezîfeyan fêm bikin, bibînin, xwedî lê derkevin, baweriyê bi serketinê bînin û bi rêxistinkirinê ve bimeşînin. Me hewl da vê bidin.

Em li ser pirsgirêkên teorîk, felsefîk, îdeolojîk, rêxistinî, terz, uslûp, tempoyê; pirsgirêkên rêveberiyê; pirsgirêkên kad-

ro rawestiyan. Bi dîtina me piraniya wan girîng bûn. Dibe ku me hemû nikarîbû bi giştî bidana, lê yên hatin ziman jî girîng bûn. Yên ku lazim e teqez bên kirin jî hene. Lazim e hesabekî mîna ku “em nekin ew ê derbas bibe, em ê jê rizgar bibin” neyê kirin. Xwe ferz dike, dixwaze teqez pêk were. Li ser vî bingehî em bawer dikin ku ew ê tenê bi akademiye re sînordar nemîne, ji bo giştî xebatên qada medyayê, xebatên YRD’ê, xebatên çapemenî-weşanê bibe tevkar ku rastiyan bibîne, bi biryardarî, li ser vî bingehî ji bo ku karibe bi plan û rêxistinî xeta û nebesiyên xwe kêm bike, were halekî ku dikare xurttir û serketîtir kar bike. Xizmet bike ku em xwe bînin vî halî. Yên ku li vir hatine gotin, derketine holê, hatine ziman xwedî taybetmendiyeke wisa ne. Dikare ne têrker be, lê yên hatin gotin jî ne kêm bûn. Ji bo bicîhanîna gerekên van, heke hewldanek rêxistî çêbibe ew ê gelek pirsgirêk çareser bibin, gelek kêmasî derbas bibin. Bi rastî jî xebatên me yên propaganda-ajîtasyonê ew ê bigihêje asteke hê xurttir, bibandor, civakê perwerde bike, seferberî rêxistin û çalakiyê bike.

Em bi vê bawer in, hemû rêveberiya YRD’ê jî tê de, hemû hevalên ku li vê qadê dixebitin, ew ê wisa nêzî encamên van nîqaşan, nêrînan bibin, wan bikin bingehekî derxistina xebateke şoreşgerî-serketî. Armanca me pêşxistina hestiyarî, hişmendiyeke wisa bû. Jinûve kişandina wêneyekî bû. Bi xwedîderketina li encamên wê, ew ê bê dîtin ku yên esas wekî nabe xuya dikin dikarin bi hewldaneke kolektîf bi lezekê pêk werin. Tenê bila bawerî pê hebe û rast nêz bibe. Bes bila kêmasî û xeta hê rasttir bên pênasekirin, hebe bi dewlemendkirinê bê dîtin. Tenê bila biryardarî û îradeya derbaskirin û meşandina rast bê nîşandan.

Li ser vî bingehî em bigihêjin yekîtiya armancê û serketinê esas wergirin. Eynî mîna pêşengên me yên ev xebat afirandine, pêş xistine, mîna rastiya me ya Rêbertiyê, mîna rastiya şehîdên me yên bi Mazlûman, Gûrbetelliyan tê ziman, em têkildarî serxistina xwe bi xwe bawer bin.

Heke nêzîkatî ev be, nîqaşên vir jî nîşan dan ku çareserî mimkun e, hem jî bi lezûbez mimkun e. Heke ev rast bê destgirtin, hemû kadro wisa nêz bibin, dikare xeta û kêmasî bêne derbaskirin, rêbazên serketî yên çareseriyê bêne pêşxistin. Ew ê were asteke ku di xebatê de yekpare serdixe, pêşengtiyê bike ku pêşiyê li zafera şoreşê veke. Baweriya me li ser vî bingehî ye, daxwazên me yên serketinê jî li ser vî esasî ne. Em ji dil û can bawer in ku yên wisa nêz bibin, hewl bidin ew ê serketî bibin.